# PEPÛLA AZADIYÊ

## – Şîrîn Elem Hûlî –

Ahmedê BILOKÎ

ROMAN

**J&J – 063**

**PEPÛLA AZADIYÊ – Şîrîn Elem Hûlî –**
AHMEDÊ BILOKÎ

**Gerînendeyê Weşanê**
Azad ZAL

**Edîtor**
Dersim OREMAR

**Redaksiyon**
Hogir BERBIR

**Amadekirina ji bo çapê**
J&J

**Wêneyê Bergê**
Rêza ELIYA [Portreya Şîrîn Elem Hûlî]

**Çapa Yekemîn**
Sermawez 2014

**Çapxane**
Berdan Matbaası
Davutpaşa Cd. Guven İş Merkezi, C Blok, No: 215/216
Topkapı / İSTANBUL
Tlf: 0212 613 12 11

**ISBN**: 978-605-4852-33-8
[Sertifîka no: 22054]

***© Weşanên J&J***
*© Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê bêyî destûra weşanxaneyê û nivîskêr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.*

---

**AJANS J&J**

**Adres:** Huzurevleri Mah. 188. Sok. 1/C-21
KAYAPINAR /DIYARBAKIR
**Email:** ajansjj@gmail.com
**Tel:** +90 412 349 01 89
**Mobile:** + 90 533 436 58 54
**Web:** www.ajansjj.com/www.ajansjj.net/www.ajansjj.org

# PEPÛLA AZADIYÊ

## – Şîrîn Elem Hûlî –

Ahmedê BILOKÎ

**Ahmedê Bilokî,** di sala 1974an de li gûndê Bilokê ya ku bi Qosera Mêrdînê ve girêdayî ye hatiye dinyayê. Hîn di temenê xwe yê biçûk de pêrgî zextên dijwar hat. Di temenê pênc-şeş saliya xwe de Kazim Xoce (Zekî Palabiyik) nas kir. Dema di sala 1980ê de li gundê wan ew şerê dijwar derket û Kazim Xoce tevlî heft hevalên xwe gihişt pakrewaniyê, bi çavê xwe dît. Wê rojê ew û kekê xwe Abidîn, bi saya apê xwe ji mirinê filitîn, lê wê rojê tiştên sotînêr dîtin. Tiştê ku di wê rojê de qewimîn her dem di dilê wî de ma. Di salên 1986 û 1987an de, hîn bêtir hevalên weke M. Emîn Aslan nas dike, di dawiya sala 1987an de tê girtin, rojekê di bin çavan de dimîne û îşkenceyê dibîne. Di heman salê de li ber çavê wî bi bavê wî îkenceyek pir mezin tê kirin û bavê wî bi rojan di bin çavan de dimîne. Ev hemû di hundirê wî de bertekên mezin çêdikin. Ji M. Emîn Aslan pir hez dike. Û êvara panzdehê Gulana sala 1988an dema kalê wî jê re dibêje radyoyê veke, nûçeya destpêkê pakrewaniya lehengê wî M. Emîn Aslan dide. Ev rewş wî dixe nava xemgîniyek mezin. Wê şevê heta sibê ranazê û piştî panzdeh rojan bi awayekî çalak tevlî tevgerê dibe. Li Botanê, Mêrdînê, GAPê, li Lubnanê Bêrûdê û Şamê dimîne. Di bîstê çotmeha sala 1993an de, li Qoserê tê girtin, li girtîgeha Mêrdînê, Amasya, Sîncanê dimîne û aniha hîn jî li girtîgeha Tîpa F ya Îzmîrê dimîne, heta niha zêdeyî 20 pirtûkan nivîsandiye. Û hîn jî dinivîse û dibêje; "Me bi bawerî û jiyana xwe ya azad, dîwar bêwate kiriye." Tenê pênç salan dibistan xwendiye. Û gazî ye; sê caran birîndar bûye, carekê jî mar pê veda ye. Bilokî heta niha di mercên zinadnê de gelek berhemên wêjeyî afirandine, 4 roman nivisandine. Ev berhema ber destê we berhema yekemîn e ku tê çapkirin. Di mercên zindanên de yên din jî li bende çapkirinê ne.

**Berhemên wî:**

* Pepûla Azadiyê –Şîrîn Elem Hûlî– [Roman], Weşanên J&J, 2014-Amed

## PÊŞGOTIN

*Bûyera kû bûye mijara vê romana di destên we de, tenê ne berhema xeyalperestiyê ye. Ango dema ku romanê wergerînin û dest bi xwendinê bikin, hûnê bibînin ku rastiya vê romanê ji hêlên xeyalî gelek zêdetire. Hûn dê bibînin ku zarokên Kurdan ji destê pergala Îranê çi êş û janan dikişînin. Hûn dê bibînin bê çawa zarokên Kurdan diçin ber îdamê û pêrgî çi kiryaran tên. Lehenga romana min ne xeyalî ye. Rastî ye…*

*Çima min romanek wisa nivisand? Weke tê zanîn keça Kurd Leyla Qasim ji hêla rejîma Sedam ve hate îdamkirin. Tiştên ku Leyla Qasim jiya mijara romanek qeraseye. Dema min dest bi lêkolînê kir, mixabin min dît ku romana vê keça Kurd ya leheng nehatiye nivîsandin û xemgîniyek mezin ket dilê min. Ji ber vê min got divê romana Şîrîn Elemhulî were nivîsandin û min rahêşt pênûsê.*

*Ez ji bo alîkarî û piştgiriya vê xebatê di serî de spasiyên xwe pêşkêşî Mazhar GÛLER û M. Şefîk ÖZTEKÎN dikim û malavayiya wan dixwazim. Hevalê Mazhar di şertên girtîgehê de ji min re çavkanî peyda kirin û bû alîkar. Hêvî dikim di demeke nêz de bigihêje azadiya xwe.*

*Hevalê M. Şefîk jî di dema nivîsandinê de bi pirkirina nusxeyan kedek mezin û bêpayan nîşan da. Biqasî min jî di vê romanê de keda wî heye. Herwisa, ez ji bo keda kekê xwe Abidînê Bilokî, nivîskarê hêja Hogir Berbir û Berçema Xerîbî spasiyên xwe pêşkêş dikim.*

*Li girtîgehê nivîsandina romanan gelek zehmete. Ger ne ji alîkariya hevalên mirov be, nivîsandin ne gengaze. Ev romana min a çaremîne. Ji ber ku ez di girtîgehê de me û derfetên weşandinê tuneye, heya niha çi romanên min nehatine weşandin. Cardin ji bo alîkariyê spas...*

***Ahmetê BILOKÎ***

# PEPÛLA AZADIYÊ

## – Şîrîn Elemhulî –

شیرین علم هولی • Shirin AlamHooli

Li welatê ku ew lê dijiya, tu tişt bi awayekî asayî pêk nedihat. Tiştên ku li vî welatî pêk dihatin û diqewimîn li tu deverên cîhanê nedihatin dîtin. Her roj bûyerek erjeng, ku mirov di nava matmayînê de dihişt diqewimî. Carna bi kiryar, carna bi zagon û carna jî bi dar- ve- kirina mirovan hemû cîhan li xwe diheyirand. Ango li vî welatî jiyan li ser devê şûrê bû. Kengî, dê çi qewimîba nediyar bû. Ji ber vê yekê mirov û civak bi şev û roj di nava tirs û xofê de dijiyan. Hemû gavên xwe bi tirs û mitalî davêtin. Lewra nedizanîn kengî, çawa, dê çi were serê wan.

Vê rewşa kambax, kêlî bi kêlî derûniya civakê xera dikir û dibû sedama bûyerên balkêş, ku mirov metelmayî dihiştin. Lî gel ku ev welat xwediyê xislet û taybetiyên wisa bû jî, ew, ango Şîrîn biryara têkoşîna azadiyê dabû û li dijî vê pergala nexweş mîna serhildêriye danîbû holê û dest bi rêwîtiyek ji agir kiribû. Rêya wê bi asteng bû, bi toz dûxan lê dilê wê mezin bû. Bê şik û guman di riya rastiyê de dimeşiya. Di riya ku ji xwe re mîna rêwîtiya heqîqetê didît dimeşiya. Dema dimeşiya qet li dû xwe nedinêrî û nedixwest stûyê xwe ba bide û li dû xwe binêre.

Piştî demeke dirêj dîsa li bajarê Tehranê bû, di nava girseya gel de bi gavên hêdî hêdî dimeşiya, zêde li der û dora xwe nedinêrî, piştî hinekî meşiya, ji nişkê ve sekinî, bêhnek kûr kişand. Vê carê bi awayekî hûrbûnî li dora xwe nêrî, bi sedan jin dît, hemû di nava çarîkên reş de bûn, tenê çavên wan xuya dikirin. Bêhna wan, rûyên wan, levêm wan, difinên wan, birûyên wan, bişrînên wan, kenên wan û diranên wan veşartî bûn, winda bûn ango dîl bûn. Ango berzebûyî bûn. Hemû dişibiyan hevdû, hemû weke hevdû bûn, weke hevdû dimeşiyan û yek reng û yek nêrîn. Nêrînên bi êş, nêrînên xeniqandî, nêrînên qedexe-kirî, nêrînên dîlgirtî û nêrînên di bin nîrê zilmê de per-çîqandî. Tu taybetmendiyên wan, tu cudahiya wan xuya nedikir. Şîrîn bi dengekî nizm ku tu kesî nedibihîst di ber xwe de got; "Em, di bin van çarikan de hemû taybetmendî, nazenîn, behre û bedewiya xwe winda dikin. Ango em di dîmenekê de heman rengîn. Tu xweseriya me nemaye li vî welatî. Ev pergal bûye kujerê giyan û xwezaya me".

Meşa xwe vberdewam kir, lê vê carê bi gavên bilindtir û êdî qet li çep û rastê xwe nedinêrî. Weke ku ji bilî ku xwe bigihîne cihê xwe pêvetir, li tiştekî din nedihizirî. Dema geheşt serê kolaneke pir teng, ji nişkê ve sê kesên bi kincên sivîl pêşiya wê girtin û ew rawestandin. Şîrîn di nava şik û mitalan de li wan nêrî û bêy ku tiştekî bêje xwest wan derbas bike, lê nehiştin. Şîrînê cardin hewil da wan derbas bike, dîsa nehiştin. Gava Şîrîn xwest bêje, "ma hûn çi ji min dixwazin" ji wan her sê kesan du kes ketin milê Şîrîn û ew bi leza birûskê avêtin hundirê otomobêlê. Şîrîn di hundirê otomobêlê de ber xwe da, xwest bigirî, xwest bike hewar, lê nehiştin. Bi destên xwe devê Şîrîn girtibûn. Wisa bi şîd û bi tundî ku hindik mabû bixeniqe. Bi neçarî bêhn dîda û distand. Mîna ku dixwestin wê demûdest bikujin, bi ferasetek hovane, derveyî miro-vantiyê nêzî wê dibûn. Şîrîn têgihiştibû ku rewîtiyek hîn

dijwartir destpê kiriye. Lewre her yekî ji hêla xwe ve bi çavsorî lê didan. Heta ku ew ji otomobêlê danîn, bi dehan kulm lêdabûn. Piştî ku Şîrîn xistibûn hundirê otomobêlê nehiştibûn qet li der û dora xwe binihêr e. Otomobêle ji nişkê ve rawestiya, deriyê wê vekirin, dîsa du kesan bi milê Şîrîn girtin û ew ber bi avahiyekê ve birin. Çavên Şîrînê bi çavbendê ve girêdayî bû û herder mîna qetranê reş. Car caran ji nişkê ve pehîn li zikê wê dixistin. Ew birin menzelekî ku di bin erdê de çêkiribûn, jêre gotin: "rûn ê". Şîrîn hêdîka bi semt rûnişt. Ew têgehişt ku bêdengiyeke mezin serwer e. Ne liv, ne tevgerek, ne dengek û ne jî pêjnek hebû. Tenê bêdengî. Tenê tarîtî. Tenê nediyarî. Tenê bêhna mirinê, bêhna xwînê, bêhna windabûnê û bêhna tenêtiyê li her derê hakim bibû.

Tenêtî, Ango neçarî, Ango dûrî, Ango keser, êş û jana bêdawî. Xwîna ji bêvila Şîrînê dihat, hêdî hêdî diherikî, gava dilopên xwînê li erdê diket, çipe çip… û dengê xwînê, dengê xwîna tîr. Dengê xwîna mirovahiyê û dengê xwîna miletekî bêdengiya hakim li odeyê dişikand.

Her sê pasdar, li dora Şîrînê bêdeng rawestabûn. Carna di navbera xwe de dimizmizîn û dixwestin rewaniya, ango derûniya Şîrînê fam bikin. Bi dengên nîzm ji hevdû re digotin; "ka dê çi bike?"

Lê Şîrînê tiştek nedikir. Bêdeng rûniştibû. Yek ji pasdaran bi gavên livgiran ber bi Şîrînê ve meşiya. Wê fam kir ku yek hêdî hêdî ber bi wê ve dimeşe. Hizirî û di dilê xwe de got; "dibe ku cardin pehînan li zikê min bixe" lewre bi mebesta ku li çolekê be û xwe ji xeteriyek mezin biparêze, bedena xwe şidand. Ewqasî bi tundî xwe şidandibû, ger tîr li sînga wê ketiba, dê bi şûn de bipengiziya. Pasdar hat li ber Şîrînê sekinî. Bi qasî kêliyekê ji jor ve li Şîrînê nêri, dûrê bi dengekî tund û tirsnak got; "rabe ser xwe," Şîrîn ranebû, pasdarî cardin bi heman

şêweyî gotina xwe dubare kir. Şîrîn dîsa ranebû. Ew jî ji ber helwesta Şîrînê matmayî man. Bi her du milê Şîrîn girtin û birin avêtin şaneyek teng, şane pir teng bû, ewqasî teng ku Şîrînê nidikarî xwe vir de wê de bide. Destên Şîrînê ji piştve girêdan, derî li ser daxistin û çûn. Ode gelek sar û mîna qeşegehê bû. Şîrîn mîna pelê çilû diricifî. Destpêkê ling û destên wê tevîzîn. Dûrê hêdî hêdî sirê hemû laşê wê dagirt. Mejiyê wê westiya, çavên wê giran bûn û êdî tu tişt ranebihîst. Janeke bê payan di bedena wê de digeriya û ji nişkê ve serê wê bi ser pêsîrên wê de wergeriya. Niha tenê bêdengiyek ji mirinê xeraptir li ser şaneyê serwer bû û Şîrîn bê liv wisa ketibû ser betona sar…

Şîrîn, bi lingê tazî, kincên tenik û bi tenêtiya xwe re, di wê şaneya tarî de bi awayekî ji xwe çûyî dima. Herî dawî pir ricifî bû, ewqasî lerizî bû, mîna ku li ser hemû laşê wê cemed hebû. Di temenê xwe de tucarî ewqas necemidî bû. Xwêdana li ser laşê wê ku xwe dabû der di nava kêliyekê de zuha bibû, dûre pêlên cemidandinê li dû hev liviyabûn. Şîrîn dilerizî, dengê teqe teqa diranê wê di wê şaneya biçûk de ku dişibiya tenûrê olan dida, olan dabû û ji ser xwe ve çûbû.

Hin li ser betonê bû, mîna ku ketibe xeweke giran, li wê derê hilweşiya bû.

Her sê pasdar di nava kenekî ku hundirê mirov, mehdê mirov dixelandin ketin hundirê menzela bin erdê, li hevdu nêrîn û bi dengekî bilind keniyan, her siyan ji hevre gotin; “kuştina mirovan çiqas xweş e!”

Cardin keniyan û bi awayekî hişk destên xwe li hev dan. Ji çavên wan xwîn, ji devê wan kilîz diherikî. Yekî ji wan, bi dengekî bilind got; “ma em ji bo çi rawestiyan e, em dest pê bikin, min bêriya şikencê kiriye!”.

Bi lez û bez deriyê şaneyê vekirin. Hundir ripîreş bû. Çavan çav nedidîtin, bêdeng bû. Pasdar gavek din avêt, dîsa tu deng û tu pêjn nehat pasdarê tirsonek, ji bêdengiyê tirsiya û di cihê xwe de rawestiya. Çongên wî ricifîn, ji nişkê ve xofek mezin kete dilê wî. Xwest gavek din bi pêş de bavêj e. Lê ew wêrekî bi xwe re nedît. Du caran di ber xwe de got: “çima deng ji vê jina ku neyartiya xwedê dike nayê!”. Bi çavên tijî tirs bi paş de vegeriya. Dema ku hevalên wî ew dîtin, matmayî man û demildest gotin;

- Ka çima te ew gawir ne anî?

- Min du caran bangî wê kir lê bersiv neda.

- Çawa?

- Ez jî nizanim

- Çima te li hundir temaşe nekir?

- Hundir pir tarî bû. Ez tirsiyam û êdî min nekarî gavek din bavêjim.

- Bizdokê bizdok!

- Ez çi bikim, gava ku min devê şaneyê vekir, tirsek cuda xwe berda ser dilê min. Min kir nekir lingê min bi pêş de neçû. Mîna ku labîrentek reşqetranî û dawiya wê nediyar li pêşiya min be, tirsiyam!..

- Em çi bikin nabe.

- Baş e em biçin, wext nemaye.

Vê carê her sê bi hevre meşiyan. Çûn li ber deriyê şaneya Şîrînê sekinîn, derî vekirin. Repe repa lingên wan di hundir de olan dida, fener pêxistin. Şîrîn li ser betonê şaneyê ya cemedî dirêj kirîbû. Bêhnek nexweş ku mejiyê mirov diêşand ji hundir dihat. Dîwarê şaneyê efinkî bibû. Ji rewayê mirov nikaribû çend deqeyan tê de bimîne, lê

Şîrîn nêzî bîst û çar saetan e di hundirê vê şaneya genî û qirêj de bi awayekî ji xwe çûyî dima.

Roniya fenerê dan ser çavê Şîrînê. Lê Şîrîn qet bertek neda. Bê liv li wir dirêjkirî bû. Destên wê yên ku ji pişt vê girêdabûn, werimî bûn. Tiliyên wê reş û şîn bibûn. Mirov digot qey giyan di bedena wê de nemaye. Du pasdaran xwe dan bin milê Şîrînê û ew anîn hêwanê, li ser kursiyekê runiştandin. Destên wê vekirin. Ji bo ku bi ser hişê xwe de were av avêtin ser çavên wê. Hêdî hêdî Şîrîn hate serxwe. Dema çavên xwe vekirin, dîsa her sê pasdar li pêşberî xwe dîtin. Şîrîn ji serma mina belga dar çilû diricifî, gelek sar bibû.

Yek ji pasdaran bi awayekî şîd ji paş ve keziya Şîrînê girt û kişand;

- Tu çima ew qasî ditirsî?

- Ez natirsim!

- Wê demê tu çima ewqasî diricifî?

- Min sar e!

- Ne, ji ber ku tawanbariyên te giran e, tu wisa dilerizî.

- Min tu tewanbarî nekiriye.

- Ji xwe hûn hemû wisan e, hûn tiştekî napejirînin.

- Ez ê çi bipejirînim?

- Tu bi xwe dizanî dê çi bipejirînî. Ne pêwîst e ez ji te re bêjim. Demeke din dê bibînî.

- Min tiştek nekiriye.

- Beriya her tiştî tu neyartiya xwede dikî.

- Ma hûn xwedê ne?

- Te çi got?

- Min tiştek negot.

- Çima tu hîn zelaltir naxivî. Ez ji hevokên te fam nakim.

- Ez bi zimanê we nizanim.

- Tu çawa welatiya vî welatî yî, ma tu kê dixapînî.

- Ez, rast dibêjim. Ez bi vî zimanî nizanim.

- Ma qey te qet dibistan nexwendiye?

- Ne.

- Ji bo ku tu tiştekî nebêjî te dest bi dek û dolaban kir.

- Ne wisaye, ez rast dibêjim.

- Em ê gavek din bibînin ku tu dizanî, an nizanî.

Lêpirser ji nişkêve ji wir çû. Şîrîn bi tenê li hêwanê ma. Hineka derfeta hizir kirinê dît. Herçiqas ku bedena wê westiya bêhêz bû jî, lê mejiyê wê, bîra wê zindî bû. Cardin her sê pasdar ketin hundir. Yekî ji wan kursiyek anî li hemberî kursiya Şîrînê bi cîh kir û li ser kursiyê rûnişt. Bi çavên tund li Şîrînê nêrî. Bêyî ku biaxive ji cihê xwe rabû, heta ku hêz hebû pehînek li zikê Şîrîn da, ewqasî bi şid lêxistibû ku Şîrîn bi qasî çend deqeyan bi ser xwe ve nehat, dikir nedikir henaseya wê nedihat. Êşek bedewî, êşa ku serê wê êşandibû, xwe li bedena wê rapêça bû. Çend çipik xwîn ji bêvila wê nûqutîn ser çonga wê. Şîrînê di hemû temenê xwe de car yekem bû pêhnek wisa hovane dîtibû. Wê fam kiribû ku ew pêhn rast e rast ji bonakuştina wê lêdane. Aso xwîn hindik be jî êşa pêhnê daketibû û Şîrînê êdî hinekî bêhn distand.

Lêpirser hinekî din jî kursiya xwe ber bi ya Şîrînê ve bir, bi çavên xwe yên zîq li nava çavên Şîrînê dinêrî.

Keça nazenîn, keça Kurd, keça ku mîna karxezalekê nazenîn û nazdar. Keça ku tenê bi zimanê Kurdî dizanî. Wê tenê biqasî xwe biderbirîne çend hevokên farsî dizanî.

Şîrîna çavxezal û keça bêhempa. Niha dest û ling girêdayî, mîna xezalekî ku tîr bi dilê wê ketiye, neçar û birîndar bû.

Lêpirser bi dengekî sawtijî;

- Tu kî yî?

Şîrîn bersiva pirsa neda, mîna ku dengê wî nebihîstibe tevgeriya û bêyî ku li lêpirser binêre, bêhnek kûr kişand.

Lêpirser cardin bi hêrs pirsî:

- Tu kî yî?

Şîrînê hêdî hêdî, giran giran serê xwe bilind kir û li nava çavê lêpirser nêrî, du caran li ser hevdu xweziya xwe daqurtand, lingên wê tevizî bûn, çend caran tiliyên lingê xwe livandin, hinekî xwîn di rehên lingê wê de geriya û ew tevizandina kambax piçekî kêm bû. Lêpiser cardin bi dengê xwe yê pelos got:

- Tu kî yî?

Şîrînê vêcarê bersiv da:

- Ez baş bi zimanê we nizanim.

- Tu çawa bi zimanê me nizanî. Tu neçarî bi zimanê me biaxivî.

- Min dibistan nexwendiye. Tenê ez bi hinek hevokan dizanim.

- Ma tu ne Farsî?

- Ne!

Dema lêpirser ev bersiva dawî bihîst dîn û har bû. Mîna ku seyê ku gule li serê wî ketibe, gazînî pêket û bi dengekî bilind got;

- Tu çawa ne Farsî.

- Ez ne Fars im, ez Kurd im. Nijada min Kurd e. Zimanê dayika min Kurdî ye, navê erdnîgariya welatê min Kurdîstan e.

- Bes e, bes e, êdî neaxive, ez ê serê te biperçiqînim. Hûn sedemê ne aramiyê ne. Hûn "terorîstin", hûn neyarê xwedê ne, li vî welatî Kurd nînin.

- Ne hûn rast nabêjin Kurd hene, zimanê Kurdan heye. Kevneşopiyên Kurdan heye, dîroka Kurdan heye. Hûn nikarin vê rastiyê tune bikin.

Lêpirser mîna haran, kef bi devê wî ketibû, rahişt qamçiyê û bi hemû hêza xwe laşê Şîrînê da ber qamçiyan. Li stu, lingên û pişta wê, hema herdera ku diket ber wî bi qamçiyê lê dida. Tevî lêdanê çêr jî digotin. Biqasî saetekê şikence domandin. Xwîn ji bêvila Şîrînê diherikî, hêsir ji çavên wê dihatin. Dema li Şîrînê didan, bênavber digotin; "zu biaxive, di derbarê karê xwe de agahiyan bide me, hûn rêxistinek çawan e? Hûn çima dixazin welate me perçe bikin?" Şîrînê bersiv nedida. Gava ku bêdengiya Şîrînê didîtin, hin bêtir hêrs dibûn û şikence zêdetir dikirin. Vecarê sola Şîrînê, gorên wê derxistin û lingê wê tazî kirin û bi qemçiyan li binê piyên wê didan. Heta ku westiyan lêdan. Qêrîn û hewara Şîrînê di hundirê wê hêwana biçûk de olan dida. Binê lingê wê weke qetranê reş lêhatibûn. Piştî navbera şikencê, lingên Şîrîn xistin nava teşta tijî sûravk. Di nava ava bi xwê de mîna ku lingên wê bi ciletê were birîn dişewitî, şewatek sotîner ku hemû bedena wê diêşand. Ewqasî diêşiya, hêsirên çavê wê mîna barana biharê dibariya. şikenceker dîsa hat li cem wê sekinî û got:

- Heke tu neaxivî, em ê her tiştî bînin serê te.

- Tiştekî ku ez bêjim tuneye.

- Heye, heye…

- Ne tuneye.

- Ji xwe em bi hemû xebatên we dizanin.

- Wê gavê çima hûn ji min dipirsin?

- Divê tu bi xwe mikor werî.

- Ez tiştekî nizanim.

- Çawa tu nizanî, hûn li dijî xwedê rabûn e.

Şîrînê bersiv neda vê pirsê û di dilê xwe de got; “em li dijî xwedê ranebûne, lê heke hûn xwedê bin, rast e em li dijî we rabûn e, heta nefesa xwe ya dawî ji em ê li dijî we bin.”

Lêpirser cardin gef li Şîrînê kirin:

- Ez ê cardin werim, heke tu vêcarê neaxivî, ez ê bi destê xwe te bikujim. Divê tu hemû tiştên xwe ji min re bêjî.

Bi çavbendek reş çavê Şîrînê girêdan. Çavbend ewqasî şidandibûn, ku Şîrînê wer dizanî dê serê wê biteqe. Ew di pêlikê re daxistin, dû re ew ji deriyekî teng re derbas bibû, ji nişkê ve bêhneke ku mirovan difetisîne li ser çavê Şîrînê liviya. Bêhna mîz û pîsî tevlihev dihat, ewqasî dijwar bû, Şîrînê nidkarî nefesê bistîne. Ji nişkê ve şikencekar ew pal da nava avê, av bi ser gozika Şîrîn diket, cîh pir teng û nizm bû. Şîrînê nedikarî li ser piyan rawest e, biqasî du saetan di rewşek xûzkirî de mabû, herî dawî ji ber ku çongên wê qerimî bûn, neçar mabû di nava wê ava genî de rûnê. Şîrînê êdî nedizanî şev e yan roj, nizanibû şev û roj çawa derbas dibin. Bi berdewamî çavê wê girêdayî bûn.

Ew çend roj bû xwarin bi devê wê neketibû. Xwe pir bêhal û bêmecal radibihîst, ji birsa dilê wê dixwewirî, serê wê gêj dibû. Piştî çar pênc saetan, hatin ew ji wê dojehê derxistin û birine cîhekî din, ew der jî pir kambax bû, lê ji devera din baştir bû. Di wexteke nediyar de jêre pariyek nan û îskaneke avê anîn. Şîrînê nanê zuha xwar. Li erdê

betaniyek qilêrî raxistîbû, çû li ser betaniyê rûnişt, çend caran li ser hevdu bêhnên kûr kişand û ew rojên wê yên ku biryara têkoşînê dabû, mîna şirîta fîlmekî dirêj di ber çavên wê re derbas bibûn. Mîna ku ji yekî re biaxive hêdîka lêvên wê yên tenik û nazenîn liviyan;

"Ez, Şîrîn, keça Kurd, keça ku zimanê wê, kevneşopiyên wê, dîroka wê, ji hêla serdestan ve nedihat hesibandin. Ez, li gundê Demqislaqê ya bajarê Makuyê ji dayik bûm. Rojbûna min sala 1984 e. Ango di sala vejîna Kurdan de ez hatime dinê, ez jî weke zarokek Kurd di nava çanda Kurdewar de hatime dinyayê, min çavên xwe li gundekî ku şahidiya hemû êş û janan kiriye, vekirine. Roja ji dayikbûm çarenûsa min diyar bibû; êş, girîn, nalîn, axîn, koçberî û mirin. Ev hemû ji bona min weke çarenivîsê hatibû diyar kirin. Dê jiyana min bi van hevokan bihata hûnandin. Û dê ev hevok bibane reşeşevkên min. Ez di nava êl û hozek mezin de hatim dinyayê, min di temenê xwe yê biçûk de, li çîrokên trajîk yên ku li ser gelê min hatine vegotin guhdarî kir. Her roj ez hinî çîrokeke têkçûn, mirin, darvekirin û mişextiyê dibûm. Dayika min bi hêsirên xwe, bi dengê xwe yê kelegirî ji min re qala têkçûna dîroka gelê min dikir. Di temenê biçûkaniyê de min navê Rabîe, Asiye û Yaşar xanimê bihîst. Navê wan, ji bo min nasname bû, kesayet bû û bû paşeroj. Nemaze serpêhatiya Rabîe xanimê, mîna tîrekî sotîner li dilê min ketibû. Lehengiya wê, welatperweriya wê, ji bo min bibû ayetek ji pirtûka pîroz. Min zêde wate û mebesta berxwedana wê nezanîbû. Lê di wî temenê biçûk de nîgaşa min a herî mezin ew bû ku dayika min jî mîna Rabîe bibe jinek bihêz. Nemaze dayika min di şevê zivistanê yên sar de dilê me bi çîroka Rabîe xanimê germ dikir. Gava dayika min navê wê bi lêv dikir keserek kûr dikişand, êşa sed salî ji çavên wê diherikî. Car caran bêy ku em bibînin hêsrên çavên xwe bi çarika xwe ya ku bi moriyan ve hatibû

neqişandin paqij dikir. Min zêde wate nedida hêsrên dayika xwe. Piştre ez dê têgeheştibam ku hêsirên dayika min; hêsirên dîrokeke wendabûyî ne, hêsirên gelekî jar û bindest in. Hêsirên neçariya jina Kurdan e, hêsirên têkçûnek dijwarin. Rabîe xanim hevala Hesikê Têlî bû, yê ku dema serhildan û şerê Agirî destpê kir, ji bo serfiraziya gelê xwe rabibû û  xwe gehandibû hevalên xwe yên serhildêr.

“Hesikê Têlî bi mêrxasî û merdiya xwe di şerê li dijî Faris û Tirkan de derdikeve pêş. Herî dawî Rabîe Xanim mîna şêre jinekê şer dike û rûpeleke nû di dîroka Kurdan de vedike. Di encame vî şerê Îran û Tirkan de Rabîe xanim tevî zarok û hevserê xwe, Hesikê Têlî şehîd dikevin.

“Dema ku dayika min serpêhatiya vê jina leheng bi van gotinên sotêner bi dawî dikir, li çavê min dinêrî û mîna ku ji min re bibêje: ‘te fam kir keça min. ’ Min jî hêdîka serê xwe bi wateya ku min famkiriye dihejand. Nizanim ji ber çi bû, nemaze dayika min ji min re çîrokên jinên leheng vedigot. Berdewam çîrokên xwe dubare dikir. Pir şevan beriya ku ez serê xwe danême ser balîfê û razêm, min ev pirs ji xwe dikir, ‘çima dayika min jî ne weke wan jinên ku bûne mijara çîrokan e?’ Lewra min pir dixwest dayika min jî mîna Rabîe Xanim, biba mijara çîrokan. Lê di wî temenê xwe de min qet bersivek ji bo pirsên xwe nedidît. Ango pirsên min bê bersiv diman.

“Keçika cîranê me Perya, ku em hev temen bûn car caran bangî min dikir û me bi hevre li pişt xanî dilîst, Perya keçikek jîr û jêhatî bû, hin di wî temenê xwe de gotinên pir mezin-mezin dikirin. Ji ber vê herdem min ew ji xwe jîrtir û li cem wê min xwe pir nezan didît. Mîna ku Perya jî di vê fêrdariyê de bû, tevdigeriya. Mînak; min herdem porê xwe bi awayekî şeh dikir û keziyên xwe dihûnandin. Lê Perya her roj bi çeşnekî cuda porê xwe

dihûnand, keziyên xwe cur bi cur girêdidan, dema ku em diçûne cem hev, demildest destê xwe davêt desmala min û digot, ka îro te çawa porê xwe hûnandiye, gava ku didît min bi heman çeşna berê keziyên xwe hûnandine, dibû tîqe tîqa wê û dikeniya. Piştî ku têr dikeniya îcar, destmala xwe derdixist û keziyên xwe nîşanî min didan. Rojekê dîsa Perya bangî min kir û xwest em biçin û li pişta xanî bilîzin, min dizanî wê Perya dîsa qala afirêneriya xwe bike, lê min biryar da ku vê carê ez  derfetê nedim Peryayê. Min çîroka Rabîe Xanim di serê xwe de zelal kir, cara yekem bû ku min li dijî Peryayê pêngavek hilgirtiba. Dema ku em çûn pişta xanî demildest min got;

- Perya

"Ji ber ku herdem ew di destpêkê de diaxivî, hinekî matmayî ma û bi rûyekî aram got;

- Çi?

- Ez dixwazim ji te re serpêhatiya jineke leheng vegêrim, çîroka Rabîe Xanimê.

- Ma tu çîroka Rabîe Xanim dizanî?

- Ew kî ye?

"Min jêre çîroka Rabîe Xanim kite bi kite vegot. Cardin Peryayê ez matmayî hiştim. Min digot, dê henekê xwe bi min bike û dê çîroka min biçûk bibîne, lê Perya bi baldar-iyek mezin li çîroka min guhdar kir, baş tê bîra min, xetên rûyê wê demildest guherî bûn, mîna keseke têgihiştî hêdî-hêdî serê xwe bada û li nav çavê min nêrî û bi dengekî xemgîn got;

- Şîrîn.

- Belê.

- Kê ji te re ev çîrok vegotiye?

- Dayika min.

- Dayika te?

- Belê.

- Gelo çima dayika min jî ji min re çîrokên wisa venagêre?

- Nizanim.

- Şîrîn.

- Bêje?

- Tu dizanî?

- Çi dizanim?

- Ez pir dixwazim bibim jinek mîna Rabîe Xanimê.

“Gava min ev hevokên Perya bihîstin, cardin min xwe li cem wê bicûk dît, lewra dayika min bi dehan caran ev cîrok ji min re vegotibû, lê qet hizra ku bibim mîna Rabîe Xanimê, nehatibû bîra min.

Min digot çima dayika min nabe mîna Rabîe Xanimê… Peryayê dîsa pirsî;

- Ma tu naxwazî bibe mîna Rabîe Xanimê.

“Ez hinekî ponijîm. Ya rast ez ne li benda pirseke wisa bûm. Beriya ku cardin Perya pirsa xwe dubare bike min bersiv da;

- Ne.

- Çawa?

- Min dixwest dayika min weke wê be.

- Ew ê çawa dayikên me mîna Rabîe Xanimê şer bikin?

- Çima, ma nikarin?

- Ne nikarin, ma tu nabînî, dayikên me çawa ji bavên me ditirsin?

- Rast e.

“Peryayê dîsa bi çîroka min, ya xwe bi ser ya min xistibû, cara yekem bû ewqas ji Perya aciz bibûm. Lê dîsa jî min pir ji Peryayê hez dikir. Heval û hemraza min bû.”

Şîrînê hêdîka serê xwe ji ser çonga xwe rakir, dema ku li dora xwe nêrî dît ku ew bi tena serê xwe di wê Şaneya reş û tarî de rûniştiye. Hin jî hemû kincên wê şipîşil bûn. Bêhna genî ji hundir dihat. Xewa wê pir dihat, di nava êş û birînan de xwe li ser beteniya şil dirêj kir. Bijangên çavê wê hêdî-hêdî giran bûn û hatin girtin…

*   *   *

Bi gurmêna derî ya erjeng Şîrîn ji xewê vecinikî û xwe komî ser hev kir. Çend caran li ser hevdu derî bi tundî girtin û vekirin. Şîrîn rabû ser xwe, çongên xwe ber bi sînga xwe ve hilkişandin û li ser beteniyê rûnişt. Li hundirê şaneyê tu ronahiyek nebû. Hundir pir tarî bû. Bêhnek pelos ku gewriya wê dişewitand bi hemû dijwariya xwe, xwe dabû ser rûyê wê yê westiyayî. Şîrînê gelek dixwest bi qasî misqalekê jî be ronahiyê bibîne. Wê ji ronahiyê gelek hez dikir, ji ber vê yekê hemû hevalên wê, ji wê re digot Ronahî.

Navê Ronahî pir lê hatibû û wê jî pir ji vî navî hez dikir. Lê niha tenê tîrêjek ronahiyê jî nebû. Şîrînê nedizanî ku di çend qatiya bin erdê de dimîne, nedizanî ew qatê çendê ye, tenê tişta ku dizanî, ev bû… Li cihekî pir kûr de bû.

Ji ber ku hewa nedistand serê wê pir diêşa. Êşa serê wê, ji êşa birînên ku di bedena wê de vebibûn geriya, di dilê xwe de got; “teqez hewakêşa vê şaneyê heye, lewre mirov nikare bêhewakeşî çirkekê jî di vir de bijî.”

Bi van hestan li hewakeşê geriya. Gava ku ber bi qorziya şaneyê ve çû ji nişkê ve bêhnek tîngerim li rûyê wê liviya, hêdî-hêdî xwe li wê bêhna tîngermî girt û hinekî

din xwe ber bi qorziya şaneyê ve pal da. Êdî serê wê li ber hewakêşê bû, lê bêhneke kambax, bêhneke tehl ku di asta mirov ji xwe dibir jê difûriya, te digot qey bêhna zirfûna xerabe jê dihat. Bêhnek tuj û dijwar bû. Tevî wê jî Şîrîn neçar bû li bê liv û lebat li ber wê hewakêşê rûne.

Dengê piyên lêpirseran ji hêwanê dihat, bi hev re di-axivîn, lê dengên wan baş nedihat Şîrînê ku axaftinên wan bibihîze, bêhna xwe çikand û bi baldarî li wan guhdar kir, lê tiştek fam nedikir, dengên wan tevlihev dibû û di wê hêwana teng de olan dida, ev jî dibû sedema nefamkirinê. Piştî çend deqeyan bi zîngîniyeke tund deriyê şaneya Şîrînê vebû, lê ji ber ku bi çavbenda stûr û reş çavên wê girêdayîbûn, tu tişt nedidît. Her du destên wê jî li pêşiya wê girêdayî bûn. Lê pêjna lingên wan dibihîst. Kêlî bi kêlî dengên lingan nêzîktir dibûn.

Fam kir ku ber bi wê ve tên. Hatin li ber Şîrînê rawestiyan, yekî ji wan, ji Şîrîn re got; “rabe ser xwe.” Şîrînê çend caran xwest rabe, lê hercar ditewişî û li ser çongên xwe diket erdê. Lêpirser têgehîşt ku Şîrîn nikare rabe, bêy ku biaxive, bi keziyên Şîrînê girt û li dû xwe bi erdê re kaş kir kir. Canê Şîrîn ew çendî êşiyabû, digot qey çermê serê wê hatiye selixandin. Xwest bike hewar, lê bêhna wê dernediket, tenê ji çavên wê hêsir herikîn. Bi qasî deh metran ew wisa li dû xwe kişandibûn û ber bi hêwana şikencegehê biribûn. Her çendî navê wê hewanê cihê şikencê bû jî, li wir bîst û çar saetan li ser rêbazên şikencê jî dihat hizirandin û rêbazên nû ji bo şikenceya girtiyan dihatin diyar kirin, dîsa tenê ew hêwan ne cihê şikencê bû, li hemû deveran şikence hebû, lewre bi şev û roj qêrîn û hewara mirovan ji hemû hêlan bilind dibû.

Şîrîn ji erdê rakirin û li ser kursiyekê rûniştandin, ji ber êşên sotîner Şîrîn bê hemdî xwe mîna pelê çilû diler-izî. Êşa serê wê her ku diçû zêde dibû. Janeke bêdawî li

hemû serê wê de diliviya, rehên ser cênîka wê mîna tiliyên destan werimî bûn û rehên pişt stuyê wê hişk bibûn. Şîrînê digot qey piçeka xwînê naçe serê wê, lewre tevizandinek bêhempa radibihîst. Hevsengiya laşê wê têk çûbû.

Her du lingên wê qeyd kirin, heta ji wan hat qeyd şidandin. Destên wê jî girêdan. Lêpirser cixara xwe pêxist, piştî ku çend caran li dû hev cixare helmijî, xweliya wê berdida ser çavên Şîrînê, ev kiryar ji hemû curên şikencê xerabtir bû. Lê Şîrîn di wê rewşa kambax de jî li ber xwe dida û nedixwest ku şikenceker bizane  ew pir jî cixarê hez dike.

Şîrîn beriya were girtin jî gelek cixare dikişand, di bin çavan de tişta herî zêde aciz dikir jî cixare bû. Lê qet ev nedida der. Niha jî wisa tevdigeriya. Kengî şikenceker xwelî berdida ser rûyê wê, bêhna xwe digirt û nedihişt bandorê li ser bike. Herî dawî şikenceker, agirê cixara xwe danî ser milê wê yê tazî, êşê dabû hestî û mejiyê vê. Şîrînê axîneke kûr kişandibû. Vê carê agirê cixara xwe di gewriya Şîrînê de vemirandibû. Heta ku agir vemirîbû li ser gewriya wê hêlabû. Şîrîn ji ber vê êşa giran wisa qîriya bû, wisa qîriya bû ku hemû derî, hemû şibake û diwar hejiya bûn. Lê belê lêpirser mîna ku ji vê êşa Şîrîn çêjê digere bi dengê bilind dikenî. Şîrîn pir tênî bibû, kezeba wê ji tîna dişewitî, ji wan re got: tasek av bidin min, li hevdû nêrîn û dîsa kenîn. Dûre jî yek ji wan got;

- Ma tu tî bûyî?

- Belê!

- Baş e, em ê avê bidin te, lê tu jî dê bersiva pirsên me rast bidî.

- Min tenê av xwest, ez…

Şikenceker nehişt Şîrîn axaftina xwe biqedîne û got:

- Bis e, bis e ez dizanim tu dê çi bibêjî; ‘ez bi tiştek nizanim, ’ te dê ev bigota ne?

- Erê.

- Lê ji bo ku tu avê vexwî, divê tu ji me re çend tiştan bibêjî.

- Tiştekî ku ez bêjim tune ye.

- Wê demê av jî tune ye.

- Bila tune be.

- Ma qey tu dixwazî kezeba te ji tîna biteqe?

- Bila biteqe!

- Ne, ne em ê avê bidin te.

Îskaneke avê anîn, ji ber ku dest û çavên Şîrîn girêdayî bûn, wan bi destên xwe îskan ber bi lêvên Şîrînê dirêj kirin, gava lêvên Şîrînê gihîştin avê, demildest îskan bi paşde kişandin û nehiştin Şîrîn avê vexwe.

- Heta ku tu neaxivî te av venexwar.

Şîrîn bêdeng ma û bersiv neda.

- Çima tu bersivê nadî?

Dîsa bersiv neda.

- Ma tu dizanî, heke tu derbarê karê xwe de agahiyê nedî me, dê bi cezayê îdamê werî darizandin. Wê demê em jî nikarin te rizgar bikin. Di nava çend mehan de tu dê ber bi sêdarê ve biçî. Divê tu biaxivî da cezayê te sivik bibe. Heke tu li me guhdar nekî, em nikarin te ji tewanbariya neyartiya bi xwedê re xilas bikin. Te dijatiya bi koma îslamî re kiriye û ev yek neyartiya bi xwedê re ye.

- Min neyartiya xwedê nekiriye û têkoşîna min ne ev e. Ev bêbextî ne. Hûn tiştên nebûyî davêjin stuyê min. Ji ber ku min tiştekî derveyî zagonên Îranê nekiriye. Ez ça-

lakvana mafê mirovan im. Ez ji bo mavên rewa yên mirovan bi riya hizrê têkoşîna ku li gorî naveroka zagonane kar dikim. Lê hûn rewşa min berovajî dikin û dixwazin li ser navê min tiştên nîgaşî biafirînin.

- Mafê mirovan bi te ma ye? Ma bi van gotinên xwe tu dixwazî kê bixapînî?

- Ez rastiyê dibêjim.

- Hiş be, carek din ez naxwazim gotineke wisa ji devê te derkeve. Mafê kîjan mirovî li vî welatî hatiye xwarin ku tu radibî ji bo mafê mirovan têkoşînê dikî? Ev derew çine?

- Ne, derew nîne, nemaze ez ji bo mafê jinan têkoşînê didim. Lê min li derveyî zagonan karek nekiriye. Tu kiryarên min yên wisa ji nînin. Hîn ji min fam nekiriye ku ji ber çi sedeman û çima we ez li vir dîl girtime? Çima ez li vir im. Çima hûn vê zilma ku li tu dera cihanê nehatiye dîtin li min dikin. Gelo hûn dixwazin bi vê şikenceyê bigihêjin ku? Lê tiştekî ku ez baş dizanim ev e; ez derbarê pirsên ku hûn ji min dipirsin qet û qet tîştekî nizanim. Hûn dixwazin min bikujin, hûn dixwazin min bibin sêdarê.

Piştî wan axiftinên Şîrînê şikencekar şêt bû. Mîna ku tîrekî jehrî li nava kezeba wî ketibe qêrîn pê ket:

- Hiş, bêdeng be, ma tu dixwazî ez te bi pora te ve daliqînim?

Şîrîn axaftina xwe domand:

- Ne, hin tiştên ku dixwazim bibêjim naqediyane. Ji vê kêliyê û şûn de ez di çalakiya birçîbûnê de me, dê perçeyeke nan ji gewriya min re neçe xwarê. Heta ku hûn dest ji şikenceyê bernedin, hûn min bikujin jî ez dest ji çalakiya birçîbûnê bernadim.

Şikenceker bi dengekî ku mehdê mirovan dixelîne keniya û wiha got:

- Te got çiii?

- Min got: ez ê dest bi çalakiya birçîbûnê bikim.

- Tu dixwazî dest bi kevneşopiyek nû bikî, ji xwe hûn çavkaniya hemû xerabî û nebaşiyan in.

- Ji bona rûmeta xwe, ez li dijî we helwesteke wisa digirim, we tu rê û rêbazên din ji min re nehiştin.

- Yên mîna te divê qala rûmetê nekin.

Şîrîn bi vê biryara xwe ew matmayî hiştibûn. Tiştekî wisa ne dipayîn. Ligel hemû şikence û hewildanên wan Şîrîn ji biryara xwe poşman nebibû. Wan destpêkê bawer nekiribû ku Şîrîn dê li ser biryara xwe bimîne. Bi saetan şikence domandin. Cardin Şîrîn ji hiş çûbû. Cardin bedena wê di nava xwîna wê de gewizîbû.

Şîrîn avêtin şaneyeke din, ev şane jî weke ya berê bû. Take cudatiya vê şaneyê taqek biçûk bû. Şîrîn li ser erdê û ji xwe çûyî dirêjkirî bû. Wisa bê liv û lebat te digot ne saleki, deh sale mirî ye.

* * *

Şev qediya û dinya hêdî–hêdî ronî dibû. Şîrîn hate ser hişê xwe. Çavên wê vekiri bûn lê gelek westiya bû, ji ber ku dest û lingên wê girêdayîbûn, nerehet bû û astengî dikişand, bi dijwarî xwe rast kir. Êşek e ku heta roja îro nedîtibû ketibû pista wê, dikir nedikir, nikaribû pişta xwe rast bike. Herî dawî bi neçarî pişta xwe sipart dîwarê şaneyê, hinekî bêhna wê derket. Ji dema ku dîl ketibû, yekemcar bû çavên wê girênedabûn. Ew jî li vê rewşê matmayî mabû. Di dilê xwe de got; “gelo çima çavên min girênedan e.”

Ligel ku çavên wê vekirî bûn jî, zêde berxwe nedidît. Mîna ku kanîkên çavên wê zuha bibûn, tiştek nedidît. Xwest hinekî çavên xwe mist bide, lê ji ber ku destên wê girêdayî bûn nikarî. Çongên xwe hinekî ber bi sînga xwe ve kişand û bi kabokên xwe hêdî-hêdî çavên xwe mist da. Piştî demekê êdî ber xwe didît. Bi qasî misqalekî hundir ronî bibû. Şîrînê stuyê xwe bada dît ku taqek biçûk di şaneya wê de ye, di wê taqê re tîrêjên tavê xwe berdabûn hundir. Bi erd xweşînkî çû li ber taqê rûnişt, dengê mirovan dihat. Dengê lingên wan dibihîst, tirpêna dilê wan hiss dikir, dengê kenê wan, lê tiştek ji axaftinên wan fam nedikir. Ligel vê yekê dîsa jî dixwest dengê mirovan were guhê wê. Ev ji bona wê dihat wateya ku hê jiyan didome.

Beriya ku were girtin ji hevalên xwe re gotibû; “ger ez rojê rûyên bi dehan mirovan nebînim, nikarim bijîm.”

Lewre demeke dirêj li ber taqê rûniştibû û qet nedixwest roj biqede, lê mixabin dawiya rojê hatibû. Ronî çûbû, tarî dahatibû. Dîsa şaneya wê bibû goristanek reşqetranî. Şîrîn hêdîka cihê pişta xwe guherand. Hindik be jî êşa pişta wê kêm bibû.

Bi dengekî nizm mîna ku razeke pir giring bi hemrazeke xwe re parve bike, lêvên wê liviyan;

“Di van mercên ku her kêlî, her saet, her deqe min dikuje de, serpêhatiya min bi awayekî pir zelal tê bîra min. Ewqas bi hûrbûnî tê bîra min, ku mîna ez wan rojan ji nû ve kêlî bi kêlî dijîm. Piştî min ew çîroka Rabîe Xanim bi Perya re parvekir nizanim bê ji ber çi bû, lê êdî ji wê rojê û şûnde Peryayê ji min re qet qala porê xwe nekir. Qet qala keziyên xwe yên dirêj nedikir. Û nedihişt mijara hûnandina keziyên wê vebe. Ji ber vê yekê min xwe tewanbar didît. Min pir dixwest mijara teşeya hûnandina keziyên xwe yên mîna du çêmên rast vebêje. Lewre di wan rojên dawî de min jî êdî bi baldarî bi şeyê dapira xwe,

porê xwe yê dirêj ku serê wan xirxalî bû şe dikir û teşeyê cur bi cur didayê. Û min pir dixwest ku ez porê xwe nîşanî Peryayê bidim. Çend caran min xwe amade kir ku mijarê bînim ser porê xwe lê Peryayê beriya min qala tiştên ku qet ne di bîra min de bûn dikir. Dûre têgihîştim Perya famkiriye ez dixwazim jêre qala hûnandina keziyên xwe bikim. Lê nizanim ji ber çi bû, qet ew derfet neda min.

“Rojekê gava ku min xwest bangî Peryayê bikim û ji bo listinê biçîne pişta xanî, li axaftina Peryayê û dayika wê bûm şahid. Perya mîna miroveke têgihiştî bi ser dayika xwe de diqêrî, ez matelmayî mabûm. Deng ji dayika wê dernediket.

Peryayê bi hêrs digot;

- Tu min baş mezin nakî, tu ji min re qala tiştekî nakî, hew tu şekirina por nîşanî min didî, tenê derdekî te heye, ew jî ez mezin bibim û mîna te bizewicim û zarokan bi-welidînim, min wê rojê ji te re got, dema hevala min Şîrînê ji min re qala Rabîe Xanimê kir, min pir fedî kir. Te bi wê çîrokê dizanî, lê te ji min re venegotibû. Dayika Şîrînê her şev jê re çîrokan dibêje. Lê tu…

- Keça min hinekî aram be û here pora xwe şe bike.

- Ez êdî pora xwe şe nakim.

- Perya keça min tu çima min tewanbar dikî? Ger ro-jekê tu mezin bibî, tu dê min mafdar bibînî.

- Ne dayê ne, ez tu carî te bi heq nabînim

- Keça min ez neçarim ji bona paşeroja te devê xwe bigirim û bêdêng bimînim.

- Dayê tu dixwazî devê xwe bigire, dixwazî negire, lê weke ku tu dixwazî ez tevnagerim.

- Perya, keça min, hê tu pir biçûkî, temenê te nebûye deh, lê tu ji niha de serê xwe gelek diêşînî.

- Tu naxwazî ez hinî tiştekî bibim. Hevala min Şîrîn bi dehan çîrokan dizane, lê ez qet yekê nizanim. Ma tu dizanî ev çiqasî min mehcûb dike. Min diêşîne.

“Dema Peryayê wisa got, dayika wê ew hembêz kir û ramûsî. Destmala Peryayê rast kir û bi dengekî keserkûr got;

- Peryaya min, çavreşa min, gula ber dilê min, ronahiya çavê min, nuxuriya min, êşa min a yekem, bextewariya min a şevên dirêj, qêrîn û nalîna min a demên neçar, sebr û aramiya min a rojên teng û giran. Peryaya min... ma ez ê çawa qêmîşî van hêsrên te bikim. Her dilopek hêsrên çavên te berberî hemû temenê minin. Gava ku ji van çavên te hêsir diherike, ji temenê min sal diçin. Divê tu vê bizanî, lê soz didim ji îro û pêde ez ê her êvarê ji te re çîrokekê bêjim. Ez nikarim xwe li ber van hêsrên te ragirim.

- Dayê bi rastî dê ji min re çîrokan vebêjî?

- Erê keça min. Ma ji çîrokên me pêvtir çi heye? Tenê ew ji me re hiştine.

“Dema axaftina wan qediya ez derbasî hundir bûm, Perya bi kelecanek mezin ez pêşwazî kirim, yekemcar bû ku ez wisa bi şîd hembêz kirim û ramûsîm. Beriya ku ez biaxivim Peryayê got;

- Şîrîn..

- Çiye?

- Tu hinekî dereng hatî.

- Min taştê dixwar.

- E zê ji tere tiştekî bêjim.

“Ez hinekî hizirîm, min di dilê xwe de got, teqez dê Perya ji min re qala gengeşiya xwe û dayika xwe bike, ez lê zîvirîm û min got;

- Ma dê qala çi bike?

- Ez dibêjim em, îro neçin pişta xanî.

- Em biçin kuderê?

- Em biçin nav dehla me.

- Ma bavê te aciz nabe?

- Ne, ne.

- Başe, em dikarin bangî Sînemê jî bikin, van rojên dawî em qet bangî wê nakin, dê ji me bixeyide.

- Ez dixwazim em herdu tenê biçin. Bila îro jî Sînemê neyê.

“Bêy ku em rawestin em çûn nava dahla wan. Li serê dahlê kaniyek hebû.

“Peryayê raste rast em birin wê derê. Kanî bi aramî û nazdarî diherikî. Newaya avê dilê mirov mest dikir. Wisa hêdî diherikî, wisa bi semt xwe berdida nava koka daran, dîmeneke bêhempa afirandibû. Li der û dora kaniyê darên cur bi cur hebûn. Bêhna hemûyan tevlîhev dibû û bêhneke têkel ku mirov ber bi aram bexşiyê ve dibir difuriya ser çavên me. Min bêhnek wisa yekem car his dikir. Bexçeyekî mîna biheştê bû. Bavê Peryayê hemû dever bi hostayî çêkiribûn. Xerzên mişmişan, xerzên încasan, xerzên tûyan, xerzên gûzan, xerzên hinaran, xerzên xoxan, xerzên gilyasan mîna ku bi hev re ketibin pêşbaziyê, bejn û bala xwe li ba dikirin. Mirov dixwest berdewamî li cihêrengî û têkeliya wan binêre.

“Wê rojê dema min bihîst ku Perya dixwaze mîna min hinî çîrokan bibe, ez gelek dilxweş bibûm. Heta wê rojê di gelek mijaran de ez ji Peryayê hesidî bûm. Lê îro têgihîştibûm ku ew jî ji hinek behreyên min diheside, belkî balkêş be, lê ez bi vê yekê dilxweş bibûm. Lê mîna ku

haya min ji tiştekî tuneye tevdigeriyam. Ji ber ku Perya keçikek şanaz bû û min nedixwest dilê wê bişkê.

“Peryayê bi dengekî nizm ji min re got;

- Şîrîn.

- Belê.

- Ma tu dizanî em ji bo çi hatin vir?

- Ne.

“Perya kenî û ji berîka xwe şeyekî ku pir xweşik hati-bû neqişandin derxist.

- Îro em ê porê xwe li ber vê kaniyê şe bikin.

“Ji nişke ve sawek ku ez ne li bendê bûm ket dilê min, demildest min bersiv da.

- Nabe!

- Çima?

- Nizanim.

- Dibe, dibe.

- Perya.

- Çiye?

- Heke hinek me bibînin em ê çawa bikin?

- Kesek nabîne.

- Wisa nebêje.

- Aram be!

- Ditirsim.

- Ew çiye îcar?

- Ez…

- Tu çi?

- Newêrim pora xwe vekim.

- Netirse.

- Çawa netirsim.

- Şîrîn…

- Belê.

- Em hê zarokin, ma dê çi bibe?

- Ma her roj ji me re nabêjin ser vekirîbûn guneha herî mezin e.

“Dema min wisa got, Perya hinekî hizirî û got;

- Em nahêlin kesek me bibîne.

- Tu ewleyî?

- Erê.

- Baş e.

“Di rastiyê de min jî dixwest em li nava wê dahla xweş pora xwe vekin û li ber kaniyê şe bikin. Lê tirsek jî di dilê min de hebû. Peryayê biryara xwe dabû. Min jî zêde li ber xwe neda;

- Başe em ê destmalên xwe vekin, lê divê tu kes me nebîne.

“Em çûn, li ser kevirekî ku li pêşiya kaniyê bû rûniştin. Destpêkê Perya destmala serê xwe derxist. Keziyên xwe yê hûnandî bi destê xwe yê biçûk veçirand û çend caran serê xwe di seleba kaniyê de dakir û derxist. Porê xwe baş ter kir. Piştre hat li pêşiya min rûnişt û bi rûyekî bi ken got;

- Tu dê pora min şe bikî?

- Min heta îro pora tu kesî şe nekiriye.

- Ez dixwazim tu pora min şe bikî.

“Gava wisa got, em ji nişkê ve keniyan. Tîqe tîqa kenê me di nava bexçe de belav bibû.

“Min hêdî-hêdî pora Peryayê şe kir. Porê wê ya ku mîna herîr nerm, dirêj û pêldar û reşqetranî bû. Porekî ku mîna pêlên behrê pel dida û ji nava destê mirov dişemitî.

“Min jî weke Peryayê serê xwe xiste nav avê, hemû porê min ter bû. Peryayê rahişte şe û bi wan destên xwe yê nazenîn hêdî-hêdî pora min şe kir. Piştî ku şekirina pora min qedand, me li hevdu nêrî û cardin keniyan. Ji ber ku me keziyên xwe nehûnandibû, pora me li ba dibû û car caran di sermilê me re xwe berdida ser sînga me, car caran jî bi hêza ba rûyê me digirt û dîmenên bêhempa derdixist. Em têra xwe li nava dahlê geriyan, beriya ku biçin malê, me dîsa destmalên xwe baş li serê xwe pêçan û porên xwe veşart. Perya li min nêrî û bi dengekî tijî gazinc got;

- Şîrîn...

- Kerem ke.

- Çima em pora xwe vedişêrin?

- Nizanim.

- Ma pora me vekirî be dê baştir nebe?

“Ez hinekî hizirîm. Tiştek nehate bîra min, lê pirsên Peryayê ez ditirsandim. Ji bo ku dilê wê nemîne min got;

- Belkî baştir be.

- Ez qet naxwazim serê xwe gire bidim û pora xwe veşêrim.

- Ez jî.

- Lê dayika min dibêje, li welatê me dîtina porê jinan gunehekî pir mezine.

“Vê carê min ji Peryayê pirsî:

- Çima gunehe?

- Diya min dibêje fermana xwedê ye.

“Êdî em li ser mijarê neaxivîn. Me bi destê hevdu girt û vegeriyan malê’’.

“Roj bilind bibû, siya çiyayên rojava gav bi gav dirêj dibûn. Bermaliyan dest bi amadekariya şîvên xwe kiribûn. Wê rojê dayika min ser û pê çêkiribû. Min ji Peryayê re got, îşev were mala me, şîva me xweş e.

Lê Peryayê qebûl nekir, xatir ji min xwest û çû malê. Dema vegerê dayika min bi ken hate pêşwaziya min û weke herdem ez bi şid hembêz kirim û ramûsîm, wê şevê me di bextewariyeke mezin xwarina xwe xwar. Şîva me xweş bû. Bavê min, ji bo şîvê spasiyên xwe raberî dayika min kirin. Cardin dayika min em li dora xwe civandin û ji me re qala Sînema Dimdimî kir. Dema dayika min qala bedewiya Sînema Dimdimî dikir, mirov li teyisandina wê heyirî dima.

Vedigot û hey vedigot dîsa jî dawiya bedewiya wê nedianî. Min, bi baldariyeke mezin li dayika xwe guhdar dikir. Lewre çîroka keleha Dimdimê dirêj bû û min nedixwest ez ji bîr bikim. Carekê dayika min gotibû; ‘ ji bîrkirin mirin e, divê mirov xwe radestî mirinê neke. ’

“Asoxîn çîrok qediya bû. Min hêdika lihêf kişand ser serê xwe û ez ketim xewa giran.”

Şîrînê bi hemû êşên xwe re, di ber xwe de bişirîbû. Tu carî bawer nedikir dê rojekê li cihekî wisa di nava êşên sotîner de biranînên zaroktiya xwe bibîr bîne. Lê di van rojên dawî de hemû tişt dihat bîra wê. Carina li bîra xwe matmayî dima. Dizanî ku xwediya bîreke zindî ye, lê nedizanî di vê astê de ye.

Mandîbûneke bêdawî xwe li bedena wê verpêçabû. Ewqasî westiyabû. Nedikarî bedena xwe bilepitîne, dest û

lingên wê girêdayî tevizîbûn. Xwîn di wan de nema bû. Şîrîn bi zor û zehmetî û piştî hewleke zor xwe li ser hêla rastê dirêj kir. Hêdî-hêdî mijangên wê ketin ser hev û çavên wê hatin girtin.

* * *

Ji hêwanê dengê qêrîn û hewaran dihat, Şîrîn hişyar bû, laşê wê hişk bibû. Çend roj bû xwarin û vexwarin nexwaribûn, devê wê zuha bibû. Ziman di dev de werimî bû. Lêvên wê tevizî bûn. Gewriya wê dişewitî, bi neçarî bêhn jê derdiket. Bi çavên xilmaşî li dora xwe nêrî, ji tariyê pêvtir tiştekî din nedît.

Şikence.

Qêrîn.

Hewar.

Axîn… û mirin, nediyarî, bêhalî, bêdadî, tîbûn û birçîbûn. Ji ber ku Şîrîn dest bi çalakiya biçîbûnê kiribû, av jî nedidanê, dixwestin bi vê riyê wê ji çalakiyê vegerînin. Lê Şîrîn her tişt dabû ber çavê xwe. Mirin jî di nav de xwe ji hemû tiştekî re amade kiribû.

Pir tî bibû. Kezeba wê ji tîna dişewitî. Kezeb û gurçikên wê qirçe qirç dikirin. Çendî tî bibû, di dilê xwe de got: “xweziya niha li ser kaniya Hemreşo bûma û min devê xwe, mîna karxezalek çiyayî têxista nava avê û bi şev û roj vexwara, qet min devê xwe ji nava avê dernexista!” Di temenê xwe de qet ewqasî tî nebibû. Qet ewqasî bêriya avê nekiribû. Êdî birçîbûn nedihate bîra wê. Tenê dixwest îskaneke avê vexwe. Tenê dixwest lêvên wê yên tenik û nazenîn bigihin avê. Bi dengekî pir nizm ya weke piste pistê de, di ber xwe de got; “Gelo dema Fêqiyê Teyran

helbesta xwe ya bi navê ‘Av û av’ nivîsand, ew jî mîna min wisa tî bibû, gelo tîbûna wî tenê ne tîbûna wehdedî wicud bû, gelo kezeba wî ji tîna dişewitî û xwe nedigihand avê, lewre pişta xwe da dar hirmiyekê û ew helbesta bêhempa afirand û ji me re hişt.”

Di kêliyekê de Şîrîn, hemû kanî û rûbarên welat anîbûn ber çavê xwe û ji wan av vedixwar. Diçû bi ava wan rûyê xwe yê hîvrengî dişuşt û lingên xwe yên qeydkirî ku tevizî bûn bi ava wan hênik dikir.

Bi dengê qêrînekê ku dilê mirovan parçe parçe dikir, Şîrîn veciniqî, ji dinyaya xeyalan hate der û velerizî, hê nedizanî ev qêrîn ji kîjan hêlê ve tê. Derî vebû, du kes ketin hundir. Çawa xwe gihandin cem Şîrînê, bi kulmistan lêdan wisa bi şîd, wisa bi tundî ku Şîrîn mîna gogê di navbera her du pasdarn de dihat û diçû. Şîrînê nedikarî xwe biparêze. Dest û lingên wê girêdayî bûn. Herdu zilaman heta ku westiyan li Şîrînê dan. Dûre Şîrîn li dû xwe bi erdê re kaşkirin û birin menzela şikencê. Ji ber ku di rojên dawî de şikenceya girtiyan zêde bû, ji hemû menzelan dengê qêrîn û hewara mirovan bilind dibû. Şîrîn li ser kursiyê rûniştandin. Çavbenda wê vekirin. Vê carê şeş kes di menzelea şikencê de hebûn. Hemû nû bûn. Kîn û xezeb ji rû û çavên wan dibariya, bi rûyên tirş, bi çavên erjeng, li Şîrînê dinêrîn. Yekî zikteşt ji nava wan rabû ser xwe, bi gavên lezgîn hat li pêşiya Şîrînê rawestiya bi dengekî sawnak got;

- Ka li min binêre.

Şîrîn xwest stuyê xwe bade û li wî binêre, lê ew hêz di xwe de nedît.

Zilamî cardin bi heman dengî got:

- Li min binêre.

Şîrînê sere xwe hinekî bilind kir û li wî nêrî.

- Tu hem dijatiya xwedê dikî hem jî dikevî greva birçîbûnê?

- Min li dijî xwedê ev kar nekiriye.

- Wê gavê, tu li dijî kê/î ketiye birçîbûnê?

- Li dijî neheqiyên we!

- Tu hem neyartina xwedê, him li dijî xwedê dikeve çalakiyan jî, ma emê çawa vê yekê ji tere bihêlîn?

- Ez li dijî şikenceya we, li dijî bêdadiya we ketime birçîbûnê.

- Tu kî yî ku li dijî hêza me serî radikî?

- Ez keçek Kurdim. Têkoşer û parêzvana mafê mirovan im.

- Carek din tu qala mafên mirovan bikî, ez ê wî zimanê te bi destê xwe derxim û bavêjim ber kûçîkan.

- Ez rastiyê dibêjim.

- Rastiya çi.

- Rastiya ku ji bona wê têkoşînê didim.

- Heke rastiyek hebe, ew jî em in. Em bixwe ne.

- Rastî li we nayê.

- Çawa?

- Hûn rastiyê barovajî dikin.

- Tu bi kîjan hêzê qala van gotinan dikî, ser û binê te, tu jinekî. Niha ez dikarim di nava kêliyekê de stuyê te bişkînim û serê te bi lingên xwe biperçiqînim.

- Tu dikarî wisa bikî, lê ev nayê wateya ku tu rastiya min ji holê radikî, ji îro û pêde dê berdewamî rastiya min li ber çavên we be, lewre min tu tewanbarî nekiriye. Min dizî nekiriye, min dermanê serxweşiyê nefirotine, ez

li dû mafê jinan im. Ger hûn serê min jêkin jî ez ji riya xwe venagerim.

- Riya te tune ye û riya te ne tu rê ye.

- Hûn min bêsedem li vir radigirin.

- Wate tu xwe tewanbar nabînî?

- Belê.

- Lê em dizanin tu ji bona çi hatiye Tehranê.

- Ez li gor riyên qanûnî hatime Tahranê. Lê hûn dixwazin bi şikencê min bînin asta tewanbariyê, hûn dibêjin em ê bi şikencê wê bînin asta ku buxtanan li xwe bike. Lê ezê tu carî vê yekê ne pejirînim. Jiber ku tiştê ku min nekariye, nikarim bixime stuyê xwe, ya herî rûmetdar ev e. Divê hûn dest ji vê zilma xwe berdin. We niha nênûkên min kişandin, sê nênûkên min tunene. Ew çendî xwîn ji wan herikî, xwîn di bedena min de nema, lê êdî ji mirinê natirsim. Ji niha û pêde mirina min jî, hebûna min jî dê herdem serê we biêşîne, jiber ku hûn neheqiyek mezin dikin. Vaye nêzî pênç-şeş rojane ez di çalakiya birçîbûnê de me, lê hûn rêzdar tevnagerin û avê nadin min. Gurçikên min mîna puşî zuha bûne. Ger wisa dewam bike, bes ezê çend rojên din bijîm.

Şikencekar bi porê Şîrînê girt û kişand, heta hêz hebû, bi pahniya piyê xwe pê li tiliya lingê Şîrîn ya ku nênûka wê kişandibûn kir. Şîrîn bêhemd qêriya, hêsirên çavên wê herikîn. Êşek wisa sotîner bi temamî hestî û mejiyê vê dagirtibû. şikencekar qiriya;

- Êş û jana te ji niha ve destpê dibe.

- Ji xwe bendewariyak min ya din ji we tuneye.

- Li vir, her tişt em in, xwedê jî, pêxember jî, dad, dadgeh, dadmend û dozger em in. Heke pîvanek hebe, ew pîvan em in. An tu dê biaxivî, an jî dê her roj sed caran

bimirî û zindî bibî, vê yekê baş bizane, em wisa bi hêsanî nahêlin tu bimirî, tu dê rojê sed caran mirina xwe bixwazî, lê em te wisa bi hêsanî nakujîn.

- Hûn dizanin.

- Tu jî dizanî.

- Ne, ez nizanim.

- Em dizanin tu dengê kîjan rêxistinêyî.

- Madem hûn çima ji min dipirsin?

- Em dixazin tu bi xwe jî bêjî…

- Ez çi rêxistinan nas nakim.

- Ger tu nebêjî, ezê çermê te bi destê xwe bi selixînim.

- We çermê Helacê Mensûr jî..

- Te çi got !?

- Min çi negot.

- Tu qala kê dikî?

Şikencekar, jî hevkarê xwe re got:

- Here jêre avê bîne. Bila têr avê vexwe ji bo ku baş biaxive, niha zimanê wê baş nagere.

Av anîn, Şîrîn av vexwar. Dema ku av di gewriya wê de diherikî mîna ku bedena wê jî nû ve dibişkive, zindî bibû. Bêhalî û bêhêziya wê hindik be jî kêm bibû. Roniya çavên wê zêde bibû. Îşîkecekar;

- Te av dixwest, vaye me av jî da te, te têr vexwar, divê îcar tu mîna bilbilan bîxwînî, biaxive, weke din tu rêya te tune ye, te fam kir?

Şîrîn mîna ku derketibe rêwîtiyek dûr û dirêj, kûr-kûr hizirî û got:

- Ez êdî naxwazim biaxivim.

- Çima?

- Hûn heman tiştan dipirsin, ez jî heman bersivan didim.

- Lê hê te pirseke me nebersivandiye.

- Pirsên ku dikarim bibersivîmin hûn napirsin.

- We ji bo çi ev rêxistina ku li dijî xwedêye damezirandiye?

- Min tu rêxistin nedamezirandine.

- Rast e, tu vê red dikî, lê tu endameka vê rêxitinêyî, mebesta we eve ku aramiya welat têk bidin. Ji bo ku hûn aloziyan derxin we rêxistinek li dijî xwedê damezirand û xebatên fesadiyê dimeşînin.

- Xebatek min a wisa çênebûye, ez doza mafên mirovan yê xwezayî dikim. Lê ji ber Kurd bûna min, hûn van buxtanan li min dikin. Nikarim li gor daxwazên we xwe mandel bikim.

- Ji xwe we xwe mandel kiriye.

- Navê rêxistanê we çiye?

- Rêxistineke min tune ye.

- Çima hûn li dijî pergala îslamî ne?

- Ez, li dijî tiştekî wisa derneketime, tenê dixwazim hemû mirov bi rûmet vîna xwe bijîn...

- Tu li kuderê hînî van peyvan bûy?

- Di encama lêgerînên xwe de gihîştîm van agahiyan.

- Wate te perwerdeya rêxistinê nedîtiye?

- Raste, min tu perwerde nedîtine.

- Lê em bawer nakin.

- Ez nabêjim ji min bawer bikin, lê rastî eve.

- Rastî ne evin, çi ji nava lêvên min derkeve rastî ew e.

- Niha ez ê rastiyê nîşanê te bidim. Wê demê tu dê bizanî rastî çiye û çi nîne?

şikencekar, bi dengekî bilind qîriya;

- Zû ji min re kelbetanê bîne.

Demildest jêre kelbetan anîn.

- Gelo hîn jî tu dixwazî li ber xwe bidî yan ne?

- Tiştekî nizanim.

- Baş e.

Şikencekar cardin qîriya;

- Sola wê derxin.

Îşîkencekar li nav çavên Şîrînê nêrî;

- Tu dizanî niha ezê çi bikim. Ezê nênûkên te yek bi yek bikşînim. Lê beriya wî karî, ezê cardin ji te bipirsim, ger tu bersiva rast bidî, ez wî karî nakim, lê heke rast bersiva min nedî, êdî gazinan neke.

- Tu kengî beşdarî rêxistinê bûy?

- Ez beşdarî tu rêxistinan nebûme.

Şikencekar nênûka Şîrînê ji binî deranî, qêrîn, nalîn, û girîna Şîrînê tevlihev bû, kezeba wê êşiya, mejiyê wê lerizî, ji çavên wê birusk cedidan, bedena wê di nava pêtên agir de ma. Çar nênûkên Şîrînê li dû hev kişandin. Êdî Şîrîn ne li wê derê bû, û ji hiş çû. Bê navber dilerizî, zimanê wê nedigeriya û peyv ji nava lêvên wê dernediketin. Guhên wê tiştek nedibihîstin. Şîrîn mîna pelên payîzê dilerizî. Rewşa wê pir nebaş bû. Canê wê ewqas şewitîbû, di dilê xwe de got; “hêza min heta wir bû, ez êdî… Li dijî vê hovîtiyê li ber xwe bidim”.

Difikirî, Şîrîn nedihate ser hişê xwe. Têgihiştin ku Şîrîn êdî bi hêsanî bi hiş nayê, demildest derziyek arambexş lêdan û ew birin şaneyek din. Mîna miriyekî ew avêtin ser betaniyek nava qirêjê de wenda bibû. Qidum di bedena wê de nemabû. Li ser navê hêzê tiştek di bedena wê de nemabû lê hêşta dengê qêrîn û hewara mirovan dibihîst. Li wêderê hemû rengên jityanê hebûn. Êşa nênûkan danediket. Êşa nenûkên bedena wê diqirqiland. Şîrîn cardin, di ber xwe de got; “gelo ez dê karibim li dijî vê hovîtiyê hîn bêtir li ber xwe bidim an ne?”.

Lê dema ku gelê wê yê bindest û hêjar dihat bîra wê, gava hevalên wê dihatin bîra wê, baweriya wê xurt dibû û ji xwe re digot; “ger min bikujin jî, ger min parçe parçe bikin, çermê min jî biselixînin, min li ser koza êgir bigerînin ez ê li ber xwe bidim”.

Ji bo ku hinek ji êşên xwe dûr bikeve, ji bo ku dîwarên şaneya reş û tarî derbas bike û êşên nênûkên li dû xwe bihêle, dîsa berê xwe da dîwarê ku bêhna mirinê jê dihat û bi neçarî lêvên wê liviyan;

“Ez hêdî-hêdî mezin dibim. Temenê min geheştibû, heşt salan. Di wan rojên heşt saliyê de, dayika min bi nexweşiyek kambax ketibû. Kar û berê malê ketibû ser mil û pişta min. Sibê zû hişyar dibûm. Heta tariyê xwe berdida erdê nedirazam û min bêhna vendida. Kar gelek bûn. Min di wî temenê xwe de ji kaniyê av dikşand. Pişta min, dest û lingên min ditevizîn. Bi gotinek din ava reş xwe berdida ser lingên min. Di wan rojan de min du tişt fam kir, min hîn bêtir dayika xwe fam kir, ez têgihîştim ku dayik hemû tişt e.

Heta wê rojê min keda dayika xwe zêde fam nedikir. Min bi wateya xwîdana ku ji eniya wê diherikî nedizanî. Min qedir bilindiya terikandina destê wê, nirxên lêvên wê yê zuha nezanîbû. Min di wan rojên xwe yê bermaliyê de

ev tişt hemû fam kirin. Nemaze ez pir nêzî dayika xwe bibûm. Ya din, cara yekê ez ketibûm nava nakokiyekê, yekemcar bû bi nakokiyekî dijiyam. Bênavber û berdewamî min ji xwe re digot: ’’çima zilam karên male nakin, çima şîvê çênakin, taştê amade nakin, ji kaniyê avê nakişînin, tevî ku temamê min biçûke jî, ez hemû karî dikim, çima jin tenê karê malê dikin û ji xwe re nagerin ’’.

Min tenê ev pirsên bêdeng ji xwe nedipirsîn, di heman demê de, li dijî mêran hêrs û helwêsta min jî zêdetir dibû. Dixwazim li xwe mikur bêm, gava min ev pirs ji xwe dipirsîn, mîna pelên daran yên li ber bayê ketine dilerizîm. Vedîlerizim û ditirsiyam, min digot qey mêr bi her tiştî dizanin. Sawek wisa di dilê min de bû. Car caran min ji xwe re digot; “gelo bavê min dizane ez li ser van tiştan dihizirim. Gelo dizane ji bona mêran ev ramanên wisa di serê min re derbas dibin?”. ez bi vê tirsê radibûm û rûdiniştim. Radizam û şiyar dibûm. Baş tê bîra min, rojekê min biryar da ku êdî qet li ser wan tiştan nehizirim. Lewra gelek caran mezinên me gotibûn, hizirîna van tiştan guneha herî mezin e. Fermanên xwedêye û divê tu kes lêpirsîna wan mijaran di serê xwe re derbas neke. Ji ber vê jî kengî ew pirs dihatin bîra min çongên min dilerizîn, gurmên bi dilê min diket û ji nişkêve devê min zipzuha dibû. Dema şîretên dapîra min dihat bîra min, ez hîn bêhtir ditirsiyam. Wê di hizra min de mêr anîbû asta xwedayê ser rûyê erdê. Di hemû şîretên wê de, ‘mêr li dijî dewletê stûxwar e, jin li dijî mêr stûxwar e. Ango jin siya mêr e. Darê şikestî yê destê mêr e, kengî bihê jinê bibe dû qet, ji lewre divê jin tişê ku aqilê vê nagihêjê neke û nehizire ’ derbas dibûn. Lê ji ber çibû ez nizanim, di van rojan de ev gotinên dapîra min qet bi serê min nediket û min rast nedidîtin. Ji ber vê ez ji dapîra xwe jî hêrs bibûm. Di van rojên havînê de ku mirov ji germa dişewitî, rewşa dayika min hîn bêhtir ber bi nebaşiyê ve diçû. Bavê min

jêre derman dianîn, car caran ew dibir cem bijîjkên nas, lê tu guhertin çênedibûn. Çendî jar bibû, mirov dikarî hemû persûyên wê bihejmêre. Min bi van destê xwe yên biçûk serê dayika xwe dişuşt û keziyên wê şe dikirin. Dema serşuştinê de digirî û digot;

- Şîrîn keça min, bermaliya minê, ez barê te pir giran dikim.

- Dayê tu barê min giran nakî, ma dema ez biçûk bûm te her rojê serê min nedişuşt.

- Keça min, tu hê biçûkî.

- Ne dayê, ne…

- Ji ber nexweşiya kambax tu îsal jî neçûye dibistanê, qaşo me biryar dabû ku te bişînîn dibistanê.

- Dayê kengî tu rihet bibî ezê hingî biçime dibistanê.

- Şîrîna min, her tişt di destê xwedê deye.

- Ezê her êvarê ji bo tendirustiya te duayan bikim dayê.

“Kengî min dayika xwe dibir serşoyê, di navbera me de axiftineke wisa kurt derbas dibû. Heta wê rojê min nezanibû ku dayik û bavê min ji bo şandina min a dibistanê biryarek wisa dane. Ez bi wê agahiyê pir bextewar bibûm. Min, Perya û Sînemê gelek caran nîgaşa çûyîna dibistanê kiribû. Nemaze Peryayê digot; ‘teqez divê ez biçim dibistanê, ’ ji wê rojê û pêde ji bo ku dayika min bi ser xwe de bê çi ji destê min dihat, min dikir. Rojekê bavê min berxek şerjê kir, min çend parî goşt di beroşê de keland, dû re min ava goşt xist tasekê û ji dayika xwe re bir, dadê av vexwar. Wê rojê mîna ku mucizeyek çêbibe, rûyê dayika min weke kulîlkekê vebû. Ez ewqasî bextewar bibûm ku ger per û baskên min heban ezê ber bi asimanan ve bifiriyam. Min ev mizgînî da bavê xwe. Ew jî di

heman astê de kêfxweş bû. Êdî her roj min ji dayika xwe re ava goşt amade dikir. Roj bi roj, kêlî bi kêlî tendirustiya wê ber bi başbûnê ve diçû. Dayika Peryayê her roj dihat serdana dayika min. Ew jî mîna min û Peryayê hemrazên hevdu bûn. Kul, êş, keser, jan û birînên dilê xwe pevre parve dikirin. Carina bi saetan diaxivîn. Li gel ku dayika min baştir jî bibû, hê wan pirsan ez mijûl dikirim û di nava pêlên mejiyê min de olan didan. Ya rast, êdî ez jî ji van pirsên xwe ditirsiyam. Pirsên bêbersiv mirovan ditirsîne, nepeniyekê di nava dilê mirov de diafirînin. Lê min dikir nedikir ji bîra min dernediketin. Berovajî vê, mîna agirê pîroz geştir dibûn, berfireh dibûm û berteka min mezintir dikir.

Kelecana çûna dibistanê jî ez ji van pirsan dûr nedixistim. Di wan rojên dawî de bavê min, berdewam ji min dipirsî, vê yekê ez bextewar dikirim. Kengî derfet bîdîta digot; ‘keça min Şîrîn, tu di van rojên dawî de pir westiyayî, ji ber vê dilê min gelek êşiya. ’

Tucarî bavê min, bi hêsanî hestên xwe wisa aşkera nedidan der. Hezkirina xwe nîşan nedida. Lê wê rojê têgihîştim ku dilê bavê min pir êşaye. Min ew jana ku di kûrahiya dilê wî de mîna çemê Zê diherikî û ber bi cîheke bê binî ve diçû dibihîst û didît. Lê cardin jî dawî bi nakokiya ku li hember mêran de jib o min çêdikir nedihat. Di wî temenê min ê biçûk de weke ku di dil, mejî û giyanê min de efsûniyek pêk hatibe û bihêlê ez hemû tiştî bibîmin.”

Şîrîn hêdîka velerizî, bedana wê di nava lerzînek biyanî de ma. Bê hemd got; “Dayê, Bavo niha êşên min pir giranin û di vê bîra tarî de dilerizim, xwîn jî nênûkên min diniqute. Meidê min dixelîne. Bedena min ew çendî dişewite, mîna ku hemû laşê min bi şîşek sor hatibe daxkirin. Dişewite. Dilsorjiyek erjeng, kembax û wêran. Ez

nizamin dê çi were serê min. Lê li vir her tişt pêkan e. Ne gengaze ku hevak têrî wehşeta vir bike. Tu peyv, tu bêje şiyana rave kirina tiştên ku li vir diqewimin nînin. Dayê herçiqas ez di vê hezaza tarî, bêbinî û cemidî de bim jî, bawer bike, her roj li ba te me.

Serê xwe datînim ser çongên te, tu mîna rojên berê ji min re çîrokên welatê minê berze bûyî vedibêjî, tu pora min şe dikî. Em bi hev re diçin nav bexçe û darên gulan, darên gilyazan av didin. Em bi dengê bilind dikenîn. Aha ez dîsa li ba te me û êşên nenûkên xwe ji bîr dikim. Ma tê bîra te dayê, te ji min re nedigot; ‘Tu êş ji êşa hestiyan xerabtir nîne ’. Lê niha ez dibêjim qey tu êş ji êşa nênûkan sotînertir nîne. Ma gelo li kîjan welatê dinyayê mirov ji hevdu re qala êşa nênûk û hestiyan dikin? Lê îro em êşan ji êşan hildibijêrin û dibêjîn gelo kîjan êş hîn dijwartir e. Dayê bibore êdî çavên min venabin. Êşa nênûkên min zêde dibin, min gelek dixwest taraxa min li ber serê min rûnişta û ji min re li Harpê bixista, belkî wî dengê Harpê yê nazîk ji êşên min re biba derman, lewre di dengê wê de, dengê xulxula avê, ba, baran, teyrik, çûk û bêhna xwezayê heye. Dengê wê biqasî çavên dayika min xweşik û rengîn e”.

Serê Şîrînê hêdî-hêdî bi ser milê wê yê rastê ve wergeriya û çavên wê yê zeytûnî qepat bûn. Dem, hilma afirandina peyva ku ji dilê teqîna mezin firiyaye û xwe li ser dara bexçê dilê mirovan daniye û bi baskên xwe yên heft rengî dilê mirov geş kiriye. Ango dem çîrokeke bêpayan e. Ne serê çîrokê heye û ne jî dawiya wê. Çîrokeke wisa xurt, bihêz û tekel e mîrov pir diwestîne. Ji hal û mecalê dixîne. Gelek qonax, ast û serdemên vê çîrokê hene.

Dem carîna ji bo dildaran dibe bextewarî

Carina dibe dojeh

Carina dibe pêla azadiyê

Carina dibe tîbûn, dibe birçîbûn, dibe êş û mirin.

Carina dibe hespeke rewan û bi çargavkî dilezîne.

Dibe mizgîniya rojbûna lehengekê…

Dem ji bo efsûnê ye. Ji ber vê yekê carina heye, carina ji tune ye… lê hebûna wê bêguman e. Lewre min ji berfîna çiyayên axê bihîstibû. Dem deryaya bê av e. Derya ya ku ji strana çêbû û tije kir, valahiya bêdengiya mezin û bi pêlên xwe yên xwedayî tevgera bêdawî da destpêkirin e. Dem şûrê destê şervanê yekemîn e û bi efsûniya xwe diheje li dijî zilmê. Dem keda mîrovê yekemîn e. Dem, peyva yekemîn e. Dem pêvajoya mezinbûna zarokekî ye. Dem di nava giyan û bedenê de pira ku ji baskê pepûlê hatiye pê. Yên ku nizanibin di ser vê pirê re bimeşin, nikarin xwe bigihînin giyanê xwe û nikarin strana azadiyê ji dîrokê re vebêje. Dem kaniyek du çavî ye, ji çavekî wê jehr diherike, ji çavekî we jî avek zipî zelal û cemidî diherike, ger mirov ji çavê wê yê jehrî avê vexwe mirin neçar e, ger mirov ji çavê wê yê zelal avê vexwe jiyan berdewam e. Dem tîr e, giyan xezal e, ger xezal xwe neparêze dê bi kuştinê re rûbirû bibe. Dem derya ye, mirov masî ye. Dem nêrîna dawî ya girtaiyê ku diçe sêdar ye ku daxwaza dîtina stêrkan dike. Dem, biŞîrîna hezkiriyane ku cara dawî li hezkiriyê xwe dinêre. Dem, dem bêhnvedana mirov e. Lê li wir, li wê şanaya tarî dem dibû gergerînek, dibû bîra bêbinî û Şîrîn dadiqurtand, dixeniqand. Nedihişt Şîrîn bêhnê bistîne. Dem li wir dibû lavlava jahrîn û xwe li bedena Şîrînê dipêça. Êdî dem nebiŞîrînek bû. Ne nêrînek, ne helbesta jiyanê bû. Ne strana azadiyê û nêrîna Şîrîn ya li çiyayê Şaho bû. Dem bibû agir û bi ser Şîrînê de dibariya. Dem bibû stirî û Şîrînê bi lingên tazî li ser dimeşiya. Dem bibû tîrekî ser jahrî û li nava dilê Şîrînê ketibû. Şîrînê bi destê xwe yê tevizandî tîrê ser jahrî ji zerya dilê xwe

dikişand û davêt. Êşek bê dawî li bedena wê pêl bi pêl pêlav dibû. Ew êşeke cuda bû. Êşa ku nedişibî tu êşan, êşeke zirav û dirêj, êşeke bê ser û ber. Êşek kulî hemû demê, li hemû hêyamê, li hemû gerdûnê û erdnîgariyê belav bûye. Êşa dilê keça kurd. Êşa birînên keça serhildêr Şîrînê.

Şîrîn demeke bi êşên xwe re, bi birçîbûna ku bedena wê bêhêz kiribû, di binê wê şaneya tarî de ku mîna qetranê bû di nava têkoşînek vîndarî de bû. Li gel hemû şikence, gef lêxwarinan jî dîsa dest ji çalakiya birçîbûnê bernedida û berxwe dida. Ji bejin û bala wê ya nazenîn tenê çerm û hestî mabû. Ava di bedena wê de zuha bibû. Lêvên Şîrînê ji bê wîtamîniyê terikî bûn, rûyê wê yê xweşik çirmisî bû. Hemû hestiyên wê jan didan.

Şîrîn li ser betaniya ter ku ji qirêjê bêhnek genî dida rûniştibû, hêdî-hêdî bêhn dida û distand. Gava ku bêhn distand xizîniya gewriya wê ya zuha di hundirê wê şaneya mirinê de olan dida. Gewriya wê ewqasî dişewitî, hêsir ji çavên wê dihat. Demeke dirêj bû, berdewamî di şaneyên bin erdê de dima û her roj şikence didît. Çend caran xwestibû xwe bikûje, lê ew derfetê ku xwe bikuje jî jê re nehiştibûn. Carekê keziyên xwe yên dirêj li gewriya xwe gerandibû û heta ji destên wê dihat şidandibû. Lê hêza keziyan têrî xeniqandina wê nekiribû. Dema ku şikencekar bi vê bûyerê hesiyabûn, demildest ew porê Şîrîn yê ku her di tayekî de dilekî lê dida, dabûn ber meqesan û jê kiribûn. Dema porê vê jê kiribûn. Şîrîn bi dengekî bilind gotibû; “Hûn çendî belengaz û tirsonekin, hûn ji hebûna porê min jî ditirsin. Lê ji bîr nekin, bi dehan caran biqasî porê min zarokên gerdûnê, zarokên Kurdan yên ku strana azadiyê dibêjin hene, ger hûn hatibin asta ku ji porê jinek Kurd bitirsin, wê demê serkeftin ya mirovahiyê ye. Dê mirovahî bi ser keve. Ez pir bextewerim, pir…”.

Piştî van gotinan bi pêhnan, bi kulman li dev û rûyê Şîrînê dabûn. Lê qet negotibû ax, bi vê helwesta xwe ew dîn kiribûn. Hîn dilopên xwînê ji bêvila wê diherikîn û li ser lêvên wê hişk dibûn.

Şîrîn di nava kul û derdan de diqirqilî, lê bêdeng bû. Hêdîka xwe livand û pişta xwe sparte dîwar. Henaseyek kûr helkişand. Bi destê xwe yê rastê eniya xwe hinekî mist da. Xwest destê xwe bavêje keziyên xwe, lê dît ku pora wê pir kurt e. Ji nişkêve veciniqî mîna ku tiştekî xwe yê herî hêja winda kiribe velerizî û bi dengekî pir nizim di ber xwe de got; "Perya, em ê êdî porê xwe li ber birka nava dahla we şe nekin. Ji ber ku êdî pora min tuneye."

Li Tahranê cîhan disincirî, germa havînê bi her awayî xwe radibihîst, meha pûşberê destpêkiribû. Tahran di nava helke helka çevisandin, qedexekirin û zilmê de bû. Jinên ku di bin çarikên xwe de difetisîn, xwîdan ji eniya wan, ji bin keziyên wan yên veşartî, ji bin milê wan diherikî û bedena wanî ku li ber tundeweriya pêlên qedexekirinê lewaz bibûn, şilo pilo dikir. Jinên Tahranî gava ku xwe li cihê tal de digirtin û ji ber çavan winda dibûn, bilez û beza birûskê çarikên xwe ji ser pora xwe ya dil didan alî û bi bawerzîniya pûşberê; rû, gewrî, stu, sîng û porên xwe hênik dikirin. Lê gelek ji wan ne di têgihiştina vê mirina zindî de bûn. Car caran li hevdu vedihewiyan, bi gotinên qels, neçar û çilmisî êşên xwe ji hevdu re vedigotin. Carinan jî jinên ciwan li dijî zext û qedexeyan karvedan nîşan didan û di jêr beşên xaniyan de her cure dînîtî dikirin. Tiştên ku nayên bîra mirov dikirin û hundirê xwe vala dikirin, kela hundirê xwe sar dikirin…

Çend roj bi ser girtina wê re derbas bibû. Di nava xwîn û xwêdanê de ew avêtibûn şaneya Şîrînê, mîna ku mîrov sakoyekî bavêje erdê, ew virvirandibûn hundir. Wisa li ser dev li erdê ketibû, ser zemîna şaneyê, destpêkê

Şîrîn wate neda bû vê hevildanê, bi çavên xwe yên ku ronahiya wan kêm bibûn, li wî dîmenî nêrî, dît ku jinek pordirêj, çîprût, nênûkên wê ojekirî, qundireya kabik bilind li pê ne, li gel wê ye, lê qet deng jê nedihat, wisa bêdeng bêdeng, li ser zemîna şaneyê dirêjkirî bû. Mîna ku ketibe xeweke giran, bê liv û tevger bû. Şîrîn hinekî xwe nêzî wê kir. Ji porê wê yê dirêj bêhna parfûmê furiya ser çavên wê. Şîrînê di dilê xwe de got ; "ev jin hîn nû hatiye girtin. Gelo dibe ku hevala me be?" Piştî hinekî rawestiya, çardin di dilê xwe de got; "ne, ev ne hevala me ye, lê çima ev avêtine şaneya min, ma gelo dibe ku ev weke sîxur şandibin vir?". Şîrîn dîsa rawesta, kûr-kûr hizirî, xwest bangî wê bike, lê tiştek negot û cardin pişta xwe da dîwarê şaneyê û rawestiya. Hêza ku alîkariya wê bike Şîrînê qet di xwe de nedidît, ji ber ku nikaribû alîkariya wê bike xemgîn bibû. Li bendê bû ku ew jina bê liv û tevger bi ser hişê xwe ve were. Çavên Şîrînê berdewanî li ser wê bû. Ji nişkê ve tiliyên destê wê liviyan, Şîrîn bi vê pêşketinê bextewar bibû. Piştî kêliyekê hêdî serê xwe bilind kir. Çavên wê bi neçarî vedibûn, mîna ku hemû bedena wê tevizî bû. Gava li der û dora xwe dinêrî ewqasî dilerizî mirov digot qey ji hundirê qeşagehê derketiye. Şeqe şeqa diranên wê di hundirê şanê de olan dida. Lî hemberî rewşa wê Şîrîn pir êşiyabû. Dî dilê xwe de got; "van hovan çi aniye serê vê jina nazenîn." Şîrînê êdî hay ji êşên xwe nemabû, êdî ji bo wê jinê êş dikişand. Destpêkê fikrên xirab kiribûn, lê niha ramanên wê cuda bûn. Dixwest kêliyekê beriya kêliyekê, bi wê re biaxive. Ev demek dirêj bû Şîrîn qet bi mirovan re ne axivîbû. Pir caran berê xwe dabû dîwarê şaneyê û bi dîwêr re axivîbû. Lê niha êdî hevaleke wê hebû. Her çiqasî ew nas nedikir jî, dixwest pêre biaxive. Jina ku li ser zemîna şaneyê dirêjkiribû, hêdî-hêdî rabibû ser xwe û li ser qorikên xwe yên mezin runiştibû. Qundureya xwe ya ku kabika wê

bilind bû ji piyê xwe derxist, nênûkên lingên wê bi boyaxa sorgevez hatibû boyaxkirin. Binê lingê wê reş û şîn bibû. Diyar bû ku hê Şîrîn nedîtibû, weke ku tiştek tune be, nedîtibe û weke kesek li dora wê nebe tevdigeriya. Car caran bi dengekî nizim digot;" îşalah ji ber vê zilma ku hûn dikin, hûnê hemû di nava agirê dojehê de bişewitin." Şîrîn bi dengekî xemgîn got;

- Tu bi xêrhatî şaneya min.

- Tu kî yî?

- Ez jî weke te girtiyek im.

Dema Şîrîn wisa got, ew ji cihê xwe rabû û bi gavên lez elez ber bi deriyê şaneyê ve meşiya, di nava ragêşiyek ne ji rêzê de bi kabika sola xwe ya dirêj li derî da û bi dengegî bilind got: "Werin, zû werin min ji vir derxin, min ji vî cihê genî derxin, min zû derxin. Ez nikarin di vir de bêhnê bigirim. Ez naxwazin ligel vê jina ku nasnakim bimînim. Zû werin, zûûûû…"

Heta ku deng ji vê derket diqîriya û bang dikir, lê tu kes nedihat. Tu kes nedihat ber derî û nedigot: "tu çima bang dikî?" Vê yekê ew dîn dikir. Şîrîn dîsa bi dengekî zirav û bihestiyar got:

- Ma tu çima wisa dikî?

- Ez nikarim di vê şaneya genî de bimînim.

- Nêzî du mahan e ez li vir im.

- Çawa? Te got çiii?

- Min got nêzî du mehan ez li vir im.

- Ez nikarim rojekî jî li vir bimînim.

- Wisa nebêje.

- Ez nikarim, nikarim.

- Wisa nebêje, tu vala vala xwe aciz dikî.

- Tu çiqas li derî bixî, kes nayê.

- Çawa nayên.

- Bes, tenê ji bo şikencê tên vir.

- Lê ez ê çawa bikim?

- Tu dê hîn bibî.

- Nikarim hîn bibim.

- Rast e hînbûna vir dijware lê…

- Lê çi?

- Ji bo ku tu pêşeroja xwe winda nekî pêwîst e.

- Tu qala çi dikî, pêşeroja çi?

Şîrîn têgihişt ku ew niha ne di rewşekê deye ku fam bike, ji ber vê yekê vê carê navê wê pirsî.

- Dikarim navê te bizanim gelo?

Gava Şîrîn navê wê pirsî, hinekî rawestiya û bi çavên rageşî li Şîrîn nêrî, mîna ku bibêje çima tu navê min dipirsî, serê xwe hejand û bi dengekî tijî hêrs got:

- Navê min Semîra Hesenîpûr e!

- Xweş memnûn bûm.

- Navê te çi ye?

- Şîrîn Elemhûlî!

Semîra vêcarê bi dengekî aram;

- Ez jî bextewer bûm.

- Ka were rûnê.

Hinekî ragêşî û tengezariya Semîra derbas bibû, dirêj dirêj li Şîrîn nêrî, dûre got;

- Hemû dever qirêj e, ez ê çawa rûnim.

- Ma gelo li vî welatî cîhekî paqij maye.

Semîra hinekî bişirî:

- Min fam nekir te çi got.

- Ez dibêjim vê pergelê hemû dever herimandiye.

Semîra kenî û hat, li kêleka Şîrînê rûnişt:

- Min nidizanî tu dînî.

- Rast e li vî welatî cudahî dînatiye.

- Wele tu dînek e hêjayî.

- Belkî tu ji din bî.

- Xwedê neke.

- Çima?

- Çima, çima.

- Li vî welatî, kesên dîn, kesên herî zîrekin.

Semîrayê mijar guherand:

- Çima porê te jêkirine.

- Ez dê piştre ji te re bêjim.

- Baş e.

- Em bi hevre hinekî biaxivin, ev du mehin ez bi tu kesî re neaxivîme.

- Ma tu çawa di vê şenaya tarî de, hişê xwe winda nakî.

- Ji ber ku welatê me bi xwe şaneyek mezin e, ez hînî şaneyê bûm e. Em li derve jî di şaneyek mezin û tarî de dijîn, ma ne wisaye Semîra… ma tu çima hatiye girtin, teqez ji bo tu li gorî pergela wan ya xeniqandinê tevgeriya yî, tu girtin e û anîne vir. Wekî din dê ji bona çi jinek mîna te nazenîn bigirin û bînin cihekî wisa kambax, ma gelo ez şaşim?

- Ne tu ne şaşî. Em êdî debar nakin. Em weke jin nikarin rûyê xwe vekin. Bedana me dîl e, ramanên me dîlin, goştê cestê me dibin çarikên reş de riziya. Hêdî hêdî mejiyên me jî dirize. Rizandin bûye çarenûsa me. Em nedikarin tiştekî bikin, em ne dikarin tiştekî bivêjin, ne dikarin bi azadî biaxivin, bistirên, bireqisin û bikenîn. Li malê darê bav û bira li ser serê me diheje, li kolanan jî darê pergela berdewamî li ser sere me ye . Weleh heta îro ez qet wisa neaxivî bûm ha, çi bi min hat keçê, ji nişkê ve bûm bilbil û çûm. Ez jî weke te hêdî- hêdî diçim ha...

Şîrîn bêhneke kûr hikişand, ziq li nava çavê Semîrayê nêrî û bi dengekî dilgovanî got:

- Semîra!

- çiye?

- Li vî welatî tenê ji bona jinê mafekî rewa heye; mirin. Lê mixabin vî mafî jî nadin wan û nahêlin bi awayekî xwezayî, bi rehmetî bimirin. Teşeyê mirina jinan jî ew diyar dikin û dixine meriyetê.

- Nahêlin em bigerin, nahêlin em hez bikin.

- Semîra!

- Belê.

- Heta ku pergelek wisa hebe, emê çawa hez bikin û werin hez kirin? Ma mafê kolan yê hezkirinê, yê azadiyê, yê axaftinê heye Semîra?

- Ez baş fam nakim tu çi dibêjî, lê em ne kole ne û ne bêkes in, malbatên me hene.

- Semîra, binêre, tu di nava xwînê de mayî, ma gelo te çi 'tewanbarî' kiriye ku ewqasî şikence lit e kirine?

- Min tiştek nekiriye, ez xwendevana zanîngehê me û îsal zanîngehê diqedînim. Malbata min li Tehranê dijîn. Ya rastî tu bixwazî, ji bo min tu wateya xwendinê nemaye.

Nahêlin em ji xwe re şahiyekê li dar bixin. Dibêjin ev welat qefeseke û hûnê li gor daxwazên me di vê qefesêde bijîn. Ji bo ku dibistanê nexwînim hezar û yek astengî derxistin pêşiya min, lê ez of nebûm û min mafê xwendinê qezenc kir, vêcarê li dibistanê pêrgî mercên ne weke hev hatim. Li ser me jinên xwendevan kiryar û zextên pir giran dimeşandin. Lê li gel hemû tiştî azweriya min ya xwendinê zêdetir dibû. Berdewam min di dilê xwe de digot, pêwîste jinên mîna Furûxê li vî welatî zêde bibin. Lê tenê min ji xwe re digot. Lê vaye êdî nahêlin em helbestên Furûxê jî bixwînin. Dibêjin li diji xwedê nivîsandiye. Nahêlin em bi dilê xwe şa bibin. Min serê te êşand, ez werim ser sedemên girtina xwe. Beriya niha bi du rojan dema ku dibistan qediyan min û çend hevalên xwe li jêrbeşa mala hevaleke xwe şahî li dar xist, pêdiviya me bi şahiyê hebû. Lê di nîvê şevê de pasdaran bi ser me de girtin, destpêkê em hemû dîmenên me bi kamerayê tomar kirın, piştre ez tenê girtim bin çavan, pir li min dan. Hemû cure şikence li min dikirin, şoka elektirîkê didan zihaya min, gava wisa dikirin min digot qey hemû welseyên min ji devê min re davêje derve. Min tu carî êşeke wisa nedîtibû. Kiryarên derveyî mirovahiyê bi min kirin. Min rabira xwe winda kiribû. Derveyî vîna xwe tevdigeriyam, ji bo ku ez hinekî aram bibim derziyek arambexşiyê li min dan. Piştî derziyê ji ser hiş çûm. Gava ku min çavê xwe vekir, şilfîtazî bûm. Binkirasê min jî derxistibûn. Berdewamî ji min re digotin: “ma tu jî ji bona mafê mirovan dixebitî û dixwazî welat perçe bikî?” Min jî digot ne tu peywendiya min bi mafê mirovan re nîne. Lewre ez nikarim mafê xwe biparêzim. Lê biqasî min fam kir, ev hemû tişt ji rûyê Kurdan tên serê me. Dibêjin dest bi “terorîstiyê” kirin e û bangeşeya li dijî xwedê dikin. Niha jî ter û hişk bi hev re dişewite. Ji xwe li vî welatî em dibin nîrê zorê de dijiyan, îcar ew jî bûne bela serê me. Ez qet fam nakim çima Kurd tiştên wisa dikin.

Xwedê heqê me ji wan re jî nehêle. Ka ezê çawa di vê şaneya genî de bijîm.

Semîra mîna pêlên behrê diçû û dihat. Geh li vir geh li wir bû. Pir neçar bû, cîhana wê, mejiyê wê, giyanê wê û hestên wê têkel bûn. Xumam bûn. Neçariya wê û nezaniya wê dibûn û dibû sedema ku lawaziyek bêpayan derkeve holê. Bertekên wê yên li dijî Kurdan pir tund bûn. Lê Şîrîn mîna ku qet tiştek nebûye tevdigerî. Şîrîn serê xwe bilind kir, li Semîra nêrî û got:

- Semîra!

- Kerem ke.

- Tu dizanî?

- Bi çi?

- Ev zêdeyî bîst rojan e min nan nexwariye.

Semîra matmayî ma:

- Tu rastî dibêjî?

- Belê.

- Çima?

- Min ji wan re got, an hûnê zextê li ser min rawestînin an jî heta ku ez bimirim ez ê nan nexwim.

- Nabe wisa?

- Dibe!

- Çawa mirov dikare bîst rojan xwarinê nexwe?

- Tiştekî ku mirov nikaribe tuneye…

- Xwîşkê dest ji vê birçîbûnê berde.

- Ji bo rûmeta xwe û ji bo azadiya gelê xwe pêwîst e ez çalakiyê bidomînim.

- Xwîşkê ji min re qala gel neke. Ew li kêf û çêja xwe digerin, tu li vir dimirî, ma wisa dibe.

- Dibe ku mirina min bibe sedema hebûna gelekî. Dibe ku mirina min bibe sedema azadiya jinê. Ew jinên ku her roj bi keviran tên recim kirin û tên kuştin. Dibe ku bi mirina min, ew ji nû ve bijîn û vejîna wan pêk were. Ger li vir bêdeng bimînim dibe ku heta-hetayê êdî em mirî bimînin. Bêdengî carina ji mirina herî kambax xirabtir e.

- Wele, Xwişka min, tu tiştên xweş dibêjî û tu serê min tevlîhev dikî, lê mixabin ez bawer nakim ku em di xema kesî/ê de ne. Hema ez rast dibêjim, sibê ji vir derkevim, tu êdî di bîra min de nemînî, ango ez dê te jî ji bîr bikim. Lewra nikarim jiyana xwe ji bona kesên din xera bikim. Lê xuyaye ku te hişê xwe winda kiriye. Lê bi ya min, tu hinekî zû hişê xwe bidî serê xwe dê baş be. Min jî digot qey tu bi aqîlî, lê dibînim ku bi rastî jî tu dînî. Tu qala rûmeta kê/î dikî, tu qala kîjan rûmetê dikî, qala kîjan gelî? waz ji wan gotinên tewşo mewşo bîne. Xwişkê wele ez poşman bûm ku ji cem te neçûm. Ha vê zanibe.

Şîrîn li gel hemû êşên xwe bişirî.

- Semîra!

- Fermo.

- Hemû kes mîna te dihizire?

- Çawa ?

- Çi tê serê wan, dibêje kesekî/ê ji bo me tiştek nekiriye, çima ez ê xwe bavêjim xeteriyê.

- Ma ev ne rast e?

- Ne. Divê em êdî wisa nehizirîn. Jin li vi welatî mîna gêrika tên kûştin. Her roj bi dehan mirov li Îranê tên dardekirin. Ger yek ranebe û ji vê bobelatê re nebêje bes e, gelo dê çawa be?

- Raste lê ev bi min û te tenê nabe.

- Ger baweriya mirov mezin be, kesên ku li baweriyê digerin, kesên ku li wêrekiyê digerin pir in Semîra, pir in…

- Hemû kes li dû jiyana xwe ye. Tu vala serê xwe diêşînî.

- Te beriyan niha qala Furûxê kir. Furûx hê di temêne xwe yê herî ciwantiyê de helwesta xwe nîşan da. Helbestên herî li derveyî rêzê nivîsîn. Netirsiya. Di helbestên xwe de qala neheqiyê kir, qala azadiyê kir. Ew ji welat mişextî kirin. Lê stuyê xwe netewand. Divê em jî stuyê xwe netewînin. Tu bi xwe dibêjî êdî nahêlin em pirtûkên Furûxê bixwînin.

- Lê dîsa jî ez nikarim hemû temenê xwe ji bo mebestek wisa vala têber bikim. Ji bo min jiyana min girîng e. Va ye, hemû tişt anîn serê min ka kê ji bo min tiliya xwe livand. Dev ji van galegalan berde Şîrîn. Ne tu serê xwe biêşîne û ne jî ez. Ha bîst roje tu birçiyî, lê hemû kes li derve li kêfa xwe dînêrin…

Şîrîn têgihîştibû ku Semîra zû bi zû qani nabe. Lewre hîn bendewariyên wê yên jiyanek pir cuda hebûn. Şîrîn jê re mînaka Bertolt Brecht ê Almanî vegot û wiha domand:

- Tu dizanî dema li Almanyayê pêla binçavkirinê dest pê dibe Bertolt Brecht dibêje;

“Berê ji bo girtina komînîsta hatin

Min tiştek negot

Ji ber ku ez ne kominîst bûm.

Pişt re ji bo girtina karker û endamên sendîkayan hatin

Min tiştek negot ji ber ku ez endamê sendîkeyan nebûm.

Pişt re ji bo girtina katolîkan hatin

Û cardin min tiştek negot

Ji ber ku ez ne protestan bûm

Û di dawiyê de ji bona girtina min hatin

Êdî kes tune bû biaxive...”

“Îcar divê em baş bi rastiyê bizanibin, belkî sibê dora te be, ger tu qêrîna kesî nebihîsî, kesek jî qêrîna te nabihîse. Ger tu êşa dilê kesî/ê nebihîsî, ranebihîse, tu kes jî êşa dilê te nabihîse. Îcar Semîra, divê tu dil û mejiyê xwe ji êşan re vekî. Lewra êşa herî mezin te bi xwe kişand û jiya. Binêre hê jî ji bin nênûkên te xwîn diherike. Divê êdî em li benda dora xwe nemînin. Ji xwe her gav, her kêlî em jî di kesayetiya wan jinên ku tên recim kirin de têne kuştin. Ma Furûx Feruxzad negotibû; ‘çûka ku miribû şîret li min kir ku firînê ji bîr nekin. ’ Heke em bi hêzan baskên xwe nizanibin, em ê tu carî nikaribin bifirin, divê em firîna xwe pêk bînin.”

Semîra li Şîrîn nêrî, hêdîka serê xwe hejand, piştre jî di dilê xwe de got; “ev jina ku bîst roj e birçî ye, çawa wisa bi çoş û kelecan dikare biaxive. Çawa ewqas tiştan dizane, teqez wê li dervî welat, li zanîngehên herî baş xwendiye, lê nizanim ew şaş e an ez. Bi yeqîniya min ew şaş e. Li vî welatî bi van gotinan tiştek nayê guherandin…” Xwest bi deng axaftina xwe bidomîn e, lê ji nişkêve bi gurmîniyeke mezin derî vebû. Semîra bi gurmîniya derî ji cihê xwe pengizî. Bêyî ku tiştekî bibêjin, sê kesên dirêj û qelew bi milê Şîrînê girtin û birin. Semîra bi dîtina wî dîmenî pir tirsiya û lerizî. Ji nişkêve xwêdan bi eniya wê ketibû. Piştî derî girtibûn nefeseke kûr helkişandibû.

Pasdaran, Şîrîn anîn mezelek tarî, ev der cîhekî nû bû. Li hemû quncên menzelê alavên şikencê hebûn. Dîmenek sawnak hebû. Şîrîn li ser kursiyê rûniştandin. Li ser qotê

serê wê lempeyek vêxistin. Her yek li hêleke Şîrînê rawesta, yek ji wan jî li hemberî wê sekinî. Şîrînê bi hêsanî qirçe qirça diranên wan dibihîst. Li hundir bêdengiyek serwer bû. Lê Şîrînê dizanî ku çi li benda wê ye. Xwe ji hemû cureyên şikence re amade kiribû. Pasdarê ku fire fir ji bêvila wî derdiket, bi dengekî sawnak got:

- Tu çima naxivî?

Şîrîn hêdî serê xwe bilind kir û li nava çavên wî ziq nêrî:

- Ez dê çend caran bêjim, tiştekî ku bêjim tune ye.

- Ma qey, tenê tu bi van hevokan dizanî.

- Erê!

- Baş e, tu bi tiştekî nizanî.

- Ne!

- Ma tu Semîrayê jî nas nakî?

Şîrîn dîsa ket şikê û di dilê xwe de got; “dibe ku bi rastî Semîra şoreşger be, çima pirsa wê ji min dikin.”

- Semîra kî ye? ez nas nakim.

- Ew jina me avête hundirê şaneya te.

- Navê xwe ji min re negotiye. Em neaxivîn.

Gava Şîrîn wisa got pasdar mîna seyê gule bi sere wî ketibe, qêrîn pêket, kef bi ser dewê wî ket, girêza genî ji devê wî herikî û xwe winda kir:

- Zû wê şilfîtazî bikin!

Şîrîn şilfîtazî kirin û bi copan li hemû deverên wê didan. Weke ku dixwestin bikujin lê didan. Bi awayekî şilfîtazî Şîrîn li ser kursiyê rûniştandin, ji ber lêdana qemçiya du takirî, birînan di bedena Şîrînê de dev vekiribûn. Laşê wê reş û şîn bibû. Dewleke avê bi ser Şîrînê ve

dakirin. Ji bo şoka elektirîkê bide laşê wê amadekarî kirin, têl bi serê her dû memikên wê ve girêdan û şoka elektirîkê li Şîrînê dan, di wê kêliyê de qêrîn û hewara Şîrînê erşa xwedê hejandibû. Janeke ku tu carî hiss nekiribû hemû laşê wê dagirtibû. Destên wê ji pişt vê girêdayî bûn. Nedikarî dest werdana tiştekî bike û xwe biparêze. Gava şoka elektirîkê dan zihaya wê, Şîrîn ji hiş çû. Edî tu tişt nedibihîst. Çend dewl av bi ser wê de dakirin. Lê Şîrîn hiş nehat. Weke herdem du pasdarn ew bi erdê ve xweşinkî anîn û avêtin şaneya tarî. Bêy ku tiştekî bêjin derî girtibûn û çûbûn.

Semîra bi dijwarî ew anîbû ser betaniyê û li ber serê wê rûniştîbû. Hê jî Şîrîn şilfîtazî bû, bedena wê ya lewaz wisa li ser betaniya nîv ter bû, Semîrayê li birînên wê dinêrî, him xemgîn dibû, him jî di hundirê xwe de diqirqilî. Di hundirê Semîrayê de hêrseke cuda çêbibû. Semîrayê laşê Şîrînê yê tazî bi cilên wê nixaft û sere wê danî ser çonga xwe. Û eniya wê Hêdî-hêdî mist da. Semîrayê di dilê xwe de got; “van şikencekeran çi li te kirin Şîrîn?” bêhemdî wê du dilop hêsir ji çavên wê herikîbûn û xwe berdabûne ser eniya Şîrînê. Di navberê de demek direj derbas bibû. Şîrînê çavên xwe vekirin. Li Semîra nêrî û bi neçarî lêvên wê liviyan.

- Semîra van kengî ez anîm vir?

- Bîsteke xweşe.

- Çawa ez anîm?

- Zimanê min nagere ku bibêjim tu çawa anîn.

Dema Şîrînê ev gotin bihîst, têgihîşt ku taziye û Semîrayê bi cilan laşê wê dapûşiye.

- Semîra ka ji kerema xwe alîkariya min bike, ez dê cilên xwe bikeme ber xwe.

- Tu xwe neêşîne ez dê çareser bikim.

- Ne, ne…

- Xwişkê binêre xwîn ji dev û bêvila te diherike, tu xwe newestîne.

Semîrayê hemû kincên Şîrînê lêkirin. Herdu lingên Şîrînê werimîbûn. Edî nedikarî xwe bilivîne. Mîna ku piçeke derman di bedena wê de nemabe bêhêz bibû. Gava Semîrayê kincên wê lêkiribûn, destên wê li hestiyên Şîrîn diket û wê yekê SEmîra gelek nerehet dikir.

Bi dengekî nizm ji Şîrînê re got;

- Xwişkê dixwazin tiştekî jji te re bêjim.

- Kerem ke.

- Gelo çi ji te re gotin?

- Pirsa te kirin, min jî got ez nasnakim. Ew dibêjin qey tu jî şoreşger î.

- Çawa, çawa?

- Dibêjin ew jî şoreşger e.

- Ne, tiştekî wisa nîne, ez tucarî nabim 'terorîst!'

- Semîra, aram be, netirse, ew dixwazin tiştên nebûyî bavêjin stuyê te, lê heke tu ber xwe bidî nikarin tiştekî bikin. Dê gefan li te bixwin, lê netirse…

- Ew di serî de dixwazin min wekî terorîstên Kurd nîşan bidin, lê ez vê yekê napejirîn im.

- Semîra kelegermî tevnegere.

- Baş e.

- Wan ji te çi pirsîn, tu jî bêjî ez çi nizanim.

- Lê…

- Lê çi?

- Dema şikenceker li min didin laşê min gelek diêşe.

- Tiştek nabe. Ger tu niha li ber xwe nedî, dê te bi tiştên nerast tewanbar bikin.

- Ez ê weke ku tu dibêjî tevbigerim.

- Spas Semîra.

- Xwişkê dixwazim tiştekî din jî bibêjim.

- Kerem ke.

- Ez dibêjim, tu dest ji vê birçîbûnê berdî dê baş be.

- Semîra ez naxwazim birçî bimînim. Lê ev pêwist bû. Îro ji bo ku gireva birçîbûnê berdim pir ketin nava hewildanê, lê min bi ya wan nekir. Min ji wan re negot, ger hûn dawiyê li zextên li ser min bînin ez ê berdim. Lê di vê mijarê de tiştek negotin. Heke daxwazên min pêk bînin ez dê navberê bidim çalakiya xwe.

- Ez bi vê bextewar bûm.

Ji nişkêve derî vebû û du kes hatin hundir. Yek ji wan qaşo bijîjk bû, xwe wisa dabû nasîn. Bi çend hevokên kurt ji Şîrînê re got, “ger tu çalakiya birçîbûnê berdî, êdî her roj te şikence nakin. Ez di vê mijarê de misogeriyê didim te. ”

Şîrîn kûr kûr hizirîbû û got;

- Heke wisa be ez dê çalakiya xwe ya birçîbûnê rawestînim.

- Temam.

- Pêdiviya min bi avê û xwarinê heye.

- Lê divê em destpêkê derziyê li te bidîn.

- Ne, ez vê napejirîmin.

- Ez dixwazim derziyek arambexşiyê li te bidim.

- Ez naxwazim.

Bijîjk piştî van gotina zêde ranewestiya, ji şaneyê derket û çû. Semîra demildest.

- Ma wele min tiştek ji vî bijîjkî fam nekir. Qaşo bijîjk e, lê ji şikencekaran tundtir û nebaştir tevdigere.

Şîrîn nefeseke kûr hilkişand.

- Ew ne bijîjk e, tenê ketiye dilqê bijîjkatiyê. Ewqas.

Semîra serê xwe hejand û bişirî:

- Tu rast dibêjî.

- Divê rastiya van şikencekaran û pergala ku nimandina wê dikin baş fam bikî. Ji ber ku em bi kûrahî rûyê wanê veşartî nas nakin, herdem têne xapandin.

Vêcarê Semîrayê ji Şîrînê re negotibû "xwişkê" û bi awayekî pir ji dil jê re got;

- Şîrînxan, a rastî tu bixwazî ev çend roje ez ji te gelek tiştan fêr bûm û dibim. Mîna ku bi salane te nas dikim xwe nêzî te dibînim. Heta vî temenê xwe ez hatim, lê mixabin hevaleka/e min a weke te çênebû. Neçarim bêjim ku te, ez bi zanebûna xwe, bi dilgermî, bi şêweya ya çêker, bi biŞîrînên xwe yên ku bawerî û hêzê dide mirovan, bi çavên xwe yên bawermend matmayî hiştim. Dibe ku ji bo te hinekî balkêş be, lê ez dibêjim başe ku hatime girtin û min jineke mîna te hêja naskiriye. Heta dawiya emrê xwe ez dê van rojan û te ji bîr nekim. Min duh gotibû, dema ku ez ji vir derkevim ez dê te ji bîr bikim. Min bibexşîne Şîrîn can.

Têgihîştibûm ku jiyan tenê bêhndan û bêhn standin nîne, di heman demê de jiyan, zanebûn, watedan û li dijî mercên dijwar berxwedan e. Ez ji te hînî van tiştan bûn. Min duh di dilê xwe de got; 'baş e ku Şîrîn can li derveyî welat zanîngeh xwendiye, ger li welatê me xwendiba dê ew jî mîna min nezan maba'. Dema li agahiyên te dinêrim. Ji xwe re dibêjim xwezî min jî li derveyî welat bixwenda.

Dema Şîrînê hevokên dawiyê ji zarê Semîrayê bihîst, bişirî û li rûyê Semîrayê nêrî. Semîrayê dît ku Şîrîn dibişîre:

- Şîrîncan tu çima dibişîrî.

- Tu dizanî?

- Çi.

- Min tenê du sala dibistan xwendiye.

Semîra bi çavên matmayî got:

- Tu henekan dikî.

- Ne, ez rast dibêjim.

- Ez bawer nakim.

- Belê, bawer bike. Ma qey farsiya min jî bala te nekişand. Ez pir hindik bi farsî dizanim.

- Raste farsiya te ne başe lê…

- Lê çi?

- Min di got qey ji ber ku te li derveyî welat xwendiye, te zimanê farsî ji bîr kiriye.

- Ne, ne wisaye. Min tenê du salan xwendiye.

- Min meraq kir, te çawa tenê du salan xwend û tu çawa hînî van hemû tiştan bûyî?

- Îro pir westiyame, ez dê ji te re qala wan herdu salên xwe yê dibistanê bikim. Dibe?

Semîra mîna ku hemû şert û mercên ku têde dijî ji bîr kiribe, bi kelecanek bêdawî got:

- Ger tu bibêjî, ez dê gelek kêfxweş bibim.

Roja din serê sibê, dîsa tavê bi awayekî pir hindik hundirê şaneya wan ronî dikir. Şîrînê cihê xwe xweş kir,

pişta xwe da dîwar û hêdî-hêdî lêvên wê liviyan û Semîra jî bi baldarî guhdar dikir.

- Di wê demsala payîzê de bavê min çûbû bajarê Makuyê, ji min re cil, sol destmalk û kirasek kirîbû.

Temenê min xwe spartibû heştan. Dibêjim qey ew demsala payîzê demsala min a herî xweş bû. Ji ber ku gelek bextewer bibûm. Ji bextewarî û kêfxweşiyê min nizanîbû ez dê çi bikim. Wê demê têgihiştim ku dema mirov zêde bextewar be, di heman demê de neçar e jî. Lewra tiştek nayê bîra mirov. Di heman salê de hev temen û hevalên min Perya û Sînemê jî dê bihatana dibistanê. Vê rewşê hîn bêtir kelecana dilê min zêde dikir. Ewqasî ez kelegermî bibûm. Ewqas xwîna min bi leze lez digeriya, min nedikarî kêliyekê li cihê xwe rawestim. Berdewam di hat û çûyê de bûm. Qet wê sibeha demsala payîzê ji bîr nakim. Ez ji ber kelecana hundirê xwe de zû hişyar bibûm. Beriya ku tav ji pişt girê gundê me derkeve, min keziyên xwe hûnandin, desmal da serê xwe û cil li xwe kirin. Nizanim bê ji ber çi bû, lê min qet nedixwest pora xwe veşêrim. Perya jî wisa bû. Jixwe me tu wate nedida girêdana por. Pir caran Peryayê ji min re digot;

- Ma gelo porê me bi zayende, ji ber vê em vedişêrin.

Heke tiştekî wisa nebe, wê demê çima dayikên me dixwazin em mûyê xwe veşêrîn.

- Ez nizanim Perya. Lê dayika min dibêje fermana xwedê ye.

- Ma heta îro kê/î xwedê dîtiye, ez bawer nakim.

- Wisa nebêje Perya tu bezekariyan dikî.

Dema ku Perya ew gotin vedigotin pir rihet bû. Lê ez dilerizîm û pêlên velerzînê, di laşê min de digeriyan. Ji bo ku Perya zêde bi pêşve neçe min destwerdanî wê dikir û min nedihişt axaftina xwe bidomîne. Ez gelek ditirsiyan.

Min di dilê xwe de digot, dibe ku ji ber van gotinên Peryayê karesetên mezin bi serê me bên. Sînem qet nediaxivî, zarokeke bêdeng bû. Di hundirê xwe de bû. Pir hindik dipeyivî. Lê berdewamî dev li ken bû. Diranên wê pir xweşik bûn. Gava dikenî sî û du diranên wê diyar dibûn. Mîna libên birincê spî û li hevdu hatî bûn. Rûyê wê yê bedew û diranên wê di nava hevsengiyek bêhempa de bûn. Ji ber vê mirov dixwest Sînem berdewam biaxive, bikene û bibişîre. Ji ber vê Perya hinekî ji Sînemê dihesidî. Car caran li ser vê mijarê min û Peryayê şer dikir. Lê Perya qet tevlî gengeşiyên me nedibû. Ji ber ku Sînem sêwî bû, bê dê mabû, dilê min li ser wê diêşiya û dişewitî. Min nedixwest dilê Sînemê tucarî bişkê. Di heman demê de Sînem keçeke pir nazenîn û nazdar bû. Mîna şitla rihana qiraxa çeman bû. Mirov digot qey hê di vî temenê xwe de, hemû barê dinyayê daye ser pişta xwe.

Wê roja ku me her sêyan da dû hevdu û em çûn dibistana gund. Em dilgeş û rûgeş bûn. Di jiyana me de rûpelekî nû vedibû. Rojek nû destpê dikir. Demek nû destpê dikir. Mîna ku em jî heyamekê derbasî heyameke din bibin. Bi taybet Perya di nava kelecanek bêdawî de bû, mirov digot ger per û baskên wê heban dê bifiriya. Lê ez hinekî peng bûm. Gava ez di deriyê hewşa dibistanê re ketim hundir, ango min gava xwe avêt hundirê dibistanê ji nişkê ve giraniyeke nediyar ku heta wê rojê nejiyabûm xwe berda ser dilê min. Peryayê hest bi guherîna di min de kir û bi gavên bêdeng xwe nêzî min kir. Bi dengekî pir nizm, di asta pîste-pistê de got;

- Şîrîn.

- Çiye?

- Tu pir bêdengî, çima?

- Tiştek nîne.

- Belê, heye, xetên rûyê te hatine guhertin.

- Ne, ez baş im.

- Ma qey tu şerm dikî?

- Te ev ji ku derxist, şerma çi?

- Madem ev çi halê te ye?

- Çi bi halê min hatiye?

- Xwîdan bi eniya te ketiye.

- Ji germê ye.

- Dinya hênik e, tu rast nabêjî, ma qey tu nexweşî?"

Ez hinekî hêrs bûm. Têgihîştim ku Perya mîna benîşt bi min ve zeliqiye û dev ji min bernade:

"Perya dev ji van gotin û pirsên xwe berde, tu tiştekî min tune ye, ez başim.

- Tu aciz bibî jî li te nagerim. Derdekî te heye tu nabêjî.

- Başe ez dê bêjim."

Perya demildest bi destê min girt û ez kişandim cîhekî talde.

- De ka bêje.

- Hundirê min dilerize. Nikarim biaxivim. Giraniyek bêdawî li ser min heye.

- Xeman nexwe, tiştekî girîng nîne. Ji ber ku em nû ne wisa dibe.

- Niha dihizirim Perya bi rastî ne ji ber ku ewqasî têgihîştinê bû ew hevok ji min re digot. Hema çi dihat bîra wê ew digot. Dûre ez birim ser kaniya dibistanê, min dest, rû û çavên xwe şuşt, gewriya xwe ter kir, bin keziyên xwe hênik kir. Hinekî bi ser xwe ve hatim. Bêhna min derket. Em dîsa derbasî hewşa dibistanê bûn. Zarok dilîstin, ez û

Perya jî çûn beşdarî yariya bûn. Lê tu kesî zêde xwe nêzî me nekir. Weke biyaniyan em li holê man. Ev dîmen li têlê Peryayê ket û xwe aciz kir. Lê ez bêdeng mam. Em çûne hundirê dibistanê. Me dît Sînem bi tena serê xwe rûniştiye. Em jî çûn li tenişta wê rûniştin. Di nava hestên nediyariyê de me li hevdu dinêrî, di rewşên wisa de Perya demildest diaxivî, lê vê carê qet neaxivî bû. Ya rastî ez ji vê hewlwêsta wê hinekî matmayî mabûm. Piştî demekî hemû şagird tevlî mamoste ketin hundir. Em rabûn ser piyan. Mamoste cîihê xwe guhert. Mamoste diaxivî lê me tiştek fam nedikir. Sînem bi baldarî guhdar dikir. Perya li min nêrî û bi dengekî hêvîşikestî got:

- Ez fam nakim.

- Ez ji fam nakim.

- Çima bi zimanê me naxive.

- Nizanim.

- Gelo bi çi zimanî diaxive.

- Nizanim.

- Ez qet hînî vî zimanî nabim.

- Ez jî.

- Yekemcare li zimanekî wisa rast têm.

- Dayika min qet qala vî zimanî nekiribû.

- Gelo hemû mamoste bi vî zimanî diaxivin?

- Nizanim.

Peryayê çi dipirsî, bersiva min “nizanim” bû. Bi rastî jî tiştek nedihat bîra min. Ji ber ku serê min tevlihev bibû. Lê Peryayê mijar dida ber lêpirsînê û dixwest fam bike. Di rewşên wisa de min xwe li cem Perya pir çilmisî his dikir. Wê rojê me tiştek ji dibistanê fam nekir. Piştî nîvro, em her sê ji dibistanê vegeriyan malê, di rê de ez û Perya di-

axivîn, lê Sînem bêdeng bû. Ew kelecana dibistanê ji nişkêve ji nava dilê min bar kiribû.

Semîrayê bi xemgînî got:

- Çima we ji zimanê mamoste fam nedikir. Ma hûn bi farsî nediaxivî.

- Şîrîn hinekî rawestiya, eniya xwe mist da.

- Na.

- Lê hûn bi kîjan zimanî diaxivîn.

- Em bi zimanê xwe yê dayikê diaxivîn.

- Wele min fam nekir.

- Semîra!

- Fermo.

- Em Kurd in. Kurd. Em Kurd bûn. Mamoste fars bû. Wê rojê ku em ji dibistanê vegeriyan, dayika min got; 'li vî welatî du gelên mezin hene, yek ji wan fars e, yek ji wan jî Kurd e;' Wê rojê ez hîn bûm ku zimanê me cuda ye.

Semîra di nava matmayînê de li Şîrînê dinêrî û mîna ku bibêje "na tu henekan dikî." Serê xwe dihejand û dikenî. Lê Şîrîn axaftina xwe qut nekiribû û didomand;

- Du salan em çûn dibistanê. Min kir û nekir, tiştek fam nekir. Perya jî wisa bû. Lê Sînem zû fêr bibû. Piştî du salan min û Peryayê dest ji dibistanê berda. Êdî em li malê bûn. Mina bermaliyan dixebitîn. Lê şik û gumanên me yên li jiyanê zêde dibûn û êdî jiyaneke dijwar ji bo me dest pêkiribû.

Semîrayê destê xwe danî ser destê Şîrînê:

- Bi rastî tu Kurd î?

- Erê.

- Min bibexşîne.

- Ez te nabexşînim.

- Çima?

- Mirov, kesên ku tewanbariyê dike dibexşîne?

- Min neheqî li te kir.

- Te, çi neheqî nekirine.

- Belê belê, min derheqê Kurdan de tiştên nexweş gotin.

- Ew ne gotina te ye.

- Çawa?

- Wan tu wisa fêr kirî.

- Dîsa jî lêborîna xwe dixwazim.

- Semîra, qet xemgîn nebe.

Roj bi nîvî bibû. Şîrînê dixwest hinekî vehese. Bêdengiyek hebû. Qêrîn û hewara mirovan nedihat, herduyan pişta xwe dan hevdu û razan…

*        *        *

Du caran di ber serê wan de derbas bibû. Bi hatina dengê lingê curdonan Semîra hişyar bibû. Milê wê yê rastê tevizî bû. Xwîdanek tirş û tahl ji stuyê wê diherikî û xwe di nava her du memikên wê re ber bi jêr ve berdida. Bêhneke nexweş ji şaneyê dihat. Semîrayê çavên xwe mist da, li hêla deriyê şaneyê nêrî, dema cave wê bi her du zir cirdonan ket, qêrîn ji Semîra bilind bû, Şîrîn ji xewê pengizî, mîna ku maran bi Semîrayê vedabe qîriyabû. Şîrîn bê hemdê xwe weke ku bixwaze Semîrayê ji xeteriyeke erjeng biparêze ew hembêz kiribû û gotibû:

- Çi bi te hat Semîra, netirse tiştek nîne.

Semîra di hembêza Şîrînê de diricifî. Şîrînê cardin heman tişt dubare kir:

- Semîra ka bêje çi bi te hat?

Semîrayê serê xwe ji ser sînga Şîrînê rakir. Bi çavên bizdok li Şîrînê nêrî:

- Vana.

- Kî?

- Şikencekeran.

- Wan çikir, ma qey cardin hatin hundir.

- Na.

- Lê.

- Curdon berdane şaneya me.

- Çi?

- Cirdon!

- Netirse…

- Çawa netirsim.

- Ew curdon her şev li vir digerin.

- Çawa!

- Ez dibêjim ev şane di bin erdê deye, di hemû quncikê wan de ku heye bi zanebûn wisa kirine. Ji bo ku derûniya me xerab bibe, ji bo ku em hilweşin, ji bo ku em li ber wan bigerin û bibêjin me ji vir derxin, wisa dikin. Heke pê bihesin ku tu ji mişkan ditirsî dê te bibin cihên hîn kambaxtir. Ji ber vê yekê dema ku te mişk dîtin, neqîre.

- Te got cihê hîn kambaxtir.

- Belê.

- Ma qey ji vê şaneya kembax xeraptir û dijwartir jî cîh hene gelo?

- Cihê wisa hene mirov, nikare nefesê bistîne. Ango ev şane li gor wan cihan bihuşte.

- Ger min zanîba dengê xwe dernedixist, ez nikarim deqekê li wan şaneyan bimînim.

- Ez beriya niha bi panzde rojan li şaneyekê dimam. Hêleke wê tijî mîz bû, bêhnek tuj û dijwar jê dihat. Bêhna min dernediket. Dixwestin derûniya min sero bin bikin. Min mirin dabû ber çavên xwe. Lê min ji wan re negot; “ez nikarim li vir bijîm.” Ji xwe wan jî gazinek wisa ji min dipayî. Li benda gotineke wisa bûn. Divê tiştê ku neyarê me dixwaze bibihîze, mirov nebêje.

- Tu çend roja li wir mayî?

- Nêzî hefteyekê.

- Te çawa debar kir.

- Piştî çar rojan û şûnde ez di rewşek nîvhişî de bûm. Min zêde tiştek ranedibihîst. Wê bêhna dijwar ez dikuştim. Serê min gêj dikir, lê neçar bûm. Neçar bûm Semîra. Çav tarî dibûm, dil dixeliya, dîwar bi ser min de diherifî, bêhna min diçikiya. Lê berxwedan pêwîst bû Semîra. Xwedê ji ber vê yekê mirov cuda afirandine. Ji bo ku em li dijî neheqiyê, li dijî kedxwariyê, li dijî şertên derveyî xwezaya mirovan têkoşînê bikin, xwedê aqil, mejî, dil, hest û hêza hizirandinê daye me. Ji ber vê yekê em heyberên herî bi siud in û divê em vê siuda xwe baş bikar bînin.

Hinek şevan de, bi dehan mişk û curdon li dora min diçû û dihatin. Li ser bedena min re derbaz dibûn, nênûkên mişkan di çermê min re diçû, şûna nenûkên wan yên mîna derziyê tuj, çermê min mîna agir dişewitand. Ji ber ku min tiştek nedixwar, zû bi zû birînên ku vebibûn

qalik nedigirtin. Êdî min tevgera hemû mişkan yek bi yek nasdikir. Diranê mişkan mîna guzan tuje. Dema dixwazim cihekî kun bikin, bi hev re dixebitin û pêhesiyam hêza wan ya herî mezin di lingên wan de ye.

Semîra ji nişkê ve axaftina Şîrînê birî.

- Wele dema tu qala wan dîmenan dikî hundirê min dilerize, niha pêlên velerizînê di bedena min de, li dû hevdu verdigerin û ricifînek cuda di bedena min de digere.

- Netirse Semîra.

- Çawa netirsim wele…

- Aramiya xwe biparêze.

- Zirava min diqete.

- Bila bînyada te qahîm be.

- Lê.

- Ez dizanim tu bi van karesatan re biyaniyî. Lê heke tu xwe li dijî wan mercan ranegirî dê nikarî bi serkeftî ji vir derkevî.

- Di dawiyê de ez mirovim.

- Raste di encamê de tu mirovî. Ji ber ku tu mirovî, pêwîste tu li berxwe bidî.

- Nizanim Şîrîn, nizanim.

- Vê yekê ji bîr neke, zirara herî mezin mişkên ku di dilqên mirovan deye, zerara herî dijwar ew didin mirovan. Ji mejiyên wan, ji peyv, ji nêrîn, ji bêhn, ji deng, ji tevgera wan û ji hemû devera wan jehr dinizile jehr. Van mişkên ku xwe xistine dilqê mirovan baş nasbike Semîra. Tu wisa li qîre vîra wan nenêre, ew mişkên herî jar û belengaz in. Semîra ev azmûneke. Ev asteke jiyana min û te ya herî girînge, ev beşeke dîroka giyana me ya herî balkêşe. Divê em bi serkeftî ji vir derkevin.

Semîra hêdî-hêdî serê xwe hejand:

- Çi ji destê min were ez dê bikim.

- Spas Semîra, spas.

- Spas ji te re Şîrînxan.

Paşê çend mirov di wexta ku hundir dikeliya ji germê hatibûn derî vekiribûn û gotibûn; “Semîra ka were li vir tu karê te nema, me bi şaşî tu aniye wê derê. Malbata te, li ber deriyê ewlehiyê rawestane, li benda te ne. Lê gava ku tu derketî derve, hemû tiştan ji bîr bike, hat fêm kirin.” Semîra di wateya erê de serê xwe hejandibû. Semîra bi rûyekî xemgîn, bi çavên ter, bi nêrînên westiyayî li Şîrîn nêrî, her tişt dabû ber çavê xwe û ber bi Şîrîn ve meşiya bû, di kêliya ku xwestibû Şîrînê hembêz bike; şikencekar gotibû; “Hevdû baş hembêz bikin, êdî hûn hevdu nebînin. Çi dibe çi nabe, vê qenciya me ji bîr nekin, lê em dizanin hûn dê ji bîr bikin”. Dema ku ev gotin digotin, di nava xwe de di keniyan; Semîrayê tund Şîrîn di hembêza xwe de girtibû, bi dengê nizim li ber guhê Şîrînê gotibû:

- Ez te ji bîr nakim. Qet xeman nexwe, ez dê vî welatî terk bikim, lewre êdî li vî welatê komara sêdareya îslamî jiyan li min heram e.

Şîrîn ji gava ku ew ramûsabû:

- Li xwe agahdar be. Li jinên ku tê recim kirin, bihizire.

- Baş e.

- Vexêra te ya xêrê be.

- Tu jî di nava xêrê de bimînî.

Semîra bi van hestan ji hundirê şaneya gemarî derketibû, gava cara dawî li Şîrînê mêze kiribû, hêsirên wê mîna berbestê zelal herikîbû ser hinarkên rûyê wê. Şîrîn bi çûyîna Semîrayê bextewar bibû û di dilê xwe de gotibû;

“Ew ji vê dojehê rizgar bû, lê dilê xwe yê zêrîn ji min re hişt û dilê min bi xwe re bir”.

Piştî çend saetan Semîra bi awayekî şilfîtazî avêtibûn cem Şîrînê. Şîrînê ji çavên xwe bawer nedikir. Di cihê xwe de qerisî bû. Devê wê nedigeriya li hemberî vê dîmenê zimanê Şîrînê, lêv û mejiyê wê qerisî bû. Mina ku zimanê xwe daqurtandibû bêdeng bû. Piştî kêliyekê kincên Semîrayê jî virvirandin hundir. Dîtin ku Şîrîn pir xemgîn e, yekî ji wan; “ma qey dilê te pir êşiya, wax wax, me nizanîbû tu ewqasî dil tenikî, keçê tu kes li vê dinyayê bi dil tenikiyê negihiştiye tu deran, dest ji van xeyalên beradayî berde. Ez dinêrim, hûn di vê şaneya tarî de aciz dibin. Lê xeman nexwen, di demeke nêz de dê zarokeke we ango bêjiyekî we çêbibe…”.

Ji hêrsan qirçe qirça diranên Şîrînê nedisekinî. Lê qet bersiva wan neda. Şîrîn çû li ber bedena Semîrayê ya tazî rûnişt. Bedena Semîrayê di nava şop û birînê şikencê de mabû. Nênûkên tiliya lingê wê ya girdekê di navê de telişî bû, bênavber xwîn jê dihat. Qoretên herdu memkên wê reş û şîn bibûn. Şîrîn hêdîka Semîra kaş kir ser betaniyê. Beriya ku Semîra were ser hişê xwe, Şîrînê binkirasên wê derxistin. Bi mistek avê rûyê wê şûşt. Semîrayê hêdî-hêdî çavên xwe vekirin. Cardin weke rojên destpêkê ji Şîrînê re got:

- Xwişkê.

- Semîra niha vehese em dê paş biaxivin.

Semîra giriya û bû hîskehîska wê:

- Xwişkê wan…

- Semîrxan a niha vehese.

Şîrînê nedixwest Semîra biaxive, lewre derûniya wê pir ne baş bû.

Semîrayê cardin go:

- Xwişkê wan…

- Temam, Semîraxan, ez dizanim.

- Tu bi çi dizanî.

- Wan bi te şikence kirin e.

- Na, na tenê şikence nekirin.

- Na, na tenê şikence kirin e.

- Tu bi rastî dibêjî.

Mina ku Semîrayê tiştên ku dixwest bibihîze, dibihîst.

- Tu baş dizanî?

- Erê.

- Çawa?

- Tu niha xwe newestîne.

- Na, ez dixwazim biaxivim.

- Baş e, wê demê mijarê ji serî de ji min re vebêje.

Şîrîn têgihiştibû ku heta Semîra neaxive aram nabe. Semîra hêdî rabû ser xwe, pişta xwe da dîwarê şaneyê û dest bi vegotina wan saetên ji dojehê kir:

- Ez di nava pêlên kelecana ku kêliyekê beriya kêliyekê malbata xwe bibînim, dimeşîm. Bi van hestan min gavên xwe bi leze lez davêt. Dema ez hinekî ji şaneyê dûr ketim. Ji nişkê ve ez rawestandim. Heta hêza wî şikencekarî hebû, sîlek li min da, ez bi wê lêdanê re gêjo mêjo bûm û li bin guhê dîwar ketim. Min got qey cîhana min hilweşiya. Agir ji ber çavên min çû. Zilamî ji bêrîka xwe çavbendeke reş û stûr derxist, tund çavên min girêdan, bi pehin û kulm mistan li newqa min, li zik, li sing, pişt û li rûyê min didan. Bê navber digotin; ”êdî te malbata xwe nedît. Lê malbata te, piştî ku me tu bire binê sêdarê, dê

werin cendekê te bibin. Wê demê em dê wî cendekê te yê stuşikestî radestî wan bikin. Ev jî siûdeke mezine ha, ji ber ku gelek malbat cendekê zarokên xwe jî nabînin, lewre ji me re duayan bike”. Min nedizanî ka ez pêrgî çi hatim e. Xwişkê ev îdam ji ku derket. Ma min çi kiriye ku wisa dikin? Ez birime hundirê menzeleke tarî, hewayê hundir gelek sar bû. Mîna qeşegehê. Berê îşlikên min derxistin. Dûre hemû cilên min. Ez ji serma dilerizîm. Sir û se-qemeke wisa min di temenê xwe de nedîtiye. Tiştekî mîna cemedê li ser pêsîrê min digerandin. Dûre ew tiştê weke cemedê bi deqeyan li ser zihaya min hiştin. Qêrîn û hewara min menzel dihejand, lê dîsa jî ew cemed li ser ziheya min ranedikirin. Ji bo ku ji hiş biçim min dixwest şoka elektirîkên li min bidin, lê nedidan. Piştî şikenceya cemedê, bi benekî qoratên her du memikên min bi tundî girêdan û kişandin. Wê kêliyê memikên min ewqas êşan, min got qey ji binî de rabûn û ji bedena min qut bûn. Têgeheştim ku ji serê memikên min xwîn diniqute. Car caran jî bi serê memikên min digirtin û badidan. Nenûka min telişandin. Carekê ez hizirîm, min di dilê xwe de got, ez dê buxtanan li xwe bikim û her tiştî bigrime stuyê xwe, da ku ji wê dojehê rizgar bibim. Lê gotinên te, şîretên te hatin bîra min. Çavê min vekirin. Çar kes bûn. Berdewamî bi copan li ziheya min dixistin. Lê tiştekî balkêş bû tu pirs ji min nedikirin. Herî dawî min êdî debar nekir û bi ser wan de qêriyam:

- Hun çi ji min dixwazin.

Bi awayekî pelos kenîn:

- Binêrin, dibêje hûn ji min çi dixwazin. Wax, wax hê nizane ku em çi jê dixwazin.

Dîsa bi copan li zihaya min dan û gotin:

- Ma tu nizanî em çi ji te dixwazin?

- Na, ez nizanim.

- Li zanîngehê we çawa xwe bi rêxistin dikir?

- Rêxistina çi?

- Rêxistina ku dixwest welat perçe bike.

- Ez tu rêxistinan nas nakim û ne endama tu rêxistina me.

- Çawa tu ne endama rêxistinê yî. Ma qey me beredayî tu cem wê jina terorîst danî. Ma qey wê ji te re qala rêxistina xwe nekir?

- Terorîsta çi, rêxistina çi, hûn qala çi dikin?

- Xwe wisa li kawikî danîne. Wê ji me re got Semîra endama me ye û li zanîngehê, li ser navê me dixebite.

- Ez ne endama kesî me, heke hûn derewan nakin wê jina hûn qala wê dikin, bînin vir, bila di rûyê min de bêje.

- Ne hewceye.

- Wê demê hûn rast nabêjin.

- Em rast dibêjin, hûn hemû wisa ne.

Şîrîn di vir de axaftina Semîrayê birî:

- Min fam nekir, dema gotin 'hûn hemû' qala kê dikir?

Semîra hinekî rawestiya:

- Nizanim.

Lê wisa jê re gotibûn:

- Hûn hemû Kurd wisa ne.

Semîra:

- Na, ez ne Kurd im.

- Tu kurd î.

- Hûn bi zorê min dikin Kurd.

- Me lêkolîn kir, dayika te jî, bavê te jî Kurd in. Ma tu dixwazî kê bixapînî?

- Teqez ev ne rast e.

Semîrayê nexwestibû, niha van tiştan bi Şîrînê re parve bike. Şîrînê jî dixwest Semîra axaftina xwe bidomîne:

- Min got ez tenê xwendevan im.

- Em jî dizanin tu xwendevanî, lê tu ciwanan dixapînî û dişînî nava partiya Kurdan ya 'terorîst!'

- Ez Kurdan nasnakim. Peywendiya min bi wan re tune ye.

- Heye.

- Na tune ye.

- Derî vebû û kesekî rûtirş, tûrikek di dest de kete hundir, di hundirê tûrik de tiştên zindî hebûn mîna çêlikên pisîkan diçûn û dihatin. Bilez û bez destên min vekirin, ez li erdê dirêj kirim û bi textê ve girêdam, bedena min şilfîtazi bû, diricifîm. Devê tûrik vekirin, bi dehan mişk ji hundirê tûrik derketin. Hemûyan bi hev re êrişî ser min kirin. Bêhemdî xwe diqêriyam. Gava ku mişkek li ser zihaya min bû, min got qey dê xwe berde hundirê min, qêrîn û hewara min zingînî bi hundir xistibû. Di wê kêliyê de, min di dilê xwe de got; 'êdî her tişt qediya, ew çi bibêjin ez dê bipejirînim '. Hê mabû ku bibêjim; 'temam' wî kesê ku mişk anî bûn, cardin hate hundir û devê tûrikê ku di destê wî de ye vekir, hemû mişkan bi hev re bazdan hundirê tûrik. Min nefeseke kûr stand. Ji ber ku hewayê hundir sar bû, ez ji hiş nediçûm. Ez birim menzeleke din û demildest dest bi şoka elektirîkê kirin û berdewamî digotin; 'Em dê ji te re bêjiyekî çekin '. Ez zû ji ser hişê xwe çûm û nizanim wan…

Şîrîn cardin ket navberê:

- Wan çi.

- Wan bi min…

- Semîra tiştekî wisa tuneye.

- Lê…

- Derewan dikin.

- Nizanim.

- Guhê xwe nede wan.

- Lê wan…

- Ew dixwazim derûniya te xera bikin. Tê bira te em, li ser mişkan axivîbûn. Îro xwestin bi rêbazekî wisa te têk bibin. Niha jî dixwazin di vî warî de te hilweşînin…

- Gelo dê hîn şikencê bi min bikin an na?

- Li vir tiştekî teqez tuneye, dibe ku her roj bi me şikencê bikin, em jî dê her li ber xwe bidin.

- Heke wisa bidome ez dê mîna te dest bi çalakiya birçîbûnê bikim.

- Semîra.

- Çiye?

- Lezê neke.

- Tu dizanî Semîra, mirov heyberekî wisa hêzdar û berxwedêre ku tiştekî nikaribe rake tune ye. Daxwaza min ji te ewe ku tu qet nebêjî ez nikarim, ger tu bêjî ez nikarim tu dê winda bikî û dê heta hetayê stuyê te xwar be.

- Lê pir dijware.

- Mirov gemiye, ger carekê gemî avê bigire dê hêdî-hêdî ber bi niqumbûnê ve biçe û encam dê kareset be. Jiber vê pêwîste gemiya me ya berxwedanê, qet û qet

avê negire û bergeha xwe bidomîne, me çarekê bagîrên dilê xwe li zeryaya jiyanê vekiriye û em dê heta dawiyê biçin. Wê demê em dê bi serkeftî xwe bigihînin rawestgeha azadiyê. Ev jî heye; carinan rawestgeh jî têrê nake, divê mirov rawestgehê jî li dû xwe bihêlê.

- Nizanim, mîna ku qet hêz di min de nema be.

- Semîra hêz bawerî ye, ger bawerî hebe, hez jî heye.

- Baweriya min hindike.

- Na, baweriya te zêdeye. Ma ne tuyî ya ku li dijî wan tiştên bê eman li berxwe didî? Belê, wê gavê baweriya te xurte. Tu ji baweriya xwe bawer bike bese.

- Hê jî hundirê min dilerize. Dema mişk tên bîra min, dibêjim qey niha li ser canê min digerin.

- Binêre, te li hemberî şikenceyeke wisa dijwar li ber xwe da ku êdî tu şikence nikare vîna te bişkîne.

- Gelo wekî din kîjan cureyên şikencê hene?

- Pirin…

- Çawa? Dê hê hemûya li ser min biceribînin.

- Ger fam bikin ku bi rastî tu ne endama tu rêxistinanî dibe ku rawestin.

- Te qala rêxistinan kir, xwişkê ma gelo ew çi tiştên ji bo te digotin raste an na?

Şîrîn bişîrî û destê Semîrayê mist da:

- Vaye tu jî endamê partiya meyî.

Semîra jî keniya bû:

- Wele ez meraq dikim, ma çima Kurdan partî damezirandine û li dijî pergela van şikencekaran şer dikin. Wisa dibêjin, serê min jî tevlihev bû.

- Semîra.

- Fermo.

- Ger tevlihevî hebe, dê zelalî jî çêbibe.

- Çawa, min fam nekir.

- Mejî dişibe avê, gava ku tu avê şêlû dikî, piştî demekê av dadiwerive û zelal dibe.

- Ango tu dibêjî, tu dê fam bikî.

- Fam kirin, azadiye.

- Çawa?

- Ger tu fam nekî, nikarî watê jî bidî, ger tu wateyê nedî, tu nikarî têkoşînê bikî. Têgehîştina rastiyê bi tekoşînê pêktê.

- Lê heke tu ji min re nebêjî ez dê çawa fam bikim.

- Ez Kurd im. Min berê jî ji te re gotibû.

- Na, em ne ‘terorîstin’, ez şoreşgerim. Ango li dijî neheqiyê me, li dijî kedxwariyê me. Lê ew rastiya me berovajî dikin. Em dixwazin li vî welatî bi nasnama xwe, bi zimanê xwe, bi kevneşopiyên xwe û xweseriya xwe azad bijîn.

- Ango partiya we heye.

- Belê.

- Hûn çend kes in.

- Em, miletekin, ango bi milyonanîn.

Çavê Semîra biriqîn, keniya û bêhemd got:

- Maşelah, maşelah, stara xwedê li ser me be.

Şîrîn matmayî ma:

- Te got stara xwedê li ser me be?

Semîra bi gotinek nîv henekî:

- Min got; stara xwedê ser we be.

Lê dîsa jî ev gotin, pir Şîrînê xweş hat.

- Em gelekin, ji ber vê ji pergela sêdarê jî natirsîn.

- Êdî ez we mafdar dibînim.

- Em tenê ji bona xwe têkoşînê nakin, di serî de em ji bona azadiya jinan xwe feda dikin.

Semîra li Şîrînê nêrî:

- Niha serê min pir diêşe, dixwazim xwe hinekî dirêj bikin.

- Baş e.

Semîrayê xwe dirêj kir û di nava kêliyekê de raza. Şîrîn jî li ber serê wê rûniştibû…

*　　*　　*

Koma şervanan dabûn pala çiyayê Şaho û weke tiliyên destan li dû hev dimeşiyan. Şîrîn di rêza çaremîn de bû. Çente li pişta wê, rêxt û şûtik li sînga wê bû. Kefiya wê li dora stuyê wê pêçayî bû. Semt bi semt dimeşiya.

Carina bêhneke kûr distand û xwîdana eniya xwe paqij dikir. Kom westiya bû, hêdî-hêdî di riyên teng, bi gavên giran û bi hêviyên mezin dimeşiyan. Nermebageza demsalê rûyên wan mist dida û dihişt ku aramiya rûyên wan zêde bibe. Di destê Şîrînê de gopalekî ji dar Kinêrê hebû. Di rêwîtiyên dirêj de gopal pir bi kêrî wê dihat. Ji ber vê yekê qet gopal ji xwe nediqetand. Di vê rêwîtiya dirêj de cardin gopal pir jê re bibû alîkar. Gelek caran ji hevalên xwe re gotibû; “ev gopal rista lingê minî sêyemîn dibîne”. Gerîla di şive rêkên teng û asê de çîv û çîvanok didan xwe û ber bi lutkeyên Şahoyê ve diçûn. Ji berbanga sibê re hindik mabû. Stêrkên şevê yên dawî li kotê Şahoyê

jar jar diçirisîn. Mîna ku kêliyên dawî yên jiyanan xwe diçirisandin.

Koma wan ji Qendîlê derketibû rê. Ev nêzî mehekê bû di rê de bûn. Li gelek cîhan bêhn vedabûn. Ji gelek xeter û xeteriyan re derbaz bibûn, lê qet ji meşê of nebibûn. Qet negotibûn “ma çima ev rê naqede?”.

Jîn Rojhilat, car caran diçû cem Şîrînê û digot;

- Ger barê te giran be, ez dikarim çentê te hilgirim.

- Na, Jîn na. Ji xwe roja ku me dest bi vê rêwîtiyê kir, barê me giran bû. Ji bo dilnizmiya te spas.

Asoxwîn koma wan gihîştibû cihê xwe. Barê xwe danîbûn, pişta xwe dabûn çentên xwe. Kûr kûr dihizirîn. Fermandara komê Berçem, kurte axaftinek kir û xwest hemû hevalên jin cihê xwe asê çêkin.

Berçem ji mêj bû li çiyayê Şahoyê dima û herî dawî dema ji çiyayê Şaho çûbûn çalakiyekê bi gulebarana pasdaran gihîştibû asta pakrevaniyê. Berçem hate cem Şîrînê, bi dengekî germ ku tijî hezkirin bû got:

- Heval Şîrîn.

- Kerem ke.

- Te pir dixwest tu werî çiyayê Şaho, vaye tu îro li lutkeyên Şahoyê yî. Bawerim tu gelek bextewer bûyî.

- Raste niha gurme gurma dilê mine.

- Dê kêliyek din roj derkeve, dîmenek bêhempa derdikeve holê, mirov naxwaze çavê xwe jê babide.

- Ev meheke ez wê kêliyê nîgaş dikim.

- Divê tu ranezêy.

- Ez ranazêm.

- Piştî saeteke din dê rengekî sorgevez hêdî-hêdî xuya bibe. Dûre jî dê tav derkeve.

- Min hemû amadekariyên xwe kirine. Divê ez wê dîmena mayînde bikim.

- Li vir him derketina rojê, him jî barkirina rojê bêpayane. Tu dê bawer bikî heta nava hestiyê xwe mirov di bin bandora wan dîmenên bêhempa de dimîne.

- Jîn Rojhilat, ji min re pir qala wan dîmenan kiribû.

- Erê, erê Jîn tenê qala wan dîmenan nake.

- Wekî din çi dibêje?

- Dibêje azûmana azadiyê Şahoye. Ji ber vê pêwîste hemû jinên vî welatî werin Şahoyê bibînin.

- Rast gotiye Jînê. Li vir per û baskên mirovan çêdibin û mirov bi xeyalên xwe re difire. Lê em dibînin jinên vî welatî, tevlî xeyalên xwe tên kuştin. Xwe hînî firandinê nakin. Pergalê tenê riya lûşê ji wan re hiştiye.

- Min digot qey ez evîndarê Şaho me, lê Jîn Rojhilat ji min xerabtire. Dibêje Şaho û tiştekî din nabêje.

- Berçem.

- Fermo.

- Tiştekî wisa dihate bîra te?

- Çi?

- Qet nedihat bîra me ku em dê rojekê weke komek jinên azadîperest derkevin çiyayê Şaho.

- Tu rast dibêjî, lê vaye îro em li virin.

- Xwezî niha Perya û Sînem jî li vir ban.

- Ew kîne?

- Hevalên min yên zarokitiyê ne. Ez û Perya bi hevdu re tevlî tevgerê bûn. Min bihîst ku Sînem jî tevlî tevgerê

bûye. Lê min qet hay jê nîne. Rewşa wan gelek meraq dikim. Ez zêde serê te neêşînim. Vaye dimena me hêdî-hêdî derdikeve.

Şîrîn axaftina xwe birî, çentê xwe vekir. Mekîna wêneyan derxist û da ber çavê xwe, gava dimen baş zelal bû tiliya xwe xiste ser denklaşorê. Bi dengekî nizm;

- Berçem, Berçem.

- Kerem ke.

- Were, were.

- Çi bû?

- Ka li pêşiya vê dimena xweş raweste ez wêneyekî te bikişînim.

Wêneyê Berçem kişandibû.

Vê carê Berçemê wêneyê wê kişand.

- Berçem.

- Bêje.

- Ka bangî Jîn Rojhilat bike, ez dixwazim wêneyekî wê jî bikişînim.

- Tu jî zêde romantîkî Şîrîn.

Her du keniyan, Jîn bi çavên xilmaşî hat:

- We çima ez hişyar kirim.

Şîrîn keniya:

- Ka were, were ez wêneyekî te tevlî vê dîmena xweş û bêhempa bikişînim.

Jîn keniya:

- Başe, lê divê ez mistek av li rûyê xwe bidim.

Şîrîn:

- Başe, lez bike. Bila ev kêliya dîrokî winda nebe.

Jîn bi lez û bez ser çavê xwe şuşt û hat:

- Temam, tu dikarî min û dîrokê mayînde bikî.

Her sê keniyan û Şîrînê cardin tiliya xwe xiste ser denklaşorê .

Şîrîn bi dengê Semîrayê ji nişkê ve veciniqî:

- Çi bû, Semîra ?

- Ev demeke ez bangî te dikim tu bersiva min nadî. Tenê tu dibişirî, te ez tirsandim.

- Na, na netirse, tiştek bi min nehatiye. Tenê heta çiyayê Şahoyê çûm, ewqas.

- Ez fam nakim, tu qala çi dikî?

Şîrînê mijar ji serî heta dawiyê ji Semîrayê re vegot. Semîra keniya. Bi dengê bilind keniya:

- Te ewqasî pesnê Şaho da, lê te qet qal nekir ku cihekî çawa ye?

“Mîna ku tu Şaho nas dikî, ez axivîm. Wê demê ez ji te re qala Şaho bikim! Şaho dilê baweriyê ye, hêvî ye. Jiyane. Şaho serpêhatiya dîrokêye, awaza bindestane. Şaho warê kulîlkên cur bi cur, warê hingivê heqîqiye. Bi zaravayê soranî ´Şaho’ navê teyrekiye. Ew teyr bi navê Şahîn tê naskirin. Li bilindahiyên Şahoyê jî Şahîn zorin. Dibe ku ev navê qedîm, ev navê bi heybet ku bêhna azadiyê jê tê, ji ber vê yekê lêkiribin. Ew jî weke Helgurd û Qendîlê bilinde. Çiyayê Şaho li Rojhilatanê Kurdistanê yek ji çiyayên herî bilinde, nêzî sê hezar û çar sed metre bilinde. Gava ku mirov ji jêr de lê dinêre sawek cuda dikeve dilê mirov. Şaho bi navenda xwe di nava Hewramanê de ye. Hêleke wê ber bi Merîvanê ve dirêj dibe û diçe, hêlek jî ber bi Kirmanşan û Kamyaranê ve diçe. Hêleke wê jî ber bi Paweyê ve. Cihekî ewle û xweş e. Qontarên Şahoyê, an jî binarên wê hemû daristanin. Daristanên berû, yên rez û

gûzan. Geşe, heta ber bi jor ve diçe zozanan. Ber bi Hewramanê ve çiyayekî pir asêye. Piştî wê, dolên gelek kûr hene, ev dol ber bi çemê Şîrwanê ve diçe. Çemekî pir mezine. Ji bajarê Sinê heya bajarê Derbendîxanê ya li Başûrê Kurdistanê ve diherike. Ger riyên Şahoyê nas neke û nezane li Şahoyê bigere, teqez dê wenda bibe. Gelê herêmê reşmalên xwe li wî çiiyayî vedidin. Li aliyê Kamyaranê erdnigarî weke karekî sereke tê meşandin. Hinek cihên Şahoyê ewqas asêne mirov dikare bi salan xwe lê veşêre.

"Li du aliyên Şahoyê Hewramî, li sê aliyan jî Soranî axiv hene, ev gel li derdora Şahoyê bi cîh dibin. Li aliyê jora av pir kême. Heta meha Tîrmehê jî ji xeynî çend kaniyan av namîne. Piştî av diqede, li Şaho çalên berfê hene û jî wan berfa qerqazî tê derxistin. Ev çal li cihên weke şikeftan, weke birînan hene û mîna qeşegehê ne.

Şêniyên herêmê bi piranî ava xwe ji wan çalên berfê qerqazî digirin. Di demsala biharê de Şaho pir şîn dibe yan bi gotineke din kal dibe. Lê di herdu demsalên havîn û biharî de Şaho azadî û bexteweriye. Ger mirov demsala havînê biçe Şahoyê û nezane bigere dê ji tîna bimire. Şaho wisa ye. Xwedî raz û razdariyê ye. Li Şaho mêşên hingiv pirin. Heliz lê zêdeye. Li derdora wê sewal têne xwedî kirin. Şaho ji serdema Zerdeştî û misilmanan de herdem ji bo Kurdan keleheke parastinê bûye. Şopa ol û jiyana kevnar lêmane. Mirov dixe nava efsûneyek bêdawî.

Heta cara yekem jî "Erdelan" ku êleke mezin a Kurdan in, bi navê Erdelan tê naskirin. Dema hîkumetên xwe yê heremî ava dikin diçine 'Şaho' yê li wêderê weke gel bi cîh dibin û wir ji xwe re weke kelehek xwezayî hildibijêrin. Hikumeta Kurdan ya yekemîn, cara yekem li Şaho çêdibe. Kurdan li wir ji xwe re welatekî biçûk ava kiribûn û xwe diparastin. Di serdema îslamê de wan hikumeta xwe li vir

damezirandine. Gundên ku li binaran tên dîtin bingeha wan digihêje deştê. Hewşên hemû malan li ser mala dine. Çawa mirov kerpîçan datîne ser hev ew jî wisa ye, mal hema bêje li ser banên malan hatine avakirin. Hemû malan bexçe hene. Gelê herêmê hemû kedkarin. Bi xwîdana eniya xwe debara jiyanê dikin.

"Şaho bi piranî bi gûzên xwe bi nav û denge herwiha bi rez û tiriyên xwe bi nav û denge. Darên Qizwanê, gul Binefş û giyayê ku navê xwe li heremê belav kiriye, 'Bereze Mêrkuj' bi taybetî li ser textên asê şîn dibe. Beraz û kewên lê dijîn. Sibeh bi dengê kewan destpê dibe. Hinek kulîlkên ku li Şaho şîn dibin li tu derên Rojhilatê Kurdîstanê çênabin. Dema mirov biharê diçe Şahoyê sermest dibe. Biharan dar hinar dibine xwîn.

Hemû dever sor dibin. Hingiv ji lat û darên wê diherike. Herêma Şaho berdewamiya rêze çiyayên Zagrosê yê. Di navbera çar bajarên, Rewanser, Pawe, Kamyaran û Ciwanroyê deye. Şaho dikeve navbera sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê. Piştî Şaho, Dalaho tê. Di wê heremê de Şaho çiyayê herî navdar û bilinde. Çiyayê Şaho xwediyê latên mezin û piraniya wan latên reş in.

Berfa wê jî, di demsala zivistanê de ji ya hemû deveran zêdetire û dereng dihele. Di demsala bihar û havînê de, gel diçim zozanên Şahoyê. Diçin warê; 'Kosê Hecîc'. Ew der pir xweşe. Weke Jîn Rojhilat jî gotibû; 'Şaho azmûna azadiyê ye'. Kî/ê di wê azmûnê re derbas bibe, dê xwe bigihîne raza azadiyê".

Semîra mîna ku taze ji xewa giran hişyar bibe hêdî-hêdî çavên xwe girtin û vekirin. Dûre li Şîrînê nêrî:

- Çima çiyayek ji me re dibe azmûna azadiyê?

Şîrîn bişirî:

- Çiya jî dişibin mirovan, hêla wan ya hizrî, bîrdozî, hestiyarî û giranî heye. Xwedî dîrok û bîrin. Dema min ji te re qala Şaho dikir, nemaze min bal kişande ser şopên dîrokê. Çima azadî û çiya? Çiya serbestî û hêze. Dijwariye. Gava mirov gav davêje çiya, mirov hemû tiştên ku bêhna serdestiyê jê tê li dû xwe dihêle. Ango mirov pira di navbera xwe û pergalê de hildiweşîne. Dibe xwedî per û bask û difire. Mirov xwe nêzî asoyê asîmanan dibîne.

- Tu li vir, di nava vê dojehê de hê çawa wisa dihizirî matmayî dimînim.

- Ger mirov di ramanê de azad be, di hestan de, di dil û mejî de azad be, war bê wateye, wateya xwe winda dike.

- Mirov dê çawa zanibe ku azadî pêk hatiye?

- Gava te tirsa hundirê xwe şikand. Gava te hêviya xwe mezin kir, gava te xwe gihand têgehîştina hişmendiya pîroziya nirxan û tu bi çavê xwe li gerdûnê, li mirovan, li xwezayê, li jiyanê û li bûyeran, li diyardeyan nêrî wê demê tu dê bigehijî raza azadiyê.

- Raza azadiyê çiye?

- Tu bi xwe yî.

- Çawa?

- Ger tu hundirê xwe kefş bikî û ger tu zeryaya hundirê xwe zanibî venêrîne, tu dê di nava pêlên azadiyê de avjêniyê bikî.

- Ev bes in ji bo azadiyê gelo?

- Bêguman ne bese.

- Weke din?

- Xwezanîn.

- Belê.

- Xwe nasîn. Watedayîna jiyanê.

- Heta roja îro min qet pirsa kî me ji xwe nekir.

- Ji xwe naxwazim, berdewamî em pirsan bikin.

Naxwazim em wan bidin ber lêpirsinê. Jiber ku pirs textên wan dihejîne. Tirsê dixe dilê wan.

- Çima ewqasî ji pirsan ditirsin?

- Her pirs çalakiyeke, Lê…

- Lê çi ?

- Ew dixwazin, berdewamî em bi mejiyên tevizandî bijîn. Giyanên tevîzî, dilên tevîzî, hestên tevizî û mejiyê tevizî, çavkaniya jiyana wane.

Semîra?

- Fermo.

- Gelo heta îro te çend caran ev pergela sêdarê daye ber lêpirsinê.

- Qet.

- Te çend caran gotiye pêwîst e ev pergal hilweşe?

- Qet.

- Pirsa herî zêde te dikir çibû?

- Min pirs nedikir, min gazinc dikirin.

- Gazin nîşaneya neçariyêye. Destpêka têkçûnêye.

- Raste.

- Hemû kesî bi gefên sêdarê bêdeg dikin.

- Erê hemû kes bêdenge. Di xewa mirinê deye. Tiştekî nabêjim. Mezlûm jî dengê xwe dernaxin.

- Semîra.

- Çiye?

- Te, tiştekî pir xweş got. Tu dizanî Martîn Luther Kîng çi gotiye?

- Na…

- Gotiye; ‘Ne zilma zaliman, bêdengiya mazlûma min ditirsîne ’. Ez jî qet ji wan natirsim. Mirina bi rûmet sed hezar carî ji jiyana bêrûmet hêjatire. Jiber ku bêdengî mirine. Wendabûn e û wendakirine.

Semîrayê serê xwe hejand û bêdengiya xwe domand.

Şîrîn fam kir ku devê wê ji tîna zuha bûye. Tameke tehil bi ser zimanê wê ketibû. Ji bo ku hinekî bêhna xwe bistîne pişta xwe da dîwar û çavên xwe girtin…

*  *  *

Wê roja ku bi şikenceyên dijwar derbaz bibû, mîna kevirekî reş û giran xwe berdabû ser dilê wan. Na, na mîna şîşeke şewtîner li ser bedenên wan geriyabû. Semîra di nava êşan de dinaliya, dengê wê dernediket, zimanê wê nedigeriya, ji tîna zimanê wê bibû mîna pîşo, tenê car caran digot “qurteke avê bidin min, heke hûn avê nadin min, werin min bikujin, bila ev dojeha ku ez di nav de dişewitim biqede. Zû werin. Werin min bikujin. Hûn çima nayên şikencekarno, ma hûn çima ji mirina min ditirsin. Avê bidin min av, av av av”. Semîra biribûn di menzeleke teng û pir gerim de rawestandibûn. Beriya ku wê bibin menzelê, çend kevçî xwarinek bi xwê dabûn wan, lê Şîrînê nexwaribû, Semîrayê tenê çend kevçî xwaribûn, dûre av xwestibû, lê av nedabûn wê. Di ser de jî, di wê kelekela Tîrmehê de ew biribûn wê menzela teng ku mîna tenûrê dikeliya. Di nava çend deqeyan de dilopeke xwîdanê di bedena wê de nemabû. Mîna hewrekê firaxan ku mirov dane ber tavê zuha bibû. Ji tîna bêhal û bêmecal ketibû.

Ber çavê wê tarî dibû. Serê wê gêj dibû. Tameke tehl weke zilindarê bi devê wê diket. Bêhna wê dernediket, gewriya wê dişewitî. Semîra di temenê xwe de cara yekem bi xezebek wisa tî bibû. Êdî nedikarî ji tîna xwe li ser lingan bigire, vir de wê de bitewişî, hêza wê qediya bû. Xwest ber bi derî ve bimeşe. Lê bi milê rastê ve tewişî û ji nişkêve kete erdê, cardin hewil da rabe ser xwe, lê bi ser neket. Tevî ku derî nêzî wê bû, lê wisa li ber çavê wê dûr dihat, te digot qey tu carî nikare xwe bigihîne derî. Di dilê xwe de got; “Divê ez, di vê dojehê de nemirim. Pêwîste bijîm.” Çavên xwe vekirin û zîq li hêla derî nêrî, tu sewt û pêjin nedihat. Mîna ku ji bilindeciyekî li goleke av meze bike, kizênî bi nava wê ketibû. Çongên xwe dan berxwe û hêdî-hêdî li ser çongên xwe meşiya, geh diket, geh radibû, herî dawî gehiştibû ber derî, xwestibû biqîre, lê dengê wê derneketibû. Bi wê kêmhêziya xwe çend caran li derî dabû. Têgihîştibû ku hinek li ber derî rûniştine, bi dijwarî axivîbû:

- Hûn çima derî venakin?

Yek ji pasdarn keniya û hate ber derî:

- Tu çi dixwazî?

- Zû min ji vir derxin.

- Çima?

- Ez ji germa mirim.

Dîsa keniya bû:

- Na, vaye tu hê saxî.

- Heke hûn min ji vir dernaxin, avê bidin min…

- Tu avê dixwazî?

- Erê.

- Başe.

- Çima hûn avê nadin min.

Pasdar bi dengekî bilind keniya bû û li pasdarê din nêrî bû:

- Jixwe miza min dihat.

Samira gava ev hevokên wî bihîstibû, tifî wan kiribû û gotibû: “hûn heywan jî nînin!” Ew pasdarê kerax û hov weke ku tiştek nebûbe, hatibû li ber Semîrayê rawesta bû û ser wê de mîstibû.

- Aha te av dixwest, ji te re av.

Semîra kêliyekê bêdeng ma û xwe ber bi deriyê hesinî ve dehf da. Serê xwe bir texma qiraxa derî û beriya ku serê xwe li derî bide, di dilê xwe de got;

- Rûmeta herî mezin mirine. Riya herî hêsan li vir mirine. Wan ji min re gotibû; “tu Kurdî” min gotibû “na” lê ez ji kîjan nijadî bim jî, vê kêliyê şûnde ez Kurdim. Şîrîn, min nedixwest wisa, bi vî awayî terka te bikim. Lê êdî tu rê û rêçên din li pêşiya min nehiştin…”

Û heta hêza wê hebû sê caran serê xwe li qiraxa derî, cîhê tuj xistibû. Wisa bi şid lêdabû, porê wê yê herîrî tevlî xwînê bi derî ve zeliqandî mabû.

Pasdarn ji nişkêve ew girtibûn, Semîrayê jî xwestibû xwe bikuje:

- Min berdin hovno, ez ê xwe bikujim.

- Tu li serê me bûyî bela…

- Hûn li serê mirovahiyê bûne bela.

- Hiş be.

- Ez hiş nabim. Ez ji we natirsim. Hûn hov in, Hûn rûyê reşê mirovahiyêne.

Bi qîrewîra wan re pasdarekî din hat û qîriya:

- Zû devê wê girêdin.

- Nabe.

- Çawa nabe?

- Pir xwîn ji serê wê tê.

- Çima çi kir.

- Xwest xwe bikuje.

- Çima wisa kir?

Pasdarê din axivî:

- Av xwest, me nedayê.

- Zû avê bînin.

Semîra bi dengekî tund:

- Ez avê venaxwim. Dixwazim bimirim. Min berdin. Hovno, şikencekarno, waz ji min bînin.

Hewildan ku bi zor avê bidin Semîrayê, lê Semîra devê xwe venekir, êdî nedixwest bijî. Piştî ku çend tas ava cemidî li serê Semîraya birîndar ku di nava xwînê de mabû kirin, bi erdê re kaş kiribûn, avêtibûn hundirê şaneyê. Semîrayê nedikarî rabe ser xwe. Çavên wê ji xwe ber hatibûn girtin. Demek dirêj ji hiş çûbû. Gava Şîrîn ji şikenceyê anîbûn şaneyê, Semîra ne li ser hiş bû. Lê piştî demekê Semîrayê çavê xwe vekiribûn û cardin derveyî vîna xwe gotibû; "avê bidin min", ji ber ku şikenceya giran li Şîrîn hatibû kirin, nekarî xwe tev bide. Rewşa Semîrayê dilê wê diêşand. Gotinên Semîrayê yên dawî ew matmayî hiştibû. Şîrîn bi dengekî tijî êş û keder got:

- Semîra , Semîra, Semîra…

Semîrayê serê xwe bilind kir:

- Tu li virî xwişkê?

- Erê.

- Dixwazim bimirim.

- Tu çi dibêjî Semîra.

- Niha mirin ji bo min ji jiyanê hêjatire.

- Na divê tu bijî.

- Dev ji min ber de xwişkê.

- Semîra te av dixwest, vaye av li ber serê te ye vexwe.

- Na ez venaxwim.

- Semîra wisa neke. Dilê min perçe perçe neke. Cîhanê bi ser serê min de xera neke…

- Xwişkê min tu naskirî bese.

- Ger tu nejî wateya jiyana min tuneye Semîra.

- Xwişkê were. Li ber serê min rûnê û ji min re qala welatê min bike, Kurdistanê!

- Welatê çi, Kurdistana çi Semîra?

- Ez Kurd im Şîrîn, ez Kurd im!

- Çi Kurd, çi Fars, çi ferq dike. Dev ji van gotinan berde Semîra.

- Na, na bi rastî ez Kurd im.

- Semîra başe, wê demê avê vexwe ji bo ku tu têkoşîna azadiya xwe bidî û bijî.

- Ma te negotibû, mirina me jî têkoşîneke.

- Lê…

- Lê çi?

- Min negotibû wisa bi hêsanî.

- Na, na.

- Çawa, na?

- Min tif li rûyê wan kir û min got ez Kurd im.

- Semîra?

- Çi?

- Tu çima xwe ji dest berdidî.

- Ez dixwazim êdî bifirim dinyaya wî alî.

Şîrîn têgehişt ku Semîrayê biyara mirinê daye. Di dilê xwe de got: “ya herî rast ez dê çawa qenaetê pê bînim”. Hinekî hizirî:

- Semîra?

- Çiye?

- Te çawa fam kir ku tu Kurdî.

- Wan ji min re gotibû.

- Kengî?

- Roja ku şikenceya mişkan bi min kirin.

- Te çima ji min re negot?

- Min ji wan bawer nekiribû. Lê ...

- Lê çi ?

- Dûre hizirîm.

- Tu hizirî çibû?

- Dayika min.

- Dayika te çi anî bîra te.

- Dayika min Xorasaniye.

- Xorasaniye, ev nayê wateya ku ew Kurde. Tu çima ji bo mirina xwe li sedeman digerî.

- Tê bîra min.

- Çi tê bîra te.

- Dayika min digot, dema ez zarok bûm, bavê min mir. Ez û birayê xwe çûn Êsfêhanê, em li wir li ber destê ba-

zirganekî xalîçeyan dixebitîn, lê ji ber ku me bi farsî nedizanî, me gelek astengî dîtin.

- Semîra waz ji van çîrokan bîne.

- Na, na ez rast dibêjim.

- Ma qey tu li halê min napirsî.

- Xwişkê min bibexşîne lê min berde.

- Semîra rabe avê vexwe. Mirinê ji bîr bike…

- Nabe.

- Dibe.

- Êdî nikarim bijîm.

- Semîra.

- Hiii…

- Ma tu dizanî.

- Çi.

- Ji bo min îdamê dixwazin.

- Dev ji min berde…

- Ma qey te nebihîst min çi got, dixwazin min îdam bikin.

Gava Semîrayê ew hevok bihîst bêhemdî xwe velerizî.

- Ew dê çawa miroveke mîna te îdam bikin.

- Wisa dibêjin.

- Na, te şaş fahm kiriye.

- Heke tu ji biryara xwe ya mirinê venegerî, dema min îdam bikin dê kî van tiştên ku li vir hatiye serê me binivîse?

- Şîrîn.

- Çiye.

- Tu bi rastî dibêjî?

- Erê.

- Ji min re jî gotibûn, lê min weke gefekê fam kiribû. Ez jî destpêkê pir tirsiyabûm.

- Ez natirsim, lê...

- Lê çi?

- Tenê xemgînim…

Semîrayê xwest çavên xwe veke, lê çavên wê venebûn. Porê wê yê reşqetranî di nava xwînê de mabû. Tayên pora wê bi hev zeliqîbûn. Hinekî bêdeng ma. Di nava wê bêdengiyê de êşa birînên serê xwe hîn bêhtir hiss dikir. Gotinên Şîrînê bênavber di nava pêlên mejiyê wê de olan dida. Bêy ku tiştekî bêje, destê xwe ber bi avê dirêj kir, av vexwar. Hinekî bi ser hişê xwe ve hat. Li Şîrînê nêrî:

- Tu çawayî Şîrîn?

- Başim.

- Ger min dilê te şikandibe, li min bibore.

- Na, na ji bo ku te av vexwar spas.

- Pir bi ser min de hatin.

- Ma çawa kirin.

Semîra hemû tişt jê re got.

Şîrînê fam kir ku çima Semîra biryara mirinê daye:

- Xwişkê tu jî pir êşandine.

- Erê.

- Ma qey tu nikarî lingê xwe rast bikî.

- Bi qamçiyan pir lêdan.

- Hov in, hov…

- Lingên min xistibûn nava du daran û dieciqandin. Bi dehan caran wisa kirin.

- Soz didim.

- Soza çi?

- Ji niha û pêde ez dê ji bo xeyalên te têbikoşim.

- Nîgaşên me yekin Semîra…

- Heta niha nîgaşên min tune bûn.

- Nîgaşên hemû jinan heye. Tenê nizanim qeyd û bendên koledariyê bişkînin.

- Ez êdî ji tu tiştî natirsim.

- Netirse Semîra, netirse.

- Natirsim.

- Bila tirs ji te bitirse.

- Niha ez xwe pir azad dibînim.

- Ev hestên bêdawiyê ne.

- Şîrîn.

- Belê.

- Wê rojê dema te qala çiyayê Şaho dikir, te gotibû em komek heval, çima heval?

Şîrîn bişirî, ev pirsa Semîrayê lê xweş hatibû:

- Semîra, na na, hevala Semîra.

Gava Şîrînê wisa gotibû bi dengekî bilind keniya bû.

Semîra jî bi vê peyvê gelek kenîbû. Ew diranên wê yê mîna libên birincê li hevhatî, xweşik ku bê qisûr bû ji nişkê ve xuya bibûn. Semîra bê navber dikenî. Şîrîn jî tevlî keniya wê ya xweş bibû. Piştî têr kenîbûn. Semîrayê bi zarekî tije hezkirin got:

- Hevala Şîrîn , hevala Şîrîn, hevala Şîrîn…

- Bêje hevala Semîra , bêje hevala Semîra…

Dema ku Semîra bêjeya ‘heval’ bikar dianî dengê wê pir xweş dibû.

Bi Kurdî qet nedizanî û hê jî nedizanî wateya heval çiye? Lewra dema ku Şîrînê bêjeya ‘heval’ bikar anîbû, ne bi farsî, bi Kurdî vegotibû. Şîrîn li ser wateya ‘heval’ dirêj dirêj ji Semîra re axivî bû. Semîra dîsa kenîbû.

- Hevala Şîrîn.

- Çiye?

- Îro ez hînî bêjeyeke Kurdî bûm. Pir bextewerim.

- Em êdî hevalin.

- Belê heval.

- Barê hevaltiyê jî girane.

- Ez dê vî barî rakim.

- Ez jî pir bextewerim ku niha hevaleke min ya nû çêbûye.

- Tu dizanî.

- Çi?

- Heke em di van şaneyên genî de nemirin û ez rojekê dayika xwe bibînim. Mizgîniya min a yekem dê ev be.

- Em dê wan rojan bibînin Semîra.

- Ez jî bawer dikim.

- Binêre, ligel hemû êşan em dikenin.

- Li derve ez ewqasî nedikenîm.

- Semîra.

- Na.

- Biborîne hevala Semîra, em hê dê gelek bikenin. Lewre hêviyên me ji hemû êşan mezintirin.

- Hêviya me ji mirinê jî mezintire.

- Hêvî dişibe avê, mirov jî dişibe gulê, ger av ji ser gulê were qutkirin dê gul demildest biçirmise.

- Em tucarî naçirmisîn.

- Te pir xweş got hevala Semîra. Dixwazim li vî welatî jin herdem weke gulên çirmisî bijîn. Naxwazim rûyên me vebe, naxwazim rûyên me bikene, naxwazin em bihizirin û biaxivin. Lê êdî Kurdan li vê erdnîgariyê bi şoreşa jinan dîroka azadiyê nivîsandine. Êdî em dê bi hevre strana azadiyê bêjin Semîra...

*        *        *

Germe, Kele kela germa Tîrmehê. Dîwar germ. Hesinên germ, av, ba, cîhana ku bi germahiya xwe mirovan dişewitîne. Germahiya ku bêhna mirovan çik dike.

Şîrîn li ber devê kuna hewakêşê rawestabû, ji bo mistek ba, ji bo ba werzînek nerim diqirqilî. Lê Şîrînê fetisîn his dikir. Bêhna wê bi neçarî derdiket. Bê hal û bêmecal bibû.

Beriya çar rojan ji nişkêve derî vekiribûn, bi leze lez Semîra ji şaneya Şîrîn derxistibûn û biribûn. Şîrîn weke kirareke berdewamî li bûyerê nêrî bû û di dilê xwe de gotibû; “dîsa ji bo şikencê birin. Semîra li ber xwe bide. Xwe sist neke. Stuyê xwe netewîne. Zû were”. Lê Semîra nehatibû, venegeriya bû û jê re negotibû ‘xwişkê’. Çar roj derbas bibûn, çar roj û çar şev. Çar caran tav derketibû, çar caran cîhan hişyar bibû, çar caran cîhan ketibû xewa giran, lê Semîra hê nehatibû. Stêrka Rojhilat çar caran li asîmanên welêt dabûn der û vemirî bû, lê Semîra nehatibû. Kengî deng ji derî bihata Şîrîn bi hêviyeke mezin li

hêla derî dinêrî, lê mixabin Semîra nedihat. Hêdî-hêdî hêviya Şîrînê kêm dibû. Pir bêriya Semîrayê kiribû. Gava ku Semîra biribûn qet tiştek negotin. Şîrîn çend caran pirsî bû, lê dîsa jî tu bersiv nedabûn. Şîrîn di nava êş û azarê de diqirqilî. Ji hêlekê ve germahiya Tîrmehê, ji hêla din aqubeta Semîraya ne diyar, ew pir diêşand. Êşeke zirav û bê dawî ji çavên dilê wê diherikî ser zeryaya cîhana bêbext. Şîrîn cardin mîna berê rûyê xwe da dîwêr û mîna ku bi dîwarê wê şaneya genî re biaxive, çû nava pêlên dem û dewranên berê. Rojên kevin û bihurî anîne bîra xwe, ew xwezaya welat ya ku mîna bihuştê, anîbû bîra xwe û hêdîka zimanê wê liviya bû:

“Sînemê. Sînema bêdeng. Sînema ku her tişt di hundirê xwe de dijiya. Sînema hev gundî û hvetemena min. Sînema Kurd, Sînema çavreş, rû esmer, xweşik û bedew. Nizanim çima, lê îro ji sibê de tu ji bîra min dernakevî. Tu ji asîmanê dilê min weke barana biharê dibarî. Tu di çemê dilê min de weke lehiya demsala payîzan diherikî. Sînem, Sînem. Mirov li vir neaxive, nabe. Roj, salîse, çirk, saet derbas nabin, şev naqedin. Sînem li vir hemû tişt bi hûrbûnî têne bîra mirov. Tiştên ku qet li dervê nedihat bîra min, niha mîna taviyên baranên biharê bi ser min de dibarin. Sînemê ew rojên bêdengiya te qet ji bîra min neçûne. Ew bêdengiya te, ew nêrînên te yên wenda bûyî û ew têgihîştina te ya jiyanê. Tu herdem mîna çemekî bêdeng hêdî-hêdî diherikî…

“Wê roja ku dayika te ya Azerî bi awayekî kambax li te dabû, hemû laşê te di nava xwînê de mabû. Ez di gaziya te de hatibûm û me dabû pala çiyayê Elkê. Gufe gufa bayê biharêye. Nû-nû reşbelekiyên berfê vebûne li çiyan. Çiyayên bilind ku bi hawara azadiyê dilerizin û bi dîmenên xwe mirov sermest dikirin, ji me re bibûn hêvî. Ava reşbelekiyên berfa qerqazî diherikîn, weke marê ji ber jahra xwe ya zêde ku diqirqilî çiv û çivanok dida xwe

û li binê newalê serê hemû avan digihişt hev. Gava em li serê girekî bilind rûniştîn û me li xemla xwezayê dinêrî, ji ber bedewiya bêhempa serê me gêj dibû. Ew çiyayên bênh veker, çiyayên arambexş û bawermend çiqasî hêz dabûn me Sînemê. Çemên biharê pêl didan û li ser hev re diqulipîn. Xwezî niha li ser wan çeman bam û min qurteke ava cemidî, zelal û xweş bi ser û lêvên xwe de kiriba, an jî bi ser kezeba xwe ya ku ji ber êşan dişwite da bikira. Lê îro ez gelek dûrî wan çemanim Sînem. Min bêriya pûş û pelaşan, qirş û qalan, dar û axê kiriye. Bihizire Sînem, tu li ber tava havînê, li ber germa Tîrmehê hatiye girêdan, li dora te agir hatiye dadan, tu bi sêlên sor hatiye dorpêç kirin, kezeba te dişewite, ji çi? Ji tîna, mîna agirê Enfalê, mîna çola Kerbelayê, mîna "Kura Fila", mîna agirê dojehê, lê tu nikarî avê vexwî, ji ber ku avê nadin te. Di ser de jî hundir germ dikin. Dixwazî mîza xwe vexwî, ew jî tuneye. Ji ber ku bedena te zuhaye, beden zuha bûye. Bûye mîna çermê xwêkirî ku li ber tavê hatiye hişik kirin. Dilopek xwîdan tenê têde nemaye. Bihizire Sînem, tu dixwazî bimirî lê tu namirî, namirî. Îcar îro li cîhekî wisa tu qet û qet ji bîra min derneketî.

"Em wê rojê heta êvarî li çiyayê Elkê geriya bûn. Min birînên te, bi kirasê xwe yê herîrî paqij kiribû. Em keniyabûn jî ha...Dîsa weke rojên berê min ji te re gotibû Sînema Dimdimî. Aha tu dawiya dawî bûye Sînema Dimdimî û tu li çiyayê Kurdistanê têkoşînê dikî. Sînema Dimdimî, niha çavên min bi çavbendek stûr û reş girêdayiye, ez tiştekî nabînim. Lê bi çavê dilê xwe te dibînim. Wê rojê em hatibûn li ser kaniya miradan rûniştibûn. Av çi xweş diherikî, masiyên biçûk çi xweş di seleba kaniyê de dilîstin. Avê çi xweş pêl dida. Dara tûyê pel vedida. Em herdu tenê bûn, Perya li ba me nebû. Te got; "ger Perya bibihîse, dê pir biheside". Te rast gotibû, dûre Perya pir hesidîbû. Ya rastî li xweşa min jî çûbû ew hesudiya wê. Îcar tu di-

zanî, dema min qala wê gera me dikir diteqiya. Ax Sînem, ax Perya. Û xwezî bi wan rojên me. Dema min gotibû;

“Sînem.

“Çiye

“Ma çima dayika te îro ewqasî li te daye?

“Çima tu wisa dibêjî.

“Piştî dayika min çû ser dilovaniya xwe bavê min ew jina Azerî anî. Tenê îro li min nedaye her roj û her kêliyê li min dide. Nahelê ez kêliyekê rûnêm. Ji sibê heta êvarî ez dixebitim. Sekin li min tuneye. Pişta min dikeve ber min. Carinan nizanim roj çawa derbas dibe. Ligel vê yekê jî dîsa min di berbanga tarî de hişyar dike. Dema ez kêliyekê dereng hişyar dibim, li min dide. Ez taştê amade dikim lê nahêle ez bixwim. Destpêkê ew û zarokên xwe dixwin, heke tiştek ji ber wan bimîne vê gavê ez dixwim, heke nemîne ez birçî dimînim. Bavê min qet tiştekî nabêje. Heman tişt li xwişka min jî dikir, niha xwişka min Leyla li ba kesekî nenas dixebite, ango xudamtiyê dike û her meh perê xwe tîne dide jin bavê. Min ji xwişka xwe re got; ‘perê xwe nede wê’ xwişka min got; ‘ji min re gotiye heke tu wereqeyekî perê kêm bînî, ez dê her roj Sînemê birçî bihêlim û lê bidim’. Ji xwe wisa dike. Lê dîsa jî xwişka min wereqeyekî jî kêm naîne. Carinan ewqasî li min dide ez ji hiş diçim. Ez li dibistanê bi ser keftim. Xwişka min ji min re du pirtûk kirîbûn, hê min nexwendibûn, avête tifikê û şewitandin. Gefên tund li xwişka min xwar. Her roj li ser bavê min zextan dike, dibêje; ‘zûka Leylayê bide mêr, em serê wê girê bidin. Ew ji wê malê re bargiraniyeke’. Lê ne wisaye, xwişka min dixebite. Mebesta wê ewe ku Leylayê ji min dûr bixe û di şûna wê de min weke xudam bide xebitandin. Ji xwe ez weke bendan dixebitim. Leyla qet naxwaze bizewice. Leyla wê rojê ji min re got; ‘ha zewicî me, ha mirî me, ji bo min feriq nake’.

“Leyla rast dibêje. Her roj jin xwe didaliqînin.

An jî xwe dişewitînin.

Per û baskên me dişkînin.

Tenê baskên me naşkînin. Me bi zindî dixin goristanê.

Rast e".

“Ma te bihîst, ji ber zextên jinbavê, ango dê mariyê, her çar xwişkên ku ji gundê Çiravê ne, xwestin xwe bikujin lê bi ser neketin û hê di wî temenê xwe yê biçûk de, her çar jî bi kesên gelekî ji xwe mezintir re zewicîn. Tu rê û deriyan li ber mirovan nahêlin. Ez jî Leylayê re dibêjim ji bo min dilê xwe neêşîne lê bi ya min nake. Êdî qet naxwazim biçime malê. Naxwazim rûyê wê jina bê wîjdan bibînim. Tu cudatiya mala me bi dojehê re namaye. Xwezî tenê li min bida, kengî devê xwe vedike dibêje, ’Ez ji Kurdan hez nakim’. Çima neheqiyê li me Kurdan dike. Ez fam nakim. Her kêlî bi kêlî derûniya min xera dibe, parsengiya min têk diçe. Gav bi gav dikevim rewşek ku raperînê bikim. Pir caran dihizirim ku agir berdim canê xwe. Heta wê rojê min ben avêt beştê kîlêrê û min stuyê xwe di qulpa benê re rakir, lê kêliya dawî Leyla hate bîra min û min kuştina xwe taloq kir.

“Sînema Dimdimî tu çawa wisa dikî.

Êdî nikarim nefesê bistînim.

Dê deriyekî xêrê vebe Sînemê, dê vebe.

Ez ji xweda duayan dikim, lê ew jî bi gaziya me de nayê.

Sînemê, mirinê jibîr bike. Jiyanê bîne bîra xwe.

Jiyan çiye Şîrîn? Ez dê çi û çawa bînim bîra xwe?

Ez jî nizanim jiyan çiye, lê ji bo ku em bijîn em hatine vê dinyayê.

Lê vaye nahêlin em bijîn Şîrîn”.

Sînem te gotibû nahêlin em bijîn. Raste nehêlin. Nahêlin em weke xwe bijîn. Wê rojê min nedizanî jiyan çi ye? Lê îro ez dizanim. Jiyan berxwedana li dijî neheqiyê ye, serhildane Sînem. Me jî serî hilda. Vaye ez li virim, tu jî li geliyê azadiyêyî û li rastiyê digerî. Ma ji vê çêtir çi heye Sînem. Wê rojê em qet netirsiya bûn û heta êvarî em geriya bûn. Dema em vegeriyabûn malê, ji gund darbesta jinekê radibû. Ew jina ku ji ber zilma mêrê xwe debar nekiribû û bedena xwe dabû ber agir. Min û te li hevdu nêrî. Ne te tiştek gotibû û ne min. Sînemê hê di ser wê roja me re çend roj berbas nebibûn ku li gund agahiyek belav bibû û digotin xwazgîniyê Sînema Dimdimî hatiye. Perya bi lez û bez hatibû cem min û gotibû; ‘ev derewe Sînem hê biçûke’. Lê derw nebû. Xwazgîniyê Sînema Dimdimî rûniştibûn. Sînem jî li ber derî bû û di navan hêsirên çavan de fetisibû. Sînemê baz dabû nava goristanê û li ber serê kêliya kevirê dayika xwe rûniştibû. Hêdî-hêdî digiriya. Kêla li ber serê gorê bû radimûsî û derdê xwe ji dayika xwe re vedigot.

Hê hêsirên te zuha nebibûn hatin û tu birin. Sînemê wê rojê ez mirim, Perya mir, tu mirî û hemû jinên gund carek din mirin. Cîhan tarî bû. Wê şevê stêrk li asîmanan xuya nebûn. Sînemê ew kêlî, ew dem, ew dîmen û ew hêsirên çavê te ji ber çavên min neçûn. Sînema Dimdimî, Sînema zîrek, Sînema ku evîndara xwendinê bû. Sînema ku di beden û canê xwe de êşên dîrokê vedişart. Sînema bêdeng, li dû xwe bêdengiyek ku dê tu kes nikaribe rave bike hişt û çû. Sînemê ew ne trajediya te tenê bû, trajediya miletekî bû. Wê demê min ew jiyana te ya serhildêr nedîtibû. Sînemê wê şevê Perya li dû te giriya. Ew Perya ya ku qet ji te hez nedikir, Perya ya ku ji zîrektiya te dihesidî, li dû te giriya. Vê zanibe ha…

Heta ku me berê xwe da çiya jî Peryayê berdewamî digot; ‘Sînem’. Sînemê va ye cardin ezana mixirbê xwendin û têgehîştim ku bûye şev. Îro çavbenda min pir şidandine. Niha, serê min li ber teqînê ye. Sînema Dimdimî, ma êdî em dê li hevdu rast bên? Nizanim, nizanim. Şevbaş Sînem…

Li stêrkan binihêre.

*        *        *

Beriya niha bi du rojan ji Şîrînê re gotibûn; “Em dê te ji vir bibin, tu dê bi cezayê îdamê werî darezandin. Ji xwe pêwîste te dared bikin. Divê tu biçî ber sêdarê. Te hê em nas nekirine. Me bi dehan kesên mîna te şandin ber sêdarê. Tu jî     dê mîna wan kesan ber bi wê qada sêdarê ve bimeşî. Tu kes nikarin tiştên ku em dinivîsin betal bikin. Ma qey te, di dema jiyana xwe de ev fam nekir. Em dê te jî ji vir bişînin, lê mêvan perweriya me ji bîr neke”. Piştî van gotinan şikencekar ber bi derî ve meşiya bû, wexta ku dikare derî bigirta, zîvirî û bi dengekî kerax got;

- Ma qey tu Semîrayê meraq nakî? Êdî wê meraq neke. Wê ji me re hemû tişt gotin û çû malê. Ji bo te jî hinek agahiyên balkêş dan. Êca êdî li benda wê nemîne. Ew çûûû…

Şîrînê qet tiştek negotibû. Piştî şikencekar derî girtibû û çûbû. Hêdîka di ber xwe de gotibû; “Semîra tu li ku yî ? Çi bi te kirin?”.

Şîrîn ji bo ku hinekî xwe ji wê dojeha sotîner dûr bixe û biçe serê çiyayê welatê xwe, ew çiyayê ku serê lutkeyên wan xwe digehande asîmanan. Ji bo ku mîna rojên berê biçe û li serê wan lutkeyên azad bigere, cardin hêdîka zîvirî û berê xwe da dîwarê germ ku mîna sêla sor

sincirîbû. Şîrînê weke di hundirê ayîngehekê de be çavên xwe girtin û ji wir çû. Niha li rojên li dem û dewranên kevin bû. Mîna kevokeke çiyayî difirî, mîna xezaleke tî ku dixwest xwe bigihîne avê, di şiverêkên çiyan re dimeşiya;

" Bi hatina berbanga bihareke xweş û geş koma şervanan bi dengê Şîrînê hişyar bibûn. Çaya qaçax û penîrê kesixandî amade bûn. Îskan li ser sifreya ji axê hatibûn rêz kirin. Çaydanê ku ji pêt û domana agir reş û qîr bibû, di destê Sema Oremarê de bû, îskan yek bi yek dadigirtin. Kelduman hêdî-hêdî ji ser îskanên mezin ber bi jor ve weke bênikê ku agir pêketibe, çîv û çîvanok li xwe dida û diçû. Sema Oremar him dibişirî, him jî bi dengê xwe, aramî li ser rûyê hevalên xwe belav dikir. Sema Oramar him şervan bû, him rojnameger. Sema her roj li cihekî, li bin kendalekî bîranîn û serpêhatiyên hevalên xwe kom dikir. Dinivîsand. Tomar dikir. Bi gotinek din serpêhatiya welatê xwe dinivîsand. Raboriya jinên welatê xwe dinivîsand. Serpêhatiya jinên bê ziman, jinên jar, jinên perçiqandî, jinên ku di nava pêlên dîrokê yên qetran de wendabûne dinivîsand. Çiya bi çiya, newal bi newal digeriya û dinivîsî.

Çeper vedan û dest bi xwarina taştê kirin. Şîrîn, Jîn, Sema, Avesta, Nesrîn, Zîn, Rengîn, Zîlan, Nalîn, Perî, Nazlican, Gulpel û Sînem. Li binê lateke çiyayê Qendîlê rûniştibûn. Li jêra wan geliyekî kûr bê ser û ber hebû. Li jora wan çiyayekî wisa bilind hebû ku çavê mirov serê wî nedidît. Çend gavan wêdetir kaniyek avê hebû, kanî ji quntara lateke biçûk diherikî, lê ava wê zor bû. Keçên Kurdan ji wê kaniyê av vedixwarin. Porên xwe bi ava wê kaniyê dişuştin û çaya xwe bi ava wê kaniya ku arambexşî dida mirov çêdikirin. Şîrîn ji zû de li vê qadê dima. Kengî derfet bidîta diçû li serê latek bilind rûdinişt û li geliyê jêrîn dinêrî. Gelek caran lênuska xwe derxistibû û bi nivîsa xwe ya kêm, kesera hundirê xwe bi rêzên kin û

sotîner nivîsandibû. Li hemberî bedewbûn û efsûniya van çiyayên xweş, sermest dibû. Pir caran di dilê xwe de gotibû; "mixabin min pir dereng berê xwe daye van çiyan". Şîrîn herdem bi dilêşeyeke gelek mezin ev peyv û hevok vegotibû. Îro dîsa piştî taştê, rahistibû çentê xwe û çeka xwe û bi gavên giran-giran ber bi kaniya ku di nava bêdengiyê de diherikî ve meşiya bû. Piştî çend deqeyan gihîştibû ser kaniyê. Ji seleba kaniyê çend mist av vexwaribûn. Bêhnek kur hilkişandibû. Bêhna Sosin, Nêrgiz, Beybûn û Nefelê difiriya ser çavê wê. Bêhneke xweş û geş bû. Bêhneke wisa xweş ku hemû êş û azarê mirovan, didan ji bîr kirin. Şîrîn pişta xwe dabû dar hejîra bejî û rûniştîbû. Beriya çend mehan ew û Perya li bin siya vê dara kevnar rûniştibûn. Piştî demjiyaneke dûr û dirêj li ser vê kaniyê di nava kincên cuda de pêrgî hevd hatibûn. Şîrînê berê Perya nas nekiribû. Lê Peryayê ew naskiribû. Piştî têr av vexwarinê vekişiyabûn cihê xwe û ji bona vehesandinê dest bi amadekariyan kiribûn. Perya ji nişkave hatibû li ber Şîrînê rawestiya bû û bi dengekî ku tu kesî nedibihîst;

- Şîrîn tu çawa yî?

Şîrîn bi rûyekî matmayî:

- Tu qala kê dikî nizanim, lê navê min ne Şîrîne, Ronahî ye.

Perya hêdîka keniya bû:

- Şîrîn ma te ez nas nekirim.

- Na.

- Ez Perya, Rûken.

Şîrîn bi bexteweriyeke mezin Perya hembêz kiribû.

- Perya çawa min tu nasnekirî.

- Min porê xwe jêkiriye û şeve.

- Te çawa porê xwe jêkir, te gelek jê hez dikir.

- Di nava van mercên dijwar de ez diwestandim.

- Tu çawayî Perya.

- Başim

- Min çawa tu nasnekirî…

- Xemgîn nebe. Şev hinekî tarî bû.

- Raste şev gelek tarî ye.

- Lê belê min tu naskirî!

- Gava te navê minî malê bi lêv kir, hinekî ketim nava kelecanê.

- Şîrîn.

- Çiye.

- Em ji riyeke pir dûr hatine, pêwîste hinekî razêm.

- Başe.

- Em dê sibê biaxivîn.

Gava Şîrînê serê xwe bilind kir, Sînem dît, Sînem hatibû li ber wê rawestiya bû. Şîrîn hinekî bi xemgînî:

- Sînema Dimdimî.

- Fermo.

- De ka were rûnê.

- Hinek karê min heye.

- Karê te çiye?

- Sema Oremar dixwaze bi min re hevpeyvînekê çeke.

- Semaya me jî bûye geroka serpêhatiyan.

- Pir baş dike.

- Raste divê trajediyên me bên nivîsandin. Ji bo ku cîhan dengê me bibihîze.

- Şîrîn divê ez biçim.

- Lez neke Sînema Dimdimî, lez neke.

- Hemû tişt amadekirî ye, li benda mine.

- Ka were rûnê, ger tu amade bî Sema li xwe naheyire. Dê bi hevaleke din re hevpeyvînê çêbike.

- Başe.

Sînem li tenişta Şîrînê rûnişt. Şîrîn zîvirî û ji Sînemê re got:

- Sînema Dimdimî.

- Çiye.

- Te qet ji min re qala xwe nekir.

- Çawa?

- Piştî tu ji gund derketî, ez û Perya tenê man. Kengî em çûbane cem hev Peryayê digot gelo Sînema Dimdimî çi dike? Pir li ber te diket.

Sînem kenî û got:

- Peryaya hesûd çawa ewqasî min meraq kiriye.

- Wele ew jî dibêje Sînema hesûd.

- Min ji heman tişt rojê bîst û çar saetan ji xwe re digot; raste ez li cem we çûm, lê dilê min li ba we mabû. Ez ji gund û hevalên xwe dûr ketim. Lê dilê min li dû min ma. Ez çûbûm gundekî pir dûr, gundekî çiyayî, min tu kes nas nedikir. Tu kesî ji ez nasnedikirim, mîna ker û lalan bûm. Lê vê baş zanibe roja ez ji gund derketim. Min Sînema Dimdimî ji we re hişt û çûm. Ew hêsirên diherikîn yên Sînema Dimdimî bûn, ew hewarên min yên ku di guhên we de olan dida yên Sînema Dimdimî bûn. Min Sînema Dimdimî ji we re hiştibû. Hestên min, giyana min, nêrîn, hezkirin û mejiyê min li cem we mabû. Malbata ku ez ji wan re weke bûk çûbûm, nîv Azerî bûn. Nîvî Kurd û nîvî

Azerî. Hevserên min bi emr gelek ji min mezintir bû. Mirovakî nezan û bê vîn bû. Ji gotina dayika xwe dernediket. Piştî hefteyekê ew jiyana ku bi agirê dojehê hatibû hûnandin ji bo min destpê kiribû. Roj bi roj pêtên agirê dojehê zêdetir ez dişewitandim. Bêhna min hatibû birîn. Ew Sînema ku her roj ji baranê direviya, vêcarê li teyrokê rast hatibû. Ya rastî tu bixwazî, min nedixwest bi temamî ji baranê birewim, jiber ku min dizanî teyrok li benda mine. Wê roja ku hatibûn min bibin, bavê min hate cem min û bi dizî ji min re got; "keça min tiştek ji destê min nayê, lê hêvî dikim ku dê ev zewac ji bo te bibe deriyekî xêrê. Min bibexşîne. Ez li wesiyeta dayika te ya gor bihişt xwedî derneketim. Ez dizanim bezekariyên min gelekin. Lê ji xwedayê xwe dua dikim ku ji niha û pêde tu bextewar bijî". Tu ya rast bixwazî, bavê min dizanî wê deriyê dojehê li ser min vebin, lê wî tenê dilê min xweş dikir. Xwe wisa belengaz nîşan dida, lê ne wisa bû.

Du zarokên min çêbûn, Leyla û Ferhad. Kar û barên min hîn girantir bibû. Leyla beriya Ferhad hatibû dinyayê. Roj bi roj her du jî mezin dibûn. Di nava malbatê de aramî nebû. Şer û pevçûn heta ku bixwazî hebû. Her meh an jinek ciwan xwe dişewitand, yan jî xwe didaliqand. An jî zarokên xwe terk dikirin û ji ber çavan wenda dibûn. Hemû jin reşbîn û bê hêvî bûn. Zordestiya zilaman di asta herî jor de bû. Bi gotineke din jinan nekarî çavên xwe vekin. Ewqasî min dijwarî dikişandin êdî ez bi findê li hevsera bavê xwe ya Azerî digeriyam. Têgehîştim ku zewac goristana jinan ya yekemîne. Roja ku em dizewicîn, dimirîn. Tîştek li ser navê me namîne, ne hiş, ne vîn, ne estatîk, ne rabihîz, ne aramî û ne jî giyan. Ji ber vê yekê dibêjim mirina me ya yekemîn zewace, ya duyemîn fizîkiye. Bi têgehên olî, jin hatiye tune kirin. Kî dikare bibêje li Îranê jin dijîn. Na negengaze. Êdî du zarok di stuyên min de bûn û pêwist bû min ji wan re daykatî bikira. Lê ez bi

xwe hê zarok bûm. Ma zarok dikare ji zarokan re daykatiyê bike?

Na. Bizane Şîrîn, min di wî temenê xwe de du zarok anîn. Bêdadiya di nava malbatê de deruniya min xerab dikir. Ez ji xwarin û vexwarinê qut bibûm. Roj bi roj, kêlî bi kêlî diheliyam. Êdî mîdê min li tiştekî venedibû. Bi nexweşiyek pir dijwar ketim. Leyla û Ferhad her roj li ber serê min rûdiniştin û digiriyan. Kesî/ê li wan nedinêrî. Bêxwedî mabûn. Vê rewşa wan hîn zêdetir ez diêşandim. Ji ber ku min li berxwe dida.

Asoxwîn ez dîsa bi serxwe ve hatim. Du sê meh di navberê de derbas bibûn. demsala zivistanê bû. Piştî taştiyê min TV vekir. Qala dîlketina rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan dikir. Wê demê min ew nas nedikir. Lê hemû Kurd ji bona wî rabibûne ser piyan. Xwe dişewitandin, li Rojhilatê Kurdîstanê jî rewş wisa bû. piştre min fam kir ku ew rêberê me Kurda ye. Dûre min li gelek axaftinên wî yên di TV ya Kurdî de derdiketin, guhdar kir. Ji bo jinan tiştên pir xweş digot. Axaftinên wî pir bala min dikişand, lê tu fikir di serê min de nebûn.

Bihar hat. Ber êvarekî, Komeke şervan hatine mala me. Yekemcar bû min ew didîtin. Di nava wan de du hevalên jin jî hebûn. Pir xweş diaxivîn. Mîna du melekan bûn. Derbarê azadiya jinê de tiştên ku qet min nebihîstibû digotin. Ha wê şevê dîsa Sînema Dimdimî hat. Dîsa Sînema Zagrosî vegeriyabû cewherê xwe. Dîsa per û baskên min çêbibûn. Mîna ku gopalekî efsunî ketibe destê min, baweriya min zêde bibû. Şeva min ronî û dilê min sivik bibû. Çavên min dibiriqîn… Hêviya min a çirmisî zindî bibû. Cardin ji kûrahiya dilê xwe keniya bûm. Leyla û Ferhad jî keniya bûn. Wê şevê ew şervanên Kurdan mîna hewariya Îsa hatin, axivî bûn, di dilê me de hêvî çandibûn û çûbûn. Ez wê şevê heta sibê ranezam. Qet xew bi çavên min

nediket. Êdî xeyaleke min hebû, hêviyeke min hebû, ji jiyanê bendewariyên min hebûn. Min di çavên wan jinên leheng de xwe û paşeroj didît. Çi hestekî xweş û bextewariyeke bêdawî bû. Şevek hêja bû. Arambexşiyekê giyanê min mist dida. Bihizire, du jinên azad, hatine û ji yeka weke min bê hêvî re qala azadî û serbestiyê dikin û hemû kes li wan guhdar dikin. Ma tiştek ji vê li ser rûyê erdê xweştir heye?

Demeke dirêj li ser vê hevdîtinê rederbas bibû. Ramanên min zelal bibûn. Min biryara xwe dabû, ez li benda roja xwe bûm û ew roja pîroz hat. Ew roja vejînê hat. Ew roja ku ji goristana tarî derkevim. Leyla û Ferhad jî amade bûn û di bin şewqa hîva meha Tîrmehê de ji wî gundê ku nedihişt nefesa jinan derkeve, em derketin. Şervanên azadiyê li benda me bûn. Gava em gihîştin cem wan tu bawer bikî, ez bûm stêrk û min xwe li asîmanan danî. Bi her awayî min xwe azad didît. Êdî Leyla û Ferhad jî azad mezin dibin. Hemû tiştî rast fêr dibin. Gava min dibînin ji min re nabêjin “dayê”, dibêjin heval!

Baweriya wan zêde bi xwe heye. Leyla êdî keçeke mezine. Xwedî behre û zana ye. Dema min gav avêt çiyê cîhana min hate guherandin. Çiya, mirovan li ser bingeha rastiyê diguherîne. Mirov roj bi roj hînî tiştên nûtir dibe. Asoyên xetimandî vedibin. Mejiyê xumam zelal dibe, cîhana tarî ronî, xeyalên mirî ji nû ve vedijîn. Çiya cihê xwenasiyê ye. Cihê xwedîtinê. Li vê gerdûnê cihê herî paqij, çiya ne. Mirovan nêzî rastiyê dike. Min serê te êşand.

Şîrîn bişirî û got;

- Ez qet aciz nebûm.

- Xweziya niha Perya ya hesûd jî li vir ba.

- Dê ew roj werin….

- Raste.

- Em dê dîsa her sê, bi hev re bikenin.

- Xwezî.

- Wa ye heval Sema bangî te dike.

- De bi xatirê te.

Şîrîn bi gotina Sînemê ya dawî re veciniqî, bêhemd got;

- Na, Sînema Dimdimî neçe.

Gava li dora xwe nêrî ew taqî tenê bû û şaneya tarî.

*   *   *

Çavên Şîrînê girêdayî bûn. Çav bendek stûr li ser çavên wê bû. Ew li ber derî rawestandibûn. Bi neçarî li ser lingan radiwestiya. Ji bêhêziyê çongên wê dilerizîn. Ewqas tî û birçî bibû, hêza ku gavekê bavêje jî di xwe nedidît. Fam kir ku dê hilweşe erdê, hêdîka pişta xwe da dîwar. Her du destên wê ji paş ve girêdayî bûn. Serê tiliyên destê wê dişewitîn. Janeke bê dawî xwe berdabû serê tiliyên wê yên zirav û dirêj.

Binê lingên wê mîna ku li ser stiriyan dimeşe diêşiyan. Hawîrdor bêdeng bû. Piştî çend mehan yekem car dengê girî, hewar, qêrîn û fîxana mirovan nedihat guhên wê. Bêdengiyek balkêş hakim bibû. Ev nêzî du saetan e, ew li ber derî rawestandibûn. Her ku dem dirêj dibû hêza wê jî kêmtir dibû. Bêhna wê diçikiya, xwîdan ji eniya wê diherikî. Şîrîn ji nişkêve tewişî û kete erdê. Pasdarê ku li cem wê rawestiyabû, bi dengekî tijî hers got:

- Tu çima rûdinê, zû rabe.

- Ez rûneniştime.

- Ev çiye wê demê?

- Tu nabînî, ez ketim.

- Çima tu dikevî?

- Hêza min nema.

- Rabe ser xwe.

- Ez nikarim.

- Zû rabe, zû.

- Ez nikarim.

- Çawa tu nikarî.

- Hêza min qet nemaye.

- Divê tu rabî.

- Ma tu fam nakî.

- Tu çi dibêjî.

- Ez dibêjim ma tu bêfamî.

- Rûniştina te qedexeye.

- Ev nêzî sê saetane we ez anîme vir. Hûn bi zanebûn wisa dikin. Hûn dizanin lingên min birîndare, lê min li ser lingan radiwestînin. Hûn dê çi bikin zû bikin.

- Em dê te ji vir bibin.

- Hûnê min bibine kuderê?

- Cihekî dûr.

- Ez dixwazim hûn demildest min bibin.

- Hindik ma, ez dê bi destê xwe te bavêjim wê dojehê.

Şîrîn hinekî vehesiya bû. Êşa lingê wê piçekî daketibû. Dîsa hêdî-hêdî rabibû ser xwe. Piştî çend deqeyan du kesan bi milê wê girtin û ew birin. Rîng li ber deriyê ewlehiyê rawestiya bû. Deriyê beşa şaneya rîngê ya duy-

emîn vekirin. Bêhneke nexweş fûriya ser rûyê Şîrînê. Meidê wê xeliya û li hev ket û verişiya. Gava ku verşiya bû ji çavên wê dilopên hêsiran herikîn. Henaseya wê dernediket. Biqasî misqalekî hewa nedihat hundir. Cîh pir teng bû. Şîrîn hêdîka li ser paldankê rûnişt.

Hê kêliyek derbas nebibû, cardin deriyê şaneya rîngê vebû. Kesek anîn avêtin cem Şîrînê. Ew jî weke Şîrîn verişiya bû. Ji ber ku çavên wê jî girêdayî bûn, Şîrîn nedidît. Şîrîn bi dengekî ku di asta piste pistê de bû jêre got:

- Hinekî virde were.

- Tu kî yî.

- Ne girînge, ez kîme an ne kîme. Hinekî virde were paldank heye, pişta xwe bide wê, tu dê hinekî rihet bibî.

- Başe, lê çavên min venabin.

- Bi dest pelankê tu dikarî bibînî.

- Ez destê xwe davêjim ku derê tere.

- Ji xwe vir gelek tenge, piçekî din virde were tu dê bibînî.

- Başe.

Şîrîn di dilê xwe de got:

- Ev deng qet bi min xerib nehat. Gelo min li kuderê ev deng bihîstiye.

Her du jî bêdeng li tenişt hevdu rûniştibûn. Rîng bi rê ketibû. Bi qasî nîv saetê çûbûn, Şîrînê cardin di dilê xwe de got; “gelo ev kî ye, gelo ez bipirsim dê bersiveke çawa bide min”. Herî dawî biryar da ku bipirse:

- Niha em dikarin hevdu nas bikin. Navê min Şîrîn.

- Min şaş fam nekir ne wisa navê te Şîrîne?

- Belê.

- Gelo ew Şîrîna ku ez nas dikim tu ewî.

- Nizanim tu qala kîjan Şîrînê dikî.

- Navê min Semîra.

Şîrîn di nava kelecanek bêdawî de:

- Semîra tu yî? Çima dengê te ewqasî hatiye guhertin.

- Dengê te jî wisa ye. Min qet dengê te nas nekir. Ez matmayî mam.

- Ez jî.

- Ji min re gotin êdî tu qet Şîrînê nabînî.

- Ji min re jî heman tişt gotin. Min gelek meraqa te dikir.

- Min jî.

- Ka hinekî vir de were.

- Heval Şîrîn tu çawayî?

- Ez baş im, tu çawa yî?

- Ez.

- Êêê.

- Ez jî…

- Semîra bêje, tu çawayî?

- Ez baş im.

- Na, na tu rast nabêjî, rewşa te ne başe.

- Wele ez başim.

- Ewqas rojan tu li kuderê bûy Semîra, tu birin kuderê?

- Ez li vir bûm, di şaneyek bin erdê de.

- Çima?

- Dixwestin bêbextiyan li xwe bikim. Min nepejirand. Her roj şikence li min dikirin. Bawer kirine ku ez şervaneke PJAKê me.

Gava ku Semîrayê qala PJAKê kiribû, Şîrîn metelmayî mabû, ji berku heta vê rojê ji Semîra re qet qala PJAKê nekiribû.

- Semîra.

- Çiye.

- Te navê PJAKê ji kî/ê bihîst?

- Wan ji min re got.

- Çawa?

- Dibêjin navê partiya Kurdan PJAK e.

- Rast gotine Semîra.

- Min çiqas berxwe da, lê dîsa jî qani nebûn. Jixwe ji niha û pêde ez PJAKî me.

Şîrîn kenî:

- Keçê her roj tu dibe tiştek.

- Min rastiya xwe di nava şert û mercên dijwar de nas kir û dît. berê ez kirime Kurd, dûre jî ez kirime PJAKî. Tu dibînî di hundirê dojehê de nasnameyên min çêbûn.

- Semîra.

- Fermo.

- Mirov rastiyên herî mezin ji neyarên xwe fêr dibe.

- Rastiya min, raxistine ber çavên min.

- Em Kurd wisa ne, dagirkeran tenê welatê me perçe nekirine. Bedena me, dilê û mejiyê me jî perçe kirine.

- Di wê şaneya tarî û di bin erdê de tiştên ku neanîne serê min nehiştin. Berdewam digotin tiştên me aniye serê

Şîrînê em dê bînin serê te jî. ji ber şikeceya avê niha zimanê min baş nagere. Nênûk bi tiliyên min ve nehiştin. Di bedena min de cihekî bê birîn nehiştine. Ez dibêjim qey di serê min de mejî tune ye. Sê şevan li ser hev şikenceya avê li min kirin. Ez dibirim, dixistime nava du textan, tenê serê min li derve dima. Text li gor stuyê mirovan çêkirine, baş li dora stuyê min diediland û bi şîd girêdidan. Wisa dikirin min qet nidikarî stuyê xwe bilivînim. Tam li ser qotê serê min av vedikirin, av dilop bi dilop diniqutî ser serê min, piştî nîv saetê her dilopa ku ber dibû mirinek bû. Gava dilopên avê li serê min diketin, weke ku giraniya gerdûnê xwe berde ser serê min, ewqasî bi êş bû. Dema dilop li serê min diketin, brûsk ji ber çavê min diçûn. Bedena min dilerizî. Min dixwest biqîrim, lê deng ji min dernediket. Weke ku yek destê xwe bêxe ser devê min, bêhna min diçikiya. Bi saetan wisa domandin, sê caran wisa kirin. Sê caran. Zimanê min giran dibû. Mîna ku çemek di hundirê guhê min de diherike; hime himeke mezin jê dihat. Niha hê jî serê min diêşe. Zimanê min bi zorê digere.

Rojekê sibê zû, ez ji şaneyê derxistim, bi lez û bez anîm li cihekî rawestandim. Çavên min vekirî bûn. Lê min zêde derdora xwe nedidît. Ji şîlaqê çavê min venedibûn. Min hemû dever xumam didît. Hêwana ku lê radiwestiyam, di aliyê wê yê rastê de du şibake hebûn, her du şibake jî du çavî bûn. Çavên wan bê bizmik bûn. Bi hatina bayekî lewaz beşeke şibake vebû. Min di şibakê re li dervê nêrî, hemû dever di nava aramiyê de bûn. Pisîkeke reşbelek, bi lingê xwe yê kulek hêdî-hêdî di qiraxa rê re dimeşiya, carinan disekinî û guhên xwe bel dikirin, devê xwe vedikir, zimanê xwe derdixist, li dora xwe dinêrî û cardin dimeşiya. Dikuliya, diyar bû ku pir westiya bû. Çend pelên hişk ku weke kavikan bûn, li ber nermebagezê ketibûn reqsê û digindirîn û diçûn. Lê ber bi kuve diçûn nediyar bû. Lê bi serbestî diçûn. Ji nişkêve zarokek di ber

min re derbaz bû. Temenê wî şeş- heft salî bû. Porê wî reş û hinekî dirêj bû, xetên xwîdanê li ser gepên wî yên qelew xuya dikirin, bi destên xwe yên biçûk xwîdana eniya xwe paqij kir. Di destê wî yê rastê de tiştek hebû, lê tênegihîştim çiye. Min pir dixwest li min binêre. Lê nezîvirî û li aliyê min nenêrî. Weke ku qet li derve nejiyabim, ew dîmen bi min pir balkêş dihat. Hê min bi têrî li dervê nenêrîbû, ku hatin û ez birim cihekî din. Ez li pişt caman rawestandim. Gava min li pêşiya xwe nêrî, min ji çavên xwe bawer nekir. Dayika min li hundir bû, du pasdar li ser serê wê rawesta bûn, bi tundî tiliya xwe jê re dihejandin. Têgehîştim ku gefan li dayika min dixwin. Dayika min bi çavên tijî tirs li derdora xwe dinêrî, mîna askekî ku ji dilê xwe birîndar bûye, neçar û bêhal, bi mital û guman bû. Hêsirên çavên wê diherikîn. Li ber çavên min, şikence bi dayika min kirin. Wê kêliyê êşeke bê dawî li bedena min de geriya. Lê neçar bûm bi awayekî din tevbigerim. Neçar bûm hestên xwe bidim aliyekî. Dema ku pasdarekî bi potîna xwe pê li lingê dayika min kir, qêrîna wê erşa xwedê hejand. Dixwestin bi vî awayî min têk bibin. Hatin ji min re gotin:

- Yan tu dê biaxivî, yan jî em dê dayika te bikujin.

Bêyî ku bihizirim, demildest min got;

- Hûn dayika min bikujin jî, tiştekî ku bêjim tuneye.

Lê min fam kir ku dayika min daxwazên wan pejirandiye. Wan çi digotin, dayika min serê xwe bi wateyê erê dihejand. Milên min girtin, ez ji wir birim cem dayika min, wexta ku dayika min a belengaz rewşa min, hal û mecalên min wisa dît, qêriya û xwe avête stuyê min. Tu kes li ba me nebû, dayika min soz dabû wan. Ez bi dîtina dayika xwe qet kêfxweş nebûm, berovajî xemgîn bibûm. Dayika min demekî wisa bi şîd ez hembêz kirim, Ramûsîm, pora min a ji xwîdan û qirêjê hişk bûyî, bi

destên xwe yên lerzok mist da. Em rûniştin. Min helwesta wê meraq dikir. Dayika min bi dengekî nizm, xemgîn, sotîner, reşbîn, bêhêvî û têkçûyî got:

- Keça min, Semîra.

- Bêje dayê.

- Çawa wisa lit e hat?

- Çawa bûme.

- Tu tenê çerm û hestî mayî.

- Xeman nexwe dayê.

- Çawa xeman nexwim.

- Li ber min nekeve.

- Tu çi dibêjî Semîra.

- Ez dibêjim ji bona min êşan nekişîne.

- Tu dizanî tu çi dibêjî.

- Erê.

- Ez dayikim dayik.

- Na, na hişê te ne li serê teye.

- Dayê.

- Çiye?

- Heta îro, hişê min ne li serê min bû, lê niha hişê min li serê mine. Tu dê bawer bikî.

- Semîra keça min, dibe ku niha bîra te xişivî be û tu baş nahizirî.

- Na, dayê.

- Keça min.

- Bêje dayê, tu ji min çi dixwazî.

- Keça min, min nedizanî têkiliyên te bi van rêxistinên xwedê nenas re heye.

- Dayê heta niha wan ji min re heman tişt digotin, lê niha tu van gotinên tewşo mewşo dibêjî.

- Keça min tu çawa ketî riyeke wisa.

- Ez neketime tu riyan lê…

- Lê çi.

- Wan ez xistime riyek pir baş.

Dayika min hinekî dengê xwe bilind kir û got;

- Tu çi dibêjî Semîra?

- Ez dibêjim heta niha tu riyên min nebûn, lê niha riyeke min heye û ez dê di vê rê de bimeşim.

- Riya çi, ma tu dîn bûyî.

- Na dayê, ez dîn nebûme.

- Tu qala çi dikî?

- Ez dibêjim, ez Kurd im.

Gava ev hevok ji nava lêvên min derket, dayika min velirizî, ji cihê xwe pengizî û hindik mabû ku ji hiş biçe. Mîna ku dilê wê rawestiyabe çavên wê hatin girtin. Piştî kêliyekê çavê xwe vekirin û giriya.

- Semîra ma tu dixwazî min bikujî...

- Na dayê, ez dixwazim rastiyê bêjim.

- Rastiya çi?

- Ma xwedê hemû evdên xwe wekhev neafirandine.

- Belê.

- Wê demê, tu çima ewqasî ji Kurd bûna min ditirsî.

- Keça min tiştekî wisa tuneye.

- Heye.

- Dibe ku hin kesan derew li te kiribin, lê tiştekî wisa tuneye. Em ne Kurdin.

- Dayê min negot tu Kurdî, min got, ez Kurdim.

- Ger ez ne Kurd bim, bavê te ne Kurd be, tu çawa dibî Kurd…

- Hê jî tu min dixapînî.

- Xapandina çi?

- Tu jî Kurdî, bevê min jî Kurde, lê we heta îro bezekariyeke pir mezin kir û we em weke biyaniyan mezin kirin. Lê baş bizane vê pergelê tucarî hûn weke xwe nedîtin û dê nebîne jî.

- Keça min.

- Bêje dayê.

- We çi?

- Me ji bo we ev kir.

- Na dayê we ji bo me tiştek nekiriye. We ji bo xwe kiriye. Lê rastî nayê veşartin.

- Keça min çi ji te dixwazin bêje û em biçin mala xwe, binêre rewşa te gelek xerab e.

- Binêre cardin tu xapandine.

- Na, na dê te berdin.

- Dayê ez dê çi ji wan re bêjim.

- Dibêjin Semîra ketiye nava rêxistina Kurdan.

- Raste, li vir wan ez xistime nav rêxistina Kurdan.

- Semîra, keça min heke tu neaxivî dê me hemûyan bigirin.

- Netirse, we nagirin. Tu ji min bawer nakî lê ji wan bawer dikî.

- Na keça min na.

- Belê, belê.

- Ji bo ku te berdin, wisa dikim.

- Dibe ku hinekî li ser te zextan çêbikin, lê dê te berdin. Binêre şikence li te kirin, mebesta wan eve bi riya te min radest bikin.

- Keça min ev rewş dê çawa be?

- Dayê, min li vir jineke Kurd nas kir, navê wê Şîrîne, zilma ku li wê dikin, şikenceya ku li wê dikin, bi gotin, bi hevokan nayê îzah kirin. Ji ber ku em Kurdin wisa dikin. Dayê heta îro tu bi zimanê xwe, bi zarokên xwe re neaxiftî, te Kurdîtî ji me veşart. Te em mîna farsan û neyarên gelê xwe mezin kirin. Tu dizanî dayê, min her roj nifir li zarokên gelê xwe dikir. Min digot çavkaniya hemû xerabî û nebaşiyan Kurdin. Lê Kurd tenê li mafê xwe digerin, tekoşîna rûmeta xwe dikin. Şîrîn ji min re qala Smaîl Axayê Şikak(Simko), Qazî Mihemed, Leyla Qasim, rêberê Kurdan Evdila Ocalan û Dr. Nûrî Dersimî kir. Vana hemû rêberên Kurdane dayê.

- Semîra can.

- Çi?

- Tu paşeroja xwe tarî dikî?

- Na, ez paşeroja xwe ronî dikim.

- Tu me davêjî nava agirê dojehê.

- Na, ez we ji nava agirê dojehê derdixim.

- Keça min hinekî aram be, wisa tevnegere, baş bihizire.

- Binêre dayê neyarên me, ez fêrî Kurdîtiya min kirim, lê tu hîna jî dixwazî min ji Kurdîtiyê dûr bixî.

- Semîra ma tu nabînî her roj bi dehan mirov diçin ber îdamê.

- Ez biçim îdamê jî ji vê riyê venagerim.

- Semîra min soz daye wan ku ez dê te ji vê riya şaş vegerînim. Divê tu hinekî li min û xwişk û birayên xwe jî bihizirî.

- Ez dizanim te soz daye wan. Lê ...

- Lê çi.

- Min soz daye xwe, piştî van êşan ez tu carî ji vê riya rûmetê venegerim.

Dayika min neçar ma bû. Nedizanî çi bike. Di nava hêsirên çavan de:

- Semîra keça min, min bibexşîne, lê heke tu ji vê riyê venegere neçarim ku te ji ewladiyê red bikim.

- Tu dizanî dayê, ez gazinan ji te nakim.

Dayika min ji ber ku bi ser neketibû, pir aciz bû. Di nava hêrseke mezin de rabû û çû. Wê şevê çend nênûkên min yên din derxistin. Sê rojan xwarin nedan min. Şîrîn qet û qet tu ji bîra min derneketî. Lê hê jî xwîn ji nênûkên min diherike.

Şîrîn bi dengekî keser kûr got:

- Min jî qet tu ji bîr nekirî Semîra.

- Tu li min neketiye gumanan, ne wisa?

- Qet, qet

- Gelo riya me pir maye.

- Nizanim.

- Ev demek dirêje em di rê dene.

- Belkî hindik mabe.

- Hêvî dikim ku hindik mabe.

- Gelo me dibin kuderê?

- Cihê ku em dê biçinê ne girînge, ez li ser wir nahizirim.

- Tu li çi dihizirî.

- Heke me ji hevdu veqetînin qet baş nabe.

- Raste.

- Ger me ji hev veqetîne, baş li xwe binêre.

- Tu jî.

- Semîra.

- Fermo.

- Em dê teqez hevdu bibînin.

- Teqez.

- Belê, lê heta wê demê baş li xwe binêre.

Hê wisa di navbera xwe de diaxivîn, ku rîng ji nişkêve sekinî. Bi lez û bez deriyê şaneya wan vebû. Ew bi leza birûskê ji rîngê daxistin. Dê ew bibirane ku derê ne diyar bû. Şev bû û dinyayeke germ.

*   *   *

Şev, Şeveke tarî. Şevek havînê. Şevek sotîner û nediyar. Dê çi bibe, dê çawa bibe, dê kî/ê were, dê kî here, îşev dê çi bibe. Şeveke dûr û dirêje. Şeva giran û dijwar. Dê kî biçe sêdarê, de kî cara dawî li jiyanê binêre, na, na, wê şev kengî biqede, wext pir maye an na? Dem çima naherike, katjimêr çima li vir tuneye. Çima dengên çirkan nayê, çi-

ma dem rawestiyaye? Şev dirêj dibe, tarî, naqede, tarî tir dibe, stêrk dinalin, bêhna êşan zêde dibe, hewara mirovan bilind dibe, bilind bûn kûr dibe, kûrbûn jî fireh. Dengê qêrîna mirovan di labîretên dûr û dirêj de olan didin û belav dibe. Gelo ev deng, dengê kê/î ye? Gelo ew kî ne? Gelo niha kîjan cureyê şikencê dibînin. Îro, duh, pêr û betirpêr, çend cure şikence dîtine. Çima şev naqede. Çima derî venabin, çima li vir wext tuneye. Çima li vir valahiya gerdûnê hê tijî nebûye. Çima? Çima dengê me li hewa hilawestî dimînin. Çima li vir deng beriya mirovan dimirin? Çima û çima?

Şîrîn keça Kurd, girtiya sêdarê. Keça Araratê. Hêdîka ji cihê xwe liviya. Çavê xwe mist da. Piştî demeke dirêj bi çavbendê çavên wê girenedabûn. Li pêşiya xwe nêrî, deriyekî hesinî dît, di binê derî de kunek hebû, kuneke bi qasî çar tiliyan fireh û dirêj, di wê kuna biçûk re ronahiya derve vebeyîna xwe dida hundir. Şîrînê piştî çend mehan dîmeneke wisa, ronahiyeke wisa û cihekî wisa didît. Mîna ku di temenê xwe de ronî nedîtibe bextewer bibû. Di dilê xwe de got; "Ronahî" gava got;" Ronahî" navê wê hate bîrê. Keniya û sê caran got; "Ronahî, Ronahî, Ronahî". wexta ku berê xwe dabû riya azadiyê, pir xwestibû vî navî li xwe bike, hevalên wê jî ev daxwaza wê pêk anîbûn. Kêfa wê gelek ji vî navî hatibû. Bi neçarî rabibû ser xwe, bi gavên giran û westiyayî ber aliyê derî ve meşiya. Çû li ber derî rûnişt, destê xwe yê rastê da ber xwe, çavê xwe anî texma kunê, di wir re li derve nêrî, di ber re jinek derbas bû, ji çavên xwe bawer nedikir, hinekî rawestiya, dîsa li dervê nêrî, vê carê du jin dîtin, di navbera wan de girtiyek hebû, xwîn ji devê wê girtiya jin diherikî. Şîrîn baş rûyê wê nedît, lê hêlek rûyê wê, porê wê baş dîtibû. Ji nişkêve veciniqî, bi paşve vekişiya, bêhneke kûr hilkişand, di ber xwe de got; "dibe ku ev ew be?". Destê xwe da bin çenga xwe û kûr hizirî. Cardin di ber xwe de got; "na, na, min şaş

dîtiye ev ne ew e”. Şîrîn di nava dudiliyê de diçû û dihat, lê nedixwest bawer bike, nedixwes tiştê ku dîtiye rast derkeve. Dilê wê pir êşa bû. Dîsa gotibû, “na, na min teqez şaş dîtiye, ma ew tu carî tê girtin? Ew li lutkeyê çiyayê welat dijî”. Herçiqasî Şîrînê wisa digot jî, lê gurme gurma dilê wê danediket û hîn bêtir zêde dibû.

Semîra di şaneya li hemberî wê de dima. Dixwest bangî Semîrayê bike. Devê xwe ber bi kunê ve bir û bi dengekî gelek nizm bangî Semîrayê kir:

- Semîra, Semîra.

- Çiye?

- Dengê min baş tê an, na?

- Belê…

- Ka were ber derî.

- Ez li ber derî me.

- Guhê xwe baş pisipêre kunê.

- Temam.

- Niha deng çawa tê?

- Pir xweş.

- Gava din yek di vir re derbas bû, gelo te rûyê wê baş dît an na?

- Du kes derbas bûn, kîjan.

- Ya dawî.

- Erê min rûyê wê dît.

- Ka bêje çawa bû rûyê wê.

- Rûyê wê pehn bû, eniya wê fireh, çavên wê hinekî hûr bûn. Bêvila wê tenik bû, lêvên wê stûr, birûyên wê geş bûn, mijangên wê dirêj û bejna wê bi qasî ya te hebû. Ez

dikarim ewqasî bêjim. Şîrîn dengê min hate te, te gotinên min fam kir, te çima ew jin ji min pirsî? Şîrîn, Şîrîn, Şîrîn…

Mîna ku Şîrîn ne li vir be, qet dengê Semîrayê nedibihîst, berdewamî di ber xwe de digot; “ev ewe, ev ewe, min rast dîtiye, çawa hatiye girtin, çawa…”

Semîrayê cardin bangî Şîrînê kir:

- Şîrîn, Şîrîn, Şîrîn, Şîrîn.

Şîrîn veciniqî:

- Bibore, fermo!

- Çi bi te hat?

- Tiştek bi min nehatiye!

- Tu çima bersiva min nadî?

- Semîra.

- Kerem ke.

- Tu dizanî ew ki ye?

- Kî ye?

- Ew Peryaye, Perya!

- Perya kî ye?

- Hevala mine.

- Hevala te.

- Erê hemtemena min, gundiya min, cîrana min.

- Şîrîn.

- Fermo.

- Rewşa wê qet ne baş bû.

- Min jî dît.

-. Gelo çawa hatiye girtin?

- Nizanim.

- Şîrîn min tiştekî din bihîst.

- Te çi bihîst?

- Ez dizanim ev der kudere.

- Ku dere.

- Girtîgeha Êvînê ye.

- Te got çiii?

- Niha em li girtîgeha Êvînê ne.

- Tu baş dizanî?

- Erê.

-. Semîra.

-. Fermo.

-. Li vir hevalên me hene, hêvî dikim ku di demek kin de em wan bibînin.

- Bi rastî?

-. Belê.

- Gelekin an na?

-. Gelekin gelek.

- Bawerim di demek nêz de em dê ligel hevalên xwe bin.

- Semîra , dînê…

-. Bêje.

- Sibê dema ku hatin em dê ji wan re bêjin an me bibin nava girtiyan, an jî em dê têkevin çalakiya birçîbûnê.

- Başe.

- Birînên te çawa ne?

-. Hê diêşin, lê xeman nexwe.

-. Ev şev gelek dirêj bû.

-. Ji êvarê hewara mirovan tê. Ma tu jî dibihîzî.

- Erê.

- Lê ne mîna dengê rastînê.

- Bi min jî wisa hat.

-. Mîna dengê bandê be.

-. Ji êvarî ez gêj bûme.

- Ev du rojin heman tişt dibin.

- Şîrîn.

- Bêje.

- Vaye deng tê, wê di ber me re derbas bibin, belkî Perya anîbin.

- Dibe.

- Baş lê binêre.

- Temam.

Hatin di ber wan re derbas bûn. Şîrîn vê carê pir xweş ew dît, Perya bû. Ango Rûken. Rûkena zîrek û bedew. Keça Rojhilatî.

- Şîrîn te baş dît.

-. Erê, min dît.

- Xwîn ji devê wê diherikî…

- Erê.

- Hêvî dikim ku tiştekî xerab çênebe.

- Semîra.

- Çiye ?

- Şevbaş.

- Şevbaş.

Şîrîn bêhêz bû, çawa xwe li ser betaniyê dirêj kir, ket xewa giran. Gava ku Perya di wî halî de dîtibû, hêza wê ya hindik mabû, bi yekcarî wenda bibû.

* * *

Girtîgeha Êvînê girtîgeheke herî kevne. Cihê şikencê, mirin, wendakirin û tunekirinêye. Girtîgeha Êvînê nîviya wê di bin erdê deye, ango hêlek wê di kûrahiya erdê deye. Ji wê beşa wê re dibêjim beşa taybet. Beşek gelek mezine. Bi hostetî hatiye çêkirin, bi dehan labîrentên tarî, teng û dirêj têde hene, şaneya kor û tarî di ber hev de hatine çêkirin. Deriyên hemû şaneyan hesinin, gava ku ew derî vedibin, zingîniya wan ji erşê xwedê derdikeve, meşa di wan labîrentan de bêhna mirov çik dike, bêhn dernakeve û dilê mirov teng dibe. Di şaneyan de hewakêş tuneye. Li ser her labîrentê hêwanek şikencê heye. Kengî dilê wan bixwaze, deriyê şaneyê vedikin û bê pirs û pirsiyar girtiyan dibin û ji bo çêjê bistînin şikencê dikin. Tu çiqasî biqîre, bike hewar jî dengê te naçe tu kesî. Qêrîn û hewara te li dîwarên hêwana ker û kor dikevin û cardin li te vedigerin. Di wan hêwanan de her cure alavên şikencê henin. Di astek wisa de şikence dikin ku tu vîn, tu giyan, tu mejî, tu dil nikaribe xwe li ber ragire, li vir hemû tiştik bi pisporî tê kirin. Axaftin, lêdan û “jiyan” bi hostetiyeke mezin tê meşandin. Ji bona ku berxwedêrên Kurd têk bibin, girtîgeh weke laberetuarekê bikartînin. Nemaze li ser girtiyên jin hemû rê û rêbaz dikirin meriyetê. Vê siba înê dîsa heman tişt dihatin kirin.

Şîrîn ketibû çalakiya birçîbûnê. Ev yek pir li telê wan ketibû, har bibûn. Şîrîn şilfîtazî kiribûn, dest û lingên wê girêdabûn û avêtibûn nava birke tijî ava cemedê. Av gelek sar bû. Ligel vê dîsa jî cemed davêtin nava avê. Şîrîn di

nava wê ava weke qeşê de dilerizî, ewqas menidî bû, bedena wê tavilî tevizî bû û ji ser hiş çûbû. Piştî demeke dirêj dema çavên xwe vekiribûn, li ber serê xwe komek jinan dîtibû, destpêkê ev weke xewnek giran dîtibû, lê dûre fam kiribû ku ev ne xewne, rastî ye. Matmayî bibû û li wan meze kiribû. Semîra jî di nava wan de bû, hemûyan bi hevre gotin; "hevala Şîrîn tu bi xêr hatî". Semîrayê destê xwe xiste bin serê wê da hinekî rehet bibe. Şîrînê bi dengekî nizm û tijî êş got;

- Navê we bi xêr.

- Şîndar.

- Zozan.

- Leyla.

- Gulav.

- Agrîn.

- Sêvê.

- Aso.

Semîra ket bin milê Şîrînê û ew bir ser doşekê, Piştî çend mehên dijwar, yekemcar, li ser nivînan xwe dirêj dikirin. Hemû jinên menzelê alîkariya Şîrînê dikirin. Birînên wê derman dikirin. Xwarin amade dikirin. Dixwestin bi Şîrînê re biaxivin, lê Şîrînê bêdengiya xwe diparast. Zozan hat li kêleka wê rûnişt û li Şîrînê nêrî:

- Tu çawayî heval.

Şîrîn kelogirî bû, hêsirên wê herikîn, bi dengekî dilkovanî bersiv da:

- Ez baş im, min hûn dîtin, niha ez bimirim ji ne xem e.

- Heval, li vir hemû tişt di asta dojehê de ye, bi hevre bûn, me li ser piyan dihêle.

- Hevala Zozan.

- Bêje heval.

- Ka Perya.

- Beriya te bînin ew birin.

- Çima.

- Gelek zextê lê dikin.

- Dê kengî were.

- Wexte wê vegerînin.

- Min pir bêriya wê kiriye.

- Niha tu hinekî vehese, em dê piştre biaxivin.

- Başe, lê dema Perya hat min hişyar bikin.

- Temam.

Şîrîn temam serê xwe nedanîbû ku raza.

*   *   *

Bêdengî, bêdengî. Bêdengî serwer e. Menzel dagirtiye. Şêniyên menzelê jî bêdengin, girtîgeh bêdeng. Şîrîn radizê. Hişyar nabe. Ketiye xewa giran. Roj bûye êvar, êvar bûye şev, şev bûye sibeh, sibeh bûye nivro, nivro bûye esir, esir lê Şîrîn hê hişyar nebûye. Gotibû, "ez dê kêliyekê razêm". Lê ev nêzî du rojane di xew de ye. Car caran xwe dilivîne û car caran jî xwe diqulipîne ser tenişta rast û çepê. Geh Semîra, geh Perya tên li ber nivînên wê radiwestin û li rûyê wê yê rawestiyayî dinêrin. Li bedena wê ya jar dinêrin. Şîrîn biçûk bûye, çavên wê çûne xwarê, gepên wê heliyan e, sêv hestiyê wê derketiye holê, ranê lingê wê heliyan e. Tiliyên wê zirav û ziravik bûn e. Perasûyên wê hemû li dervê man e. Tayên spî ketiye nava porê wê yê reşqetranî. Çavên wê yên ku berdewamî

dikeniyan, xemgîn in… Roniya wan kêm bûye. Şîrîn bûye mîna lepekî, ne hêz, ne goşt pêve nemaye.

Semîra bi paçê di destê xwe de xwîdana eniya wê paqij dikir. Balîfa wê rast dikir. Bedena Şîrînê mîna ku agir di canê wê de dadayî be dişewitî. Mîna ku tenê wê bûbe koza agir, dişewitî. Semîra fam kiribû ku ev ne rewşek asayiye. Gulav hatibû cem Semîrayê, bi rûyekî xemgîn, bi dilekî birîndar got:

- Gelo çima Şîrîn ewqasî bêhêz ketiye?

- Duh gelek şikence lê kirine, jixwe ev çend mehe dibin şikencê de bû, şikenca duh jî bû dilopa dawî.

- Ji bo ku bigihêje tenduristiya xwe em dê her tiştî bikin.

- Şîrîn ji bo min her tişt e, divê çê bibe.

- Xeman nexwe teqez dê çêtir bibe.

- Gelo li vir jî her roj şikence heye an na?

- Dema dilê wan bixwaze, dibin…

- Ma evder ne girtîgeh e.

- Navê wê girtîgehe.

- Çawa?

- Evder şikencexana herî dijware.

- Min qet navê vê girtîgehê nebihîstibû.

- Raste, gelek kesan nebihîstiye lê girtîgeheke kevne. Hemû muxalîfên vî welatî di vir re derbas dibin.

- Min di xewnên şevan de jî bîra tiştekî wisa nedikir.

- Tu dizanî wateya navê wê çiye?

- Di zimanê me Kurdan de tê wateya “eşqê” lê mixabin niha ev nav ji bo me dojehe.

- Pêwîste ez jî hînî Kurdî bibim.

- Tu qet nizanî.

- Na.

- Çawa tu nizanî.

- Dayik û bavê min, qet bi Kurdî nediaxivîn.

- Soz em dê te hîn bikin.

- Gelek dixwazim.

- Başe.

Ji nişkêve Şîrînê çavên xwe vekirin. Semîra û Gulav kenîn.

- Werin werin, va ye Şîrîn hişyar bû.

Hemû hatin. Lê dîsa Perya nehatibû. Şîrîn keniya:

- Ez pir razam gelo?

Zozan:

- Na tenê nêzî du rojan.

Hemû biŞîrîn. Şîrîn li dora xwe nêrî:

- Ma qey hê Perya neanîne.

Semîrayê zû got:

- Belê, belê Perya hatiye.

- Çima ew jî nayê.

- Dê bê.

- Bila were ez rûyê wê bibînim.

- Niha xwe dirêj kiriye.

Şînda û Zozanê dest bi çêkirina xwarinê kirin. Xwarinek germ ji Şîrîn re amade kirin. Şîrînê xwarina xwe qedandibû.

Şîrîn di nava aramiyeke bêhempa de li hevalê xwe nêrîbû û cardin bişirî bû.

*       *       *

Piştî çend salan Perya û Şîrînê li girtîgeha Evînê hevdu dîtibûn. Lê çawa? Şîrîn bêhêz û Peryayê jî nedikarî biaxive. Niha Perya li hemberî Şîrînê rûniştibû. Perya, Keça berxwedêr. Keça ku hê di temenê biçûkaniyê de, xwestibû bibe mîna Rabîe Xanimê û ji bo rûmeta Kurdan şer bike. Keça ku tucarî neheqî nedipejirand û berdewam li dijî neheqiyê disekinî. Perya niha li Şîrînê dinêrî, lê nediaxivî. Tenê li Şîrînê dinêrî, Ewqas.

Wê lêvên xwe bi hev dirûbûn, lêvên xwe mîna ku mirov kincekî bidirû dirûbûn. Ew lêvên wê yên bedew di nava xwînê de wenda bibûn. Bi dîtina Peryayê di wî halî de dilê Şîrînê êşiya bû. Peryayê bi çavên xwe yên ku êş jê dibarin, hemû tişt ji Şîrînê re vedigot. Ji zû de ne av vexwaribû, ne jî nan xwaribû. Şîrîn li çavên Peryayê nêrîbû, roniya çavên Peryayê êdî qels bibûn. Şîrînê xwe negirtibû û hêsiran xwe berdabû ser rûyê wê, bi hemû hêza xwe Perya hembêz kiribû û ramûsabû. Şîrînê bangî Şîndayê kiribû, Şînda hatibû cem Şîrînê.

Şînda:

- Fermo.

- Ka zû bêje, çima Perya lêvên xwe dirûne?

- Her roj şikenceyên giran lê dikirin. Digot êdî nikarim debar bikim. Rojekê Perya birin û şikenceyek pir dijwar lê kirin. Gava vegeriya hundir, bi dengekî bilind got; “kêrê ji min re bînin, ez dê zimanê xwe jêkim”. Lê me nehişt. Bi rikdarî tevgeriya û xwest zimanê xwe jêke. Gava dît ku em

nahêlin îcarê ji me re got;” heke hûn nehêlin ez zimanê xwe jêkim, wê demê divê hûn devê min bidirûn”. Em mat û metel man û neçar. Wê biryara xwe dabû ku zimanê xwe jê bike. Digot: “ez dê zimanê xwe bibirim da bizanin êdî ez qet naxivim. Dixwazin min bikûjin, lê wî karî nakin”. Wê şevê heta sibê em nerazan, xew nekete çavên me. Jixwe her şev dihatin yek ji me dibirin şikencê, heta nîvê şevê şikence li me dikirin û weke cendekên bê giyan em davêtin menzelê. Me du rojan li ber serê Peryayê nobet girt. Lê Perya bi biryar bû. Herî dawî me daxwaza wê pêk anî, dema ku devê wê ango lêvên wê hatin dirûn. Tenê hêsir ji çavên wê diherikî. Ne diqêriya û qet xwe nedilivand. Bi rastî em hemû matmayî mabûn. Bê navber xwîn diherikî. Rojên ewil tevî ku devê wê dirûbûn jî cardin şikence lê dikirin. Lê du- sê rojên dawî rawestane. Dixwazin kêlên lêvên Peryayê vekin, lê ew napijirîne. Me jî jê xwest kêliyan veke, lê qani nabe. Dibêje heta nemirim, dev ji vê çalakiya xwe bernadim.

Şîrîn nefeseke kûr hilkişand:

- Wisa nabe.

- Em çi bikin.

Hemû li hevdu civiyan û di nav xwe de axivîn:

- Ez dibêjim, em hemû devên xwe bidirûn.

- Divê em ji wan re bêjin heke hûn zilma li ser me û hevala me ranewestînin em dê hemû xwe bişewitînin.

- Gelo em menzelê bişewitînin çawaye.

- Nabe, divê em zû riyekê bibînin.

- Rewşa Peryayê nebaşe.

- Nêzî deh rojane av venexwariye, tenê carna di bêvila wê re çend dilopan didinê, ewqas.

- Heke em rêbazekî baş nebînin, dê bimre.

- Riya herî baş eve em hemû sibê pi hevre daxwaznama bidin û bibêjin, divê hûn zextan rawestînin, an na em dê êvarî menzelê bişewitînin.

- Divê em destpêkê Peryayê qani bikin.

- Heke zextan rawestînin dê Perya vekirina kêlan bipejirîne.

- Dîsa jî divê em vê yekê misoger bikin.

Wê şevê Şîrîn dûr û dirêj bi Peryayê re axivî bû, herî dawî Peryayê sere xwe bi wateya erê hejandibû.

Sibê zû hemûyan daxwazname radestî berpirsyara beşa jinan kiribû. Wê jî daxwazne biribû menzela kargeriyê, hemû berpirsyarên gitîgehê amade bûn. Dema berpirsyarê yekemê girtîgehê daxwazname dît ji cihê xwe pengizî bû:

- Dîsa çibûye?

- Daxwazname ji bo Peryayê nivîsîne.

- Heke em zextên li ser Perya bi dawî nekin, dibêjin, em hemû dê devê xwe bidirûn û menzelê bişewitînîn.

- Ew kîne gefan li min dixwin?

- Qurban hêrs nebe.

- Lê, çi bikim?

- Divê em riyekê bibînin.

- Riya çi?

- Riyekê ku wan ji vê riyê vegerînin.

- Tenê riyek heye.

- Wê agir berdin menzelê, bila hemû têde bibine qîşot.

- Tu mafdarî lê…

- Niha rewş ne guncave.

- Ma te ji bîr kirye, ji jor hişyarî hatibû, digotin hinek baldar bin.

- Aha encama baldariyê eve.

- Pêwiste em bêjin temam.

- Na, na ew gefan li me dixwin, dev ji wan berdin, nikarin tiştekî wisa bikin.

- Qurban.

- Çi?

- Wisa nehizirin.

- Çawa bihizirim.

- Ev PJAKî çi dibêjin dikin.

- Çawa, wate tu dibêjî dê hemû devê xwe bidirûn?

- Belê.

- Na, tu şaşî.

- Ma nayê bîra te wê jina bi navê Aso got: ez dê zimanê xwe jê bikim, çû zimanê xwe jêkir.

- Qurban wextê me zêde nîne.

- Raste wextê me tuneye ku em hemû Kurdan bikujin, lê wextê me yê ku em van neh, deh mişkan bikujin heye.

- Çawa?

- Bi awayekî em dikarin xwe ji wan xelas bikin.

- Nabe.

- Tu çawa dibêji nabe?

- Ez ewlehiya welat dihizirim.

- Tu qala kîjan welatî dikî?

- Welatê me.

- Vê ji bîr neke, welatek heke hebe, ezim, zagonek hebe ezim, dadgehek hebe ez im, dozgerek û dadmendek jî hebe dîsa ezim. Ezim. Ezzzz…

- Raste qurban.

- Wê demê tu çi dibêjî?

- Ez jî dizanim xwîna wan vexwim.

- Wê demê here û xwîna wan vexwe.

- Lê.

- Lê çi?

- Niha nabe.

- Dibe, dibe…

- Rewşa welat.

- Ji min re qala rewşa welat neke.

- Başe.

- Hûn her yek tiştekî dibêjin.

- Qurban em dikarin wan ji hevdu jî veqetînin.

- Me berê jî heman tişt kir.

- Raste.

- Hûn naxwazin em wan bikujin wê demê biçin, bêjim temam.

- Başe.

- Lê piştî ku wê jina bi navê Perya devê xwe vekir, dîsa dê heman tiştî bidomînin.

- Başe.

- Ez nahêlim yek ji vir zindî derkeve.

- Temam ezbenî.

Berpirsyara beşa jinan, bi gavên bi lez çû menzelê, bi dengekî tund got;

- Daxwazên we hatiye pejirandin, bila xwe amade bike, em dê wê bibin cem bijîjik, dê kêliyên devê wê vekin.

Dengên wan bilind bû:

- Gelo rast dibêje?

- Ev nexapandin be.

- Ma em qebûl bikin.

- Heval Leyla çi dibêje.

- Em ji heval Leylayê bipirsin, bila piştre Perya biçe.

- Raste.

Leylayê pirtûka xwe danî ser berkêşkê û hat ber derî:

- Heke we daxwaza me pejirandibe, dê hevala me kêliyên devê xwe veke.

- Teqez daxwaza we hatiye pejiranin.

- Hûn me naxapînin newisa?

- Na, na.

- Bila Perya zû were.

- Divê hûn zû Peryayê bînin.

- Temam.

Peryayê xatir ji hevalan xwest û ji derî derket û çû.

- Hêvî dikim zû vegere.

- Heval Şîrînê çawa ew qani kir gelo?

- Dibêjin hevalên hev yên serdema zarokîtiyê ne.

- Bi rastî?

- Semîrayê wisa got.

- Ev Semîra jî bi her tiştî dizane ha.

- Erê, erê…

Piştî demeke dirêj xetên aramiyê xwe li rûyên wan dida der, wê kêliyê kederê ji bin siya bêriya çavên wan, bar kiribû û di nava bendewariya hatina Peryayê de rawestiya bûn.

*  *  *

Çend roj li ser vegera Peryayê derbaz bibûn . Xwîna lêvên wê sekinî bû, lê hê jî  kul bû, birîn nû bû, hê jî werimî bû û jana wê berdewam bû. Du rojên destpêkê qet neaxivîbû. Lewra gava lêvên wê diliviyan hest bi êşeke bê dawî dikir. Şîrîn qet ji ber serê wê ranedibû. Bi vegera Peryayê gelek dilxweş bibû. Di wan rojên dawî de Semîra jî giranî dabû ser hînbûna zimanê dayikê, gelek zû pêş dikeft. Şîndayê mamostetiya wê dikir. Car caran rewşa wê dibû mijara henekan. Semîra berdewam kêfxweşiya xwe bilêv dikir. Şîrînê ji wan re qala hevnasîna xwe û Semîrayê dikir. Qala rojên destpêkê yên Semîrayê dikir, him dikeniyan, him xemgîn dibûn. Herçiqas li ser wan zext hebû jî, coş û kelecana wan bilind bû.

Rewşa Aso dilê wan dişewitand. Aso bi zimanê xwe yê nîvco hînî jiyanê dibû. Karê herî zêde yê Asoyê xwendin û nivîsandin bû, gelek dinivîsî. Leylayê jî karê rêxistinê dikir. Hemûyan ew weke berpirsiyara xwe hilbijartibû. Leyla, zana, jîr û têgeheştî bû. Agahiyên wê li ser dîrok, felsefê û ramyariyê berfireh hebûn. Bi dilnizmî agahiyên xwe bi girtiyên din re parve dikir. Jiyana wan di nava dilgermî, hevaltî û parvekirineke hêja de derbas dibû.

Perya û Şîrîn li bin dîwarê hewakêşê rûniştibûn. Bi dengekî nizim diaxivîn. Perya di nava aramiyek gerim de

bû. Şîrînê ji nişkêve destê xwe avêtibû ser milê Peryayê û bi dengekî xemgîn gotibû:

- Perya.

- Fermo.

- Gava min dît ku tu dîl ketî dilê min pir êşiya.

- Ma dizanî heval ji bona te jî çiqas xemgîn bûn.

- Na.

- Pir êşiyan.

- Ji ber ku ez zû hatime girtin, xwe tewanbar dibînim.

- Wisa nehizire.

- Belê , belê wisaye, divê ez qet nehatibame girtin.

- Şîrîn.

- Çiye.

- Dibêjin ji te re îdamê dixwazin, raste?

- Erê raste.

- Çawa dibe.

- Min jî fam nekir.

- Ji bo çi dixwazin, temam neyartî, neyartî. Lê…

- Gava ez birim cem qazî, tenê sê deqeyan li hêwana dadgehê rawestiyam.

- Tiştek nepirsîn?

- Na, nehiştin ez xwe biparêzim jî.

- Ma nahêlin mirov biaxive?

- Na, tenê çend gotinên tewşo-mewşo dibêjin û dibêjin here.

- Neyartiya xwe baş dikin.

- Ez, bawer nakim ku cezayê îdamê bidin min.

- Ez jî bawer nakim.

- Lê dîsa jî neyare.

- Raste.

- Dê çi bibe ne diyare.

- Wisaye.

- Bi derbasbûna demê re em dê bizanîn.

- İhsan Fetahiyan bê lêpirsîn darvekirin.

- Ew jî li vir dima.

- Min kenê wî, dildariya wî ya jiyanê qet ji bîr nekir.

- Ew bû baran û bi ser dilê me de barî.

- Dixwazin çavên me bi îdamê bitirsînin.

- Lê ew kêm, em zêde dibin. Weke helbestvan jî gotiye; ma dikarin gola wanê zuha bikin…

- De ka em îdamê zêde nexin rojeva xwe.

- Tu rast dibêjî.

- Ka bêje tu çawa hatî girtin Perya. Te çawa ev agir bi dilê min xist.

- Çawa bêjim. Mijareke dûr û dirêje, lê dixwazim bi kurtî ji te re vegêrim. Ez ji bo xebatên ramyarî çûbûm Mehabadê. Nêzî sê mehan li wê xebitîm. Rojekî dema ji kolaneke teng derbas dibûm, ji hêla çar kesên nenas ve hatime girtin. Piştî sê rojan ez anîme Tehranê, ji xwe tu dizanî çawa şikencê dikin.

- Belê.

- Bi kurtasî wisa bû.

- Beriya ku ji Qendîlê veqetim min Sînema Dimdimî dît. Gelek bêriya te kiribû,

gelek.

- Sînemê, Sînemê…

- Çiye?

- Du zarokên wê jî hene.

Peryayê bi kenî got:

- Bi rast…

- Wele.

- Sînema hesûd, dîsa cudahiya xwe derxiste holê.

- Erê, erê…

- Sînemê, Sînemê min pir bêriya wê kiriye.

- Digot, teqez pêwiste ez Peryayê bibînim.

- Sînema hesûd.

- Ew jî dibêje Perya hesûde.

Perya bi dengekî bilind kenî:

- Neheq nîne. Min ji wê bêdegiya wê hez nedikir.

- Tenê ji bêdengiya wê?

- Temam, ez hinekî ji çûyîna wê ya dibistanê jî dihesidîm, lê…

Şîrîn kenî:

- Lê çi?

- Niha min gelek bêriya wê hesûdê kiriye. Sînemê, Sînemê… çav biçûkê, dev li kenê, hesûdê…

- Li wir jî hemû kes jêre dibêjin Sînema Dimdimî.

- Wele.

- Erê.

- Min bizanîba wisaye, min jî dê jêre wisa bigota…

- Wê dîsa biba tîqe tîqa wê û dikenî…

- Xwezî niha min ew bidîta.

- Em dê wê jî bibînin.

- Te dît ez ji bo wê giriyam, lê hê jî ji min re dibêje hesûd.

- Min Jîn Rojhilat û Sema Oremar jî dîtin.

- Min jî Jîn dît.

- Jîn bûye agir.

- Pir dixwest biçe Bakur.

- Gelo çû an na?

- Nizanim.

Şîrîn û Perya di nava hestên arambexş de derbasî hundirê menzelê bûn. Çavên Peryayê dibiriqîn.

*    *    *

Çavên Şîrînê êdî baş nedidîtin. Her ku diçû ronahiya çavên wê kêmtir dibû. Mîna fanosekê ku hêdî-hêdî roniya wê kêm dibû ber bi vemiriyanê ve diçû. Çavên Şîrînê jî êdî weke berê dûrahî nedidît. Ji bo ku berçavkê bidin wê bi dehan caran çûbû nexweşxanê, lê tu encam negirtibû û pirsgirêka berçavkê çareser nekiribû. Weke hemû daxwazên wê ev daxwaza jî red kiribûn. Dixwestin Şîrîn bê çav bimîne. Dixwestin roniya caven wê biqedînin. Lê nedizanîn ku Şîrîn ne bi çavên xwe, bi dilê xwe li cîhanê dinêre.

Li vir şikenca bi awayekî hosteyane, kone û teknîkî dihate meşandin. Bi gotina wan, bi rêbazên sar û germ şikence dihat kirin. Di navenda vê şikence de derûniya mirovan hebû. Li wir, ango li benda 209ê hemû hewildan, têkilî, xwarin, vexwarin û axaftin, şikence bû. Bîst û çar

saetan şikenceya derûnî berdewam bû. Ji ber ku roniya çavên Şîrînê roj bi roj kêlî bi kêlî kêm dibû, vê yekê astengiyên neyênî derdixist pêşiya wê. Zêde nedikarî bixwîne û binivîsîne. Semîrayê carna jêre digot; “Tu dê baş bibî, hinek dem pêwist e”. Dixwest bi wan gotinan Şîrînê dilxweş bike û baweriyê bide wê. Şîrîn jî ji ber ku di vê famdariyê de bû, tiştek nedigot, tenê bi biŞîrîneke germ bi sînor dima.

Semîra di van rojên dawî de giranî dabû ser axaftina Kurdî, bi taybet bi Şîrînê re bi Kurdî diaxivî. Kurdiya Şîrînê gelek xweş bû, herikbar, nerm û hebo hebo bû. Şîrîn ji bo ku Semîra Kurdiyê baş hin bibe, di nava hewildanên bêsînor de bû. Çi ji destê wê dihat dikir. Ji xwe Semîrayê digot; “mamosteya min tu yî”. dema Şîndayê ev gotina Semîrayê dibihîst hêrs dibû û demildest digot; “min ewqas ked di ber te de da, ma te çawa ewqasî zû ji bîr kir”. Şerê Semîra û Şîndayê hertim wsa berdewam bû. Perya jî dikenî û digot; “bi xwedê şerê Şînda û Semîrayê, şerê min û Sînema Dimdimî jî derbas kiriye”.

Tevî hemû êş û kulan jî ken ji lêvên wan kêm nedibû.

Semîra dîsa weke herdemê hatibû li cem Şîrînê rûniştibû û diaxivîn. Semîra xwe ranegirtibû û hatibû serdana wê. Bi rûkenî got:

- Heval Şîrîn.

- Fermo.

- Duh min derfet nedît ku ji te re qala serdana malbatê bikim.

- Raste.

- Dayika min hatibû.

Şîrîn kenî:

- Bi rastî ez jî meraq dikim. Vê carê helwesta wê çawa bû?

- Min jî dixwest ji te re qala helwesta wê bikim.

- Dê baş bibe.

- Duh dema ez çûm serdamê, dayik û bavê min hatibûn. Bo min gelek balkêş bû.

- Çawa.

- Dayika min dema ez hembêz kirim, bi Kurdî û dengekî bilind got; ‘keça min tu çawayî?’. Ez matmayî mam. Dûre em rûniştin. Dayika min bi devkenî got;

- Semîra can.

- Bêje dayê.

- Lêborîna xwe ji te dixwazim.

- Çima?

- Min neheqiyeke mezin li te kir.

- Dayê wan rojan ji bîr bike.

- Keça min ji îro û şûn de, tu çi biryarê bidî, em li pişta te ne.

- Bi rastî tu wisa dihizirî?

- Erê keça min.

- We ez kêfxweş kirim dayê.

- Min û bavê te heta roja îro bezekariyeke mezin kir. Me bibexşîne.

- Dayê.

- Bêje keça min.

- Niha du hevalên min bi cezayê îdamê tên darazandin, dizanî ji ber çi?

- Na.

- Tenê ji bo ku ew jî weke me Kurdin.

- Xwedê ji wan xwedênenasan re nehêle.

- Divê êdî dayik û bavên me ji xewnên giran û mirinê hişyar bibin.

- Raste keça min raste, heta îro me xwe xapand. Dema ez ji cem te çûm malê bi rojan hizirîm, têgihîştim ku dixwazin me û zarokên me bînin hemberî hev.

- Ez bi van gotinên te gelekî kêfxweş bûm.

- Min li TV ya Kurdan temaşe kir. Bi hezaran keçên weke te têkoşîna rûmetê didin.

- Dayê, beriya her tiştî divê jin azad bibin, divê em azad bibin. Ma tu nabînî jin di kîjan rewşê de dijîn. Tu nirxên me, tu wateya me nîne. Ma gelo ji vê kembaxtir tişteke din heye? Na. Vaye bavê min jî li vire, heta roja îro m

In nedikarî li cem bavê xwe dev vekim. Di dilê min de tirsa herî mezin, bavê min bû. Lê niha baweriya min, bi min heye. Têgehîştim ku zindiyeke xwedî vîn, hest, raman û dilim. Ma ji vê fêrdariyê çêtir çi heye dayê?

- Raste keça min.

- Niha em komeke jinan li vir dimînin. Em gelek ji hevdu hez dikin. Em hemû tiştên xwe bi hev re parve dikin. Herçiqasî di bin zilmê de jî bin, dilê me azade. Mejiyê me, giyana me û hestên me azadin. Min li vir gelek çirokên sotînêr bihîstin. Kurdên me jar û hejar, keçên xwe di temenê biçûkatiyê de weke qerwaş didin dewlemendan û êdî tu agahiyan ji wan nagirin. Ma gelo ji vê bezekartir çi heye? Dilê dê û bavan çawa tiştêkî wisa radike û dipejirîne, ez fam nakim… Dayê ma tu digirî?

- Na keça min na!

- Belê, belê tu digirî.

- Dema te qala keçên biçûk kir dilê min pir êşiya. Min xwe ranegirt. Êşeke mezine. Xwedê rê tu kesî nede.

- Bihizire hê di temenekî biçûk de.

Dayika Semîrayê kete navberê û nehişt Semîra gotina xwe bi dawî bike:

- Keça min bes qala van bûyeran bike. Dilê min dişewite.

- Dayê belkî ez derkevim.

- Ser xêrê be.

- Lê ez li malê rûnanêm.

- Keça min, dilê te çi dixwaze wê bike.

- Spas.

- Ka hevalên te çawa ne? Îşelah rewşa hemûyan başe.

- Belê başin. Lê rewşa hevalekê me gelek diêşîne.

- Çima.

- Aso.

Dayika Semîraya bi bihîstina wî navî velerizî:

- Te got Asooo.

- Erê.

- Çi jê hatiye?

- Aso, aso…demekî wisa bêdeng ma û got: zimanê min nagere qala wê bikim.

- Ka zû bêje keça min, çi li Asoyê hatiye?

- Asoyê zimanê xwe jêkiriye.

- Dayika Semîrayê wisa hişik bû, weke ku di dinyayê de nîne. Piştî demekê hate serxwe, pepûkê çima zimanê xwe jê kiriye?

- Ji ber şikence.

- Wey eznemînim.

- Dayê hêdî.

- Ka bêje Aso keçeke çawaye ? Ji kuye?

- Aso, ez dê çawa ji te re qala rindî û bedewiya wê bikim. Biqasî min bilinde, rûyê wê fireh û mîna berfa çiyayê Şaho spî ye. Bêvila wê piçekî dirêje û serberjêre, çavên wê dişibin axa cûn, birûyên wê weke kevanê zirav-in, mijangên wê geşin. Gava ku dikene du qorçal xwe li rûyên wê didin der. Heval dibêjin hûn pir dişibin hevd. Ji Urmiyê ye.

- Te got ji Urmiyê.

- Erê.

- Keça min gelek silavên min li Aso bike, wê hembêz bike û ramûse.

- Başe.

- Şad bin keça min.

- Vexêriya we ya xêrê be; aha, dayika min wisa tevgeriya:

Şîrîn cardin kenî:

- Te ez kêfxweş kirim Semîra.

- Min qet ev ji dayika xwe nedipayî.

- Te silavên me ji wan re got.

- Erê, erê, çawa.

- Spas.

- Ji te re jî gelek silav hebûn.

Semîra ji duh de dixwest bi Aso re biaxive, lê derfet nedidît. Gava ku dît Aso bi tenê digere, ji nişkêve ji cem Şîrînê rabû û çû cem Asoyê.

Şîrîn bi dengekî hêdî di ber xwe de got:

- Gelo çima dayika Semîrayê ewqas Aso meraq kiriye?

*  *  *

Rêwîtiya wan pir dirêj domandibû, lê dîsa jî dema ku gehîştibûn malê dest bi gengêşeye dijwar kiribûn:

- Ew helwest bûn?

- Kîjan helwest?

- Tu çima wisa bi Semîrayê re axftî?

- Çawa?

- Ma qey tu xurifiyî.

- Yê xurifiye ne ezim, tu yî.

- Çawa ezim.

- Heke tewanbariyek hebe yê teye.

- Tu çi dibêjî?

- Tu dizanî ez çi dibêjim.

- Ma te helwesta Semîrayê nedît.

- Min dît.

- Êêê…

- Êê, êê, êê…

- Pir vekirî got êdî ez nayêm malê.

- Bila nêye.

- Çawa bila nêye.

- Heta îro me ji derewan pêvetir çi hinî wan kir.

- Derewên çi?

- Te çi zû ji bîr kir.

- Min ji bîr nekiriye.

- Wê demê bêdeng be.

- Semîra hatiye li hemberê min, nizanim qala çi dike, tu dibêjî bêdeng be?

- Erê bêdeng be.

- Bi vî awayî tu nikarî bigihêjî tu deran.

- Ez rast dibêjim dixwaze çi bike, bila bike.

- Hema wisa?

- Erê hema wisa.

- Tu dê, biedilînî.

- Vê yekê jixwe bipirse.

- Ez dê çi ji xwe bipirsim hurmet?

- Min nedizanî tu ewqas kezebreşî.

- Kezebreşiya çi, te ev ji ku derxist îcar.

- Gava qala Asoyê kir te qet bertek nîşan neda.

- Ka bêje te dixwest ez çi bikim?

- Min negot rabe bireqise, te dikarî hinekî meraq bikî.

- Subhanelah ha, ez dê çi meraq bikim?

- Ma qey te Aso ji bîr kir?

- Na, min ji bîr nekiriye.

- Madem çima te nepirsî?

- Hurmet belkî ev ne ew be, li vî welatî bi hezaran Aso hene.

- Dema Semîrayê qala wê dikir, tu piçek jî xemgîn nebûy.

- Te aqilê xwe wenda kiriye, aqilê xwe…

- Heke te aqilê xwe wenda nekiriba ma te keçika me difirote wan bê wijdanan, hê tifal bû tifal.

- Min firot ha.

- Te firot teee.

- Îcar ez bûm bezekar.

- Tu îro nebûyî bezekar.

- Te çima wê demê tiştek negot, he.

- Tu bê wîjdanî, çawa min wê demê negot, ez bi şev û roj giriyam. Min ji te re got ew nuxuriya mine, roniya çavê mine, nede ew hê heşt salî ye, te li min guhdar nekir.

- Dema min ji te re xanî bi wan pereyan kirî te negot na.

- Xaniyê te nav serê te bixwe, ha ji îşev û şûn de ez di vî xanî de ranazêm û rûnanim.

- Hinekî şanaza te heba, ma te Asoya min dida wan pozbilindan.

- Ma qey li vî welatî min tenê ev kar kiriye?

- Tu hê jî fedî nakî.

- Ma qey te xwe ji bîr kir.

- Min çi ji bîr kir?

- Ma bavê te tu nefirotibûye bazirganekî Îsfahanî, ma min tu ji wê bendetiyê xelas nekirî, kesî/ê nirxê pisîkikê jî nedida te.

- Tu çi dibêjî? ma tu fedî nakî?

- Ez rastiya te dibêjim.

- Tu çawa xwe ewqas biçûk dikî.

- Tu, min neçarî dikî.

- Hiii.

- Ma ne wisaye, dema min tu naskirî, tu weke mirîşkeke kor bûy, danekî xwarin didan te, sê danan nedidan. Min tu ji wê dojehê rizgar kirî û min tu xistiye şûna mirovan.

- Niha ji bo ku tu bezekariyên xwe veşêrî, tu rabirdûya min li rûyê min dixî.

- Ma ne wisaye, te ji hemû kesî re digot ez sêwî me, lê tu sêwî nebûy, tu bendeyek bûy.

- Tu heta sibê jî bêjî, nikarî xwe paqij nîşan bidî, te Asoya min firot wan.

- Min ji te re xanî kirî.

- Min sed carî ji te re got, em Asoyê neşînin cîhekî wisa dûr, lê te bi ya xwe kir.

- Min ji ku dizanî Aso dê wenda bibe.

- Te, baş dizanî.

- Tu neheqiyan li min dikî.

- Heta dojehê tu neheqî.

- Hurmet tu bi gotinan nikarî bezekariyên sivik bikî.

- Ma tu qet hizirî? heke Aso û Semîra li wir hevdu nas bikin dê çi bibe?

- Na ez nahizirîm ji ber ku ew ne Asoya meye.

- Çawa tu dizanî ew ne Asoya meye.

- Çi karê Aso di nav tevgereke wisa de heye.

- Çawa Semîra beşdarî nav bû, Aso jî wisa ketiye nav.

- Wisa nehizire hurmet û waz ji vê wesweseya xwe bîne.

- Ez çawa bihizirim û mîna te bêxem bim…

- Semîra li pey tiştekî wisa nakeve.

- Te Semîra qet nas nekiriye.

- Ma me ji Semîrayê re negot beriya ku tu bi ser lingan kevî xwişka te Aso di qezeyekê de jiyana xwe ji dest daye.

- Hemû tişt bi vê gotina te naqedin.

- Ez nikarim serê xwe bi gotinên te yên vala re biêşînim.

- Ez weke navê xwe dizanim ew Asoya meye.

- Ma tu kahinî?

- Gava Semîrayê qala wê dikir, min zanî ku ewe.

- Hurmet bi rastî dilê min jî pir diêşe. Lê…

- Lê çi, çi?

- Tiştekî ku bikim nîne.

- Heye.

- Çiye?

- Here û li Asoyê bigere.

- Ma te heta niha negot, ya girtîgehê Aso bi xweye.

- Belê.

- Êêê.

- Here lêpirsînê bike.

- Çawa.

- Ew zilamê ku Aso qewraştiya wê dikir, teqez dizane.

- Min deh caran jê pirsî.

- Lazime tu bi xwe biçiye Urmiyê.

- Li Urmiyê her roj bûyerek diqewime, nikarim biçim.

- Divê tu biçî.

- Hurmet…

- Çiye?

- Niha ez westiyame, sibê.

- Sibê çi?

- Em sibê biaxivîn.

- Başe lê…

- Lê çi?

- Ez ji bîr nakim, êdî pêşiya vê bûyerê bernadim.

- Ji xwe niha serê me di teşqelê de ye, tu dixwazî belayeke din jî li serê me vekî.

- Ew zarokên mene, tu çawa wisa dibêjî.

- Ma li vî welatî çend keç weke Semîrayê xweş dijîn.

- Te ev jî di dawiya dawî de kire minet.

- Ma ne wisa bû…

- Bese, bese ji ber van gotinên te ez dê xwe bikujim.

- Ya ku mijarê dirêj dike tuyî.

- Heta ku birîna min rehet nebe, ez dê berdawam bêjim.

Ji nişkêve deng ji wan biliyabû û bêdengî li ser menzelê serwer bibû…

*         *         *

Du roje Şîrîn di nava nivînan de bû. Nedikarî rabe serxwe, wisa dikuxî, wisa dikuxî mirov digot qey dê kez-

eba wê biteqe. Xwîdan mîna avê ji eniya wê diherikî. Agirê ku di canê wê de pêketibû, zêde bibû. Şînda li ber serê wê rûniştibû, bi xewliyeke destan xwîdana enî, stu û pişta wê zuha dikir. Hêsir ji çavên Şîrînê herikîbûn. Geh diricifî, geh dinaliya, kuxîn jî berdewam bû. Dema dikuxî, xweziyek tevî xwînê ji gewriya wê hatibû. Vê rewşê hemû tirsandibûn. Şînda bi dilkovanî li çavê Şîrînê yên qels nêrî. Leyla bi dengekî kesertijî got;

- Heval Şîrîn tu çawayî?

- Ez başim.

- Tu zêde baş xuya nakî.

- Na, na ez başim.

- Hinekî li ber xwe bide, xwe bernede, vaye heval dermanan amade dikin. Gelo ev kuxik ji ber çiye?

- Min serma girtiye.

- Lê hewa pir germe.

- Ev serma ne ya îroye.

- Te, kengî serma girtiye?

- Berî min bînin vir, ez xistim nav ava cemedê, aveke wisa qerisî bû, di nava kêliyekê de bedena min tevizî bû…

- Dibe ku kezeba te xişivî be.

- Ez jî wisa dihizirim.

- Em dê baş li te binêrin, tu dê rihet bibî.

- Zêde xeman nexwin, tiştek li min nayê.

- Çi pêwist be em dê bikin.

- Gelo Semîra çi dike niha.

- Ew û Perya pirtûkê dixwînin.

- Semîra bihata vir dê baş biba.

- Çima?

- Ez dixwazim beşek ji jiyana xwe jêre vebêjim.

- Paşê, paşê…

- Na, na bila were.

- Başe.

- Dema hat bila pênûs û lênuskê jî bi xwe re bîne.

- Şîrîn.

- Çiye?

- Tu min ditirsînî, ma qey rewş pir nebaşe.

- Na lo, tiştek tuneye.

- Wê gavê tu çima lênûsk û pênusê dixwazî.

- Min ji Semîrayê re qala hemû jiyana xwe kiriye, lê tenê min ji wê re qala beşek jiyana xwe nekiriye, dixwazim wê beşê jî vebêjim.

- Lê cardin jî.

- Mitalan neke.

- Çawa mitalan nekim, bêhna te dernakeve.

- Leyla.

- Çiye?

- Hinekî balîfa min rast bike, ez dê ji te re tiştekî bêjim.

- Keremke.

- Aso.

- Çi li Aso hatiye?

- Gelo tu bi rabirdûya Asoyê dizanî an na?

- Belê ez dizanim.

- Ji ku ye.

- Ji malbatek dewlemend ya Urmiyê.

- Başe.

- Te çima ev pirs kir?

- Min dixwest hinekî wê nas bikim.

- Van rojên dawî ew û Semîra pir diaxivin.

- Bi rastî.

- Belê.

- Hiii.

- Niha Aso hinekî baş bûye.

- Pêwîste jêre bibîne alîkar.

- Raste.

- Heval dibêjin helbestan jî dinivîse.

- Erê.

- Ger rihet bibim, ez dê helbestên wê bixwînim.

- Vaye Semîra hat.

- Heval Şîrîn, te bangî min kiriye.

- Erê Semîra.

- Rewşa te çawaye.

- Weke ku tu dibînî.

- Ka, bêje ez çi bikim.

- Semîra.

- Fermo.

- Ez dê biaxivim, tu jî binivîse. Ez dê ji te re qala wan rojên jiyana xwe bikim. Tu jî dê hevokên min nemir bikî. Min nedixwest di vê rewşa kambax de ji te re vebêjim, lê ez dibînim wext teng dibe, roj zû derbas dibin. Dewran dizîvire. Ez dê bêjim, tê guhdar bike, ez dê bibêjim tu dê

hevokan saz bikî, ez dê bêjim û tu bêjeyên min yên şikestî, nîvcomayî, têr keser û tenê ragihîne dahatuyê.

Semîra, qederê riya me li cihekî gihand hev. Îro jî çarenûs dixwaze riya me ji hev veqetîne. Me rêwîtiyek bi êş, jan û dijwar bi hevre derbas kir.

- Belê.

- Niha jî ez dê ji bo te qala beşeke jiyana xwe bikim.

Ligel ku dilê Semîrayê pir êşa bû, qet tiştek negotibû, tenê go:

- Ez dê bi kêfxweşî binivîsîm.

- Ji ber nexweşiya giran, ji ber bêhaliya xwe û ji ber ku agirê di bedena min de pêketiye min dişewitîne, dibe ku hevokên min nîvco bimînin. Tu wan temam bike.

Ez, Şîrîn. Ango Şîrîn Elemhûlî. Navê min yê din Ronahî. Ez ji Rojhilatê Kurdistanê, bajarê Makuyê me. Di nava êla Celalî û Mîlanan de hatime dinyayê. Bi bêhna mêrxasiya Araratê mezin bûm. Bi êşên çirokên dayika xwe stewiyam. Min mirin, têkçûn û jarî û hejarî dît. Min çîroka Hesenê Kizilcî di temenê xwe yê biçûk de bihîst. Min ew serpêhatiya wî ya ku di nav de xerîbî, evîn, hezkirin, mixeştî bûn, şikence, girtîgeh, neçarî, welatperwerî, hewar, qêrîn, keser, keder, nalîn û axîn heye bihîst. Hesenê Kizilcî hewara duh, îro û sibêye. Hewara binê girtîgehaye û nêrînên dawî yên evîndaran ku negihiştine evîna xwe. Hewareke nîvcomayî. Bi çîrok û serpêhatiya wî gelek şevên min derbas bûn û trajediya Simkoyê Şikak, navê birîna dilê Kurdaye. Ez li cihekî wisa mezin bûm. Ez di nava pêlên cîhaneke tarî de mezin dibûm, lê di hemû qonaxên temenê xwe de li roniyê geriyam. Min dizanî berdêla ronahiyê girane, lê dîsa jî lê digeriyam. Min dixwest mejiyê min, dil, giyan û hestên min ronî bibin û berdêla wê çi be bidim. Herî dawî min têkoşîna azadiyê

naskir. Wê demê min hebûna xwe jî naskir, ronahiyeke bêdawî di dilê min de cîh girtibû, ronahiya ku pêlên tarîtiyê yek bi yek diqetandin û pêşiya min ronî dikir. Jinên Kurd perda mirinê ji ser çavên xwe davêtin û dibûn serhildêr. Êdî li dû xeyalên xwe diketin. Êdî diaxivîn û dikeniyan, êdî ji jiyanê hez dikirin. Qefil bi qefil beşdarî meşa azadiyê dibûn û herî dawî ez...Min jî biryar da. Biryara azadiyê, biryara meşa serkeftinê, meşa nû. Meşa jiyana bextewer û meşa miletekî.

Wê şevê min û Peryayê xatir ji jiyana bindest xwest û em çûn. Di wê şeva tarî de seh li dû me reyan û em çûn. Me di wê şeva payiza paşîn de ku ji asîmanê Makuyê stêrk dibarîn cara dawî xatir xwest û çûn. Di wê şeva tarî û hênik de zû dimeşiyan. Gava dil azad be ling qet nawestin. Asîman ji stêrkan dikeliya, yek dixuriçî, yek dibiriqî. Çi dîmeneke xweş bû. Çi şeveke bextewer bû. Bêhna axê, bêhna çilûyên weşiyayî, bêhna pûşiyê hişk çiqas xweş dihate bêvila me. Xwezî niha ez di bin wan stêrkên geş de meşiyabam, xwezî, xwezî...

Wê şevê di rê de qet newestiyam. Cara yekem bû ku di bin şewqa hîvê de bi şervanan re dimeşiyam. Em komek heval bûn. Zêdeyî bîst kesan, nîvî keç û nîvî xort. Tiştekî me ji hev zêdtire nebû. Kelecana hundirê min, gurme gurma dilê min di gelî û newalan de hilnedihat. Hestên min bibûne lehî û lêser û diherikîn. Bi qasî sê saetan em meşiyan. Serkêşê koma me, ji nişkêve ferman da û kom rawestiya, wexta vehesînê hatibû. Em her yek di cihê xwe de rûniştin. Şervanekî kevin ji serî heta dawiyê komê derbaz bû û kom hejmartibû. Ne kêm bû û ne jî zêde. Hevalek jin av gerand, dema av belav dikir, digot; ’tenê sê qurtan vexwin’ ava me hindik bû. Me jî bi gotina wê kir. Şev her ku ber bi nîvî re diçû hêniktir dibû. Stêrka di biriqînê de şerê hev dikirin, min stêrk pir nêzî xwe didîtin. Ewqas kelecana min zêde dibû, min dixwest biaxivim. Lê

axiftin di şevê de qedexe bû. Jîn Rojhilat li pêşiya min bû. Ew ji min xurttir dimeşiya. Dema rabûn û rêwîtiyê hatibû. Fermandarê komê got; 'bila heval hevdu bişopînin'. Min tu wate nedabû gotina wî. Rengîn Urmiye, ji paşve ez hişyar kirim; 'li hevalên pêşiya xwe miqate be'. Wê kêliyê min mijar fam kir.

Em dimeşîn û dimeşiyayin lê riya me nediqediya. Hêdî-hêdî diwestiyam, çongên min sist dibûn, lê min li xwe nedigirt bêjim; 'westiyam e'. Şeva despêkê ji bo min girîng bû. Di heman demê de ji bo min bi wateya azmûneke dîrokî jî bû. Pêwîst bû bi serkeftî ji vê azmûnê derkevim. Rengîn Urmiyê çend caran ji min re got; 'heke tu westiya be, em dikarin hinekî rawestin'. Lê min nepejirand. Ji nişkêve girekî pir bilind li pêşiya me derket, wî girî ez çavtirsandî kirim. Me da pala gir, em di şive rêyeke pir teng de dimeşîn. Dawiya dawî me xwe gehandibû serê gir. Wê kêliyê mîna ku ez ji heyamekê derbasî heyameke din bûne, xwe pir sivik his dikir. Jîn Rojhilat zîvirî û kenî. Min got;

- Tu çima dikenî?

- Tu dê gelek çiyayên wisa bibînî.

- Bi rastî.

- Erê ma ev çiye?

-Hişyariya bêdengiye ji Rengîn Urmiye ve hat. Wê şevê heta berbanga sibê em meşiyan. Em li quntara çiyayekî bilind, di nava daristaneke tarî û geş de bi cîh bûn. Cihê me mîna biheşta ser rûyê erdê bû. Ji ber kelecana hundirê xwe ez ranezam. Bi hatina sibê re deng bi qebe qeba kewên gozel ketibû. Ewqasî qebe qeb dikirin û dixwendin mirov digot qey dê qirika wan biçire. Lê beramberî hev dixwendin û dûre difiriyan û dengek li dû xwe dihiştin; viç, viiç, viiiç, daran dest bi pelweşandinê

kiribûn. Pelên zer bi hatina bayekî qels jî ji guliyên xwe diweşiyan û bi girankêşiyeke balkêş li hewa çiv didan û li ser erdê vediniştin û rûyê erdê dinixumandin. Ew sibeh çi sibeheke arambexş bû. Hewayê ku hişê mirovan ji ser dibir. Jîn Rojhilat li tenişta min radiza. Kefiya xwe avêtibû ser rûyê xwe û ketibû xeweke giran. Tiştekî balkêşe min nedixwest ew razê, min dixwest ew zû hişyar bibe û em biaxivin. Lê hişyar nedibû, Rengîn Urmiye çend gavan ji min wêdetir rûniştibû. Lênûska di destî de tiştek dinivîsand. Rûyê Rengîn Urmiye fireh bû, bedewiya wê bala mirov dikişand. Aramiyeke bêhempa li ser rûyê wê serwer bû. Bêvila wê ya dûz û hinekî stûr, lêvên wê yên li hevhatî, mijangên wê yê tenik û birûyên wê yê reşqetranî di nava ahengiyek bêpayan de bûn. Rengîn piştî ku nivîsa xwe bidawî kir, îcarê dest bi xwendinê kir. Ji bo min gelek balkêş bû, Rengîn Urmiye qet kêliyek xwe jî vala derbas nedikir. berdewam dixebitî.

Roj bilind dibû, hemû şervan hişyar bibûn. Wextê taştê hatibû, du şervanan çay amade dikirin, zirçaydanekî reş dabûn ser agir, du şervanên din jî xwarin amade dikirin. Sifra me ya ku ji erdê ango ji axê amade bû, zeytûn, penîr û ava bacanên sor û çaya mîna xwîna kevroşkê bû. Jîn Rojhilat hêdîka di guhê min de got:

- Mirov ji vê çayê têr nabe.

Ez kenîm, ew jî kenî. Perya mîna ku dihesidî li me dinêrî. Min bi çêjeke mezin qurta yekem li çaya xwe da. Tameke xweş li ser zimanê min hişt. Mîna ku min di temenê xwe de tucarî çayeke wisa venexwaribe li min xweş hat. Jîn Rojhilat rast gotibû. Baş tê bîra min, wê sibeha payîzê min sê îskanên mezin ça vexwaribû. Medyayê piştî çayê, cixarek pêçayî dirêjî min kir. Lê min venexwar. Hevalan desteke cilan dane min. Kincên şervaniyê. Di nava aramiyek bêhempa de min kincên xwe li xwe kirin. Min

şûtika xwe ya Îranî li pişta xwe pêça, di wê navberê de jîn Rojhilat hate cem min.

- Ser xêrê be.

- Spas.

- Pir xweş li ser te rûniştiye.

- Xeyalek min pêk hat.

- Dê hemû xeyalên te pêk werin.

- Ji bo pêk hatina xeyalên xwe em derketin vê rêwîtiya pîroz.

- Ka em biçin berûya kom bikin.

- Em biçin.

Ez û jîn Rojhilat ji koma şervanan dûrketin. Me xwe berda nava kûrahiya daristanê. Berûyên ku sor bibûn ji kovikên xwe diketin. Me du çente berû tijî kirin û em vegeriyan. Me berû li ser agir biraştin û xwar.

Hêdî-hêdî roj ber bi êvarê ve diqulipî. Siya çiyan dirêj dibû, tava payîzê di ser qotên çiyayên bilind re diçû ava. Rojê li dû xwe dîmeneke sor, kesk, cûn û mor dihişt, dîmeneke wisa xweş, wisa arambexş bû mirov nedixwest çavên xwe jê ba bide. Me alavên xwe dan ser hev, beriya ku ji cihê xwe vekişîn, me hemû şopên xwe wenda kirin. Ez hînî rêbazekî din ya gerîlatiyê jî dibûm. Me wisa kir ku mîna tu kes li wir nejiyaye. Rengîn Urmiye hat ba min, rûyê wê dikeniya, têgihîştim ku dixwaze ji min re tiştekî bêje, min hinekî xwe nêzî wê kir. Perya û Jîn Rojhilat ji dûrve li me dinêrî û dibiŞîrîn. Rengîn bi wî rûyê xwe yê tijî ken go:

- Heval Ronahî.

- Kerem ke.

- Ma tu ji rêwîtiya êvarê re amadeyî an na ?

- Amade me.

- Rê pir dûre ha.

- Çiqasî dûr be jî amade me.

- Başe.

Em wê şevê heta ber destê sibê meşiyan. Di rê de lingên min xwînî bibûn. Lê min qet ji kesî/ê re negot. Piştî sê roj û sê şevan em gehiştîn biryargehê, komek hevalên jin em pêşwazî kirin. Me silav da hevdu. Nizanim bê ji ber çi bû, lê di wê kêliyê de min xwe pir rihet his kiribû. Bextewariyek ku tucarî mirov nikare bîne ziman di dilê min de digeriya. Em li akademiya pakrewan Bêrîtanê bûn. Akademî di berwarê çiyakî bilind û bê ser û bê ber de hatibû avakirin. Efsûniyek wê ya bê dawî hebû. Her cure pirtûk hebûn. Pirtûkên felsefî, dîrokî, hunerî, çand û ramyariyê. Lê min nedikarî bixwînim ji ber ku xwendina min tunebû. Em nêzî şêst şagirdên jin li akademiyê diman û perwerde didît. Hemû kes mîna mêrûyan dixebitî. Kêliyeke xwe vala derbas nedikirin. Hemû têgeh ji nû ve şîrove dikirin. Di demeke kurt de hînî xwendin û nivîsandinê bûm. Êdî min bi zimanê xwe dixwend û dinivîsand.

Hestekî şanaz û serbilind bû û êdî ez bi van hestan re dijiyam. Beriya her tiştî ez li wir hînî raza azadiyê bûm. Dilê min vebû, mejiyê min ronî bû. Baweriya min bi min hat. Li wir têgehîştim ku bawerî biqasî hebûna mirovan girînge. Lewra ya ku hebûnê watedar dike, baweriya azadiyê ye. Li wir mirov dest bi vedîtina kesayeta xwe dike. Destpêkê me li ser ‘çima navê akademiyê Berîtan?’ perwerde dît. Êdî min Zanayê Amarî pir ji nêzve nas dikir. Ez pir nêzî wî bûm. Çavên wî li çavên min dinêrî. Bi qasî şeş mehan li wir mam. Dûre me xwendinameyên xwe girtin û beşdarî tekoşîna jinan bûn, barê me giran bû. Em him jin bûn, him Kurd. Lê meşa me meşa rastiyê bû. Rastî di dilê

me de bû û em li dilê xwe xwedî derdiketin. Heke mirov nikaribe li nîgaşên xwe xwedî derkeve mirov dê nikaribe li tu tiştî xwedî derkeve. Yên ku bêderfetiyê weke çarenûs bibînin tucarî nikarin qala azadiyê bikin. Lewre neçarî ne çarenûsa mirovane. Yên ku derfetan diafirînin mirovin. Ji ber vê divê her mirovek derfeta azadiya xwe biafirîne. Berdêla azadiyê girane, lê azadî hêjayî hemû tiştiye. Yên ku wateya azadiyê fam nekin nikarin tiştekî bikin.

Dîsa qeyrana kuxkê destpê kiribû. Bêhna Şîrînê dernediket, Semîrayê qurtek avê dayê, lê qeyrana kuxkê derbaz nedibû. Semîrayê destê xwe xist bin serê Şîrînê û hinekî serê wê bilind kir. Şîrînê nefeseke kûr kişand. Xwîdana eniya wê paqij kir û got:

- Semîra.

- Bêje.

- Ez hinekî westiyam.

- Hinek vehese.

- Min dê pirsek ji te kiriba.

- Çiye?

- Tu bi Asoyê re axivî.

- Erê.

- Te silavên dayika xwe jê re got.

- Belê, pir germ nêzî min dibe. Naxwaze ji min biqete.

- Bi rastî.

- Erê, navê dayika min pirsî. Gava min jê re qala malbatê kir xemgîn bû. Lê dûre kêfxweş bû, min jê xwest ku malbata wê nas bikim, lê got 'dawiyê'.

- Başe, baş.

- Aso pir zana ye.

- Raste.

- Berdewam helbestan dinivîse.

- Te helbestên wê xwendine.

- Erê.

- Xweşin!

- Ax Aso ax…

- Xwezî zimanê xwe wisa jênekiriba.

- Kî dizane wê çi êş kişandiye.

- Ji dadgeha min re hindik ma.

- Wê te berdin Semîra.

- Nizanim.

- Na, na bila dilê te rihet be.

- Ez naxwazim te li vir bilêlim û biçim.

Ji westandinê çavên Şîrîn hêdî-hêdî hatin girtin û kete xewa giran…

* * *

Ji kêfxweşiyê menzel dihejiya. Semîra û Perya texliye bibûn. Semîra bêdeng û Perya xemgîn bû, lê hemû hevalên din kêfxweş bûn. Dikeniyan. Ji hevdu re digotin: "du hevalên me texliye bûne". Şîrîn bi şid Perya û Semîra hembêz kiribû. Gava Şîrîn gehîştibû Peryayê û hembêz kiribû, Perya giriya:

- Ez tucarî te ji bîr nakim.

- Ji dêvla min Sînema Dimdimî ramûse.

- Ji min re qala wê hesûdê neke!

- Jêre bêje, Şîrînê gelek bêriya te kiriye.

- Ez dê teqez jêre bêjim.

- Niha ji bo min îdamê dixwazin. Lê dilê min li cem we ye.

- Îdama çi Şîrîn, wisa nehizire.

- Li vî welatî hemû tişt pêkane.

- Tu aramiya xwe biparêze.

- Perya can.

- Çiye?

- Ji dêvla min Jîn Rojhilat hembêz bike û ramûse. Qet ew rûyê wê yê bawermend ji ber çavê min naçe.

- Ez dê silavên te ji hemû hevalan re ragihînim.

- Semîra jî ji bîr neke.

- Çawa?

- Lê xwedî derkeve.

- Tu xeman nexwe.

Cardin bi bêriyeke bêpayan Perya hembêz kiribû û ramûsabû. Mîna ku qet nedixwest wê berde, ew hembêz kiribû.

Semîra ji nişkêve xwe avêt stuyê Şîrînê:

- Ez dê çawa te li vir bihêlim

- Semîra.

- Çiye?

- Riya te vekirî be.

- Naxwazim biçim.

- Semîra xwe amade bike, xwe bernede.

- Bêy te…

- Semîra divê tu biçî tekoşînê bikî û tola xwe ji wan hilînî.

- Ji bo te çi ji destê min bê ez dê bikim.

Aso bi çavên hestiyar û tijî hêsir li Semîrayê dinêrî. Ew nêrînên wê, bi ber çavên Şîrînê ket:

- Semîra.

- Belê.

- Te xatir ji Aso xwest an na?

- Na.

- Bi awayekî xweş xatirê xwe ji Aso bixwaze. Ew gelek ji te hez dike. Zimanê wê tuneye, lê di hundirê wê de bager û bahoz radibin.

- Ez dê xatirê xwe jê bixwazim.

Şîrînê cara dawî Semîra ramûsî:

- Riya te jî vekirî be Semîra.

- Tu jî baş li xwe binêre.

- Mitala min neke.

- Çawa mitala te nekim.

- Semîra demek dijwar û riyek dirêj li benda teye.

Semîra bi gavên giran ber bi Asoyê ve meşiya. Aso ew bi hemû hêza xwe hembêz kir û got:

- İii, hiii, miii

Dixwest hin tiştinan ji Semîrayê re bêje, lê Semîrayê ji galegala wê fam nedikir. Aso kaxezek ji bêrîka xwe derxist û çend rêzên ku nivîsîbûn nîşanî Semîrayê da.

"Ji dayika xwe re bêje dema Aso silavên te girt, pir kêfxweş bû. Min pir caran ew di xewna xwe de dîtiye. Heta ku ew min ji bîr neke ez wê ji bîr nakim. Semîra ez pir ji

te hezdikim". Semîrayê cardin Aso hembêz kiribû û ramûsîbû.

Derî vebû, dema çûnê hatibû. Perya û Semîra bi dilekî sotînêr ji hundirê menzelê derketin û çûn. Şîrîn bi çavên xemgîn û tijî hêsir li nivînên Perya û Semîrayê nêrî bû. Beriya niha bi çend rojan Leyla, Zozan, Agrîn û Sêvê texliye bibûn. Wê demê jî kenî bûn. Qîriyabûn û lîlandibûn. Şîrînê nedixwest hevalên xwe xemgîn bike, lê gav bi gav, kêlî bi kêlî, roj bi roj bi tenê dima û ber bi îdamê ve diçû. Her roj îdam dianîn bîra wê û gef lê dixwarin. Tişta herî dijwar ew bû ku nedihiştin Şîrîn xwe biparêze. Bi gotineke din bêy ku wê bidarazînin roj bi roj ew li bena sêdarê nêzîktir dikirin. Perya û Semîra jî ev rastî baş dizanîn, lê nedixwestin dilê Şîrînê biêşînin.

Dem, dewr û dewran zîvirîbûn, roj li pey hev herikî bûn, meh di nava lezgîniyek ne ji rêzê de derbas bibûn. Şîrîn her roj hinekî din ji hewna xwe ve diket, mîna ewrekî ku jê hatibe kişandin ziwa dibû, lewaz dibû, mirov digot qey xwarin di gewriya wê re naçe xwarê û tiştekî naxwe. Ji rojan pêncşem bû. Bêdengiyê per û baskên xwe bi ser girtîgehê kişandibûn. Piştî demeke dirêj rûyê Şîrînê keniya bû. Şîrîn li ber eynikê rawestabû û pora xwe ya dirêj şe dikir. Asoyê jî pirtûk dixwend, car caran serê xwe bilind dikir, li Şîrînê mêze dikir û dibişirî. Ew jî bi rewşa Şîrînê bextewer bû. Şîndayê derî vekir û hate hundur:

- Keçê tu bûye perî. Ew çi bedewiye.

Şîrîn kenîbû:

- Şînda tu jî henekê xwe bi min neke.

- Na wele, min tu bi zorê naskirî.

Şîrîn bi dengekî nizm got:

- Şîînda.

- Çiye?

- Ka were, were.

- Çi bû.

- Tu dizanî.

- Na.

- Aso.

- Çi bi Aso hatiye.

- Ji sibê de li min dinêre û dibişire.

- Bi rastî?

- Erê, erê ez jî mîna ku haya min jê tuneye tevdigerim. Pir kêfa wê ji vî halê min re hatiye.

- Aso zimanê mirovahiyê ye.

- BiŞîrîna ser lêvên hemû zarokane.

- Min qet nedîtiye ku Aso porê xwe şe bike.

- Şe nake.

- Çima?

- Nizanim.

- Piştî çûna Semîrayê pir xemgîn bûye.

- Raste.

- Pir dixwaze biaxive lê…

- Hevaltiya wê gelek hêjaye.

- Berxwedêriya wê jî bêhempa bû.

- Aso, Aso.

- Şîrîn.

- Çiye?

- Gelo çima qet malbata wê nehatine pey keça xwe?

- Nizanim.

- Rojekî hatiban dê gelek baş biba.

- Te qala malbatê kir, îro malbata min dên bên.

- Bira.

- Erê, erê.

- Silavan bigehînê.

- Başe.

- Ka bipirse çi heye çi nîne.

- Ez dê bipirsim.

- Bila silavên me ji hevalan re bibêjin.

Hê Şîrîn û Şînda diaxivîn ku deriyê menzelê bi gurmîniyakê ku mirov dihejîne vebû:

- Şîrîn Elemhulî xwe amade bike serdana te heye.

Şîrîn amade bû. Çarika xwe avêt ser serê xwe û ji menzelê derket. Li ber devê derî kesa berpirsiyar zîvirî û bi dengekî hewomî:

- Tu girtiya îdamêyî.

Şîrîn aciz bû:

- Ev karê dadgehêye, tu çima vê biryarê didî.

- Ez neçarim bînim bîra te, li gor tewanê xwe tev bigere.

- Tu tewaneke min tuneye.

- Hê jî tu bawer nakî ku dê te îdam bikin…

- Ez dê çima bawer bikim?

- Bawer bike, bawer bike.

- Vê zimandirêjiyê bihêle.

- Ya rast heta îro min gelek girtiyên îdamê dîtine, lê yek jî nedişibî te.

- Li vir raweste.

- Çima.

- Dê kêliyek din malbata te were.

Dayika Şîrîn, biraza û xwişka wê derbasî hundir bûn. Şîrîn û dayika xwe hevdu hembêz kirin. Belkî deh caran dayika wê ew ramûsî. Dûre xwişka wê di heman astê de ew hembêz kiribû û Şîlana biçûk, delala ber dilê metika xwe, stêrka esmanê hundurê metika xwe, Şîlan. Şîlana xweşik, kulîlka Şahoyê, sorgula çiyayê welat, Şîlan. Hêviya metika xwe ya ku ji îdamê dihate darazandin. Şîlanê, hêdî-hêdî ber bi metika xwe ve meşiya, cara yekem bû metika xwe didît. Şîrîn ji nişkêve ew hembêz kiribû û ramûsîbû, ramûsîbû û ramûsîbû. Şîlan bi Kurdiya xwe ya zelal û nazenîn got:

- Metê.

- Bêje cana metê, bêje metê qurban.

- Ez dixwazim te maçi bikim.

Şîrîn rûyê xwe spartibû lêvên Şîlanê û Şîlanê meta xwe têr têr ramûsîbû.

- Metê.

- Bêje roniya çavên min.

- Ez gelek ji te hez dikim.

- Wey, ez bi qurbana wan gotinên te bim.

- Metê, bavê min gelek silav li te dikirin.

- Tu jî silavên min bêje bavê xwe Şîlana min.

Dayika Şîrînê, bi xemgîniyeke bêdawî û bi çavên tijî hêsir got:

- Keça min Şîrîn.

- Dayê negirî, dayê can negrî bila kêfa neyarên me nêye.

- Keça min giyan bi te re nemaye.

- Na dayê ez başim.

- Keça min rewşa te dê çawa be?

- Dê baş bibe dayê, dê baş bibe.

- Keça min ez qala îdamê dikim.

- Serê xwe bi wê mijarê re neêşîne dayê.

- Dibêjin wê teqez te îdam bikin.

- Dayê, ez dizanim ji bo ku min ji vê riya rûmetê vegerînin li ser we zextên giran kirin û dikin. Lê daxwaza min ji we eve ku hûn serê xwe netewînin. Li ber xwe bidin.

- Keça min piştî ku me ewqasî şikence dît û şûnde em êdî stûyê xwe natewînin.

- Ez bi vê yekê pir kêfxweşim. Dê gelê me, jinên neçar û zarokên welatê min bi ser kevin.

- Lê rewşa te me ditirsîne.

- Dayê ez dê heta dawiyê bi ser bilindî bimeşim.

Xwişka Şîrînê axaftin birî û got:

- Şîrîn.

- Bêje xwişkê.

- Tu ji min mezintir bûy. Karê malê te dikir, Te gelek zahmetî kişandin. Gava ew rojên kambax tên bîra min, dilê min pir diêşe, min bibexşîne.

- Xwişkê, tu çawa tiştekî wisa dihizirî, qet tiştên wisa neîne bîra xwe. Ka ji min re hinekî qala derve bike. Çi heye çi tuneye?

- Heval tên û diçin.

- Kî/ê tên.

- Sema Oremar û çend kesên din.

- Rewşa heval Sema Oremar çawaye?

- Başe , başe, herî dawî dema hatin, pir silav ji te re şandin, Sema Oremar digot heke derfetên wê hebin bila ji me re binivîse. Rengîn Urmiye ji çend caran hat.

- Ez pir bextewar bûm.

- Tu dizanî kengî tên mala me, Şîlanê ji wan kilama dibêje…

- Bi rastî.

- Erê.

- Şîlanê.

- Ha metê.

- Metê can, tu kîjan kilaman dibêjî?

- Kilamê Delîla, 'dil dixwaze here cengê!'

- Weke din.

- 'Dayê xatir ji te dixwazim!'

- Weke din.

- 'Hevalno!'

- Ka ji min re kilamekî bêje.

- Kîjanê bêjim…

- 'Dil dixwaze here cengê!'

- Başe metê.

Şîlan bi dengê xwe yê nuwaze û mîna newaya ava ku hêdî-hêdî diherike û dilê mirov mest dike, kilama xwe gotibû.

- Metê min xweş got?

- Roniya çavê min te pir xweş got. Ez dê qet vî dengê te yê xweş ji bîr nekim.

Şîrîn zîvirî û ji xwişka xwe re got:

- Xweşkê, baş li Şîlanê binêre

- Xwişka min tu qet xeman nexwe.

- Dayê, wexta me nema tu jî baş li xwe binêre.

- Keça min, min bihîst ku hevalek we zimanê xwe jêkiriye. Gelo rewşa wê çawa ye?

- Niha başe.

- Dilê hemû kesî/ê ji bo wê pir êşiya.

- Dayê bila gelê me zanibe ku ev der sed qatî ji dojehê girantir, dijwartir û xeraptire. Aso ji ber vê zilmê zimanê xwe jêkir. Di helbesteke xwe de wiha dibêje;

'' Zimanê mirovahiyê heye

Lê nagere, lê lale.

Guhên wan heye lê qêrîna me

Kurdan nabihîsin.

Min zimanê xwe jêkir

Belkî ji laliya min şerm bikin.

Belkî ji zimanê xwe şerm bikin''.

Bê zimaniya Aso, ziman bûna Kurdaye. Lal bûna wê qêrîna dîrokê ye. Hewara Kurdane. Vebûna zimanê Kurdane. Ji bo ku zarok bi bextewarî kilaman bêjin Aso zimanê xwe jêkir.

- Şîrîn.

- Bêje dayê.

- Ji dêvla min wê ramûse.

- Başe.

Wextê veqetînê hatibû, wextê çûnê. Şîlan dê ji metika xwe veqetiyaba. Beriya ku Şîlan ji wê veqete, Şîrîn benê sor yê ji serê keziyê xwe girêdabû vekiribû û dabû Şîlanê:

- Şîlan can.

- Ha metê.

- Bi vî benî pora xwe girêde.

- Başe.

- Wenda neke ha.

- Na metê, ez qet wenda nakim.

- Dema ku hevalên min hatine mala we, wan ji dêvla min ramûse û hembêz bike.

- Ez dê hemûyan ramûsim.

Xatir ji hevdu xwestin û ji hev veqetiyan. Dayik û xwişka Şîrînê, çav bi hêsir destên xwe hejandibûn. Bi gavên giran ji hundir derketibûn û çûbûn.

* * *

Dem rawestiya bû, qet ji cihê xwe nediliviya, qey derbas nedibû. Dem giran, roj giran, hewa giran, hemû tişt giran bûn. Roj nediqediyan. Ne diyariya ku dihat domandin; Şîrîn dixiste nava tengezariyek dijwar. Nûçeyên ku derbarê îdamê dihatin weşandin zêde dibûn. Herî dawî dema ew biribûn dadgehê, carek din li rûyê wê biryara îdamê xwendibûn. Şîrîn daxwaza parastinê kiribû, lê destûr nedabûn wê. Nehiştibûn parêzer jî were hêwana dadgehê. “Ji xwe girtiyan digotin; ev der ne hêwana dadgehê ye”, “hêwana şanoyê ye”. Qaziyê “dadgehê”, nedihiştin ji wî pêvetir kesek biaxive. Wî biryara her tiştî

dida û her tişt bi encam dikir. Di daneşîna dawî de Şîrîn ji bo ku biaxive xwedî angeştek mezin bû. Her çi qasî xwestin wê derxînin jî, daxwaza xwe ya axaftinê dubare kir. Qazî neçar mabû mafê axaftinê bide wê:

- Rêzdar Qazî.

- Tu dixwazî çi bêjî?

- Rêzdar qazî we heta îro mafê axaftinê nedaye min.

- Tiştekî ku tu bêjî tuneye.

- Rêzdar qazî, hûn nahêlin ez xwe biparêzim.

- Mijarek ku tu biparêzî tuneye.

- Heye.

- Heke tu lêborînê bipejirînî, ez dê mafê axaftinê bidim te.

- Çima lêborîn rêzdar qazî?

- Te tewanbariyeke pir mezin kiriye.

- Tu, tewanbariya min tuneye.

- Heye.

- Ez dixwazim xwe biparêzim.

- Na.

- Çima na?

- Destpêkê lêborîn, ango poşmanî.

- Rêzdar qazî ev çawa dadwerî ye.

- Em nimandina dadê dikin.

- Wê demê çima tu nahêlî ez biaxivim.

- Divê tu berê lêborîna xwe raber bikî.

- Rêzdar Qazî, tu dibêjî; “xwe mandêl bikî. Nasnameya xwe binpê bikî, giyana xwe bifroşî, mejiyê xwe tune bikî.

Ez dê dû re mafê axaftinê bidim te”, ma gelo wê demê tu dê mafê axaftinê bidî min an dê bidî mukurkarekê ku tu cudahiya wê ji mişkekî re nemaye? Heke tiştê tu dixwazî ez bikim, pêk bînim wê gavê pêwîstiya axaftinê namîne.

- Belkî tu rizgar bibî.

- Na ez rizgar nabim.

- Tê rizgar dibî.

- Ez dê heta mirinê mirî bim, ango tu dixwazî destpêkê min bikujî, dûre min berdî.

- Ma qey tu li xelasiya xwe nahizirî.

- Na ez li xelasiyeke wisa nahizirim.

- Tu li xelasiyeke çawa dihizirî?

- Xelasiyeke bi rûmet.

- Rûmet, rûmet…

- Belê.

- Dev ji van gotinên beredayî berdin.

- Na, ne wisaye rêzdar qazî.

- Wê mafê heta-hetayê dê doza min bidome.

Qazî bi dengekî bilind kenî:

- Ev mişka kor çi dibêje!

- Ez dibêjim ev doz bi dawî nabe.

- Çend rojên te man e, gava tu çiyî îdamê dê hemû tişt biqede.

- Ev doz, doza gelekî ye rêzdar qazî.

- Dema tu çûyî îdamê van gotinan bêje.

- Raste, hûn dikarin min îdam bikin. Ma hûn dikarin azadiyê jî îdam bikin, qet. Ma ew hêza we ya ku hûn azadiyê bibin sêdarê heye? Qet. Dê roj were hûn dê stûyê xwe

li ber azadiyê bitewînin. We Êhsan Fetahiyan îdam kir, ma hûn bi ser ketin? Qet. We xortê Araratî, Hesen Demir îdam kir, ma hûn gehîştin mebesta xwe? Qet û qet. Ma hûn dikarin çiyayê Agirî tune bikin? Qet. Hûn tucarî bi sernekevin rêzdar qazî. Lê em dê bi serkevin. Lê vê jî bizanibin ji bo ku biçim îdamê min tiştek nekiriye.

Bilez û bez Şîrîn ji hêwana “dadgehê” derxistibûn û cardin anîbûn girtîgeha Êvînê.

Di van rojên dawî de Şîrîn bêdeng bû. Gulav jî texliye bibû. Li menzelê tenê Şîrîn, Aso û Şînda mabûn. Tevî ku nivîsandina Şîrînê kêm bû jî, berdewam dinivîsand. Dîsa lênûska xwe vekiribû, kûr kûr hizirî bû û dest bi nivîsandinê kiribû:

“Dildara azadiyê, Jîn Rojhilat

Ez ji te re çawa bêjim û çawa binivîsim? Di şev û rojên girtîgehê de dilê min bê navber ji bo we lêdide. Salên borî, rojên me yên bextewer, kenên me yên li bin çiyayên bilind û serkêş bibîr tînim. Hê jana şaneya yek kesî di bedena min de bigere jî, bi hebûna wê jana hestiyên xwe ji bîr dikim. Ew silavên te yên germ, li vir bûn sedam ku karibim nefesê bistînim. Min berê di hinek pirtûkan de xwendibû, qala girtiyê îdamê dikirin. Ya rastî min zêde wate nedabû wan rêzên pirtûkan. Lê niha ez bi xwe girtiyeke îdamê me, îdam, Erê îdam. Gotineke sar. Gotinek erjeng. Lê rastiya vî welatî. Ez li vir têkoşîna jiyanê didim. Ez bi hebûna we hêzê digirim. Di mijara îdamê de pir zelalin. Di wê baweriyê de me, dê vê biyarê pêk bînin. Wê rojê hatin ji min re gotin; “xwe amade bike, îşev şeva te ya dawî ye”. Bêguman tu kes naxwaze biçe îdamê. Lê dema ku ji min re gotin, qet netirsiyam. Min li nava çavên wan nêrî û got; “hûn kengî werin ez amade me”. Min serê xwe şuşt û ketim nava bendewariyê. Asoyê ji min re seriyek penîr û pariyek nan anî. Lê qet mîdê min tune bû ku

xwarinê bixwim. Piştî çend deqeyan rabûm ser xwe û meşiyam. Xwîdana li ser canê min hêdî-hêdî zuha bibû. Şîndayê dixwest ji hêrsan biqîre, min nehişt. Dûre em têgehîştin ku ji bo êşan bi min bidin kişandin wisa kirine. Xemên min, diltengiyên min zêde bin jî nîgaşên min dîwarê girtîgehê derbas dikin. Niha êşên min weke lehiya biharê diherikin. Lê dilê min di nava zeryaya azadiyê de avjeniyê dike. Jîn, min pir bêriya we kiriye. Tu her şev mêvana dilê minî. Tu hemû çiyayan li dû xwe dihêlî û têye cem min. Rewşa te çawaye? Bawer dikim ku ew dilê te yê azad, roj bi roj hîn bêhtir mezin dibe. Dema te ev nameya min xwend ji dêvla min, li dîmenek nuwaze binêre. Min gelek bêriya dengê çûkan, dengê sîsirkên şevê û xume xuma dengê avê kiriye. Baş li dilê xwe binêre, silav keça dilberz. Silav Roniya Rojhilat. Silav Jîna bawermend. Ger min dilê te êşandibe bibexşîne Jîn. Bi hêviya rojên azad û bextewer Jîn…”

Şîrînê hêdî pênûsa xwe xiste nav lênûskê û xwest hinekî vehese. Lê Asoyê nehîşt. Aso kenî:

- Hiii.

- Şîrînê fam nekir ku Aso çi dibêje. Aso dîsa kenî.

- Hiii, kix, kix…

- Aso can.

- Hiii…

- Aso can ez nizanim tu çi dibêjî.

- İh ih ih…

- Tişta tu dixwazî bibêjî, li ser kaxezê binivîse.

Asoyê serê xwe hejand:

- Semîra…

- Êêê.

- Semîra xwişka mine.

Şîrîn bi çavên metelmayî got:

- Tu henekan dikî?

- Na, rast dibêjim.

- Ez li nêzîkatiya dayika Semîrayê ketibûn şikê, lê min qet ev texmîn nekiribû.

- Semîra xwişka min a heqe!

- Te çima jêre negot?

- Min bi zanebûn negot.

- Çima?

- Semîra keçeke hesas û nazenîne, ger min jêre ev rastî bigota dê gelek şikestiba.

- Bi ya min te bigota dê çêtir ba.

- Dilê min ranekir.

- Te çawa fam kir ku hûn xwişkên hevin.

- Roja ku çûbû serdanê, qala min dike. Dayika me dest bi lêpirsînê dike. Semîra jî bi berfirehî qala min dike.

- Çawa tu ji malê veqetiyayî.

- Mijar dirêje, ez dê dawiyê ji te re bêjim, lê…

- Lê çi.

- Qet devê min nagere ku qala wê demê bikim….

- Aso can, ez dixwazin serpêtahiya te bibihîzim, lê ger tu nexwazî nebêje, tiştek nabe.

- Na, na ez dê bêjim.

- Spas.

- Dema ez heşt salî bûm, Semîra bi çarpiya dimeşî, rojekê bavê min, dema me şîv dixwar, li min nêrî û got:

- Keça min, em neçarin te bişînin kar.

Ya rastî min nizanîbû kar çiye û ez dê ji bo karekî çawa biçim. Hê hefteyek neqediyabû, ji Urmiye du kes hatin û ez bi xwe re birim. Wexta ku ez dibirim pere dan bavê min, dema bavê min pere dijmart dikenî. Min tu wate nedida helwesta bavê xwe. Dayika min kirasê xwe diqetand, digiriya. Nedixwest min bişîne. Lê bavê min digot; " hurmet, xwe nafîre, dê dîsa were mala xwe".

Wexta ku em gehîştin Urmiyê, ez radestî malbateke dewlemend kirim. Gotina ku min ewilî bihîst ev bû; "me tu kiriye. Êdî tu dê ji bo me bixebitî". Min zêde wateya van hevokan fam nedikir. ji ber ku ez zêde westiya bûm. Wê şevê heta sibê razabûm. Lê jina malê ez bi dengekî erjeng hişyar kirim û got; "tu ji bo razanê ne hatiye vir. Me ewqas pere dan, rabe ser xwe û zû here bixebite". Ez yekser birim cihê kar, şeş heft keçê di temenê min de li wir dixebitîn. Karê me çêkirina tayê xalîçeyan bû. Carinan bi zikê têr, carinan bi zikê birçî, em radizan. Bi salan jiyana min wisa derbas bû. Heta ku beşdarî nava partiyê bûm wisa dijiyam.

- Qet malbatê li te nedipirsî?

- Na.

- Çima?

- Belkî dixwestin min ji bîr bikin.

- Tu ji vê yekê bawerî?

- Belê Semîrayê ji min re got; "Navê xwişka min a mezin Aso bû. Lê di qezayekê de jiyana xwe ji dest daye". Biqasî min fam kir ji xwişk û birayên min re wisa gotine.

- Ez nabêjim, çawa wisa kirin?

- Semîra hinek qala malbatê kir. Dewlewend bûne û Kurdîtiya xwe veşartine. Bavê min mirovekî kone û fêlbaze.

- Hiii.

- Semîra hinekî cuda mezin kirine.

- Xwezî te hemû tişt ji Semîrayê re bigotiba.

- Min dê bi vî zimanê xwe yê jêkirî çawa ev tiştên sotînêr jêre bigota…

- Semîrayê gelek ji te hez dikir.

- Belê.

- Heke dayika te baş fam bike gelo dê çi bike.

- Nizanim.

- Wê were an na?

- Bawer nakim.

- Çima tu bawer nakî

- Ez jî naxwazim were.

- Çima Aso can.

- Ez naxwazim min di wê rewşê de bibîne.

- Aso.

- Çiye?

- Te gelek helbest nivîsandine?

- Belê.

- Ez dê hemûyan bixwînim.

Aso kenî:

- Pir bextewar bûm.

- Aso xan qet bêhna xwe teng neke.

Aso bi awayekî şid bi destê Şîrîn girt, mîna zarokekî ku xwe bavêje stuyê dayika xwe, Şîrîn hembêz kir.

Di wê kêliyê de Şînda hat:

- Çay amadeye.

Her sê li dora masê rûniştin, him sihbet dikirin û him jî çaya xwe vedixwarin…

*    *    *

Şîrîn di rojên dawî de, rûpelên lênûska xwe bi rojnivîskan dixemiland. Tiştên dihat serê wê dinivîsî. Ango tiştên ku bi serê wê hatibûn dinivîsîn. Car caran jî jiyana xwe ya li ser devê şûr dinivîsand. Îro cardin rahiştibû pênûsa xwe û dinivîsand. Şînda û Asoyê jî pirtûk dixwendin. Şînda him dixwend, him jî nîşe digirt. Şîrînê carinan beşên ku nivîsîbûn, dubare dixwend.

**5ê Avrêla 2010ê**

Çend rojin kişik dane me. Berê qet kêfa min ji lîstika kişikê re nedihat. Bi dilrihetî dikarim bibêjim gava min textê kişikê didît, di hundirê xwe de pir aciz dibûm. Çawa? Ji ber ku zilam şev û rojan dilîstin û jin jî dixebitîn. Jiyana zilamên gundê me li ser textê kişikê derbas dibû. Serê xwe pir li ser kişikê diêşandin. Lê serê wan pir hişk bû. Gava ku dilîstin têkiliyên xwe ji cîhanê qut dikirin. Bavê min jî nexweşê kişikê bû. Dema ji bo lîstikê rûdinişt nedizanî rabe. Wê rewşê dayika min tengezar û hêrs dikir. Lê tiştek ji destê wê nedihat.

Beriya çend rojan wexta ku textê kişikê dane me. Min ji nişkêve bertek nîşan da. Ez aciz bûm, min got demildest bibin. Kesa ku alavên kişikê anîbû, mat û metelmayî li min nêrî. Weke ku bibêje, “em qenciyekê dikin, lê ev bersiva qenciya me nîne”. Şînda bi gavên lezelez hate cem minû got: “Kişik ji bo me başe bila bîn in”. Şînda alavên kişikê ji destên wan girt û vegeriya hundir. Hema di wê kêliyê de Şînda textê kişikê saz kir û bangî Asoyê kir; “Ka were were ez te têk bibim”. Min xwe ranegirt û got; “ma qey tu jî pir ji lîstika kişikê hez dikî” Beyî ku bihizire bersiva da; “Erê”. Heta vî emrê xwe min destê xwe nedabû kevirên kişikê. Rojên destpêkê Aso û Şînda berdewam dilîstin. Min jî li wan temaşe dikir. Lê Şînda qet Aso têk nedibir. Ji ber vê yekê Şînda hêrs dibû, xwe aciz dikir. Belkî bi we balkêş were, ez pir zû hînî lîstika kişikê bûm. Li girtîgehê mirov bixwaze hînî çi bibe, di nava bîst û çar saetan de hîn dibe. Îro ez û Şînda bi hevre lîstin, Şînda pir bi angast bû, ji bo ku min têk bibe xwe amade kiribû. Lê mixabin ew têk çû. Beriya niha bi demekê min pirtûka *Paulo* Coelho ya bi navê “Şervanê Roniyê” xwendibû, ew beşa ji bo kişikê nivîsî bû, min ji Şîndayê re vegot:

- Tu dizanî *Paulo* Coelho derbarê lîstika kişikê çi dibêje?

- Na, nizanim.

- Dibêje; Textê kişikê cîhane; kevirên kişikê tevgerên me yên jiyana rojane ne. Rêzikên lîstikê jî zagonên xwezayê ne. Em lîstikvanên li hember xwe nabînin, lê em dizanin herdem lîstikê adîlane, bi sebir û bi duristî dilîze.

Şînda kenî û got:

- ***Coelho*** xweş gotiye.

- Raste xweş gotiye, lê di jiyana rastîn de qet dadwerî tuneye. Tenê li ser textê kişikê dadgerî heye. Balkêşe vî

welatî textê cîhanê afirandiye li gor Coelho! Lê bi qasî misqalekî dad tuneye.

Ji ber ku min Şînda têk biribû Aso pir keniya bû. Min û Aso li dijî Şîndayê tifaqek xurt çêkiribû. Ger hûn rastiyê bixwazin ev rewş li gor dilê Şîndayê jî bû. Bi kurtasî dixwazim bêjim, min jî ji kişikê hezkir. Ger dayika min bibihîze ez bi kişikê dilîzim dê çi bihizire gelo?

Îro qet îdam nehate bîra min. Min di dilê xwe de got; “gelo ji ber ku ez hîn bêhtir nêzî îdamê dibim, êdî nayê bîra min. Çavkaniya min a hêzê Asoye. Ew lale, bêzimane, lê mirova herî bextewar ya vê cîhana bêbexte. Carinan ji xwe re dibêjim xwezî ez û Aso bi tenê li giravekê jiyaban…Û min bi şev û rojan helbestên Asoyê xwendiban. Lê baş dizanim tiştekî wisa ne pêkane. Lê heke mirov li ber îdamê be jî nîgaş xweşin. Pir xweşin.

Min bêriya Semîra û hevalên din yên ku ji vir texliye bûne kiriye. Ji bo Semîrayê ez di nava mitalan de bûm, lê piştî ku min bihîst Semîra geheştiye cihê xwe bextewar bûm. Gelo dema Semîra, ji Sînema Dimdimî û Jîn Rojhilat re qala min kir, çi bertekek nîşan dan? Xetên rûyên wan çawa bûn? Kîjan hevok bi kar anîn? Gelo Sînema Dimdimî giriya? Nizanim bê çima ev tişt tên bîra min, lê dema mirov nêzî îdamê dibe her tişt tên bîra mirov. Duh min navê hemû hevalên xwe yên serdema zaroktiyê hejmartin. Mînak, alavên di hundirê mala me de, yek bi yek hatine ber çavên min; xaniyê me li taxa jora gund, pişta xanî li latek mezine, bin hinekî vala ye, di navbera xênî û latê de kêzînek heye, zivistanan av ji vê kêzînê diherike. Xaniyê me ji çar juran pêk tê. Jura mêvanan, jura razanê, jura rûniştinê û jura kekê min. Hewşeke mezin li pêşiya xaniyê me heye, hewş bi kevirê mezin û çarqozî hatiye lêkirin. Dîwarê hewşê biqasî bendekê bilinde. Ser dîwarên hewşê bi pejikên daran hatiye nixumandin. Deriyê hewşa me

mezine û deriyekî darîn li bere. Li qorziya hewşa me ya rojhilat darek tûyê heye, tûyên wê reşin û bi qasî tiliya girdekê stûr. Zaroktiya min li ser guliyên wê dar tûyê derbas bûye, carna min lêvên xwe bi ava tûyan sor dikir, beriya ku bavê min bibîne min demildest lêvên xwe dişuşt. Xaniyê me bi hosteyî hatibû lêkirin. Li gor dapîra min digot; kalê min bi tena serê xwe di nava çar salan de xanî ava kiriye. Ji ber vê yekê dapîra min herdem digot; "zarokno, xanî aramiya mirove, ger aramî tunebe wateya jiyanê jî tune ye". Dapîra min mijar hinekî pirole dikir. Di bin van gotinên wê de, daxwaza ku em ji kalê xwe re şikir bikin hebû. Lê bi rastî jî xaniyê me xweş bû. Gava ku dar hijîrên me pel vedikirin, hinarên me kulîlk didan, bahîva li pişta xaniyê me ku di bin quntara latê de koka xwe berdabû nava dilê axê, bi kulîlkan dihat xemilandin, mirov xwe di nava bexçê bihuştê de didît. Ji ber vê yekê dapîra min ne neheq bû. Di serdana dawî de dayika min ji min re got; "ev du salin hinarên hewşê kulîlk venadin". Dapîra min gotiye; "ji ber Şîrînê ketine şînê û reş girêdane, ji ber vê yekê kulîlkan venade". Gava min ev bihîst pir xemgîn bûm. Ji ber ku tucarî hinarên me bê kulîlk nemabûn. Kengî demsala biharê hatiba ji kulîlkan dibûn xwîn. Min ji dayika xwe re got; "dibe ku ji ber nexweşî mexweşiyan be, ne ji bona mine, bila dapîra min wisa nehizire û xwe xemgîn neke". Lê pêhesiyam ku dayika min jî heman tiştî dihizire.

Ez li jura malê ya rojhilat hatime dinyayê. Em Rojhilatî ji odeyan re dibêjin jur yan jî menzel, başûrî jî dibêjin menzel, bakurî jî dibêjin ode an jî menzel. Mezela ku lê welidî me ya herî mezine. Du şibakên mezin têde hene. Saeta dîwar bi şev û roj çirke çirkê dike. Dîwarên menzelê bi xalîçeyên bi wêneyên Nebî Elî û bi wêneyên xezalan hatiye xemlandin. Di dîwêr de taqeke biçûk heye, di hundirê wê taqêde radyoyek ji demên kevin maye. Li pêşiya şibakê dara hijîrê heye. Dema mirov li ber şibakê

rûdinê bêhna pelên dar hijîran difûre ser çavê mirov. Bêhneke wisa xweş, mirov qet jê têr nabe. Ez berdewamî li ber wê şibakê rûdiniştim û li dervê dinêrî. Di van rojên dawî de ew bêhna xweş pir tê bîra min.

*       *       *

## 10 Avrêla 2010ê

Beriya sê rojan dîsa hatin bangî min kirin, gef li min xwarin. Ji bo ku lêborîna xwe ji wan bixwazim her tişt kirin. Lê min nepejirand. Daxwaza wan ew bû ku ez di hafa dadgehê de bi stuxwarî ji wan lêborînê bixwazim. Lê ez baş dizanim ku mebesta wan ne efûkirina mine. Mebesta wan ewe ku di kesayeta min de; Kurd bûna min, neteweya min û nirxên min biçûk bixin. Bi gotineke din dixwazin jiyana min bê wate bikin. Carinan ji westandina min dixwazin sûd bigirin û di kêliya ku ne amade me, tiştan bi min bidin gotin. Min fam kir ku ew li derfetekî wisa digerin. Bi şev û roj li benda keyseke wisa ne. Pêşiyan vala negotine "av radizê, neyar ranazê". Carina li vir di kêliyên lêpirsînê de gotinên herî xweş û nerm dibêjin. Dixwazin mirov ji wan bawer bike. Ji dilqekî dikevin dilqekî. Li ber çavê mirov îlîzyonê dikin. Lê çavên wan yên ne dilsoz hemû tiştî derdibirin. Jîn Rojhilat herdem digot; "ji mirovên bêbawer bawer nekin, ji ber ku ew bêbawer in". Birastî jî wisaye. Biqasî misqalekî baweriya wan bi mirovahiyê tuneye. Nirxekî wan yê pîroz tune. Tenê mebesteke wan heye, mirov jî bînin asta xwe.

Hemû hewildanên wan ji bona vê yekê ye. Lê herdem têk diçin, wînda dikin.

Li gel hemû hewildanan min daxwaza wan nepejirand. Cardin bi tundî gefa îdamê li min xwarin. Jixwe îdam bûye perçeyek ji jiyana min. Kengî bangî min dikin, ez dibêjim vê carê cara dawiye. Xatir ji hevalê xwe dixwazim û diçim.

Gava min lêborîn red kir, bi çavbendeke reş çavên min girêdan, ez birim cihekî nediyar. Bi saetan li ser lingekî rawestiyam, tevî ku lingê min birîndar bû jî ez duçarî li van tiştan rast hatim. Birîna lingê min vebû, xwîn jê herikî, êşeke bêhempa di bedena min de geriya. Destpêkê mîdê min xeliya, dûre ji nişkave hilweşiyam. Serê min li dîwarê şaneyê ket, wê gavê têgehiştim ku ew şane, şaneyek hewrekdare. Bêhna min dernediket, serê min gêj dibû, min dixwest heta hêza min heye biqîrim. Lê mîna ku zimanê min hatibe jêkirin, dengê min dernediket. Min çavbend ji ser çavê xwe da alî, hundir ewqasî tarî bû, çav çavan nedidît. Heta îro min tariyeke wisa nedîtibû. Ji nişkave ketim nava gumanan, min di dilê xwe de got; “ma gelo çav di serê min de tuneye, gelo roniya çavê min qediyaye”. Bi destpelankî hinekî bi paşve çûm. Serê min li dîwarê şaneyê ket û bi şûn de pengizîm. Pir tî bibûm. Zimanê min ji tîna werimî bû, devê min zipîzuha bibû. Êşa lingên min berdewam bû. Bêhneke cuda gewriya min dişewitand. Nizanim ew bêhna çibû. Lê dişibiya bêhna sîrê. Bêhneke gelek dijwar bû. Derî vekirin:

- Tu çima ewqasî rikdarî?

- Ez ne rikdarim.

- Em ji te re dibêjin hevokekê bibêje û xwe xelas bike. Lê tu…

- Hûn ji min hevokekê naxwazin.

- Em çi dixwazin?

- Hûn rûmeta gelekî ji min dixwazin.

- Dev ji van tiştên dîno mîno berde.

- Jixwe hûn an me dîn dibînin, an jî “terorîst”, lê em ne herdu ne jî, em Kurd in û daxwaza rûmeta xwe dikin.

- Ma tu dixwazî biçî îdamê?

- Na.

- Wê demê ev çi helwestin?

- Ji dêvla ku ez lêborîna xwe bixwazim û heta dawiya temenê xwe her roj biçime mirinê, ango biçim îdamê, ez dê carekê biçim îdamê ma ev ne çêtire? Hûn dixwazin gelê min di kesayeta min de heta heta îdam bikin.

- Ka te digot tukes nikare Kurdan îdam bike.

- Lê dema ez lêborînê bixwazim, dê heta hetayê gelê min li ber îdamê be û ez jî dê her roj biçime îdamê…

- Tu kes bi îdama te nizane.

- Dê hemû cîhan bibihîze….

- Dev jê berdin, ka wê bînin şaneya din.

Ez birim şaneyeke fireh. Heta niha min tu şaneyeke wisa mezin nedîtibû. Şibakeyeke mezin tê de hebû, min şibake vekir. Li pêşberî min hêwaneke fireh xuya bû. Li hundirê hêwanê tevgerek hebû, lê çavên min baş nedidîtin. Ji bo ku baş bibînim, min çavên xwe bi kefa destê xwe mist da û cardin mêze kir, min dît ku jinek qelew, şilfîtazî, ku pêsîr û qorikên wê mezinin di nav du kesan deye, her yekî bi milekî wê girtibûn û ber bi cîhekî nediyar ve dibirin, gava dimeşiya kesê sêyemîn bê navber bi qamçî li qorikên wê yên tazî dixist, lê balkêş bû jinik qet ne digiriya, tenê hêsir ji çavên wê dihat. Diyar bû ku jêre gotibûn neqîre. Hê dîmenên wê jina qelew li ber çavên min neçûbûn, ku hatin ez birim menzelê ango cem Aso û Şîndayê. Di rê de ji min re gotin; “ew jina ku te dît wê îşev

biçe îdamê”. Lê weke ku min tiştek nebihîstibe, bêdeng mam.

Ez ji we re tiştekî bibêjim; girtiyên li ber îdamê bin naxwazin zêde biaxivin û naxwazin bersivê bidin her pirsê. Carinan Şînda ji min pirsan dike, lê weke ku min nebihîstibe tevdigerim. Mirov xwe di bin barekî giran de dibîne. Lê Asoyên mirov, hestên mirov pir zelalin. Ez çi dibînim, çi dibihîzim, çi dixwînim, di bîra min de bi cih dibe û ji bîr nakim. Niha dixwazim bi şev û roj binivîsim. Ji ber ku kengî radihêjim pênûsê xwe di nava aramiyê de his dikim.

Dema vegeriyam menzelê, min dît ku Aso nimêj dike, heta wê rojê min qet nedîtibû ku Aso nimêj kiribe. Roja înê bû û nimêja Asoyê pir domand. Tê gehîştim ku duayan dike. Bi çavên matmayî min lê temaşe kir. Rûyê Asoyê di nava aramiyek bêhempa de bû. Aso sicaca xwe pêça û hate cem min, dikenî, bextewer bû. Êdî em bi riya îşaretan bi hevre diaxivîn.

- Şîrîn.

Dûre xwe avêt stuyê min, heta hêz di milên wê de hebûn ez hembêz kirim:

- Tu çawayî?

- Başim.

- Min gelek tu meraq kirî.

- Xemgîn nebe vaye ez li cem te me.

- Ez vêcarê gelek tirsiyam.

- Aso can.

- Hii…

- Tu xwe pir diêşînî.

- Na, na…

- Nikarin tiştekî bi min bikin.

- Min got qey vêcarê birastî tu birine sêdarê.

- Ji min re gotin em te dibin îdamê, lê ez birime şikencê.

- Min pirsa te kir, gotin êdî li benda wê nemîne, ew hate îdam kirin.

- Ji niha û şûnde li wan guhdar û bawer neke.

- Min demildest serê xwe şuşt û dest bi nimêjê kir. Min pirtûka piroz jî xwend.

- Gelek spas dikim Aso can.

- Tu jî li ber nekeve.

- Aso can.

- Çiye?

- Heta îro, min qet nedixwest li ser îdamê biaxivim, lê dixwazim, hestên xwe bi te re parve bikim. Roja ku min gava xwe avêt nava vê tekoşînê, min xwe ji hemû tiştî re amade kiribû. Lê tu rastiyê bixwazî qet û qet îdam nehatibû bîra min. Lê vaye îro îdam pir nêzî mine. Her roj berê wê li ser serê mine û dixwazin safeke bêdawî di hundirê min de çêbikin. Lê çawa bêjim, safeke ku naşibe tu safan, cuda. Safeke bêdeme. Heta niha min bawer nedikir min îdam bikin. Lê êdî bi rihetî dikarim bêjim, biryara wan teqeze. Ez jî amade me. Gava biçim îdamê ez dê nehêlim çongên min bilerizin.

- Duh min li radyoyê guhdar kir, Semîrayê name şandibû, qala te dikir. Digot; “Ji bo îdamê asteng bikin, ez dê bi şev û roj bixebitim. Dîsa digot, em dê vê mijarê bixin rojeva qada navnetewî…”

- Xwezî min jî namaya Semîrayê guhdar kiriba.

- Belkî careke din jî binivîse.

Aso ji bo min xemgîn dibe. Ji ber vê yekê heta ji destê min tê li cem wê dikenim. Ez qet qala êşên xwe nakim. Aso rûyê mirovahiyê yê germe û wîjdana Rojhilata Navîne.

Îro dehê Avrêlê ye û fam dikim ku zivistan qediyaye, bihar hatiye. Lê li vir hemû demsal dişibin hev. Salê duwanzde mehan şikence heye…

Gava din menzela cîranên me agahî dan me, bi rastî ew jina qelew û şifîtazî îdam kirine. Wexta min bihîst, min di dilê xwe de got; "Gelo esaleta îdamê jî nemaye li vî welatî, him hûn dibin îdamê, him jî hûn tazî dikin û şikenceyan lê dikin". Ew hêsrên wê yên bêdeng û bi tenê ew çavên wê yên ku roniya wan vemirî û ew hewara wê ya bêdeng û birîndar… Ew porên wê yên reş ku mîna qetranê bûn û li ba dibûn, ew nêrînên wê yên bê hêvî û nîvcomayî hate ber çavê min û ez li wê roja ku dê min tê de îdam bikin hizirîm, kûr û dûr noqumî nava ramanan bûm. Herî dawî min di dilê xwe de got; "neçarî çi tiştekî dijware, li ser rûyê vê dinyayê".

## 11 Avrêla 2010ê

Aramî çi hestekî xweşe, mirov ber bi bexteweriyeke bêdawî ve dibe û deriyên nû li ser mirovan vedike. Îşev di nava arambexşiyeke bêhempa de me. Aso helbesta xwe ya bi navê; "Kêzika min a qidoş" ji min re anî, bi rastî dema min xwend xwîna di rehên min de, bi lezelez diherikî û kelecaneke ku heta îro qet nejiyabûm, laşê min dîl girt. Helbesteke gelek xweş bû. Aso bi Kêzika Qîdoş re ketibû nava dîdareke bêhempa. Kêzika Qîdoş ketibû xeweke giran. Asoyê bi bêjeyên xwe wê ji xewa mirinê hişyar dike, lê Kêzika Qîdoş xeyidiye, naxwaze bifire, naxwaze bimeşe,

naxwaze daxwaza Asoyê pêk bîne. Lê Aso bêwest û rawest jê re hevokan rêz dike, heta ku Kêzika Qîdoş difirîne û Aso dibêje min ew bi helbestekê firand. Dibêje min bêje afirand û ew firand. Aso hosteya bêjeyêye. Geroka peyvê ye. Gencîneya helbestê ye. Bi hevokên xwe mirov dilerizîne. Bi cezbê dixe, sermest dike. Kengî ez helbestên wê dixwînim baskên min çê dibin û ber bi stêrkan ve difirim. Çavên min û çavên stêrkan li hevdu dikevin. Hêsrên stêrkan yên bexteweriyê bi ser porê min de diherike. Hemû bargiraniya min diçe. Xwe li ser pêlên behreke bê ser û ber dibînim. Aso weke Homerose. Berê xwe dide xwezayê. Xwe berdide kûrahiya xwezayê. Di guhê axê de dike piste pist. Ji dilopên baranê re dilorîne, axîna kevir û beran radibihize û bi hevokên xwe, bi çarînên xwe berê xwezayê sivik dike. Wê rojê Aso hate cem min, pênûs di dest de bû, dikenî û got; "min zimanê xwe wenda kir, lê min pênûs qezenc kir. Tu hêz nikare pêşiya pênûsa min bigire". Aso , hemû tiştî watedar û nirxdar dike.

Min îşev şibake vekir û li derve nêrî, asîman sayî û zelale. Stêrk geş û gelekin, dibiriqînin. Şev bêdenge, bêhna biharê tê. Şînda jî hate cem min. Em axivîn û keniyan. Dûre min ji Şîndayê re qala biranîneke xwe kir:

Em nû çûbûn çiyê. Ez gelek bi kelecan bûm. Ji bo ez têkevim çavên hevalan, vir de wê de baz didim. Carinan pir diwestim. Lê qet ne xema mine. Nemaze ji çûyina avê çêj digirim. Gava diçûm ser wan kaniyên ji rojan, dîsa ava me nemabû. Jîn Rojhilat bangî min kir, ji min re got; "em dê çayê çêkin, lê ava me qediya ye". Demildest min rahişt galonan:

- Ez dixwazim biçim avê.

Jîn Rojhilat kenî:

- Lê tu cihê kaniyê nizanî, tu dê çawa biçî?

- Hinekî ji min re rave bike bese, ez dê kaniyê bibînim.

- Başe, tu vî girî derbas bikî, dê latek derkeve pêşiya te, tu xwe nêzî lat bike dê mêşeke hinguv bibînî, dê li wê mêşa hinguv binêrî, ew mêş dê bifire û ber bi hêla kaniyê ve bifire. Tê bide dû wê mêşê, ew bi ku de biçe, tu jî bi wê hêlê ve bimeşe, dema mêş ji ber çavên te wenda bû, dê şiverêyeke pir teng û zirav derkeve pêşiya te, beriya ku tu di wê şiverêyê de bimeşî, berê lingê xwe yê rastê bavêje, teqez vê ji bîr neke, heke tu destpêkê lingê xwe yê çepê bavêjî tucarî tu kaniyê nabînî. Dema tu meşiyayî qet li aliyê jêrîn nenêre. Berdewamî li liyê jorîn binêre. Beriya ku tu xwe bigihînî serê şiverêkê, dê dar hijîrê derkeve pêşiya te, tu dê marekî dirêj ku bin zikê wî zere bibînî, mar wê li te binêre û derziya xwe derxe, lê weke te ew nedîtibe, tu dê di ber re derbaz bibe. Ger mar fam bike ku te ew dîtiye dê li dû te bê û wê te bişopîne. Dema tu gihiştî serê şîverêyê dê dareke mazî derkeve pêşiya te, ew dar gelek kevne. Hundirê wê vala ye, li ser guliyekî wê hêlîneke çûka reşbelekê heye, ger tu guliyekî wê hêlîna çûka sîngezerî heye ku li ser guliyekî wê hêlîna çûka cûn heye û li ser guliyekî wê hêlîna kevokşînekê heye; di wan hemû hêlînan de hêk hene. Heke tu zanibe di kîjan hêlînê de çend hêk hene, ger tu bi hejmara wan hêkan bizanî, tu dê kaniyê bibînî. Gava te ev azmûn derbas kir û tu deh deqeyên din meşiyayî, wê ji dûr ve dara sewûlê xuya bike. Divê tu xwe bigihînî wê dara sewûlê. Tu çiqasî ber bi dara sewûlê ve bimeşî, ew dê hîn bêhtir ji te dûr bikeve. Belkî tu heft şev û heft rojan bimeşî, lê tu dê xwe bigihînî dara sewûlê. Dema tu gihîştî ew dara sewûlê divê tu bikenî, ger tu nekenî, dê kanî zuha bibe û dê destvala vegerî.

Dema Jîn Rojhilat hevoka dawî vegot; em bi dengekî bilind kenîn. Hevalan av anî bû, çayê dem kiribûn, lê ji bo ku neçim avê Jîn Rojhilat çîrokeke wisa lê anî bû, ji ber ku xweşa min jî çûbû, bi baldarî min guhdarî kiribû. Ax Jîn ax.

Min gelek bêriya wê kiriye. Ew kenê wê yê germ, ew çavên wê yê ku hêvî ji wan diherikîn, nêrînên wê yên bawermend, hêrsa wê ya mezin a li dijî serdestiyê. Jîn Rojhilat keça çiyan, keça dilazad.

Piştî min û Şîndayê têr li asîman nêrî, em vegeriyan cem Aso. Çay amade bû, me tevde ça vexwar.

**13 Avrêla 2010ê**

Duh Aso ji min re got; "çi dibe, çi nabe nameyekê binivîse". Wexta ku ev hevok ji lêvên wê derketin, xetên rûyê wê yên xemgîn ji nişkêve diyar bibûn û kaniya çavên wê tijî hêsir bibûn. Kî/ê dizane ji bo ku Aso van hevokan ji min re bêje çend rojan hizirî bû. Çiqasî dilê wê êşa bû, lê mirov nikare ji rastiyê bireve. Êdî ew jî vê rastiya îdamê dipejirîne, ango dizane ku dê min îdam bikin. Ji ber vê dixwaze, ez li dû xwe nameyekê bihêlim. Qet tiştekî wisa nehatibû bîra min. Ya rast ez nizanim dê çi binivîsim jî, qet tiştek nayê bîra min. Lê pêwîste ez daxwaza Asoyê pêk bînim. Belkî ji dayika xwe re nameyeke kurt binivîsim, an jî ji hevaleke xwe re. Niha tiştek di dilê min de tune. Gelo ez ji wan re qala çi bikim? Gelo ez ji wan re wasiyetnameyekî bihêlim an na? Lê ez dê hewil bidim beriya îdamê çend hevokan binivîsim. Herçiqas mirov nexwaze li ser roja îdamê bihizire jî, cardin jî ew ramanên sotîner mîna baranê bi ser mirov de dibarin. Leyla Qasim pir tê bîra min. Lehengiya wê di nava pêlên mejiyê min de olan dide. Min serpêhatiya wê, di temenê zaroktiya xwe de bihîstibû û vaye îro dîsa ew li ba mine. Şevêdin min ew di xewna xwe de dît, dikenî û ji min re digot; "Şîrîn tu bi xêr hatî".

Duh cardin biryar anîn, tê fam kirin, amadekiriyan dikin. Wisa xuyaye dê di demek nêz de biryara xwe bixin meriyetê. Ji bo girtiyên ku li benda îdamê ne dem tuneye. Tenê dema nefesê distînin, bêhtir wateya demê fam dikin, dîsa dem, roj, saet û çirk mîna avê diherikin û diçin. Her tişt bi lez weke birûskê lê tê. Şev û roj mîna tava barana biharê tên û derbas dibin. Tiştekî balkêşe, van rojên dawî de xewgiran bûme. Carna dema diçim xewgehê, di nava çend deqeyan de radizêm. Heta Aso yan Şînda min hişyar nekin ji xweber bi xwe nahesim. Berê berovajî vê, qet xewa min nedihat.

Îro baraneke gelek xweş barî. Aso û Şînda heta dawiyê li bin baranê geriyan. Şilo pilo bibûn. Asoyê carna berê xwe dida esman û baran dilop bi dilop li ser rûyê wê cih xweş dikir. Min jî gelek dixwest wî karî bikim, lê ya rast min ew hêz di xwe de nedidît.

## 15 Avrêla 2010ê

Şînda jî texliye bû. Duh piştî xwarina nîvro agahiya texliya wê anîn. Gava Şînda çû gelek giriya. Nedixwest ji me veqete. Wisa xwe li min pêça bû, qet nedixwest min berde. Dema çû em jî xemgîn bûn, lê kêfxweşiya me zêdetir bû.

Dema Asoyê henek bi wê dikirin, jê re digot; “keça Hewranî”. Şînda gelek xweş direqisî, carina kincên gelêrî li xwe dikir û weke Sarya Serhedî radibû reqsa drama dikir. Gelek baş direqisî, gelek. Gava porê xwe yê dirêj li ba dikir, dikete nava efsûniyeke bê dawî û mirov nedixwest çavê xwe ji wê ba bide. Cardin mîna herdem Asoyê jê re got; “keça Hewranî vaye tu diçî û em dimînin”.

Şînda nekarî pêşiya herikîna hêsrên xwe bigre û bi çavên tijî hêsir li min nêrî:

- Şîrîn can.

- Bêje.

- Em dê teqez hevdu bibînin.

- Erê, em dê di demek pir nêz de li çiyayan hevdu bibînin.

- Raste.

- Şînda can, baş li xwe binêre.

- Tu jî.

- Silavan bêje.

- Temam.

- Bila heval ji bo min xemgîn nebin.

- Şîrîn can weke din daxwazeke te hebe bêje.

Hindik mabû, ku min bigota; “bila cendekê min li gundê min veşêrin” lê di kêliya dawî de min negot. Ji ber ku min ji Şîndayê re gotibû em dê hevdu bibînin.

- Erê daxwazek min heye.

- Bêje.

- Gava tu derketî derve ji dêvla min bi pêxasî li ser axê bigere.

- Başe.

- Û heta dawî li çiyayên bilind binêre.

- Weke din?

- Li daristanan, li çeman, li kaniyan binêre.

- Başe.

- Daxwazek min a din jî heye.

- Bêje.

- Here mala me û biraziya min Şîlanê ramûse.

- Tu jî pir baş li xwe binêre.

Şînda bi hêsrên çavan de xatirê xwe ji me xwest û çû. Min hêdîka di dilê xwe de got; “Şînda ji te re vexer be”. Ji ber ku ka careke din me dê hevdu bidîta yan ne qet nediyar bû. Herçiqas qet hêviya min ku cardin em hevdu bibînin tunebe jî, carina ji xwe re dibêjim belkî îdama min rawest û ev neheqî pêk were. Şînda tu jî çûyî, vexêr be ji te re keça Hewranî....Vexer be. Te dilê me ji bi xwe re ber bi wan çiyayên bilind ve bir…

**16 Avrêla 2010ê**

Roj bilind bû li Rojhilat. Tava vê meha biharê rûyê min, pora min mist dide, radimûse. Dilê min hêdî-hêdî serê xwe hildide û dikene. Kelecana hundirê min dikele. Lê tênagehim rengê kelecana di hundirê min de çawaye? Îro gelek zû ji xewê hişyar bûm. Îşev min xewneke ecêb dît, ez li ber şibakeyekê rawesta bûm. Jura ku ez lê dimam zêde ne mezin bû, lê menzeleke xweş bû. Hundirê jurê bi wêneyê Kemal Pîr, Zeynep Kinaci, Mazlûm Dogan, Ferhat Kurtay, Mahsum Korkmaz, Serok Abdullah Ocalan, Sema Yuce, Leyla Qasim û gelek wêneyên dinhatibû xemilandin. Ez gelek bextewer bûm. Min şibake hêdî-hêdî vekir. Di şibakê re bayekî hênik, xweş û arambexş xwe berda hundir. Min li derve dinêrî, zeryayek zelal, şîn û bêser û ber derdikeve pêşiya min. Tîrêjên tavê li ser pêlên zeryayê diçûrisîn. Çavê min dibiriqîne. Tu sewt û pejnek nayê. Deng tune ye. Hemû tişt di nava bêdengiyê de ye. Ez li avê û tîrêjên tavê dinêrim. Dîmeneke xweşike, dîmen-

eke xwezayî. Deriyê jurê vedibe, Jîn Rojhilat dikeve hundir.

Dikene, lê naaxive. Rûyê wê weke rûyê zeryayê zelale, arame. Ez ji kêfan difirim, Jîn hembêz dikim. Jîn hêdîka ji min re dibêje; “vaye ez hatime te bibim. Em dê îşev li keştiyê siwar bibin û biçin. Hevalan pir bêriya te kiriye”. Gava ku min xwest cardin Jîn hembêz bikim, hişyar bûm. Ez li xewgehê û bi tenê bûm. Min tu carî xewneke ewqasî zelal nedîtibû.

Min û Aso tevde pirtûk dixwend, niha em bi tenê mane. Lê Aso mîna deh kesaye. Carna di dilê xwe de dibêjim; “niha zimanê Aso heba û em bi dengekî bilind bikenîn, biqîriyan!”. Ez jî niha mîna wê bêdeng bûme. Duh ji min re got; “gava bêdengiya min û te dibe yek gerdûn dibêje. Çiya di nava xem û şermê de dixengîn e. Bêdengiya jinekî ji bo mirovahiyê cezayê herî girane. Lê bêdengiya me dengê herî bilind e”.

Îro ez hinekî kûr hizirîm; ger mirov di riya serfiraziyê de biçe îdamê gelo tu wateya îdamê dimîne? Bi yeqîna min tu wateya wê namîne. Di rastiyê de ew pergela ku dixwaze min îdam bike, esas ne min, xwe îdam dike. Ji ber ku ez tu carî namirim. Tu îdamek nikare hêza min tune bike. Roja ku biçim îdamê dê bi hezaran Şîrîn zêde bibin, weke zêdebûna Leyla Qasim û ew jî dê bi îdama min kêm bibin. Kêmbûn mirine, tunebûne. Ez jiyanê di asta azadiyê de dijîm. Zaneyê Amarî ev tov xiste nav dilê min. Ez ji wî hînî vê razê bûm. Wisa sînorên zanînê ji holê rakirin û riya têgihîştina wateyê rê min da. Min duh çîroka Prometheus xwend. Bandoreke mezin li ser min hebû. Çarenûsa min jî weke ya wî ye. Her roj min dikujin, her roj min tune dikin. Lê ez dîsa jî bi derketina rojê re xwe diafirînim. Kezeba min diqedînin, lê kezeba min mîna kulîlka sosinê ji nişkêve vedibe û bi rengîniya xwe xwezayê dixemilîne.

Xwestin min biqedînin, lê hêza wan têrê nekir. Xwestin mîna Tiamat min perçe perçe bikin, lê bi serneketin. Niha jî dixwazin min îdam bikin. Ez vê baş dizanim îdam cureyê mirinê ya herî dijware lê îdama wan jî dê têrî tunebûna min neke.

Riya min dirêje, bi hewraze, tijî asteng û keleme. Ez dê geh bikevim, geh rabibim. Lê di dawiya dawî de ez dê xwe bigihînim cihê xwe. Ez tu carî gazinan nakim. Gazin der-birîna jariyêye û ez jî ji jariyan hez nakim.

Duh Asoyê ji min re got, ji Qazî re nameyekê binivîse. Ez dizanim tu encamê nade, lê dîsa jî ez dê binivîsim.

Ez ji jiyanê hez dikim, lê zêde pirolê nakim. Ji ber ku pirolê kirin, wendakirina rastiya jiyanêye û di rastiyê de xwe wendakirine. Ez, zû bi zû bawer nakim û zû bi zû baweriya xwe ji dest nadim. Ez naxwazim tucarî dilê min bibe mîna asimanên bê stêrk. Dixwazim berdewamî stêrkên asimanê dilê min mîna moriyên mercanî biçûrisin û çavên hemû kesî/ê biqemişîne. Bila wisa çav di nava dilînêriyê de bimîne ku qet baweriya xwe wenda nekin.

Dapîra min herdem ji min re digot; “keçê bila her kêlî çavên te bibiriqin. Roja ku çavên te nebiriqin tu dê fam bikî ku wê rojê ji emrê te gelek tişt çûne. Şîreta min a din jî eve, bila pişta te di bin barên bêkêr de xûz nebe, heke pişta te xûz bû bila di bin barên pîroz de xûz bibe. Wê demê xûz bûn dibe dûz bûn. Dîsa ji xwariyan nereve ku tu tama rastiyan bibinî, rûyê xwe ji êşan ba nede, ku tu nirxê xweşiyê zanibî. Bila herdem mirin di bîra te de be da tu jiyanê bi bextewerî bijî û jiyanê watedar bikî”.

Niha ez dihizirim, dibêjim dapîra min hê di çardeh saliya min de ez fêrî hemû rêgezên jiyanê kirime. Gelo vêga ger li ba min ba dê ji bo îdamê çi bigota? Gelo dê çi şîret li min kiriban? Belkî dê ji min re bigota; “keça min ji îdamê netirse da îdam bibe rûyê mirovahiyê yê reş, da

perdeya rûyê gerdûnê bikeve”. Lê dîsa jî ez şîreta wê ya ji bo îdamê pir meraq dikim.

## 17 Avrêla 2010ê

Demeke dirêje ku di girtîngehê de me. Lê ji evîna min a azadiyê biqasî misqalekî tiştek kêm nebûye. Dixwazin evîna min a mirovahiyê, evîna gelê min, evîna min a axê tune bikin. Ji ber vê yekê dîwarê bilind xistine navbera min û gelê min. Her çendî dîwar bilind bin jî ji evîna min, ji hêviya min ne mezintirin. Ji ber ku evîna min ya bêhempa hemû dîwaran hildiweşîne û bê wate dike. Çawa asoyê asiman û deştan li cihekî xwe digihînin hev, dilê min jî li cihekî xwe digihîne dilê gelê min. Min cih û war di dilê xwe de bêwate kiriye, ez di binê reşçalekê de bim jî, dilê xwe dikim find û roniya çavê xwe vêdixim û wê reşçalê ronî dikim. Em jin, xwediyê dilekî wisa nebezin ku tucarî naweste. Ji ber vê yekê dibêjim, cîhan li hêlekê, dilê jinekê ku bûye evîndara azadiyê li hêlekê. Hê roja ku ez nû hatim girtin dixwestin min di tarîtiya girtîgehê de; tîrêjên tavê, ronahiya rojê çûrisîna stêrkan û barîna baranan li ber çavên min reş û bênirx bikin û min di nava reştariya girtîgehê de bifetisînin.

Girtîgehên vî welatî, di hemû kêlî, qonax û demên jiyanê de mirinê tînin bîra mirov. Bêhêvîtiyê diafirînin.

Gava ez dibirim şaneya yek kesî, nemaze ji min re tiştek digotin; “dema tu ji vê şaneyê derketî, divê stuyê te xwar be, tu weke xudameke neçar dest li ser hevdu derkevî pêşberî me, ger tu wisa nekî tu dê gelek carên din werî vir”. Daxwaza wan ew bû ku bi giyanekî têkçûyî ji wan şaneyan derkevim. Lê ez herdem bi vîneke xurttir ji wan çalên mirinê derdiketim û bi serbilindî dimeşîm.

Kengî ez davêtim wan bîrên mirinê, ça û cixare li min dibirîn. Mirov bê nan heta kêliya dawî ya temenê xwe jî dikare debar bike. Lê bê avî, rewşek sotênere. Mirov nikare hilmê bistîne. Di demsala havînê de av nedidan min. Di demsala zivistanê de jî betenî û kincan nadin. Bi şev û roj diricifim. Şeqe şeqa diranên min girtîgeh dihejand. Dema li ser erda betonî radizam, bi rojan nexweş diketim û dikuxî. Niha gurçikên min, kezeba min pir xişivîne. Me ji vê şikenceyê re digot, şikenceya spî. Ango li te nadin, lê bi cureyên der mirovî, bi rêbazên derûnî dixwazin mirovan hilweşînin.

Bi rastî ev teşeyên şikencê, deh qatî ji şikenca fîzîkî dijwartirin. Ger mirov xwediyê vînek ji pola be û xwediyê ramanên zelal nebe, ne mimkûne ku xwe di bîst û çar saetan de li ser piyan bigire. Lewra ji bo ku vîna mirov bişikê, ji bo ku ramanên mirov şêlû bibe, kesayet têk biçe, her tişt tên kirin. Ji bo van tiştan; war, amûr û seqayî guncave, bi kurtî ji bo radestkirina vînê hemû tiştî amade dikin.

Hinekan ji me çavê xwe, hinekan derûniya xwe, hinekan hemda xwe, hinekan kezeba xwe, hinekan gurçikên xwe, hinekan jî dest û lingên xwe wenda kirin.

Bihizirin tu mirov bêy ku wesleyekî xwe wenda neke ji vir dernakeve. Ji bilî keça rikdar Semîra. Ew keça nazenîn ku min digot nikare li ber xwe bide, bû çiya, bû deqa bahîvê, bû vînek ji çiyan mezintir. Bu dilekî bi qasî zeryayê û derket pêşberî wan zilimkaran û ez matmayî hiştim. Ew jîra çîçilaskî bû zinar û hilneweşiya.

Hest dikim dem zû diburin û wextê min hindik dimîne. Lê wadayîna jiyanê, hestê min a azadiyê mezintir dike.

**19 Avrêla 2010ê**

Duh, di wextekê de ku em ne li bendê bûn, girtin ser menzela me. Bi lez û bez çavên min û Asoyê girêdan û em birin şaneyên tarî. Di navbera şaneyên yek kesî û menzelên giştî de, bi qasî sî an jî bîst metreyan dirêjahiyek heye. Dîwarê şaneyên yek kesî hemû bi hevîrê ûfinkî hatiye seyandin. Ji ber ku her cure kêzik li wir hene. Carna dema hin kêzik bi mirov vedidin, agir bi canê mirov dixe. Mîna ku bi şîşeke sor çermê canê mirov dax dikin e. Ewqasî dişewite, dinya li ber çavê mirov reş dibe. Şûna devên wan sor û dora wê reş û şîn dibe. Bi rojan xurandinek ku nehatiye dîtin destpê dike. Tu çiqasî dixurinî, zêdetir dixure. Dîsa di şaneyên tarî de dûpişk bera hevdu dide. Ev rewş tirseke mezin dixe dilê mirov. Ji ber ku qet xew nakeve çavê me. Divê berdewamî em hişyar bin. Ev hemû tişt bûne perçeyek ji jiyana me.

Aso xistibûn şaneya tenişta min. Ji ber ku Aso nedikarî biaxive, heta nîvê şevê em bêdeng man.

Dema em anîn menzelê saet sêyê şevê bû. Birinc û çaya me li nav hev xistibûn. Hemû alavên me tevlî hevdu kiribûn. Ango menzel ser û bin kiribûn. Tursîl û şekirê me tevlî hev kiribûn. Aso kenî û got.

- Ji bo tevliheviyê ev pergal takaneye.

- Xeman nexwe, piştî her tevliheviyê zelaliyek heye.

- Lê dema her roj tevlihevî hebe, dê dîtina zelaliyê bibe xewin…

Ez keniyam û…

- Aso can dev ji felsefê berde, ka em dê çawa xwe ji vê dîmena têkêl xelas bikin.

- Şîrîn tu hem dest bi felsefê dikî û hem min tewanbar dikî…

Em dîsa kenîn. Em wisane, piştî şikenceyên giran, piştî dijwariyên giran, teqez tiştekî ku em pê bikenin diafirînin…Ji ber ku dema ku em dikenin, em hemû êşên di bedena xwe de ji bîr dikin. Min qala kenê kir, Sînema Dimdimî hat bîra min. Carna ez, ew û Perya heta me hêza hebû em dikenîn, ji nişkêve Sînemê rûyê xwe tirş dikir û digot; “Dayika min dibêje gava jin zêde dikenin karesetên mezin tên serê wan”. Me jî ji vê yekê bawer dikir û ji bo ku em kenîbûn, demildest poşman dibûn. Tirs û xofeke cuda dikete dilê me. Lê niha em berovajî wan gotinan tevdigerin. Çiqas em dikenîn ewqas bextewer dibin. Ewqas ji êş û janan û ji birînan dûr dikevin. Çav hûrikê Sînemê, min gelek bêriya te kiriye.

Heta ku tava sibê derket me karê xwe qedand. Me ji xwe re çayeke reş çêkir. Aso weke ku dixwest ji min re tiştekî bêje, lê nedigot, carina dirêj dirêj li min dinêrî û rûyê xwe diguherand. Min bi dengekî nizm.

- Aso can.

- Çiye?

- Ma tu dixwazî tiştekî ji min re bibêjî.

- Na.

- Belê, belê.

- Nizanim çawa bêjim.

- Tişt nabe, bêje.

- Dayika min.

- Çi bi dayika te hatiye?

- Gelo dema ez derkevim, biçim wê bibînim an na?

Ya rastî, min bersivik nedît ku ji Aso re bêjim. Ji ber vê min tenê got:

- Çawa?

- Ez dibêjim Semîra ji bo dayika min behsa min kiriye.

- Aso can.

- Çiye.

- Ger rojekê tu derketî derve, here û dayika xwe bibîne.

- Lê…

- Lê çi?

- Ez wê hêzê di xwe de nabînim.

- Aso, heke fikrek te ya wisa çêbûye, ev tê wateya ku hêza te heye.

- Nizanim.

- Semîra tiştekî wisa bihîstibe dê helwesteke gelek tund bigre.

- Raste, dema min ji Semîrayê re qala hinek tiştan kir, ligel ku nedizanî ez xwîşka wê me jî bertekên pir tund nîşan da.

- Aso can.

- Çiye?

- Dibe ku dema tu texliye bibî ez ne li ba te bim.

- Çawa?

- Li vir tiştekî mîsoger tuneye. Dema tu texliye bûy teqez here dayika xwe bibîne.

- Niha ramana min baş ne zelale.

- Piştî şêlû bûnê zelalî tê.

Em dîsa kenîn. Asoxwîn, Aso qanî bibû. Gelek dixwaze dayika xwe bibîne. Lê gava tiştên ku bi serê wê anîne, tê bîra wê aciz dibe, hêrs dibe. Lê ez di wê baweriyê de me ku Aso dê dayika xwe bibîne. Ji ber ku gelek bêriya dayika xwe kiriye. Ez tirpe tirpa dilê wê dibihîzim…

*   *   *

Dixwazim bibime stêrkek

Û heft parzemînê cîhanê

Bibirîqînim….

Ji ber ku ez heft nuwazeyên cîhanê

Di dilê xwe de vedişêrim…

ASO

*   *   *

**20 Avrêla 2010ê**

Niha sê rêhevalên min yên mêr weke min li benda îdamê ne. Ferzad Kemanger, ango Mazlûmê gelê Rojhilat, ango mamosteyê gelê xwe. Ango filozofê heyama nû. Berxwedêrê mezin. Dilçiyayê gelê hejar û blindest û Ferhad Wekîlî û Elî Heyderiyan. Sê leheng, sê canfîda, sê ramyar, sê mafparêz, sê kesên ku di riya heqî û neqîqetê de dimeşin. Sê mêrxas, sê çemên dîrokê, sê cîhan. Sê zarokên Kurdan û sê kulîlkên cîhanê.

Îro min nameyeke Ferzad Kemanger xwend. Ew, bi şev û roj dixwîne, diafirîne, dinivîsîne, vedibêje û pêk tine

û bi fikrên xwe yên serhildêr jiyanê dixemilîne. Herikîna dîrokê diguherîne. Ew mamostê jiyanê ye. Ji reşbîniyê, ji bêhêziyê û ji tirsê dûre. Dema min nameya wî xwend têgehîştim ku çiqas di kesayeta xwe de îdam tune kiriye. Wî di beşeke nameya xwe de nivîsiye:

’’ Lê îro dixwazim jiyanê ji min bistînin, ji eşqa ji hevnifşên xwe re min biryar daye wesleyên laşê xwe bideme wan nexweşên ku mirina min karibe jiyaneke ji wan re bibexşîne, weke xelat pêşkêş bikem û dilê xwe tevî hemû “evîn û hêza” ku têdeye, mîna hediyeyekî bideme zarokekî. Ferq nake ew zarok li kuderê be, li rex Karûn yan quntara Sebelan an li rex çola Rojhilat an jî zarokek li ser çiyayê Zagros ku li benda hilatina rojê rûniştiye, tenê dilê serkêş û bêqirarê min di sînga zarokekê de lêbixe ku ji min serkêştir hêviyên zarokatiya xwe bi heyv û stêrkan re behs bike û wan wekî şahidek bihesibîne, da di dema mezinbûnê de xiyanetê li xewnên serdema zarokatiya xwe neke, dilê min di sînga kesekî/ê de lêbide ku bi şevan bi zikê birçî serê xwe datîne ser balîfê û bîra “Hemîd” xwendakarê şanzdeh saliyê bajarê min, di dilê xwe de zindî bihêle, ku nivîsîbû; Biçûktirîn xweziya min jî di vê jiyanê de bi cîh nabe û pişt re xwe daliqandibû.

Bihêlin bila dilê min di sînga kesekê de lêbide, girîng nîne ew kes bi çi zimanî diaxive, yan rengê çermê wî/ê çawaye? Tenê bila zaroka karkerekî be da ku destên bavê wî/ê yên qelişyayî agirê serhildaneke nû di dilê min de zindî bike.

Dilê min di sînga zarokekê de lêbide ku di paşerojên ne ewqas dûr de li gundekî biçûk de bibe mamoste û her roj danê sibê zarok dê bi kenên xweşik pêşwaziya wî bikin, şirîkê hemû xweşî û lîstokên xwe. Dibe wê demê zarok tama feqr û birçîtiyê nezanin û di dinyaya wan de tu

wateya peyvên girtîgeh, şikence, zulm û newekheviyê tune be.

Bihêlin dilê min di quncikekî vê cîhana pehn û berfireh de lêbide tenê jê agahdar bin, ew dilê mirovekî ye ku gelek raz û welatê min pêre hene ji xelkê ku tevaya dîroka wan êş, xem û azar bûye.

Bihêlin dilê min di sînga zarokekî de lêbide da ku sibehan ji qirika wî bi zimanê xwe yê dayikê hewar bikim.

"Dixwazim bibim bayek

Peyama hez û eşqa mirovan

Bigihînim her dera vê cîhanê".

Ez jî dibêjim mamoste can, ji xwe te bi hezkirina xwe ya bêpayan, dilê xwe da tevahiya zarokên vê gerdûnê. Gava te li gundekî çiyayî li dibistanên di rengên kavilan de bûn perwerde dikirin, te hezkirina xwe xiste nava dilên wan zarokên zik birçî. Mamoste, ma gelo dilê te dê di dilê zarokekê de bihewe, min ne bawere, binêre ev gerdûn ji dilê te de teng tê. Heft parzemînan dilê te ranekir. Ango di tu parzemînan de hilnehat. Mamoste ez dibêjim ya herî baş tu wî dilê xwe yê ku nizane mirin çiye, li hemû zarokan belav bike û ez jî hinek ji wî dilî dixwazim. Zehrayê derbarê te ji bo min hinek qala te kiribû. Niha Zehra mezin bûye û di riya te de dimeşe. Digot te ew meaşê xwe yê hindik li zarokan belav dikir û xwe bê dirav dihişt. Zehrayê digot, mamoste Ferzad bi dizî dirav ji bêrîka xwe derdixist û bêy em bibînin dixiste nava lênûskên me. Mamoste min gelek dixwest ez ji weke Zehrayê şagirda te bam û min li ber wan destên te perwerde bidîta. Mamoste niha ez û tu girtiyên îdamê ne. Lê dibînim ku te ji mêjve hemû sînor derbas kirine û xwe gihandiye dilê zarokên welatê min. Mamoste weke tu jî herdem dibêjî, em ji vê

cîhanê koç bikin jî, dê ev karwan raneweste. Ji ber ku carekê karwan ji cihê xwe liviyaye.

Mamoste, em berdewam silavên te digirin. Bila ji wan çavên te yên ku bawerî û hêvî jê diherikin, ronahî kêm nebe. Tu bi ronahiya çavên xwe dilên tarî ronî dikî. Her çend cîhan tarî be jî, ji berbangê re hindik maye. Kî/ê dizane belkî careke din teqîna mezin pêk were û vê carê tarî, mirin, ne wekhevî, serdestî, kedxwarî, qedexe kirin, çewisandin û bêdadî ji hemû dilan koç bike. Ma nabe mamoste? Çima nebe mamoste, çima?

Xwezî min derfet heba û nameyên te yên rojên îdamê hemû xwendiban. Ez ji xwe dizanim, gava benê îdamê li benda mirov be tiştek mîna berê nayê jiyan kirin û nivîsandin.

Min kartpostala ku te ji bo heştê Adarê şandibû wergirt. Ji bo min hêjayî cîhanê bû. Di wan mercên ji dojehê xeraptir, dijwartir de tu rabûyî ji me re peyama pîrozbahiyê dişîni. Ez spasdarim mamoste. Bi rastî jî tu dilcîhanî..

Mamoste dilê te çemekî jiyanêye û dê heta heta li ser rûyê vê dinyayê biherike.

**22 Avrêla 2010ê**

Êdî em hîn bûne, kengî derî ji nûve vedibe, bê hemdê xwe em dibêjin; “vêcarê çiye gelo?”. Ji ber ku dema derî bi hêrseke mezin vedibe, teqez tên ji me yekê dibin û dest bi şikencê dikin. Duh dîsa hatin û bi rûyên tirş û tehl gotin; “Şîrîn sibê tu dê bêye daliqandin, lê di wexteke nediyar de”. Wisa gotin, derî girtin û çûn. Îskana çayê di destê min de bû, min hêdîka bi semt îskana xwe danî erdê. Ji îskana min kelduman bilind dibû. Tenê min dixwest di vê kêliyê

de li keldumana ku ji îskana min bilind dibû binêrim. Bi dengekî hêdî min di ber xwe di got; “ temenê perperokê û yê mirovan wekd heve”. Nizanim çima min wisa got, lê gava ev hevok ji zarê min herikîn, ji nişkêve ew matmayîna min qediya û min dîsa dest bi vexwarina çaya xwe kir. Dema Asoyê dengê wan bihîst îskan ji destê wê şemitî û ket erdê. Yekemcar bû min Aso wisa didît. Çavên wê yên reş ku weke libên zeytûne ne, çirk bi çirk mezintir dibûn. Tenê li min dinêrî. Ji cihê xwe nedilivî. Weke peykerekî ku bi erdê ve hatibe westarkirin bû. Hê ew dengê wan yê pelos ku bi qasî misqalekî bêhna mirovahiyê jê nedihat di kûrahiya guhê min de olan dida: “ Em dê sibê te daliqînin, em dê sibê te daliqînin!”.

Dema ev hevok vegotibûn pir aram bûn. Mîna ku mizgîniya xêrê bidin min, axivî bûn. Axirê Aso ji cihê xwe liviya. Bi gavên girankêş hêdî-hêdî meşiya û hat li hemberî min çong veda û li rûyê min nêrî, hêsrên wê mîna moriyên mercanî diherikîn. Neçarî ji çavên wê diherikîn. Nizanim ji ber çi bû gotina Aso ya ewilî ev bû;

- Tu birçiyî Şîrîn?

Di wextên din de ji min re digot, xeman nexwe, tucarî te bi darve nakin. Lê duh ew hevok bikar neanî û tenê got;

- Ma tu birçiyî?

Min dirêj dirêj li Aso nêrî û got:

- Erê.

Di rastiyê de ez ne birçî bûm. Lê Aso çi bigota, min dê bi ya wê bikira. Asoyê jib o min xwarin amade kir. Serê xwe şuşt û cardin dest bi xwendina pirtûka pîroz kir. Dema bû êvar ji min re av germ kir, min jî xwe şuşt. Asoyê porê min şe kir û keziyên min hûnandin. Em heta sibê ranezan. Çi dihat bîra min, min ji Asoyê re vedigot. Heta min evîna ciwaniya xwe ya platonîk jî jê re got. Çend ca-

ran min got, xwezî niha Perya û Sînema hesûd jî li vir ban û Jîn Rojhilat, me bo cara dawî hevdu hembêz kiriba. Şev gelek zû qediya bû, sibê zû dema hatin, min ji wan re got; “ hûn îro kengî, di kijan saetê de dê min îdam bikin”. Lê bersiv nedan min û çûn.

Min fam kir ku dixwazin min di nava bendewariyeke wisa erjeng de bihêlin. Heta êvarî em wisa man. Aso ji min zêdetir êş dikişand. Me dawiyê fam kir ku îdama min taloq kirine, ango ez dê çend rojên din bijîm, tenê çend rojên din. Edî li vir ji bo min her kêliya jiyanê berberî temenekiye. Dixwazim hemû wextên jiyanê tijî tijî bijîm. Gava mirov li ber îdamê be têdigehe ku dema mirov rast bijî tiştekî ku neke namîne. Ji ber ku emrê mirov têrî her tiştî dike. Tenê bila rast jiyîn hebe bes e.

**24 Avrêla 2010ê**

Li vir berçavkê nadin mirov. Çavên min êdî baş nabînin. Tevî vê dîsa jî berçavkê nadin. Bi mehane ev pêdiviya min pêşwazî nekirin. Dixwazin bi awayekî temamî kur bibim. Aso bêziman hiştin, dê min jî bê çav bihêlin. Lê baş dizanim bêçaviya min jî dê wan bitirsîne. Çîroka hunermendê navdar ya Chiliyê, Vîctor Xara hate bîra min li Santiyagoyê. Şikencekar destê wî hûr dikin, da li gîtarê nexe, kela hundirê xwe vala neke, bi newaya xwe qala azadiyê neke û strana “layê layê” ji bo zarokên Chîliyê nestirîne. Lê ew bê navber distirê û dengê xwe digihîne zarokên çavbizdok:

“Were, were, were…

Were cadeya pan û berîn dipîvin.

Dahatuyeke din di karê xwe mukemel bûnê de ye”.

Dem û dewran dizivire, ji rojan rojekê manşetên rojnameyên Chîliyê “Rihet razên dîktator mir” û jenyarê gîtarê, dibe xemla dîwana helbestê û gel bi şahê beyta dîwana helbestvanê xwe serbilindin êdî.

Ger wisa bidome ez dê piştî demeke kurt bi çavên xwe yên ronî di wan de nemayê binivîsim. Ez jî weke hunermendê hêja, dê bê navber vê dojehê vebêjim. Ji bo şoreşgeran girtîgeh, dîroka mirin û lêdanêye. Çîrokeke wisa dirêje qet dawî lê nayê. Lewma di dawiya her çîrokê de çîrokeke bêhtir, bi bandor û sotînertir destpê dike û di hemû çîrokan de mirin û lêdan heye. Girtîgeha Êvînê mexzenek wisaye ku mirov her cureyên mirin û lêdanê têde dibîne. Di vê xeşîma ku nîvê wê di bin erdê deye her roj, her kêlî mirovek bi şikencê, ji ber nexweşiyê, ji ber janên bedena xwe serê xwe li dîwaran didin û dimirin.

Îcar nedana berçavkekî li ber van tiştan mîna misqalekî dimîne. Lê li girtîgeha Êvînê çîroka berçavkê pir sotînere, ha yek ji wan çîrokan;

Demekê li vê girtîgehê girtiyekî ramyarî hebûye. Xwedî berçavke, ji ber şikenceya erjeng û tund berçavka wî dişkê û ew girtî di şûna camê de perçeyek kaxezê tê de bi cîh dike, cara dawî bi vê dîmenê diçe serdana dayika xwe, dayika wî, wî wisa dibîne û vê dîmenê bi xwe re dibe derve. Ew girtî piştî demekê şûnde ji ber şikenceyê tê kuştin û di gorek bênav û nediyar de tê veşartin, çend hefte şûnde berçavka şikestî û kincên wî yên bi xwîn didin dayika wî, lê cendekê wî nadinê.

Li girtîgeha Êvînê hemû kêliyên jiyanê ramanake bêdawiye û ev raman dê tu carî bidawî nebin. Lê, gelo mirovahî dê kengî dest bi xwendina vê ramanê bike?

**26 Avrêla 2010ê**

Dayê..

“ Ez hêza nivîsê di xwe de nabînim. Lê tevî hemû tiştî dixwazim ji te re binivîsim. Dibe ku ev nameya min a dawî be. Lê dilê min ku ji bo azadiyê hildavêje dê herdem li ba we be. Te di telefonê de ji min re gotibû; ‘bihêz be!’ Ez baş im. Tu xeman nexwe dayê. Tenê tişta ku min diêşîne, ez ê cara dawî we hez bikim û hûn jî ji hevdu hez bikin. Hezkirin û azadî mafê mirovan yê herî bingehîne. Dayê hûn jî li xwe xwedî derkevin. Li çanda xwe û li mafê mirovan xwedî derkevin. Jiyan bi azadiyê watedar dibe.

Dilê min pir diêşe, lê ne ji ber ku diçime îdamê. Ji bo ku min ji mirovahiyê re, ji gelê xwe yê bindest, jar û hêja re xizmet nekir. Jana dilê min ya herî mezin eve. Lê bawеriya min heta dawiyê heye ku dê ev têkoşîna mirovahiyê bi serkeve.

Dayê ji dêvla min Şîlanê ramûse. Ez ji wê û hemû zarokan hez dikim. Ez di şexsê wê de hemû zarokan silav dikim. Dibe ku hûn careke din, dengê min nebihîzin. Gava ez îdam kirim, xwe neêşînin. Ji ber ku îdama min berdêla azadiyêye. Ez silavên xwe yê germ ji dayika hevala xwe Perya û Jîn Rojhilat re dişînim. Dapîra min çawaye? Bila ji kulîlkên hinarê nexeyide. Kengî li wan kulîlkên sorxwînî binêre dê çavên min bibîne. Heke cendekê min bidin we, min li cem hevalên min, veşêrin. Weke ku zanayê Amorî gotiye, dê azadî bi serkeve. Ez we hemûyan yek bi yek hembêz dikim”.

***Girtiya îdamê Şîrîn***

*     *     *

Şîrîn ji ber êşa ser û çavê xwe êdî mîna rojên berê nedinivîsand. Devê lênuska xwe girtibû û pênus xistibû çavê dolaba xwe ya herî jor. Aso carna helbestên ku dinivîsandin ji Şîrînê re dianî û dixwest Şîrîn wan bixwîne. Şîrîn jî beyî ku bêje çavên min diêşin bi bextewerî dixwend.

Şîrîn di van rojên dawîde kûr dihizirî. Diyar bû ku di nava tîrbûnek kûr de bû. Ji meha Gulanê re du roj mabûn. Îdama wê hîn bêtir di rojevê de deng vedida. Semîra bi awayekî çalak di vê mijarê de dixebitî. Semîra herî dawî bi zimanê Inglîzî, gotarek bi navê; "jineke Kurd li ber îdamê ye" nivîsandibû. Vê gotarê pir deng vedabû, lê cemeda li ser dilê serdestan nehelandibû. Hindik be jî kesên xwedî wijdan dengên xwe bilind kiribûn. Lê di mijara îdamê de tu guherandin çenebibû. Berovajî wê îdam her roj zêdetir nêzî Şîrînê dibû. Şîrîn jî êdî di vê têgiştinê de bû. Di nava bêdengiyek kûr de xwe amade dikir.

Beriya rojekê, ji nişkêve dayik û bavê Aso hatibûne hevdîtinê. Lê Aso di derbarê serdanê de tiştek negotibû. Lê belê Şîrînê meraq dikir. Lê nexwestibû vê mijarê dema ku Aso ji serdanê vegeriya bû, ji wê bipirse. Niha wext guncav bû, Şîrîn bi dengekî hêdî ji Asoyê re got;

- Aso xan.

- Fermo.

- Te qet qala dayik û bavê xwe nekir.

- Çawa wisa dibêjî Asoxan. Ez herdem amade me ku li te guhdar bikim.

- Semîra.

- Semîrayê çi kiriye?

- Çûye malê.

- Bi rastî.

- Belê pir aciz bûye.

- Çi gotiye.

- Dayika min, digot heta îro tiştên ku qet me nebihîstibûn Semîrayê ji me re gotin.

- Erê.

- Semîrayê gotiye we di rastiyê de Aso nefirotiye, we xwe firotiye. We giyan, xwîna, mirovahî, esl û feslê xwe firotiye. We rûmeta xwe, jiyana xwe firotiye. We heta niha nanê heram xwariye. Dayika min pir giriyaye. Lê Semîrayê gotiye tu çiqasî bigirî jî tu ji wan bezekariyan xelas nabî. Bavê min jî cara yekemîn mîna zarokan giryaye.

- Wekî din çi gotiye?

- Gotiye biçin û lêborîna xwe ji Aso bixwazin. Lê ez bawer nakim ku we bibexşîne. Ji min lêborîna xwe xwestin.

- Te çi got?

- Min jî got, dema ez ji malê derketim zimanê min hebû. Ez giriyam min got dayê, bavo min nedin van kesên ku qet nas nakim, lê we ez bi peran firotim. Niha zimanê min tuneye ku ji we re bêjim dayê û bavo.

Û niha Aso jî tune ye. Ango ew Asoya ku we firot tuneye. Ew Aso mir.

Çû, lê ez tenê ji we re tiştekî dibêjim. Lêborîna herî mezin ewe ku hûn piştgiriyê bidin doza min û Semîrayê.

- Semîra pir li malê maye an na?

- Na, tenê hefteyekê maye û çûye.

- Belê.

- Semîrayê navê xwe kiriye Ronahî.

Şîrîn keniya:

- Bi rastî?

- Belê, dayika min ji dil digot; ‘ez bi wê serbilindim. ’

- Bavê te?

- Wî jî heman tişt digot.

- Ez bextewer bûm.

- Dayika min digot niha Semîra di TV yê de nûçeyan dide.

- Semîraya me jî ne hindike ha.

- Erê, erê, dayika min digot; “dema diaxive ez dibêjim ma gelo ev Semîra ye? Bi Kurdiyeke pir xweş diaxive. Mirov dibêje qey berê qet bi farsî neaxiviye”.

- Semîra wisaye.

- Çawaye?

- Çi têxe serê xwe, teqez pêk tîne. Weke teye ha.

- Na, na em ne wekhevin.

Şîrîn dîsa keniya û ji dil got:

- Semîra can, Semîra can…

- Kengî dest bi nûçeyan dike, berê qala te û hevalê Ferzad, Ferhad û Elî dike.

- Aso.

- Kerem ke.

- Heke te rojekê Semîra dît, jêre bibêje Şîrînê gotiye, tiştên ku em bi hevre jiyan bila ji bîr neke.

- Tu xeman nexwe…

- Û spasiyên min bêjê.

- Başe.

- Semîra, Semîra keça rikdar.

- Silavê dayika min pir li te hebû.

- Ser çavan.

- Semîrayê jêre qala te kiriye.

Hîn diaxivin ji nişkêve derî vebû. Bangî Şîrînê kirin. Jêre gotin “amade be demeke din, tu dê biçiye telefonê”. Şîrîn bi çavên matmayî li dora xwe nêrî. Zû bi zû, mafê telefonê nedidan wan. Piştî çend deqeyan Şîrîn çû telefonê:

- Elo, ez Şîrîn.

- Şîrîn, keça min.

- Dayê can.

Dayika Şîrînê bi dengekî kelegirî:

- Keça min, roniya çavê min, tu çawayî?

- Dayê, ez baş im, hûn çawanin?

- Em başin. Keça min tendirustiya te çawaye?

- Başe.

- Keça min em ji ber agahiyên dawiyê ditirsin.

- Dayê can.

- Bêje keça min.

- Rewşa dapîra min çawaye?

- Baş e, baş.

- Şîlan çawaye?

- Vaye Şîlan li ba mine.

- Ka bide wê ez dengê wê bibihîzim.

- Metê tu çawayî?

- Ez başim, ez gorî tu çawayî?

- Başim. Min ji hevalên te re stran got.

- Kêfa wan hat?

- Belê. Metê...

- Çi?

- Tu dê kengî bêy.

- Şîlana min, ez dê di demek kin de werim.

- Metê, ez destê te maçî dikim.

- Ez jî çavên te maçî dikim. Ka bide bapîra xwe.

- Şîrîn, keça min.

- Bêje dayê.

- Xew nakeve çavên min.

- Xwe neêşîne dayê.

- Keça min çavên te çawa bûn.

- Başe.

- Ma berçavk dan te an na?

- Hê nedane.

- Çima nadin, heke mijar dirav be, me dirav şand.

- Na, na mijar ne pereye.

- Lê çiye?

- Naxwazin bidin.

- Şîrîn can.

- Hiii…

- Beriya çend rojan Semîrayê telefona me kir, gelek silav ji te re û ji Asoyê dikirin.

- Serçavan…

- Ez dê dîsa heman hevokê bêjim; bi hêz be keça min xwedê mezine.

- Dayê wext qediya.

- Baş li xwe binihêre keça min.

- Hûn jî dayê can.

Gava Şîrînê telefon girt, kesên ku ew anîbûn telefonê, li nav çavê Şîrîn nêrîbûn û gotibûn;

- Vê qenciya me ji bîr neke, ev telefona te ya dawiyê bû.

Şîrînê qet bersiv nedabû wan û raste rast hatibû menzelê.

*    *    *

Bêhna biharê tê, bêhna Yas, Nêrgîz, Sosin û Beybûnan. Bêhna kulîlkên çiyayê Şaho. Dinya bûye bihar. Meha Gulanê hatiye, xwezayê xwe nû kiriye, kirasê demsala zivistanê avêtiye û xwe xemilandiye. Şîrîn bêhna biharê bi hemû hebûna xwr his dike. Têdigehe ku bihar hatiye. Şîrîn cara dawî radihêjê pênûsa xwe, cara dawî dixwaze çend rêzan ji Qazî re binivîse. Cara dawî ji cihê xwe radibe, bi gavên giran ber bi dolaba xwe ve dimeşe, deriyê dolabê vedike, ji çavika herî jor pênûsa xwe derdixe, cardin hêdî-hêdî vedigere cihê xwe. Hêdîka bi semt rûdinê. Lênuska xwe vedike. Rûpelekî ji nava lênuskê dikşîne û cardin lênuskê digire. Destê xwe dide bin çenga xwe û dirêj dirêj dihizire. Ji wir diçe, derdikeve rêwîtiyeke dûr û dirêj. Geh dikene, geh xemgîn dibe. Cardin vedigere girtîgehê û serê pênusê dibe ser kaxizê û di dilê xwe de dibêje; “gelo ez bi hevokek çawa dest pê bikim”. Pênûs ji cihê xwe diherike:

“ji ber ku ez Kurdim, min bi darve dikin!

Sê salê min li gitîgehê tijî bûn, ango salên dirêj. Sê salên tijî keder, tijî azar. Sê salên bê demsal, bê meh, sê

salên bêdawî. Ango sê salên bi êşa li pişt tîrkên girtîgeha Evînê, ku du salên dema girîbûna xwe min vala û bêy parêzer û beyî hebûna hukmekî wekî biryara girtinê derbas kir. Ango du salên bêyî ku sedemek nivîskî were gotin, girtî mam û niha sê salên min diqedin, sê sal. Ez dibêjim sê sal, hûn bibêjin dîrokeke dûr û bêdawî. Rojên giran, mehên ji dojehê û salên tenêtiya temenê min û demên man û nemanê.

Di dema desteseriyê de min rojên gelek tehil di destê Sipahê de derbas kirin û piştî wê jî lêpirsînên benda 209ê dest pê kirin, her tişt ji serî de destpê kirin. Piştî benda 209ê jî min dema mayî li benda giştî derbas kir. Daxwazên li pey hev yên ku min ji bo diyarkirina qederê bê bersiv dihiştin, heta ku di dawiyê de hukmê ne adil yê îdamê dan min. Li gel ku ji Kurdîtiya min pêvetir tiştekî bibe sedemê îdamê tune bû, dîsa jî hukmê îdamê li min birîn. Û niha ez li benda roja îdamkirina xwe me. Ji ber çi ewqasî di girtîgehê de mam gelo? Çima divê ez bêm îdam kirin? Gelo bersiv ji ber Kurdbûna mine? Ger ji ber vê be ez ji dibêjim; ez Kurd ji dayik bûme û ji ber Kurd bûna xwe min êş û zehmetî kişandine.

Zimanê min Kurdî ye, ez bi zimanê xwe bi malbat, heval û nasên xwe re ketime nava têkîliyan û bi wê mezin bûm û zimanê me pira pêwendiya meye. Lê, destûr tune ku bi zimanê xwe binivîsim. Ji min re dibêjin dest ji Kurbûna xwe berde û mandel bike. Ez jî dibêjim; ger ez karekî wisa bikim ez xwe înkar dikim.

Qaziyê rêzdar, lêpirsêrê hêja!

Di vê dema ku we lêpirsîn ji min dikir, heta min nedikarî bi zimanê wê biaxivim jî. ez di wan du salên mayîna li beşa jinan a girtîgehê de bi rêya hevalên xwe hînî zimanê farsî bûme, lê we bi zimanê xwe lêpirsîn ji min kir, ez dadgeh kirim û hukum li ser min da. Di rewşeke wisa de

ku min nedizanî çi li derdora min diqewime û min nedikarî xwe biparêzim, we hukum li min birî.

Cureyên şikenceyên ku we li min kirine, bûne kabûsên şevên min, êş û janên rojane ji ber şikenceyên li ser min pêkhatî bi min re rojan tînin dawiyê.

Derbên ku di dema şikencê de li ser min dane, bûne sedema giraniya serê min. Gelek rojan êşên giran êrîş dikin, êşa serê min ewqasî girane ku nizanim li dora min çi diqewime. Carna ez bi saetan ji hiş diçim û xwîn ji difina min tê û piştre hêdî-hêdî vedigerim ser rewşa asayî û têm ser hişê xwe.

Xelatek din ya şikencekaran kêmbûna ronahiya çavane û her ku diçe kêmtir dibe û hê jî daxwaza min a ji bona berçavkê bêbersiv maye.

Dema ketim girtîgehê porê min yekdest reş bû, niha ku sêyemîn sala mayîna di girtîgehê de derbas dikim, her roj şahidê spî bûna beşek ji wan im. Porê min, qefil bi qefil spî dibe.

Ez dizanim we ev şikence tenê li ser min û malbata min pêk neanîne, belkî li zarokên hemû gelê Kurd û bi taybetî li ser kesên mîna Zeyneb Celaliyan, Ronak Sefazade û yên din jî tên kirin. Ez vê rastiyê her roj dibînim. Çavên dayikên Kurdan li benda dîtina zarokên xwe her tim bi girîne. Ew ji ber egera bûyeran hertim dilperîşan û mişawîşin, her lêdaneke telefonê û egera bihîstina xebera îdamkirina zarokên xwe, wan vediciniqîne û dixe nava safê.

Îro 2yê Gulana sala 2010an e. Piştî demek dirêj cardin ji bo lêpirsînê ez birim beşa 209 a Evînê û cardin sûçên xwe yên bê bingeh di derheqa min de dubare kirin. Ji bo rawestandina biryara îdama min, ji min xwestin ku alikariya wan bikim. Lê ez nizanim, dema ku min gotinek

zêdetir ji tiştên gotî tune, daxwaza hevkariyek wisa tê çi wateyê? Di encamê de ji min xwestin tiştên ku dibêjin; dubare bikim, lê min wisa nekir.

Lêpirsêr got; me sala par dixwest te serbest berdin, lê ji ber ku malbata te bi me re hevkarî nekirin, kar gihîşt vê derê. Lêpirser bi xwe got ku ez di destên wan de rehîneyek im û heya ku ew negihêjin armancên xwe wê min rabigirin, yan jî di encamê de îdam bikin. Lê Azadî Qet!

***Şîrîn Elemhulî***

* * *

Gava salname 9ê Gulana 2010an nîşan dida, mirovahî li girtîgeha Evînê carek din di nava şerma dîrokê de difetisî û diçû Îran carek din di bin perdeya reşqetranî de wînda dibû…

Şîrîn û Aso rûniştibûn, diaxivîn. Şîrîn giran giran diaxivî. Car caran qurmek li cixara xwe dida û dûkela cixarê dikişande kezeba xwe û piştî kêliyekê ji kune difina xwe re berdida. Asoyê jî hêsirên xwe dadiqurtand û diaxivî. Beriya çend deqeyan biryara hukmê îdamê ragihandibûn Şîrînê; pêwîst bû di demeke kurt de xwe amade bikira.

Bihizirin, yek derî vedike, bangî we dike û dibêje xwe ji îdamê re amade bike. Hûn xwe amade dikin. Şîrînê xwe amade kiribû. Zêde dem nebû, dem teng bû. Saet, kêlî û çirk zû derbas dibûn. Lê Şîrîn di nava aramiyeke bêdeng de bû. Çend cixare li ser hev helmijîn. Derî cardin vebû. Şîrîn têgehîşt ku wext hatiye, destê xwe da ser çonga xwe û hêdî-hêdî rabû ser xwe, bi şid Aso hembêz kir, rûyê wê

bi dehan caran maç kir, di guhê Aso de got; “ez ji hemû hevalan hez dikim” û çû…

Şîrîn meşiya, meşiya
Disekinî...
Li Asoyê dinêrî
Aso li wê dinêrî
Çavên wan, dilên wan
Rûyên wan nedixwest
Ji hev veqetin.
Gavên wê giran bûn
Dimeşiya
Disekinî
Dimeşî-disekinî…
Dimeşî, dimeşî, dimeşî
Lê nedigihîşte ber derî.
Belkî deh caran sekinî
Û deh caran li Asoyê nêrî
Nêrînên dawî
Peyvên dawî
Kêliyên dawî
Û dawiyên dawî
Û derî.
Û Şîrîn ji derî derket
Li ber derî rawestandin
Du kes bûn
Du celadan

Şîrîn hizirî
Rojên zaroktiya wê
Rojên şervaniyê
Rojên dijwar
Sînema Dimdimî
Jîn Rojhilat, Perya
Salên zarokatiya wê
Roja ku ji gund veqetiya bû
Qendîl, Şaho, Zagros
Semîra, Zeyneb Celaliyan
Hemû tişt di ber çavên wê re
Derbas bûn û çûn..
Ew roja ku Şîrîn li bendê bû hatibû
Ew dem, ew saet hatibû.
Şîrîn hêdika di dilê xwe de got:
Ez, Şîrîn Elemhulî
Keça Kurd.
Evîndara Azadiyê
Ez, di sala 1984an de li Demkislaka
Bajarê Makuyê hatim dinê…
Şagirda Zanayê Amarî
Şopdara Leyla Qasim.
Min tucarî di jiyanê de stuyê xwe xwar nekir
Ez Şîrîn.
Niha ber bi qada sêdarê ve dimeşim.
Ji bo rûmeta gelekî dimeşim.

Ji bo mirovahiyê dimeşim.
Şîrîn dimeşiya…
Celadan got; çavên wê girêdin.
Şîrîn got;
Ji çavên min netirsin
Dixwazim kêliya dawî
Li esman binêrim.
Dixwazim stêrkan bibînim…
Dixwazim rengê gerdûnê yê dawî bibînim
Dixwazim dîmenên dawî bibînim.
Celad bêdeng bûn
Şîrîn geheştibû qada sêdarê
Li dora xwe nêri tu kes nedît.
Got; çi bêdenge dinya…
Stêrk yek bi yek vedimirîn
Asiman tarî dibû.
Kindir xistin stuyê wê,
Beriya ku celad kindirê bikişîne
Şîrînê got; BIJÎ AZADÎ.. û
Dengê wê yê dawî
Di dilê gerdûnê de olan da.

*        *        *

ASO

Navê min Aso. Asoya bê ziman. Asoya Horesanî. Aso ango hevala Şîrîn Elemhulî, Hemraza Şîrînê Aso.

Û vê sibê, mm zû ji xewê şiyar bûn. Şîrînê bihîstibû ku dê îro bê îdam kirin. Heta êvarî em axivîn. Çend diyarî dane min, nîvro min xwest em hinekî bimeşin, daxwaza min red kir û ji min re got; "Asoxan êvarî riya min dûre, divê ez rawestim". Dema wisa digot dikeniya. Dîsa ji min re got: ''ji bo dilê Turaniyan xweş bike me îdam dikin''. Agahiya îdam kirina her sê hevalên din jî hatibû. Şîrîn ji bo wan pir xemgîn bibû. Mîna ku ew dê qet neçe ber îdamê tevdigeriya. Ber êvarê, deriyê menzelê vebibû. Gotibûn xwe amade bike, gava wisa gotin; Şîrînê bi dengekî bawermend got; "hûn dê kengî min bibin darve bikin". Wan jî got; "herî zêde du saetên din". Piştî çûn, Şîrîn li min nêrî û got; "ka were hê du saetên min hene". Mîna ku bibêje hê du salên min mane, di nava aramiyek bê dawî de bû. Deriyê me vekirî bû, min jêre hinek xwarin anî, lê tenê du parî xwarin. Danê nîvro ji min re gotibû hinek avê ji bo min re gerim bike, ez dê serê xwe bişom. Tu carî Şîrînê karê xwe bi kesî nedida kirin. Têgehiştim ku wê di xwe de nedidît. Min av gerim kir, serê xwe şuşt, dûre cardin bangî min kir û xwest ez keziyên wê bihûnim. Şîrînê gelek ji porê xwe hez dikir. Porê wê dirêj û xweşik bû.

Şîrîn di nava aramiyek bêdawî de bû, navê hemû kesî yek bi yek ji martibû û bi silavên taybet bo wan şandibû. Çend caran li ser hev gotibû; "em dê bi serkevin. Êdî em winda nakin. Dê jina azad bi serkeve". Çavên wê yên ku roniya wan kêm bibûn hinekî xemgîn bûn.

Lê rûyê wê zelal bû. Dema min Şîrîn hembêz kir, mîna ku qet nedixwest min berde, baskên xwe li min pêça bû û li hemberî celadan serbilind bû. Bi gavên giran, hêdî-hêdî meşiya... Dema Şîrîn ji ber çavên min winda bû, ji zûde

dilê min jî çûbû sêdarê. Lê ez baş dizanim sêdara pergela îdamê di bin mezinahiya dilê Şîrîn de hilweşiyaye…

Çûm ber şibaka menzelê, hîvê xwe di bin ewrên meha Gulanê de veşartibû û li Rojhilatê hîvê çar stêrk li dû hev xuriçîbûn…

***        ***        ***

# NAME Û WÊNE

Du nameyên **Şîrîn Elem Huliyê** ji girtîgeha Êvînê

**Ez rehîneyek im…**

*13/02/1389 – 3/05/2010*

*" Ji ber ku ez Kurdim, min bidarve dikin "*

Sê salên min li girtîgehê tije bûn, yanî sê salên bi êşa li pişt tîrkên girtîgeha Êvînê, ku du salên dema girtîbûna xwe vala û bêy parêzer û bêy hebûna hukmekî wek qirara girtinê derbaz kir.

Di dema desteseriyê de min rojên gelek tehil di destê sipahê[1] de derbas kirin û piştî wê jî lêpirsînên benda 209'ê dest pêkirin. Piştî 209'ê jî min dema mayî li benda giştî derbas kir. Daxwazên li pey hev ên min ji bo diyarkirina qederê bê bersiv dihêştin, heta ku di dawiyê de hukmê naadilê îdamê dan min.

Ji ber çi di girtîgehê de mam? Çima divê ez bêm îdamkirin? Gelo bersiv ji ber Kurdbûna min e? Ger ji ber vê be ez jî dibêjim: ez Kurd ji dayik bûme û ji ber Kurdbûyina xwe min êş û zehmetî kişandine.

---

1 *Ew behsa „Spahê Pasdaranê Ênqilab" dike ku li pey desthilatdariya Xumêynî li Îranê hate damezirandin. Roja îro hemû sazîyên mezin û fêrmî yên Îranê di bin kontrola Spahê Pasdarên Ênqilab"ê da ye.*

Zimanê min Kurdî ye, ez bi zimanê xwe bi malbat, heval û nasên xwe re ketime nava têkiliyan û bi wê mezin bûm û zimanê me pira peywendiya me ye. Lê, îzin tune ku bi vî zimanî biaxivim, bixwînin û di dawiyê de rê nadin bi zimanê xwe binivîsim. Ji min re dibêjin dest ji Kurdbûna xwe berde û înkar bike. Ez jî dibêjim: Ger ez karekî wisa bikim ez xwe înkar dikim.

Qaziyê rêzdar, lêpirserê hêja!!

Di vê dema ku we lêpirsîn ji min dikir, heta min nedikarî bi zimanê we biaxivîm jî. Ez di wan du salên mayîna li beşa jinan a girtîgehê de bi rêya hevalên xwe hînî zimanê Farsî bûme, lê we bi zimanê xwe lêpirsîn ji min kir, ez mehkeme kirim û hukim li ser min da. Di halekê de ku min nedizanî çi li derdora min diqewime û min nedikarî xwe biparêzim.

Cureyên îşkenceyên ku we li min kirine, bûne kabosên şevên min, êş û janên rojane ji ber îşkenceyên li ser min pêkhatî bi min re rojan tînin dawiyê.

Derbên ku di dema îşkencê de li serê min dane, bûne sedema giraniya serê min. Gelek rojan êşên giran êrişê dikin, êşa serê min ewqas girane ku nizanim li dora min çi diqewime. Carna ez bi saetan ji hişê xwe diçim û xwîn ji difina min tê û piştre hêdî-hêdî vedigerim ser rewşa asayî û têm ser hişê xwe.

Xelateke din a îşkencekaran kêmbûna ronahiya çavane û her ku diçe kêmtir dibe. Ku hêjî daxwaza min ji bo berçavkê bêbersiv maye.

Dema ketim girtîgehê pore min yekdest reş bû, niha ku sêyemîn sala mayîna di girtîgehê de derbaz dikim, her roj şahidê spîbûna beşek ji wan im.

Ez dizanim we ev îşkence tenê li ser min û malbata min pêk neanîne, belku li zarokên hemû gelê Kurd û bi taybet li ser kesên weke: Zeyneb Celaliyan, Ronak Sefazade û yên din jî tê kirin. Çavên dayikên Kurda li benda dîtina zarokên xwe hertim bi girî ne. Ew ji ber egera bûyeran hertim dilperîşan û mişawiş in, her lêdaneka telefonê û egera bihîstina xebera îdamkirina zarokên xwe, wan vediciniqîne û dêxe wehşetê.

Îro 2'yê Gulana 2010'an e. Piştî demeke dirêj cardin ji bo lêpirsînê ez birim beşa 209'a Êvînê û cardin suchên xwe yên bê bingeh derheqa min da dubare kirin. Ji bo rawestandina biryara îdama min, ji min xwestin ku alîkariya wan bikim. Lê ez nizanim, dema ku min gotinek zêdetir ji tiştên gotî tune, daxwaza hevkariyeke wisa tê çi wateyî? Di encamê de ji min xwestin tiştên ku dibêjin dubare bikim, lê min wisa nekir.

Lêpirser got: Me sala par dixwest te serbest berdin, lê ji ber ku malbata te bi me re hevkarî nekirin, kar giha vêderê. Lêpirser bi xwe got ku ez di destê wan de rehîneyekim û heya ku ev negehîjin armancên xwe yê min rabigirin, yan di encamê de îdam bikin, lê azadî qet!

Serkeftin

***Şîrîn Elem Hulî***

### *Serbihuriya girtin û işkenceyên li ser min*

Ez di meha Nîsana 2008' an de li Tehranê ji aliyê çend kesên bi cilên sivîl hatim binçav kirin, yekrast ez şandim binkeya hêzên Sipahê. Bi ketina hundur bêy ti lêpirsîn û bersivan dest bi lêdana min kirin. Ez bi giştî 25 rojan di binkeya Sipahê de mam, 22 rojan di girava birçîbûnê de bûm û tevaya wan rojan rastî îşkenceyên giranên fîzîkî û rewanî hatim.

Lêpirser mêr bûn û ez bi kelepçeyê bi textê ve hatbûm girêdan. Wan bi batona elektirîkê, qamçî, mist û pênan li ser û rûyê min, laş û binê piyên min dixistin. Heta di wan heyaman de min nedikarî bi temamî Farsiyê fêm bikim û biaxivim. Dema ku pirsên wan bêbersiv diman, dîsa dest bi lêdanê dikirin heta ji hiş diçûm. Dema dengê bangê dihat û ev ji bo nivêjê diçûn ligor ku wan bi xwe digot derfet didan min ku baş fikrên xwe bikim û dema ku vedigeriyan, cardin lêdan, ji hiş çûn, ava sar û...

Dema ku didîtin ez li ser mangirtinê bi îsrarim, dixwestin bi rêya sonde û sêromên ku ji rêya difinê dişandin mîdeya min, mangirtina min bişkînin. Lê min ber xwe da û sonde radikêşan ku dibû sedem xwînber bûneke zêde û bi êş ku piştî du salan hêjî şopa wan maye û min gelek nerehet dike.

Rojekê di dema lêpirsînê de, pêneke ewqas bihêz li zikê min dan ku dem û dest tûşî xwînrêjiyek zêde bûm. Rojeke din yek ji lêpirseran hat cem min, tenê lêpirserek bû ku min rûyê wî dît. Di demên din de çavbend li çavên min bû. Gelek pirsên eleq beleq ji min dipirsîn, dema bersiv nebihîst, şeqek li rûyê min da û demance li ser serê min ragirt û got: '' bersiva pirsên ku dipirsim, bide. Ez dizanim ku tu terorîst û endama PJAKê yî, keçê bizanîbe tu

biaxivî yan ne ferqek nake, em kêfxweşîn ku endameka PJAK’ê di destên me de dîle’’.

Carekê dema doktor bo dermana birînên min hatbû, ji ber lêdanan ez di dinyaya xewn û hişyariyê de bûm. Doktor ji lêpirser daxwaz kir ku min bişînin nexweşxanê. Lêpirser pirsî: ’’ Çima lazime li nexweşxanê bê derman kirin, ma li vir çareser nabe?’’

Doktor got: ji bo çareseriyê nabêjim, li nexweşxanê ez karekî dikim ku ew keç weke bilbilan bo we bikeve axiftinê’’. Roja paştir ez bi kelepçe û çavbendê birim nexweşxanê. Ez li ser text razandim û derziyek li min dan. Wer bêjî min hay ji xwe nemaye û bersiv dida her pirsa ku wan dixwest û dipirsî, wan jî tevaya dîmenan bi kamerayê qeyd dikir. Dema hatim ser hişê xwe min pirs kir li ku me û min zanî hêj li ser textê nexweşxanê me û piştî wê cardin ez birim hûcreya yek kesî.

Lê wer xuya bû ew yek ji bo lêpirseran bes nebû û dixwestim ez zêdetir ezabê bibînim. Bi piyên birîndar ez li ser pê radigirtim heya ku piyên min diwerimîn, piştre ji bo min cemed dianîn. Şevê heya sibê dengê hawar, nalîn û girîyê dihat û ez bi bihîstina wan dengan têk diçûm, piştre min zanî ku ew dengê qeyd kirî û yê teyipê bû ji bo nerehet kirina min. Yan bi saetan di oda lêpirsînê de dilopên ava sar çipik-çipik bi ser serê min diketin û şevê ez dibirim hûcreyê.

Rojeke din bi çavên girêdayî li ser kursiyê runiştibûm û lêpirsîn ji min dihate kirin. lêpirser cigareya xwe bi destê min vemirand. An rojeke din bi solên xwe ewqas zext anî ser piyê min kir ku piyê min reş bû û nînukên min ketin. Yan hîn rojan bêy ti lêpirsînekê tevaya rojê ez li ser pê dihêlam û lêpirseran xaçepirs bersiv didan(hell dikirin). Bi her hal her tiştê ku ji destê wan dihat dikirin.

Piştî ku ji nexweşxanê vegeriyam xwestin min bişînin benda 209’ê. Lê ji ber rewşa tenduristiya min bi awayekî ku min nedikarî rêve biçim, benda 209’ê ez qebûl nekirim û rojekê ez li ber deriyê 209’ê ragirtim heya ku di encamê de ez şandim nexweshxanê.

Êdî min ferqa roj û şev nedizanî, nizanim çend rojan di nexweshxaneya giştiya Êvînê de mam heya birînên min hinek baştir bûn, piştre ez veguhestim benda 209’ê û lêpirsîn li vê derê destpêkirin. Lêpirsînên 209’ê teknîk û şêwazên taybetî yên xwe hebûn û li gor gotina wan bi siyaseta sar û gerim nêz dibûn. Destpêkê lêpirserê tûre û girj dihat û ez îşkence û tehdîd dikirim ku ti qanûnek ji bo wî girîng nîne û her karê ku dilê wan bixwaze bi min re dikin û...Piştre lêpirserê baş û aram dihat û ji wî dawa dikir ku dev ji wan karan berde. Cixareyek dida min û cardin pirs dubare dikirin û ev dewra batil cardin dubare dibû.

Di heyama ku di 209’ê de bûm, bi taybet rojên destpêkê ku lêpisrîn hebûn, rewşa min baş nebû û xwîn ji difna min dihat, tenê di hûcreyê de derziyeke arambexş li min didan ku dibû sedema razana min di tevaya dema rojê de. Ez ji oda yek kesî dernedixistin û nedibirime bêhdariyê...

***Şîrîn Elem Hulî***

*Beşa jinan a girtîgeha Êvînê*

Hiûn dikarin canê

Min digirin ema

Nikari şerfa Min

ji Min bigirin

آزادی از کودکی

آعازمی شود

Rêb



۲۰/۴/۱۳۸۸

شیرینم

دلم ابریه و روحم زخمی، گویی پر از آه‌ها، آه‌هایی که انگار بی‌شمار

دریغ دارد که همراهی نیست. کاش تنها بودم که تنها بودن تجربه زیبایی است

زمان از باورهای شکسته‌ام که لحظاتی رحم نمی‌کند

باور نبودن مرا وادارم به ماندن و تجربه کردن می‌کند. ماندنی اجباری و تجربه‌ای

تلخ. فصل سنگینی‌ست فصل کوچ پرستوهاست از سرزمین عشق و

مرا این خزان زمین در ماندن وجود تو التیامی است بر همه دلتنگی‌ها و

شکسته‌های اعتراف نشده، یاران سفر کرده، غریبه‌هایی که به زودی

نام دوست می‌شد بر آنان نهاد.

این بازی زندگی است، جای تعجب باقی نمی‌گذارد این تجربه زندگی

باید گذراندش و گذشت و زندگی را آن گونه که هست پذیرفت

تقدیم دوستانی

بعد تلخ بودن

سیلوا


امین

ساعت یازده شبه و اتاق ما هنوز هم شلوغ و پر سر و صداست.
تو هم هنوز اینجایی و خدا رو شکر به ۲۰۹ منتقل نشدی. فقط
به خاطر دعاهای ... بود ؟ . شیرین اگه زودتر از تو
آزاد شم خیلی دلم برات تنگ میشه. دلم می‌خواد تو رو تو دنیای
آزاد ببینم - (قرارمون که یادته ... ؟) ولی قول بده
تا اون موقع مراقب خودت باشی. این روزها هم بالاخره
یک روز تموم میشه (مثل یک مرد) و تو اینقدر قوی هستی که
این تجربه رو هم با موفقیت بگذرونی. من برات دعا می‌کنم
که خداوند همه این لحظات سخت رو
در کنار تو و با تو باشه عزیزم.

تو دوست خوب منی.

مریم جون

۱۳۸۸/۷/۲۲



۱۳۸۹/۴/۲۵




**Şehîd Şîrîn Elem Hûlî**

شهيد شيرين علم هولي














2004 12 16


NNS ROJ


بازداشتگاه اوین
Evin House Of Detention